

Îkram Oguz

Jîyan bi kurdî xweş e!



Weşanên navkurd: 1

Jîyan bi kurdî xweş e!

İkram Oğuz

Berg: navkurd
Tarîxa Çapê: Adar; 2019

Weşanên navkurd
Goerdelerstr. 16
70806 Kornwestheim

Tel: (0049) 0152 33 52 08 06

Mail: navkurd@gmail.com

facebook:www.facebook.com/navkurd/

Jîyan bi kurdî
xweş e!

Îkram Oğuz

Naverok

Jîyan bi Kurdi xweş e!	15
Pêgihîştina ziman û raman!	17
Nîyet û kîrin!	26
Ziman û bikaranîna ziman	29
Gelo Kurd çima xwe dixapînin!	31
Xwedê Kurdan, ji Kurdên zimantirk biparêze!	34
Roja zimanê zikmakî!	37
Şer û wêje... ..	40
„Mirovê av bi kizmorîkê dabû vexwarinê...“	44
Çend gotinên pêşîyan!.....	48
„Aqilê sivik, barê giran!..“	50
„Xalo, ez kulaba diçînim!“	52
„Ax piştî min...!“	55
„Hêk bê pîvaz tê xwerin!“	58
Ronakbîr û xwerina qapusqayê.....	61
Çoyê şivan û qoçê bizinê!.....	64
„Ya dizanim ew e ku, ez tu tiştêki nizanîm!„.....	67
Bavê min û Şivan, ez û Şakiro.....	69
Awazên Şakiro û rewîtîya min.....	75
Mirov di dinyayek piçûk de xwe mezin dibîne	78
Rêwîtîya di nav çend pirtûkên Kurdî da!	80
Kurd Îdol.....	84
Dikana Evdo.....	87
Tucarê têk diçe, dest davêje defterên kevn.....	90
Tirk û biratî.....	94
Bawerî mîna evînê ye, bi zorê nabe.....	97
Kurd bi bêdengiya xwe dibin şîrikê qatîlên xwe!	99
Kesên nezan weke mîh ên kol in.....	102
Pereyê di berikê da û îmana di dil da!	103
Tirs.....	105
Şivan û huner.....	107

Jiyana bi hesûdî.....	109
Ajansa 19ê êvarê... ..	112
Xalê Resûl û kap a gur.....	115
Mesela kivkark û biroşê.....	118
Daweta cinan û qafikê pîvazan.....	121
Xalê Qero û çîroka ruhustîn.....	126
Bavfile!.....	131
Mifreze û bejna Naso ya xil û xwar.....	134
Navê kerên Hemê.....	140
Kurd û nasnameyên li ber mirinê!.....	142
Newala waweylê!.....	145
Gelo Kurd li neynikê mêze nakin!.....	148
Kurdên Bakûr!.....	150
Teknolojî û Kurdên binerd.....	152
Doza pêneriyê û navê çayikê.....	154
„Zêdeyîya keviran davêjim, peyker dimîne.“.....	158
Kurdên Bakûr û rexneyên vala... ..	161
Ferqa Kurdên Bakûr û Başûr... ..	164
Kurdistan hêdî hêdî mezin dibe.....	166
Roj roja serxwebûnê ye!.....	169
Şahîyek çandî û civakî: Dawet.....	171
Cejna qurbanê û civat.....	177
Cejna remezanê û piçûktîya min.....	180
Destpêk û dawî.....	184
Serê salê binê salê.....	186
Newroz.....	189
Zarok wekî firîşte çavên xwe li dinê vedikin... ..	192
Bi çavê Ronî Kurd û Kurdistan!.....	195
Bu kafir xwe, bu misilman hevalê xwe xilaskir.....	198
Ji şêxan ra paletî ji serokan ra koletî... ..	201
Mele Mahmûd û gotina rast.....	204
Saeta bavê min... ..	208
Destpêka dawîyê.....	216
Xewn û xeyalên kin û dirêj.....	218

İkram Oğuz

Di sala 1962an da li gundeki Tekmanê, Xanbegiya Jêrin, ji dayîk bûye.

Mekteba ewil li gund, ya navîn û lîse jî li Erzurumê xwendiyê.

Di dema 12ê Îlonê da tê binçavkirin.

Di navbera salên 1984-88an da li Zanîngeha Îstenbolê Fakolta Îktisadê dixwîne.

Çend salan li Îstenbolê di firmayeka taybet da wek rêvebir dixebite.

Bi destpêka sala 1992an da dest bi karê çapemeniyê dîke.

Di navbera salên 1992-94an da dibe xwedî û berpisiyarê giştî yê Rojname ya Azadî.

Sedem nivîsên wî û xwedîtiya wî ya rojnameyê di derheqê wî da bi sedan dawe vedibûn û tê cezakirin...

Di sala 1995an da derdikeve dervayî welat, karên xwe yê sîyasî li Ewropa didomîne.

Di dawîya salên 90'î da dest ji sîyaseta aktif berdide û di firmayek taybeti da wek rêvebir dest bi xebatê dîke.

Di sala 2004'an malpera <http://www.navkurd.net> dadi-mezrîne û ji wê demê vir da berpirsiyariya malperê dîke û di malperê da bi Kurdî dinivîsîne.

Bi navê Şevîn û Kejal du qîzên wî hene...

Berhemên wî:

Mîro, Roman, Weşanên Do, 2014

Rêwî, Roman, Weşanên Doz, 2017

Pêşgotin

Jîyan bi Kurdî xweş e.

Jiber ku, Kurdî ji bo min ne tenê ziman e.

Kilam û stranên dengbêjan...

Çîrokê çîrokvanan...

Ken û henekên qîz û xortan...

Reng û dengê jîyana Kurdan...

Hebûn û xemla jîyana min e...

Di heft salîya xwe da min dest bi xwendina Kurdî kir. Piştî hînbûna jibo xwendina Quranê, min pirtûka Ehmedê Xanî ya bi navê Nubahara Piçûkan û Mewlûda Mele Ehmedê Batê xwend. Jiber ku, li her derên ku dersa Quranê dihat dayîn, li wir ev herdu pirtûk jî bi tîpên erebî dihatin xwendin. Dema ku min dest bi xwendina wan kir, ne haya min ji Ehemdê Xanî ne jî ji Mele Ehmedê Batê hebû. Herdu pirtûk jî weke ayetên Quranê gotinê Xwedê dihesibandin. Bi destpêkirina dibistana ewlin va weke her zarokeke Kurd, ez jî bêhemdê xwe ji axaftin û xwendina bi Kurdî dûr ketim.

Salan şûnda, di dema xortaniya xwe da careke din li ser zimanê xwe yê li ber mirinê vegeyîyam. Mixabin wê demê jî ne pirtûk ne jî kovar û rojnameyeke bi Kurdî bidest diket.

Di dawîya salên 70yî da kurteçîroka Samed Bahrengî ya bi navê Masîyê Reşê Piçûk, ku di Rîya Azadî da hatibû weşandin, xwend. Dû ra, Destana Memê Alan, di dema zanîngehê da jî romanên Erebe Şemo, Şivanê Kurd, Hopo, Jîyana Bextewar û Kela Dimdimê bi awayekî bidestxist.

Min berga wan bi rojnameyên kevn dinixamt û di kuncikekî da bi dizî dixwend. Mixabin wê demê ji xwendina xwe sedî sed fam nedikir. Jibo ku zimanê min li min vege-re, her romanekê dubare û sêbare dikir. Dem û demsal derbas bûn, bi guhartin û pêşveçûnên teknolojiyê va di-nya me jî guherî. Dinya ku bê serî û bê binî dihat tarîfki-rin, piçûk bû. Di wê dinya piçûk ta îmkân zêde, astengên ku dewletên dagirker weke berfa belanên Çiyaye Şahwe-lat derxistibûn pêşîya me, roj bi roj helîyan û yekoyek ji holê rabûn. Bi saya pêşveçûna teknolojiyê îro her kur-dek, li her derê dinê û her dem dikare kovar, rojname û pirtûkên Kurdî bixwîne, li kilam û stranên Kurdî guhdarî û li filmên Kurdî jî temaşe bike...

Bêguman bi pêşveçûna teknolojiyê va ne tenê dinya, Kurd jî guherîn. Gelek Kurd li ser zimanê xwe yê li ber mirinê vegeşîyan û îro bi zimanê xwe yê şêrîn dixwînin, dinivîsînin û bi Kurdî dijîn...

Min jî 15 sal berê dest bi nivîsandina Kurdî kir û heta roja îro du roman û bi sedan makaleyên bi Kurdî nivîsand.

Bi sedan çîrok û romanên Kurdî xwend, bi saya xwendin û nivîsandinê, kurdîya min roj bi roj pêşda çû, zimanê min ê şêrîn, zelal û dewlemend bû.

Îro ez jî di her xalê jîyana xwe da zimanê xwe yê weke şîrê dîya min şêrîn û zelal bikar tînim û dijîm.

Bi jîyana xwe ya Kurdî ra, şad û bextewar, kêfxweş û ser-bilind im.

Ji ber vê yekê ye ku dibêjim, jîyan bi Kurdî xweş e!

Piştî weşandina romana xwe ya bi navê „rêwî“ min biryar dabû ku, ez ji nivîsên xwe hinekan tomar bikim û weke e-pirtûk, li ser înternetê biweşînim. Jibo vê yekê di nav arşîva xwe da gerîyam û 65 nivîsên ji sîyaseta rojane dûr, hîlbijart û wek weşana NavKurdê ya yekemîn tên weşan-din.

Çima e-pirtûk?

Ji du sedeman min biryar da:

Ya yek, piranîya nivîsan jixwe di nav 15 salên dawî da, di <http://navkurd.net/> ê da hatibûn weşandin.

Ya din jî, xwendina pirtûkên bi Kurdî, di nav Kurdan da hê jî kêr e. Pirtûkên ku tên çapkirin, ew ji, bi taybetî li Tirkîyê li her derê nayên firotan. Ev yeka jî bi serê xwe tenê astengeke mezin e. Dema ku pirtûkek di her pirtûkxaneyê da neyê dîtin, nagihîje destê xwendevanan û nayê xwendin.

Di vî warî da <https://www.pirtukakurdi.com/> herçiqas bi rîya înternetê bazara pirtûkên Kurdî bike û karekî pîroz bîne cîh jî, barê nivîskar û weşanxaneyan sivik nake.

Kurdên ku îro ji xwendina Kurdî tama pêşîrên dîya xwe digrin û dixwînin, piranîya wan bi medyaya sosyal ra têkildarin. Ew hergav dikarin e-pirtûkên Kurdî daxînin ser computer ya jî telefona xwe û li her derê wan bi hêsanî bixwînin...

Ji bo vê yekê jî ne hewce ye bedelek bidin, ne jî jibo bi-destxistina pirtûkan bahaneyek bibînin...

Loma ez dibêjim, bila pêşkêşkirina e-pirtûkê ji min, xwendina wê jî ji we be...

Îkram Oğuz

Kornwestheim, 01.03.2019

*Ez Kurd im, çîyayî me û kenarî
Van çend peyvên min ên kurdewarî
Îmza bikin ji kerema xwe, bi qencikarî
Û bi guhê însafê li wan bikin guhdarî*

Ehmedê Xanî

Jîyan bi Kurdi xweş e!..

Mirov qasî tama ku ji zimanê xwe digre, ewqas welatperwer e...

Kurdî, zimanê min ê zikmakî, zimanê dîya min.
Zimanê ku di zaroktîya xwe da pê girîyam û kenîyam.
Zimanê ku pê axifim, pê lîstim û mezin bûm.
Zimanê ku, di heft salîya min da, ji alî neyarên bavû kalên min va, bi destê zorê li min hate qedexekirin.
Wê rojê, tu car jibîr nakim.
Ew roja ku min dest bi dibistanê kir û kerr û lal bûm...
Guhê min xitimîn, zimanê min di devê min da tevizî...
Axaftina min hate birîn.
Kenên min revîyan û ji min dûr ketin.
Şev û roj, li der û hundir, li mal û dibistanê, li çol û çîyan, bê deng û seda, di dilê xwe da girîyam. Wê rojê, di zaroktîya min da, jîyana min ji min hate dizîn.
Jiyaneke bîyanî û derew derket pêşîya min. Zaroktî û xortanîya min, ji zimanê dayîka min dûr derbas bû.
Zimanê min ji min xeydî, ez ji tama wî bêpar mam.
Bîst salên min bi zimaneke bîyanî, bi zimaneke pûç û vala, bi zimanê neyarên bav û kalên min derbas bû.
Bêken û rûken...
Piştî bîst salan, rojekî li bajarên xerîb û di nav kûçe û kolanên tarî da, li pey rêça zimanê dayîka xwe ketim û careke din lê vegerîyam.
Ji axa welatê xwe dûr, rastî Ereba Şemoyê nemîr hatim.
Bi Jîyana Bextewar ra li koka xwe gerîyam...

Bi Şivanê Kurd ra, ber bi welatê bav û kalên xwe çûm...
Bi Hopo ra ketim nav Kela Dimdimê, li wir, bi mêrxasî û
dîroka dewlemend a gelê xwe hesiyam. Di bin sîya bircên
Kela Dimdimê da, min ji xwe ra warek nû ava kir.
Ji nû va bi zimanê dayîka xwe axifîm, bi zimanê dayîka
xwe keniyam û ji şabûnê weke demên piçûktîya xwe bi
dengêkî bilind pê giriyam.
Guhên min ên xitimî vebûn.
Zimanê min ê tevizîbû, ji nû va livîya.
Ken hatin ser rû û rûçikên min.
Şev û roj, bi kêf û eşq, bixwe jixwe ra axifîm û li axaftina
xwe guhdarî kir...
Bê navber û bê westan...
Bê xew mam...
Di nivê şevê da dengê Şakiro kete guhê min.
Bi kilam û awazên wî ra jîyana min dewlemend...
Bi stranên Şivan va rengîn bû.
Bîr û bawerîyên min xurt bûn...
Jîyana min careke din ji nû va guherî...
Piştî xwe da salên xwe yên wendayî.
Berê xwe da pêşerojê û di jîyana xwe da rûpelek nû vekir.
Di wê rûpelê da îro bi dilekî şa...
Bi mêjûyekî zelal û bi rûken...
Bi zimanê xwe yên zikmakî.
Ew zimanê ku dayîka min bi lorîyên xwe min mêjandibû
û mezin kiribû...
Ji dil va difikirim...
Dikenim û diaxifim...
Dixwînim û dinivîsînim...
Bi dewlemendîya zimanê min...
Dilê min geş, hestên min azad...
Jîyana min xweş û rengin dibe...
21.02.2016

Pêgihîştina ziman û raman!

Di salên 90'da me li Stenbolê bi navên Kurdî kovar û rojnameyek diweşand. Ji bo danasîna wan, me şahîyên çandî lidarxistibûn û ji çar parçeyên Kurdistanê huner-mend vexwendibûn.

Ji wan hunermandan yek jî Seîd Gebarî bû.

Seîd Gebarî ji Başûrê Kurdistanê hat û qedere mehekî li Îstenbolê ma. Her şevê di mala hevalemî da dibû mevan, bi serê sibê ra dihat kargeha rojname û roja wî jî li wir derbas dibû.

Şahî qedîyan, karê Seîd Gebarî jî xilas bû û dema vegera wî hat. Roja ku vegere, berî xatir xwestinê, gilî û gazinê xwe li me hemûyan kir û got:

„Dewleta Kemalîst di nav 70ê salan da zimanê we guhart û mala we xirab kir, we jî di nav hefteyekî da mala min xirab kir..“

Seîd Gebarî neheq nebû.

Navê rojname û kovara me bi Kurdî, mixabin naveroka wan, ji % 90 bi zimanê Tirkî bûn.

Me daw û doza Kurdistanê azad dikir, lê kar û barê xwe yê sîyasî û rojane jî dîsa bi zimanê Tirkî bi rê ve dibir.

Laşê me Kurd, mêjûyê me bi Tirkî dixebitî.

Daxwazên me daxwazên Kurdistanî, zimanê daxwazên me jî Tirkî bû.

Di ser wan rojan da 25 sal derbas bû, di vê navberê da Kurd, di warê sîyasî û çapemenîyê da gavên gelek balkêş avêtin. Îro di bin destên wan da bi sedan kovar û rojname, radyo û televîzyon he ne. Lê ew malxirabîya ku me

salan berê li Seîd Gebarî kiribû, Kurdên Bakûr îro wê malxirabîyê qat bi qat li çar parçeyên Kurdistanê dikin û hem mala xwe, hem jî mala wan xirab dikin.

Mijara ziman û raman mijareke grîng e...

Birîna Gelê Kurd ya herî kûr e...

Di derbarê mijara pêgihîştina ziman û raman da Antropolog dibêjin, tiştê ku mirovan ji candarên din vediqetîne ew jî raman e. Raman jî bi ziman tê îfadekirin. Sedem vê yekê ye, ku mirov dikare bi hêsanî bibêje, ziman veguhastina raman e. Pêwendîya ziman û raman, her tim bala zimanzan û zanyaran kişandiye.

Ji wan kesan yek jî Antropolog Edward Sapîr e. Sapîr, ziman weke forma raman binav dike û dibêje:

„Cudahîya di zimanekî da cîh digre, di zimanekî din da nîne. Em xwezayê ancak gor îmkana ku zimanê me rê dide, dibînin û tarîf dikin. Bi guhartina ziman va forma raman jî tê guhartin. Civatên ku zimanên wan ji hev cuda be, sîstema ramanên wan jî ji hev cuda ye.“

Gor vê hîpotezê, her civat gor zimanê xwe, xwezayê tarîf dike û gor zimanê xwe jî bîçimê dide raman û çanda xwe. Dîsa gor encamên zanistî antropolog dibêjin, mirov ancak bi hin taybetîyan va dibin mirov.

Bi pêdivîya zanînê, mirov zanînê, bi pêdivîya bedewîyê, mirov bedewîyê hildibirîne, hunermendîyê dike û ji hûner zewqê digre. Gor rasteqîna xwe an jî gor rasteqîna civatê, rê û dirban dide ber xwe û tevdigere. Ev hemû taybetî, bi ramanê mirov va girêdayî ne.

Mirov, têkilîyên di navbera tişt û bûyerên ji xwe û ji derwayê xwe dibîne, wan bi hev ra muqayese dike û ji wan encaman dertîne. Bi vî awayî, ji karê gihîştina encama ku ji têkilîyên di navbera tişt û bûyerên gerdûnî da derdikeve, ramîn, ji gihîştina encama ku ji ramînê tê derxistin jî raman e.

Mirov, hebûna xwe ancax bi saya ramanê xwe kifş dike û jê hayîdar dibe.

Di navbera ziman û raman da têkilîyeke girîng he ye. Ziman û raman her yek weke her rûyê kaxizêkî bi hev ra girêdayîne.

Ziman, qalib û qab û amûra raman, tiştên ku raman şênber dike, ew jî ziman e. Ramanê ku ji alî ziman va nehatibe şênberkirin, nabe raman.

Raman heta ku nebe gotin û neyê ziman, hebûn û qîmeta wî jî nayê zanîn. Ji ber ku mirov ramanên xwe gor qalibên ziman, bi peyv û hevokan va tîne ziman û bi kesên din ra parve dike.

Beranberîya tiştên ku mirov bi peyvvan tîne ziman, di mêjûyê wan kesan da ancax bi marîfeta pêyvvan va tê fam kirin.

Hîm û amûra raman peyv, mala wî jî ziman e.

Gelo, mirov difikire ku diaxife, an jî diaxife ku difikire?

Ev pirs ji dema Yewnan a Kevn vir da tê gengeşîkirin.

Weke Mînak:

Eflatun dibêje; „raman axaftina bêdeng e“ û rola ziman nîşan dide...

Deskardes jî dibêje; „difikirim ku, ez he me!“ û rola raman derdixe pêş...

Filozofê Alman Leibniz jî, ziman weke neynika hiş bi nav dike û dibêje; „hiş û ziman bi hev ra girêdayî ne.

Peyv ne tenê ji bo ku mirov nêrînên xwe bi hin kesan ra parve dike, dema ku mirov tenê bifikire jî peyv jê ra lazim e.

Mirov bi hin kesan ra biaxife, an jî bifikire, hişê wî li şûna tiştan peyvvan datîne, ku ev jî karê hiş hêsan dike. Peyv çiqas baş, çiqas bikêrhatî û zelal be, hiş jî ewqas zelal û bikêrhatî dibe.

Dem a ku mirov ji zimaneke bîyanî, koka peyvvan baş hîn

nebe, mirov wan peyvan ji ber dike, hînbûna bi jiberkirinê jî, hişê mirov şêlû, xebata mirov jî asteng dike...”

Ji ber ku ziman li alîkî enstrûmana vegotina hiş e, li alîkî jî hiş dikemilîne.

Qalibên ziman, ew qalibên ku mirov ji zikmakî da werdigre, di wan qaliban da mantiqên veşartî hene, ew jî hişê mirov didirûvînin. Ew çiqas zelal û paqij bin, hiş jî ewqas zelal dibe û baş dişixule...

Ziman û têgihîştina zarokan

Ji kîjan milêti dibe bila bibe, her zarok peyva xwe ya herî ewil bi zimanê xwe yê zikmakî tîne ziman.

Bi zimanê xwe yê zikmakî digrî û dikene.

Bi zimanê xwe yê zikmakî kilam û stranan guhdarî dike û distirê.

Dab û nêrîtên civaka xwe, çand û huner û dîroka gelê xwe bi zimanê xwe hîn dibe.

Bi zimanê xwe yê zikmakî xwe îfade dike, fikr û raman û şexsiyeta wî bi zimanê dayîka wî pêdigihîje.

Ji bo pêşerojê, bi zimanê xwe, ji xwe ra li rê û dirban digere.

Her zarok ancax bi zimanê xwe dikare binirxîne û biafirîne.

Ji ber ku ziman ne tenê amûra ragihandin û pêwendîyê, ziman nîşana nasnameyê ye, ku ji bo her miletek weke ruh û can e!

Mirov dikare bibêje, ew zarokên ku di civakên azad û xwedî dewlet da mezin dibin, bikaranîna zimanê xwe yê zikmakî, ramanên xwe dewlemend û berfireh dikin. Bi dewlemendî û xurtbûna ramanên wan jî, zimanên wan dewlemend dibe û pêşda diçe.

Ev pergala gerdûnî, di nav Kurdistan da, bi taybetî li Kurdistanê Bakûr, bi awayekî din tevdigere.

Sedemê qedexebûna ziman, her zarokeke Kurd, di heft

salîya xwe da ji zimanê xwe yê zikmakî dûr dikeve û bi zimanek bîyanî perwerde dibe. Wek zarokeke Kurd dest bi dibistanê dike, piştî dibistanê wek xorteke Tirk vedigere mala xwe.

Dê û bav pê ra bi Kurdî biaxifin, ew bersiva wan bi Tirkî dide.

Kurdên bajêrî, bi piranî di nav malên xwe da, bi zar û zêçên xwe ra, bi Tirkî diaxifin, di her xalên jîyanê da zimanê Tirkan bi kar tînin.

Kurdên ku ji çerxa asîmîlasyonê dûr mane, di gundan da dijîn ku, ew jî di jîyana xwe ya rojane da, bi deh peyvan biaxifin, moxabin îro wan peyvan jî bi saya pêşveçûna teknolojîyê, nîvkurdî û nîvtirkî, herdu zimanan tevlihev dikin û tînin ziman.

Ji bo vê yekê ye ku zimanê Kurdên Bakur îro zimaneke tevlihev û birîndar e.

Birîndarîya ziman jî, ray û ramanên wan tevlihev û şêlû dike.

Pêwendîya ziman û tekoşîna gelên bindest...

Di jîyana gelan da, bi taybetî di jîyana gelên bindest da ziman xwedî roleke mezin e.

Di şerê navbera serdest û bindestan da ziman weke alav û armanc tê bikaranîn. Ji ber ku ziman temsîla şaristanî û medeniyetê dike û berhemên wan vedihewîne. Heta ku ziman bi dest nekeve, ax bi temamî bi dest nakeve.

Ji ber ku ziman amûra xweîfadekirinê û vegotinê ye. Ji bo her milletî ziman xweser û taybetî ye û li gora pêdiviyên wî milletî saz bûye.

Heger ku tekoşîna Gelê Kurd heta îro bi ser neketibe, ji sebebên sereke, yek jî birîndarîya ziman e.

Kurdên Bakur, bi sedsalane ji bo ziman û nasnameya xwe derdikevin serê çol û çîyan.

Dikevin heps û zîندان...

Dukujin û tên kuştin...

Ji welatê xwe, ji axa bav û kalên xwe dûr dikevin...

Mixabin ji bo hînbûn û bikaranîna zimanê xwe gavekî sivik jî navêjin.

Di warê ziman da, sazî û rêxistinên Kurdên Bakûr jî birîndar û seqet in. Ji bo vê yekê ye ku ew tu car dewleteke serbixwe, dewleteke netewe naxwazin û daxwaza dewletbûnê ji bo Gelê Kurd, daxwazeke çewt û guneh dibînin.

Bi daxwaza federasyon û otonomî û xwe(lîli)serîyê, berê xwe, dû ra jî Gelê Kurd dixapînin.

Halbûkî, milletê ku li zimanê xwe xwedî dernekeve, ew zimanê xwe tenê wenda nake, ji çand û hunera xwe, ji dîrok û nasnameya xwe jî dûr dikeve.

Ji hîmê milletbûnê yek jî pûç dibe û dilerize.

Dema ku hîm bilerize, wê gavê tekoşîn û serkeftin jî, milletbûn û xwedî dewletbûn jî dibe xewn û xeyal.

Mîrê Cizîra Botan Bedirxan Beg, di jîyana xwe ya sirgûnê da li ser têkçûyîna xwe û bindestîya Kurdan disekine û gor tecrûbeyên xwe di derbarê ziman û tekoşîna Gelê Kurd da wuha dibêje:

„Di tekoşîna gelê bindest da, gelê bindest xwedî sê çek û sîleh in. Ji wan yek ol (dîn), yek ax, yek jî ziman e. Heger ola gelê bindest û serdastan yek be, wê gavê çeka olî ji destpêkê da ji holê radibe. Heger serdest, rêvebir û rewşenbîrên gelê bindest ji axa wan dûrbixînin û bi demografiya axê ra bilîzin, wê gavê ax jî ji dest derdikeve û tenê ziman dimîne. Dema ku gelê bindest li zimanê xwe xwedî dernekeve û di hemû xalên jîyana xwe da bikar neynê, wê gavê gel jî, çek jî namîne“.

Gotinên Mîr Bedirxan, qasî rastîya xwe, ewqas jî ji bo hemû Kurdan, bi taybetî jî ji bo rewşenbîr û nivîskaran, hosîyeke netewî û dîrokî ye. Mixabin, Kurd bi piranî heta roja îro li hosîyên wî xwedî derneketin û ew neanîn cîh.

Ziman û rewşenbîr

Di daxuyanîya Komîteya Amadekar ya Însîyatîfa Rewşenbîrên Kurd da hevokek bala min kişandibû. Di wê hevokê da tê gotin:

„Em ji bo Kurdistanê yekpar ketine rê, jêr û jora Kurdistanê jî ya meye.“

Sedema ev nivîsa min jî, ev hevok e.

Rast e, armanca hemû Kurdên welatperwer Kurdistanê serbixwe û yekpar e.

Lê ji bo vê yekê çi pêwîst e?

Gor raya min sê tişt pêwîst in.

Îradeyeke xurt

Tevgereke netewî.

Hêz û partîyên Kurd û Kurdistanî.

Ji ber ku rîya serkeftin û serxwebûnê, rêyekî dûr û direj e.

Di wê rîya dûr û dirêj da merhaleyên kin û nêzîk, astengên kûr û dijwar cîh digrin.

Gihîştina encamê, ancax ji derbasbûna merhaleyên nêzîk va mimkûn e.

Ji wan merhaleyan yek jî ziman e.

Ziman îro birîna Kurdan ya herî kûr e.

Qelsîya Kurdayetîyê ye.

Ez bawerim kêmasîya rewşenbîrên Kurd ya herî mezin jî ev e.

Divê Rewşenbîrên Kurd, berî her tiştî li ser vê kêmsîya xwe bisekinin û wî ji holê rakin.

Daxwaza ji bo Kurdistanê serbixwe û yekpar, daxwazeke bêhempa ye. Mixabin, ev daxwaz ne di demeke kurt da, ne jî bi hêsanî tê cîh. Carcaran bi deh salan, carcaran ji bi sedsalan dikude. Di vî warî da nimûneya herî balkêş Gelê Kurd û dîroka tekoşîna wî bixwe ye.

Bi sedsalane ku Gelê Kurd ji bo azadî û serxebûna xwe, bi tekoşerî şer kir û dike. Îro jî bi mêranî û mêrxasî ber xwe

dide. Lê hê jî bi ser neketîye û negihîştîye armanca xwe. Ji bo serkeftinê hêz û partî û yekîtîyeke neteweyî jî carcaran bi serê xwe tenê ne bes in.

Qasî vê yekê şert û mercên pergala dinê jî girîng in. Eger pergala dinê li alî me venegere, em di tekoşîna gelê xwe da bi ser bikevin jî, wek Kurdistanê Başûr, damezrandina dewleteke serbixwe dîsa nîvco dimîne.

Ev yek, qasî sazî û rêxistinên barê rewşenbîran jî giran dike.

Rewşenbîr, bi ray û ramanên xwe, bi zimanên xwe dikarin perspektîvên nû bidin ber sazî û rêxistinên. Ancax bi vî awayî dikarin rola xwe bilîzin û dîsa bi vî awayî dikarin rîya wan ronî, karên wan jî sivik bikin...

Heger sazî û rêxistinên dewletê damezrînin, rewşenbîr jî bi moral û ruhîyeta neteweyîyê, wê dewletê dixemilînin.

Ew bi çi dibe?

Ew jî bi ziman û hunerê bi wî zimanê tê kirin, dibe.

Ji ber ku, îro di navbera Kurd û Tirk û Ecem û Ereban da xênci ziman tu cûdahîyeke din jî nemaye.

Heger ku îro Mîr Bedirxan serê xwe ji gorê rakira û li rewşa me temaşe bikira, ez bawerim wê ji me hemûyan ra wuha bigota; „Ji bo gihîştina armancên xwe yên kûr û dûr, berê dest bi yên nêzik bikin û wan bînin cîh. Bi vê yekê hûnê çeka xilasbûn û serxwebûnê xurt, armancên xwe yên dûr û kûr jî nêzik û hêsan bikin...“

Belê, xebata ji bo yekîtîyeke netewî û damezrandina dewleteke serbixwe, bi deh salan, heta bi sed salan dikude. Lê ji bo hînbûn û bikaranîna zimanê şeş meh û hewldanêke bi ruhê Kurdîyê tenê bes e.

Werin, em di vî warî da biryara xwe ya yekemîn bidin û li pişt biryara xwe bisekinin.

Jiber ku Rewşenbîrên Kurd, ancax bikaranîna zimanê xwe yên zikmakî dibin rewşenbîrên Kurd.

Weke Mînak:

Yaşar Kemal - Mehmet Uzun, Cemal Surreya - Cegerxwîn,
her çar jî Kurd bûn û ji dê û bavên esilKurd peyda bibûn.
Mixabin Yaşar Kemal û Cemal Surreya nivîskar û şairê
Tirk, Mehmet Uzun û Cegerxwîn jî nivîskar û şairê Kurd
in. Sedemê Tirkbûn û Kurdbûna wan jî tenê zimanê wan
e...

Jiber ku, zimanê Yaşar Kemal û Cemal Surreya Tirkî, yê
Mehmet Uzun û Cegerxwîn jî Kurdî ye.

Kar û hunerê rewşenbîrek bi kîjan zimanî be, ew gor wî
zimanî tên binavkirin...

Werin, em ji îro da li ser zimanê xwe yên birîndar vege-
rin, zimanê xwe dewlemend, ramanên xwe jî zelal bikin.

Bi Kurdî bifikirin...

Bi Kurdî biaxifin...

Bi Kurdî bixwînin...

Û bi Kurdî binivîsînin...

Heger ku berî herkesî Rewşenbîrên Kurd, ev armanca
nêzîk bidin ber xwe û di vî warî da bi ser bikevin, wê gavê
rola xwe ya ji bo avêtina hîmê dewleteke serbixwe û yek-
par jî dikarin bînin cîh...

Wek gotina dawîyê, gor raya min her Kurdek qasî ku zi-
manê xwe dizane û wî bikartîne, ewqas xwedî nasname
û xwedî rûmet e!...

Rewşenbîr û ronakbîrên Kurd jî ancax bikaranîna zimanê
xwe dikarin rola xwe bilîzin...

Brûksel, 04.06.2016

Nîyet û kirin!

Nîyet û kirin, bi hev ra girêdayî ne.

Nîyet tişteki nedîtbar...

Kirin jî tişteki berbiçav û şênbar e.

Kirin ji nîyetê pêk tê...

Heger ku nîyet û kirinên mirovan yek nebin û di navbera wan da ahengîyek tunebe, di encamê da nîyet û kirin ji hev cuda dibin.

Carcaran ji nîyetên çê û pîroz, encamên çewt û xelet, carcaran jî ji nîyetên xirab encamên çê û pîroz derdikevin holê...

Wek mîsal; Kurd û kiryarên wan...

Nîyeta Kurdan ya di warê sîyasetê da nîyeteke baş û pîroz e, lê mixabin pirçaran encama kiryarên wan ji nîyeta wan cudatir dibe.

Ez bi xwe tu car ji nîyeta Kurdên ku di nav sîyasetê da cîh girtine û dixebitin, nakevim şikê. Kîjan hêz, ya jî kîjan partî dibe bila bibe, kesên ku di nav sîyasetê da cîh digrin, ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd dixebitin, di bingeha nîyet û daxwazên wan da azadî û serxwebûna Kurd û Kurdistanê cîh digre.

Ew jî nîyeteke baş û pîroz e...

Ji ber ku pirsgirêka Kurd wek goga agir e. Heta nuha kî ku destê xwe avêtibe, ji bo berjewendîyên xwe yê şexsî tu tişteki jê nedîtîye û ji îro şûnda jî tu kes karekî jê nabîne. Bîlakîs di wê rê da bi hezaran Kurd ji can û malên xwe bûn û hê jî dibin.

Ji dewletê zilm û zordarî dîtî û dibînin...

Ji para hinekan ra heps û zîndan, koçberî û sirgûn, ji para hinekan ra jî kuştin û mirin ket û dikeve...

Heger nîyeta Kurdên ku hata îro doza Kurd û Kurdistanê kirin û yên îro wê dozê didomînin, ji nîyeteke baş û pîroz neba, tu kesî cîhê bîla bê sebep destê xwe dirêjî goga agir nedikir û jê dûr disekinî...

Lê dîsa jî mirov dikare bêje, gelo nîyeta baş û pîroz bi serê xwe tenê bes e!..

Nîyeta bê kirin û kiryar, an jî kirin û kiryarên ku ji nîyete cudatir çiqas çê û pîroz in!..

Ji sedsalan virda Kurdên xwedî doz, ji bo ziman û çand û hunera xwe, xwîna xwe rijandin, lê ji bo bikaranîna zimanê xwe gavekî pêşda neavêtin. Rûmet nedan/nadin çand û hunera xwe...

Di jiyana xwe ya rojane da roj bi roj ji Kurd û kurdayetîyê dûr ketin û dikevin...

Sedem cudayetîya nîyet û kiryarên wan, îro encamên çewt û xirab derdikevin pêşîya wan.

Jiber vê yekê ye ku hem ew zîrar û zîyanê dibînin, hem jî kesên derdora wan û nîyeta wan...

Ji salên 90î vir da bi dehan partîyên legal hatin damezrandin.

Rojname û kovarên bi zimanê Kurdî hatin weşandin.

Weşanxaneyên ku pirtûkên Kurdî weşandin û diweşînin hatin avakirin.

Salan berê dewletê bi fen û fût kilît li derîyê partîyên legal dixist û rêvebirên wan dadgeh dikir, îro Kurd bi destê xwe derîyê wan digrin û ji bo xatirê biratîya gelan partîyên nû ava dikin û dikin xizmeta Tirkan.

Rojname û kovarên ku bi zimanê Kurdî weşanê xwe didomandin, ji alî dewletê va dihatin qedexekirin, îro sedem kemasîya xwendevanan, Kurd bi destê xwe weşanên wan dibirin û kilîtê li derê wan dixînin.

Ji bo guhdarîkirina straneke Kurdî canê xwe didan, îro

bi dehan televîzyon bi zimanê Kurdî weşanên xwe dikin, lêbelê piraniya Kurdan berê xwe nadin û li wan temaşê nakin...

Astengên li pêşîya çapemenîya Kurdî ji holê rabûn, Kurdan dest ji çapemenîyê berdan, pirtûkên ku bi zimanê Kurdî tên çapkirin, di kuncikên weşanxaneyan da dirizîn...

Wek dersa bijarte be jî, di dibistanên Tirkan da perwerdehiya bi zimanê Kurdî dest pê kir, mixabin Kurd zarokên xwe nêzikî wê dersê nakin...

Lê çi dikin?

Bi piranî hemû kar û barên xwe, bi zimanê Tirkî birêve dibin û bi wî zimanî sîyasetê dikin.

Di malên xwe da bi zar û zêçên xwe ra, li kûçe kolanan bi heval û hogirên xwe ra bi Tirkî diaxifin, bi Tirkî dixwînin û bi Tirkî dinivîsînin.

Di hemû xalên jîyanê da wek Tirkan dijîn...

Bi vê yekê jî nasekinin, kesên ku wek wan nafikirin, bi zimanê Tirkî û bi tewnek tund û tûj wan tawanbar dikin...

Mixabin, nizanîn ku ew bi xwe jî roj bi roj, sal bi sal ji Kurd û kurdayetîyê dûr dikevin û bi lez û bez gavên xwe ber bi tirkayetîyê davêjin...

Nîyetên kesên wusa çiqas çê û pîroz bin, kirin û kiryarên wan jî ewqas çewt û xelet in...

25.04.2014

Ziman û bikaranîna ziman

Di kongreya Partîya Demaoqrat a Kurdistanê da Mesûd Barzanî dibêje:

„Xwedê gelê Kurd xuluqandîye û zimanê wê û mafên wî jî Xwedê daye“.

Gor bawerîya olî ev gotineke raste û tu kesek xwedîbawer nikarê îtiraza vê yekê bike. Kî ku vê rastîyê qebûl neke, bi bawerîya xwe ya bi Xwedê ra jî dikeve şikê ku, ew jî ji bo wî kesî sebebê gunehkarîyê ye.

Dema ku mirov li rewşa Kurda û cînarên wan ên misilman dinihêre, mirov bi bîr û bawerîyên wan dikeve şikê. Ne Kurdên misilman ji bo mafên xwe yê ji alî Xwedê va hatine dayîn, dixebitin, ne jî cînarên wan ên misilman Kurdan di vî warî da mafdar dibînin.

Mirov dikare bibêje, Kurd ji bo nexwastina mafên xwe, cînarên wan jî ji bo nenaskirina mafên Kurdan gunehkar in.

Di vê babetê da rewş û gunehkarîya cînarên Kurdan hata alîkî tên famkirin, lewra misilmanên wan jî, demoqrat û sosyalîstên wan jî, lîberal û mirovhizên wan jî, bîr û bawerîyên xwe tenê ji bo xwe û ji bo menfata xwe dihebînin. Ji bo van kêmasîyên xwe kîtêb û mishaban li ser hev diqelibînin û ji kêmasî û xeletîyên xwe ra qûlpek dibînin.

Misilmanên cînar dibêjin; „em hemû ji ometa Muhammed in, Xweda û ola me yek e û em hemû bira ne. Ne hewceye ku hûn bi netewa xwe, xwe bi nav bikin û ji bo bikaranîna zimanê xwe îsrar bikin“.

Demoqrat û sosyalîstên cînar dibêjin; „em di warê miro-

vatîyê da wekhev in û hemwelatîyên dinyayekî ne. Armanca mirovên wek me, ne parastina zimanêke, ne jî ji bo damezrandina dewleteke netewî ye. Ji bo zimanê xwe jî xem nekin, ne tenê zimanê we, zimanê me jî di pêşerojê de wenda dibe. Dest ji van daxwazên xwe yê paşverû berdin û bi me ra bimeşin...”

Lîberalên cînar dibêjin; „hevalno, dem dema destbixistina mal û mulk e. Dem ne bi axaftina zimanê zikmakî, ne jî bi parastina axê va sînordar e. Dest ji ziman û sînora berdin, li cîhanê binêrin. Bi kîjan zimanî pere qezenç dikin bi wî zimanî bi axifin, li kîderê pere tê qezençkirin, wê derê weke welatên xwe bihesibînin. Hewl bidin xwe û fêrî zimanên navnetewî bin û di jîyana xwe da peyatî nemînin.“

Kurdên oldar li pey misilmanên Ereba û Eceba û Tirk diçin, gor wan jîyana xwe didomînin û xwe ji kok û bingeha xwe dûr dixînin.

Kurdên sosyalîst û demokrat, weke sosyalîst û demokratên derdora xwe, karên xwe yê rojane didin alîkî û ji bo damezrandina cîhanêke nû, xewn û xeyalan dibînin. Kurdên liberal, xêncî mal û mulkê dine tu rûmetê nadin tişteke din û tenê bi pere û pûlên xwe, xwe binav dikin.

Kurdên ku xwe ronakbîr û welatparêz dihesibînin, daxwaza zimanê xwe yê zikmakî dikin, mixabin pirañya wan, ne bi zimanê xwe yê zikmakî dixwînin û dinivîsînin, ne jî wî di tîkilyên xwe yê rojane da bikar tînin. Daxwazên xwe yê di vî warî da jî, bi zimanê neyarên xwe tînin ziman.

Sebebê hemû kêmasîyên xwe, bi kirin û kiryarên dagirkerên xwe va girê didin. Bi vî awayî, berê xwe, dû ra jî vedigerin kesên der dora dixapînin.

22.12.2010

Gelo Kurd çima xwe dixapînin!

Min xwe amadekiribû ku ez îro di vî kuncikê xwe da, beşa sêyem ya romana ku bi navê „Mîro“ nivîsandibû, biweşînim. Lê mixabin carcaran nûçeyek, an jî bûyereq diqewime, mirov nikare di cîhê xwe da bisekine û pîlan û programên xwe diguherine.

Min jî îro wusa kir.

Bi xwendina nûçeya ku duh di hemû rojnameyên Tirkan da hatibû weşandin, carek din dîsa vegeyîyam ser hînbûn û bikaranîna zimanê zikmakî û kêmasîyên Kurdan...

Di wê nûçeyê da dihat ragihandin ku girtîyên KCKê yên ku li Erzurumê tînan dadgehkirin, derdikevînan huzura dadgehê û dixwazin xwe bi zimanê xwe yê zikmakî biparêzin. Hakim jî daxwaza wan qebûl dike û dora axaftinê ye-koyek dide girtîyan.

Ji girtîyan yek radibe bi Kurdî dest bi axaftina xwe dike, piştî çend hevokan şûnda axaftina xwe vedigerîne ser zimanê Tirkî.

Yekî din radibe, ew jî bi Kurdî dest bi axaftinê dike, piştî ra ger Tirkî ger Kurdi diaxife û herdu zimanan li hev diqelibîne.

Hinek hevalên wî, di cîhê xwe da nerazîbûna xwe tînan ziman û dibêjin, „ya baş ewe ku parastina xwe bi Tirkî bidomîne, ji ber ku zeman derbas dibe“.

Ew jî wek hevalê xwe yê berî wî axaftîye, dest ji Kurdî berdide û axaftina xwe bi Tirkî didomîne...

Ez dizanim hûnê bibêjin: „Ma sûcê wan çî ye?“

Ew bi salan di mektebên Tirkan da, ji alî dewleta Tirk va

hatine asîmîlekirin û ji ziman û kurdîya xwe dûrketine. Îro jî nikarin bi Kurdî biaxifin.“

Rast e, dewleta dagirker sed sale Kurdan asîmîle dike, heta çend sal berê axaftina bi zimanê Kurdî jî qedexe bû. Lê ew kesên ku ez qala wan dikim, kesên sîyasî ne û doza Kurd û Kurdistanê dikin.

Doza serbestbûna zimanê xwe yê zikmakî dikin û hata îro jî dixwestin bi zimanî xwe li dadgehên da xwe biparêzin. Heta ji bo vê daxwazê bi hezaran girtî ketin greva birçîbûnê û ji du mehan zêdetir berxwe dan. Sîrf ji bo vê daxwazê, gelek kes cîhê bîla bê sebeb di heps û zîndanên da salên xwe derbas dikin. Ji ber ku parastina bi zimanê Kurdî qedexe bû. Ji destpêka vê salê va, di hinek qanûnên Tirkan da guhartin çêbûn.

Mixabin ew kesên ku ji bo parastina bi zimanê zikmakî, dest bi greva birçîbûnê kiribûn û li ber mirinê razabûn, îro radibin di dadgehên Tirkan da, du peyvên Kurdî diaxifin, dû ra jî tê da dimînin û axaftina xwe vedigerînin ser Tirkî.

Hakim û rojnamevan û siyasetvanên Tirk çî dikin?

Li wan dinihêrin û bi dengê bilind bi wan û bi hemû Kurdan qîlfê xwe dikin û dikenin...

Heger ew di daxwazên xwe yên di warê ziman da qels nebana, di girtîgehên Tirkan da jî hîni zimanê xwe dibûn û îro jî bi serfrazî bi zimanê xwe yên zikmakî diaxifin û li dadgehên Tirkan da jî xwe bi serfrazî diparastin.

Bi parastina xwe ya bi Kurdî jî nedibûn sedemên qîlf û henekên Tirkan.

Mirov dikare bi hêsanî bibêje; dewleta Tirk ji bo mafê parastina bi zimanê zikmakî qanûnên xwe yên sedsalî guhart, lê mixabin Kurd hê bi Tirkî xwe diparêzin û naxwazin di warê ziman da xuyên xwe biguherînin...

Di alî ziman da li dervayî welat jî rewşê cûda nîne. Tu dinihêrî ew Kurdên ku wek gotina Tirkan dikin kufekuf û bi

bayê sosyalîzma têkçûyî fizildûmanê radikin, ji bo hînbûn û bikaranîna ziman, hezar bahaneyan ji xwe ra dibînin. Bi teorîyên ezber û bi zimanê Tirkî, di rojekî da Kurdistanê ava dikin, di heftekî da pergala Rojhilata Navîn saz dikin, di mehekî da rêvebirtîya dinê digrin bin destê xwe û tewna wê ji binî va diguherînin. Lê mijar were ser ziman, ji bo Kurd û Kurdayetîyê, heta ji bo avakirina Kurdistaneke serbixwe jî, hînbûn û bikaranîna ziman pêwîst nabînin!

09.02.2013

Xwedê Kurdan ji Kurdên zimantirk biparêze!

Rojekî berê di rojnameya Radîkalê da hevpeyvîneke gelek balkêş hatibû weşandin. Rojnamevana Tirk Îdil Ekşi pirsîbû, hunermenda Kurd Tara Mamedova jî bersivandibû.

Dema ku min ew hevpeyvîn xwend, ez bi navê hunermenda Kurd û bi gotinên wê gelek kefxweş bûm.

Gotinên wê gelek bala min kişandin.

Seîd Gebarî û jîyana min a Îstenbolê hate bîra min.

Ji vir 25 sal berê me şevên ji bo piştgirîya Kovara Deng û Rojnama Azadî lidarxistibûn, Seîd Gebarî jî wek hunermend têkilî wan şevan bibû. Rojên wî li bûroya kovarê, her şeveke wî jî li mala hevalemî derbas dibû.

Wê demê çawa ku navê kovarê bi Kurdî, naveroka wê jî bi Tirkî bû, em jî hemû Kurd, lê zimanê me yê rojanê jî bi Tirkî bû.

Seîd Gebarî li ba me, di nav hefteyekî da fêrî Tirkî bû. Sedem vê yekê ew, ji me û ji jîyana me eciz dibû û qîlf û henekê xwe bi me fikir, peyvên Tirkî û Kurdî tevlihev fikir û bi me ra diaxîfî. Roja çûyîne xatirê xwe ji me hemûyan xwest û got;

„Kemalîstan di nav heftê salî da mala we şewitand, we jî di nav hefteyekî da mala min kambax kir“.

Ji wê rojê vir da 25 sal derbas bûn, hemû tengasîyên li pêşîya zimanê Kurdî yekoyek ji holê rabûn, lê Kurd hê dîsa Kurdên berê ne. Tiştên ku 25 sal berê li Îstenbolê hatibûn serê Seîd Gebarî, 25 sal şun da, li Europayê hatiye serê Tara Mamedova...

Mamedova bi eslê xwe ji Bazîdê ye. Malbata wê berî sed sal berê ji Bazîdê koçber dibe û diçe Êrmenîstanê. Bi salan şûnda malbat ji wir jî koç dike û diçe li Asya Navîn bi cîh dibe. Mamedova di sala 1983an da li Kirgizîstanê tê dinê. Piştî hilweşandina Sovyetê, ew, bi malbatî careke din koçber dibin û berê xwe didin Rusyayê.

Mamedova dibejê:

„Xencî Kurdan hemû kesên ku koçber dibûn, welateke wan hebû û ew jî diçûn li wir bi cîh dibûn. Tenê Kurd ji vê yekê bêpar bûn. Sedem vê yekê em jî çûn li gundeke Rusyayê bi cîh bûn. Kesên Rus, Kurd li welatê xwe nedixwestin û li dijberî bicîhbûna me derdiketin...“

Mamedova di bin şert û mercên gelek giran da dest bi xwendinê dike, di danzdeh salîya xwe da diçe li Dibistana Çand û Hunera Kurd ya li Moskovayê, dersên muzîkê, reqas û tîyatroyê digre. Di 21 salîya xwe da ji Moskovayê bi rê dikeve, diçe Parîsê û li wir hunermendîya xwe ya di warê muzîkê da didomîne.

Nuha jî bi navê; „AX“, albûmeke derxistîye û di wê albûmê da bi hemû zaravayên Kurdî (Kurmançî, Soranî û Zazakî) stranên dibêje...

Lê tişta ku di hevpeyvînê da zêde bala min kişand, ew jî, Tirkîya Tara Mamedova bû.

Rojnamevana Tirk jê dipirse:

„Tu çawa fêrî axaftina Tirkî bû yî?“

Mamedova ji dipersivîne û dibêje:

„Ez ne li Tirkîyê, li Europayê, li ba Kurdên Bakûr fêrî zimanê Tirkî bûm.“

Belê hunermenda Kurd, li Kazakîstanê tê dinê, li Rusyayê mezin dibe, dû ra diçe Parîsê, li wir ji Kurdên Bakur fêrî zimanê Tirkî dibe.

Gelo di dinê da kambaxîyeke ji vê yekê zêdetir he ye?

Ne hewceye ez dûr û dirêj qala Kurdên li Europayê dijin, bikim.

Weke tê zanîn, li seranserî welatên Europayê bi kêmasî du mîlyon Kurd dijîn.

Piranîya wan, ji zilm û zordarîya dewleta Tirk revîyane û hatine li wir bi cîh bûne. Sedem vê yekê mafê pênerberîyê ji dewletên Europayê histandine.

Hemû Kurdên li Europayê dijîn, li dijberî dewleta Tirk sîyasetê dikin.

Ji dûr va be jî, Kurdistaneke azad û serbixwe dixwazin.

Gor Kurdên li ser axa welat dijîn, di nêrîn û daxwazên xwe da qat bi qat misoger in.

Di gotinên xwe da tûj û tund in.

Kesên ku weke wan nafikirin û bi wan ra nameşin, bi îxanet û ajanîyê tawanbar dikin.

Lê di hemû xalên jîyana xwe da zimanê Tirkî, zimanê dewleta ku bi salan li wan zilm û zordarî kiriyê, bikartînin.

Bi wê yekê jî nasekinin, ew Kurdên ku wek hunermenda Kurd Tara Mamedova, ku ji axa Kurdistanê dûr mezinbûne û tu têkilîya wan û Tirkîyê bi hev neketîne, fêrî zimanê Tirkî dikin...

Wek malên xwe, mala wan jî dişewitînin.

Bi sîyaseteke kevneşopî dijbertîya dewleta Tirk dikin, bi kirinên xwe yê sosret, di warê asîmîlasyônê da, karê dewletê hêsan dikin.

Dema ku mirov li sosretî û rûreşîya wan dinihêre, tenê dikare bibêje, bila Xwedê Kurdên ji dervayî Bakûr, ji Kurdên Tirkîyê biparêze!..

04.07.2014

Roja zimanê zikmakî!

Gelo bala we jî kişandîye, xêncî Kurdan tu kes roja zimanê zikmakî pîroz nake. Ji ber ku hemû gelên cîhanê her roj qîmet û rûmetê didin zimanê xwe.

Her roj bi zimanê xwe difikirin û diaxifin.

Bi zimanê xwe dixwînin û dinivîsin.

Bi zimanê xwe dixebitin û dijîn.

Loma roja zimanê zikmakî rojeke girîng nabînin û ji bo pîrozkirina wê jî xwe nawestînin.

Kurd û milletên weke wan bindest, tenê vê rojê pîroz dikin. Ji ber ku di salê da tenê rojek zimanê wan tê bîra wan. Kurd, bi taybetî Kurdên Bakûr, her sal di vê rojê da pênc peyvan li pê hev rêz dikin û bi rîya telefonê, an jî bi rîya computerê ji dost û hevalên xwe ra dişînin û dibêjin: „Roja zimanê zikmakî pîroz bê!“

Lê çawa û li kî û kê pîroz be, ew bixwe jî nizanin...

Gor raya min, Kurd pîrozbahîya vê rojê jî heq nakin. Ji ber ku hemû gelên li rûyê dinê dijîn, hemû rojên salê bi zimanê xwe yê zikmakî difikirin, diaxifin, dixwînin û dinivîsînin. Di her karên xwe da zimanê xwe bikartînin...

Ew Kurdên ku di salê da carê zimanê xwe yê zikmakî tînin bîra xwe, ew çi dikin?

Ew, xwe zêde nawestînin û di vî warî da hemû kêmasîyên xwe, bi bahaneyên erzan vedişêrin. Di salê da carekî têkilî meş û şahîyek dibin, heta ku ji wan were, bi dengên bilind diqêrin û dibêjin:

„Zimanê me, nîşana hebûna me ye!“

„Zimanê me, rûmeta me ye!“

Meş û şahî diqede, ziman û rûmeta ziman jî tê ji bîr kirin. Jiber ku, Kurd di salê da 365 rojan bi Tirkî, bi zimanê neyarên xwe, difikirin, diaxifin, dixwînin û dinivîsînin. Bi Tirkî radizên, bi Tirkî xewnên xwe dibînin û bi Tirkî ji xewê hişyar dibin û weke Tirkan jîyana xwe didomînin. Tenê roja 21ê Sibatê, zimanê wan ê zikmakî tê bîra wan, ew jî bi Kurdîyeke nîvco û bi hevokek şaş pîrozbayîya xwe dinivîsînin û ji heval û hogirên xwe ra dişînin... Halbûkî weke salên derbasbûyî îro li Tirkîyê jî zimanê Kurdî ne qedexe ye. Ne ku di warê çapemenîyê da, li dadgehên dewletê jî Kurdî tê bikaranîn.

Le dîsa jî Kurd ji zimanê xwe dûr disekinîn, di karên xwe yê sîyasetê da, di karê xwe yê çandî û hunerî da, di jîyana xwe ya rojane da jî zimanê dewleta Tirk bikar tînin. Siyasetvan û ronakbîrên Kurdên Bakûr hê bi zimanê neyarên xwe daw û doza zimanê xwe dikin. Dema ku têkilî konferansek an jî civînek bibin, derdikevin ser dikê, bi du-sê peyvên Kurdî guhdarvanên xwe silav dikin, dû ra vedigerin ser zimanê Tirkî û axaftina xwe didomînin. Bi rastî di vî warî da ne xwe, ne jî guhdarvanên xwe diwestînin. Sedem axaftinên xwe yê bi Tirkî bahaneyên xwe yê erzan tînin ziman, kêmasîyên xwe bi tawanbar kirina guhdarvanan va vedişêrin û dibêjin: „Min dixwest ez bi Kurdî biaxifim, mixabin guhdarvan gotinên min ên bi Kurdî fam nakîn!“

Guhdarvan kî ne?

Ew jî wek axaftvan Kurd in...

Televîzyonên ku ji alî Kurdan va hatine damezrandin, di weşanên xwe da hê jî zimanê Tirkî bikar tînin. Lê naxwazîna gelê Kurd televîzyonên ku di weşanê xwe da zimanê Kurdî bikar tînin, temaşe bikin. Bahaneyên wan jî wek bahaneyên sîyasetvanan hazir e û dibêjin; „dewlet, bikaranîna ziman, me ji daw û doza me dûr dixîne û me asîmîle dike!“

Bi çi asîmîle dike?

Bi zimanê Kurdî...

Roman û çîrokên ku bi Kurdî hatine nivîsandin, di de-poyên weşanxaneyan da dirizin.

Li Kurdistanê Bakûr û li bajarên Tirkîyê 25 mîlyon Kurd dijîn, mixabin li seranserê Kurdistanê ji romanên bi Kurdî yên herî baş jî ancax hezar heb tînin.

Bahaneyên xwendevanên Kurd jî wek yên din, dîsa di be-rika wan da hazir e û dibêjin, „em pirtûkên bi Kurdî biki- rin û bixwînin jî ji wan tiştêkî fam nakin!“

Ji çi fam nakin?

Ji zimanê xwe yên zikmakî...

Di civata Kurdan da kesên ku îro bi zimanê xwe yên zik- makî diaxifin û di jîyana xwe ya rojane da wî bikartînin, ew jî dîsa tenê gundî ne. Mixabin, bi axaftin û bikaranîna tevlihev jî ne ziman pêşda diçe, ne jî dewlemend dibe...

Roja zimanê zikmakî pîroz be! Lê li kî û li kê?

Mîrov dikare bibêjê, bila ev roj li Tirk û Ereb û Farisan pîroz be! Ji ber ku ne tenê ew, Kurdên di bin bandora wan da dijîn, ew jî bi dil û can, bi kêf û eşq bi zimanê wan di- fikirin, diaxifin, dixwînin û dinivîsînin. Qasî ku ew qîmet û rûmetê didin zimanê xwe, Kurd jî qîmet û rûmetê didin wan û zimanên wan...

Salan berê li gundên Kurdistanê heger kesekî di meha rojîyê da rojî negirtaba û cejna rojîyê pîroz bikira, kesên derdora wî bi qîlf û henek jê ra digotin; „ma te rojî girtibû ku, tu cejnê pîroz dikî?“

Kurdên zimanTirk jî weke ew kesên rojîxwir, 365 rojên salê ji zimanê xwe dûr in, di salê da tenê rojek zimanê xwe tînin bîra xwe û ji bo pîrozkirinê şahîyan lidardixin. Gelo Kurdên zimanTirk jî wê pîrozbahîyê heq dikin?

21.02.2014

Şer û wêje...

Şer û şîn, du peyvên wekhev û bi hev ra girêdayî.

Du peyvên reş û tarî.

Bi xwîn û girî...

Bi êş û derd...

Jiber ku şer komkujî ye.

Kuştin û mirin e...

Şer terbiyekirina bi tîbûn û birçîbûnê ye.

Talankirina mal û mulk e...

Koçberî ye...

Trajedîya mirovahîyê ye.

Şer, wêrankirina gund û bajaran, xerabkirin û şewitandina xwezayê ye. Jiber ku di bin kavlê şer da jinên bî û zarokên sêwî, kal û pîrên stûxwar dimînin.

Di encama şer da ne tene mirov, mirovahî jî dimire.

Nivîskara Belarûsî Svetlana Aleksiyeviç ku xwedîyê xelata Nobelê ya 2015an, di merasima xelatgirtinê da wiha dibêje:

„Di zarokatîya xwe da ez li gund dijîyam. Min ji lîstika di nav kuçeyan da dihat lîstin, pir hez dikir. Êvaran, jinebîyên gund, jinebîyên westyayî yên li ser sedirên dar rûdiniştin, weke miqnatis me ber bi xwe dikişandin.

Ne bav û ne bira ne jî mêr ên wan hebûn. Piştî şer nayê bîra min ku, di gundê me da jî mêr hebin. Di dema şer da ji her çar mêr ên Belarûsî yek, li enîya şer, yan jî di şerê partîzanan da hatibûn kuştin.

Dinya me ya piştî şer, tenê dinyayek jinan bû. Tiştên ku zêde di bîra min da ma ne, jinan qet qala mirinê nediki-

rin, tenê qala hezkirinê dikirin. Roja dawîyê, çawa ji hezkirîyên xwe qetîyabûn, çiqas û bi hesteke çawa li benda wan sekinîbûn, çawa hê disekinîn...

Sal û demsal derbas bibûn, hê jî li benda bav û bira û mêrên xwe bûn.

Digotin: 'Bila bêdest û bê pî vegere. Ez wî li ser pişta xwe digerinim, bê dest û bê pî...'

Wek gotinên nivîskara Belarûsî, wêje, ya jî wêjekar neynûkê li rûyê şer, rûyê wî yê qirêj ê bi xwîn û lêm digre û nîşan dide.

Heger ku xwedî tesir be rê li ber mirina mirovahîyê digre. Di jîyana wêjekar da şer cîh nagre.

Jiber ku wêjekar, xeyala dinyayek bê şer û bê kuştin dike. Wêjekar ji bo vê yeke difikire û diafirîne.

Karê wêjekar afirandina jîyeneke bextewar e.

Loma, wêjekar li rê û dirban digere, dixwaze ji gul û sosînan gulîstanek nû ava bike.

Wê gulîstanê, bi peyvên di hemahengîya jîyana rojane da hatine jibîrkirin, dixemilîne û jîndar dike.

Ji bo jîyaneke watedar, rê û rêbazên evîndarî û bextewarîyê nîşan dide.

Sedema vê yeke ye ku weke hemû kesên hunermend û zanyar, weke hemû kesên hilberînêr û afirînêr, weke hemû kesên mirovhiz, wêjekar jî dijberê şer û pevçûnê, dijberê kuştin û mirinê ye.

Di jîyana wêjekar da hovîtî, di meclîsa hovîyan da jî wêje û wêjekar cîh nagre.

Dengê wêjekar naçe guhê tîran û zordaran.

Ji sûr û çeperên ku li çarnikalên koşk û serayên zordar û tîranan hatine çikandin, derbas nabe.

Li dîwarê wan sûr û çeperan dikeve û şûnda vedigere.

Loma di welatê di bin desthilatîya tîran û zordaran da, warê wêjekar pîrî caran heps û zindan, sirgûn û koçberî ye.

Lê li ku dibe bila bibe, wêjekar di bin tu şert û mercan da bêdeng namîne.

Jiber ku amûrên wî/wê peyv, kare wî/we ji afirandina jîyanek bi peyvyan e.

Heta ku di berika wî/wê da peyv û di sere wî/wê da jî hiş hebe, afirandina xwe didomîne...

Mixabin îtiraz û dijberîyên ku wêjekarên li dijberê şerên borî kirine û li yên ku diqewime, dikin, ji şerê Efrînê ra nekirin û nakin.

Hinek nerazîbûnên bi dengê nizm hatine kirin û tînin kirin jî, di civatên herêmê da nehatin bihîstin.

Sedema bêdengîyê jî ji taybetmendîya Efrînê tê.

Jiber ku Efrîn Kurd û Kurdistan e.

Efrîn bajarokek bêxwedî û bêxwedan e.

Efrîn sewî ye.

Efrîn bîra bêbinî ye.

Ji bo ku lingên wan neşiqite û di bin bîra bêbinî da wenda nebin, wêjekar bere xwe nadin Efrînê.

Rûyê xwe li Efrînê diguherînin û ji bajarê sêwî dûr disekin.

Wêjekarên Tirk û Ereb û Ecem bi çavê desthiladarên xwe li Efrînê dinihêrin û şerê Efrînê gor wan nêrînin xwe dinirxînin.

Kurdên li Efrînê dijîn terorîst, Efrînê jî hêlîna terorîzmê dibinin.

Wêjekarên dinê, ji çepera ku dewletên dagirker li dora Kurd û Kurdistanê, bi şer û kuştin û bi amûrên medyayê çikandine, belengazî û bêçaretîya gele Efrînê nabînin.

Ji dûr va gazî û hawara Kurdên Efrînê jî nabihîzin.

Wêjekarên Kurd hebin jî kem in. Ew jî weke welat û gelen xwe parçe parçe bûne û ji xwe û ji welatê xwe dûr in.

Hinekên wan ji zimanê xwe, hinekên wan jî di bin tesîra dagirkerên xwe da mane û ji Kurd û kurdayetîyê dûr disekin.

Yên ku bi ziman û bi ruhê kurdayetîyê tevdigerin, kê m in.
Ew bi hawar û gazî diqêrin û digirîn, dixwînin û dini-
vîsînin...

Mixabin dengê wan jî lawaz e.

Ne zordar û tîran hawara wan dibihîzin, ne jî Kurd...

Kurdên dibihîzin, ew jî ji gotinên wan fam nakin...

Jiber ku ew bi zimanê sêwîyan dinivîsînin û qedera gele
xwe dijîn.

Efrîn piştî berxwedana xwe ya 58 rojan ji nişkava ket...

Dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wê, îro bi hovane bajarê
Efrînê talan dikin.

Dest didin ser mal û milken Kurdan û dizî û çilpizîyê dik-
in.

Darên Zeytûnê ku, ew li seranserî dine nîşana aşitîyê tèn
qebûlkin, dişewîtin.

Li ber çavê dine, li ser Peykerên Kawa yê Hesinkar gu-
leyan dibarînin û ji cîhê wî radikin.

Ji niha da bi demografîya Efrînê ra dilîzin û gele Kurd ji
axa bav û kalan dûr dixînin.

Wêjekar û hunermendên Tirk çi dikin?

Ew ji bo kîrin û kiryarên dewleta xwe ya dagirker, destan-
an dinivîsînin û bi helbest û stranan pîrozbahîyê li leşker
û çeteyên girêdayî wan dikin.

Şer û encama şerê Efrînê jî carekî din dide xuyakirinê ku,
gerdûnîya wêjeyî li seranserî dine nebe jî, li Rojhilata Na-
vîn hê dereweke bi boçik e.

Li vir wêjekar berdevkê desthilatdarê xwe, wêje jî di xiz-
meta dewleta wî da ye...

23.03.2018

„Mirovê av bi kizmorîkê dabû vexwarinê...“

Piştî mirina Yaşar Kemal, hevaleki min jibo wî hevokekî nivîsandibû: „Karıncaya su içiren adam...“

Gelo ji vî hevokê bêtir hunermendîya Yaşar Kemal a di warê nivîsandinê da nîşan bide, hevokedin he ye...

Kizmorîk û vexwarina avê, tê aqilê ki/kê?

Hevokede wusa ancax ji devê nivîskarekî wekî Yaşar Kemal derdikeve û ji alî yekî wek wî va tê nivîsandin.

Min jî ev hevok vegerande Kurdî û kir sernivîsa xwe...

Nivîsandin karekî zor û zehmete.

Mijara nivîsê Yaşar Kemal be, ev kar bêtir zehmet dibe.

Beşera mirov tê girêdan, peyv di devê mirov da dimîne.

Min Yaşar Kemal, di salên 70'yî da bi rîya pirtûka wî ya bi navê „Efsaneya Çîyayê Agirî- Ağrı Dağı Efsanesi“ va naskir. Ji wê rojê vir da min şopa pirtûkên wî domand û piraîya pirtûkên wî bi kêf û eşq xwend.

Min kîngê dest bi pirtûkeke wî bikira, dilê min fireh, Yaşar Kemal jî di dilê min ê fireh da cîyekî giring digirt û tê da mezin dibû...

Lê dema ku kurdbûna wî biketa bîra min û li ser pirtûkên wî yên bi zimanê Tirkî hatibûn nivîsandin, bifikirîyama, wê gavê jî ew li ber çavê min piçûk dibû û jê diqehirîm.

Qehirîn û hezkirin...

Herdu hestên min bi hev ra diketin berebezîyê...

Carcaran yek zêde derdiket pêş, carcaran jî herdu bi hev ra...

Yaşar Kemal, bi salan di dilê min da wek lehengekî bi dualîdar jîya. Li alîkî bi rîya pirtûkên xwe lehengekî nêzîk û

nas, li alîyê din jî lehengekî dûr û negihêj...

Heta ku min di salên 90î da, bi wî ra îmkana hevnasîna rûbirû dît. Di sala 1993an da ev îmkan bi awayekî rasthatinî kete destê min.

Wê salê Partîya Demoqarsîyê (DEP) di bin serokatîya Yaşar Kaya'da hatibû damezrandin. Piştî damezrandina partîyê çend meh şûnda, bi pêşniyara Yaşar Kaya li Îstebolê li Hotela Sheratonê koktêyla danasîna partîyê hatibû lidarxistin.

Bi sedan sîyasetvan, nivîskar û ronakbîrên Kurd û Tirk beşdarî wê kokteylê bibûn.

Ji wan yek jî Yaşar Kemal bû.

Ez jî wê demê wek endamê DEPê û xwedîyê Rojnama Azadî beşdarî kokteylê bibûm.

Eywana ku koktêyl tê da hatibû amadekirin, eywaneke mezin û bi îhtîşam bû. Beşdaravanên koktêylê di navbera xwe da komên piçûk saz kiribûn, hinek li ser lingan bi hevra diaxifîn, hinek jî ketibûn milê hev û di nav eywanê da pêgermog danîbûn.

Di wê navbeynê da çavê min li Sîrrî Sakik û Yaşar Kemal ket. Yaşar Kemal ketibû milê Sîrrî, bi sohbetekî kur û dûr bi hev ra dimeşyan. Sîrrî Sakik min ji destpêka damezrandina HEPê va nasdikir, lê cara yekemîn bû ku min bi çavê serê xwe Yaşar Kemal didît.

Ez ji hevalên xwe qetîyam û ber bi wan çûm. Min berê ji wan lêborîn xwest û bi zimanê Tirkî xwe bi Yaşar Kemal va da nasîn. Jiber ku heta wê rojê haya min jî axaftina Yaşar Kemal ya bi zimanê Kurdî nebû. Bi bihîstina navê Azadîyê ra, Yaşar Kemal destê min givaşt û bi min ra bi Kurdî axifî. Bi axaftina wî ya Kurdî, ji şabûna lingên min ji erdê qetîyan, min digot qey ez di nav ezmanan da difirim. Piştî hevnasîna me, Yaşar Kemal ket milê min, li alîki wî Sîrrî, li alîyê din jî ez, em çend deqîqeyan bi hev ra meşyan.

Di wê navbeynê da Yaşar Kemal, li min nihêrî û got; „Tu dizanî çima ez evqas zêde ji Sîrrî hez dikim?“

Berî min, wî bi xwe bersiva pirsra xwe da û wuha got; “ez ji Sîrrî hez dikim, jiber ku bêhna Şemo ji Sîrrî tê...”

Ez careke din şaş û metal mam...

Ne hewce bû, ez jê bipirsim ku tu çima ewqas ji Şemo hez dikî?

Jiber ku bersiva pirsra min, di nav gotinên wî da veşartîbû...

Bi wê bersiva wî ya veşartî, ew li ber çavê min careke din mezin bû.

Ji wê rojê vir da, rîya me neket ser hev, lê di derheqê mezinahîya wî û hestên wî yên di warê kurdayetîyê da tu car neketim şikê.

Yaşar Kemal, di jîyana xwe da tu carekî Şemo nedîtîbû, bi Şemo ra hevaltî nekiribû.

Yaşar Kemal di milê Sîrrî da bû, lê ji Sîrrî zêdetir ji Şemo hez dikir.

Çima?

Ji ber ku Şemo wê demê li dijberî zilm û zordarîya dewleta Tirk derketibû û şerê çekdarîyê dikir. Di nav Kurdan da nav û dengê wî belav bibû, wek lehengekî bê hempa dihat binav kirin.

Yaşar Kemal jî sedem vê yekê ji Şemô hez dikir û tama hezkirina Şemo ji Sîrrî digirt...

Hinek Kurd dibêjin; „Yaşar Kemal çima bi Kurdî nenivîsand?“

Yaşar Kemal jî wek zarokekî Kurd çavê xwe li dinê vekiribû, di bin zilm û zordarîya dewletê da mezin bibû.

Di warê asîmîlasyônê da wî jî wek hemû Kurdên Bakûr para xwe girtibû, ji ziman û çanda xwe dûr ketibû. Sedem vê yekê bi zimanê Tirkî dest bi nivîsandinê kiribû, heta roja mirinê jî karê xwe yê nivîsandinê bi wî zimanî domand.

Ew, bi dostên xwe yên Kurd ra bi Kurdî diaxiffî, lêbelê bi

kurdîyekî nîvco, kurdîya wî ya kêma jî têrî nivîsandinê nedikir.

Ev kêmasîyeke mezin bû, lê mixabin sedemê wê kêmasîyê, duh jî îro jî dewleta dagirker e.

Ne ku tenê Yaşar Kemal, bi hezaran Kurdên ku li dijberî dewletê derketibûn û daw û doza Kurdistanê dikirin, ew jî bi Tirkî diaxifîn û bi Tirkî dinivîsandin. Piranîya wan îro jî bi wî awayî karê xwe dikin.

Sedem vê yekê ye ku, ez bi xwe dikarim bi hêsanî bibêjim, Yaşar Kemal bi Tirkî diaxifî û dinivîsand, lê dilê wî bi Kurdî diavêt.

Me tenê dengê zimanê wî dibihîst û guh nedida dengê dilê wî.

Me bi dengê zimanê wî tam ji zimanê Tirkî girt, mixabin bi bêdengîya dilê wî jî em ji tama zimanê wî yê bi Kurdî mahrûm man...

03.03.2015

Çend gotinên pêşîyan!..

Gotinên pêşîyan di edebîyata Kurdî ya devkî da gotinên pêşîyan cîheki gring digrin. Wek hemû milletên li rû dinê Kurd jî li van gotinan xwedî derketine û bê qeyd û bend hata îro anîne.

Wek tê zanîn ku rastîya gotinên pêşîyan gorî encamên zanyarî nehatine cêribandin, lêbelê rastîya wan bi tecrûbêyen salan va hatîne îspat kirin. Ji ber wê yekê ye ku her pêşgotinek bi serê xwe gelek tiştan di nav xwe da dihêwirîne.

Di gotinên pêşîyan da her xalên civatê tên dîtin. Ew, çêyî û xirabîyên civatê, rewşa olî û aborîya civatê, têkilîya mêr û jinan, têkilîyên serdest û bindestan hwd. bi kurtayî tînin ziman...

Gotineke li ser têkilîya jin û mêran:

Jina xirab ketîye destê merê çê, ne tê kuştin ne jî tê berdan!..

Mirov dikarê di vê pêşgotinê da cîhê jin û mêran bu-guhurîne û wuha jî bikar bîne:

Mêrê xirab ketîye dest jin a çê ne tê kuştin ne jî tê berdan!..

Wekhevîya jin û mêran:

Şêr şêr e, çi jin çi mêr e!..

Mêr çem be, jin behr e!..

Rastî û durustî:

Çêleka bi dizî tê ga, eşkere dizê!..

Dawîya derewan heta nîvê şevê ye!..

Dewlemendî û feqîrî:

Hê hesp tu ne, lê afir jê ra çê dike!..

Bêrika feqîran vala, dilê wan tijî ye!..

Jîr û teralî:

Heger havînê tu li ber sîyê pal bidî, tu yê zivistanê jî zikê xwe mist bidî!..

Kesê ku havînê serê wî kelîya be, zivistanê jî kasika wî dike!..

Çavnebarî û çavbirçîtî:

Tu ji min ra çi dixwazî, bila Xwedê du qatî wî bide te!..

Pîrê bawer nedikir mêr bike, mer kir niha doza malheys-tekê dike!..

Tirs û cesaret:

Berxê nêr ji bo kêr e!..

Ji şertên mêranîyê 99 neh, rev e!..

Axa û xulam:

Malê axa tere, canê xulam derdikeve!..

Şêx û mele:

Mirûdê nezan şêxê xwe şaş dike, şêxê nezan jî mirûdê xwe di erdê ra kaş dike!..

Xwerina xweş cemaatê dikşîne ser sifrê, melayê şaş cemaatê dibe ser kufrê!..

Piştî van gotînên xweş û zêrîn dixwazim bi pirsek B. Franklin nivîsa xwe biqedînim.

"Di dilê kesên din da li qencîyê, di dilê xwe da li xirabîyê bigerin."

25.04.2010

„Aqilê sivik, barê giran!..“

Gotinên pêşîyan her tim bala min dikşînin.

Ji ber ku di her gotinek pêşîyan da rastîyeke zanyarî he ye.

Her gotinek xezîneyek bêbinî, mîraseke çandî û dîrokî ye. Rastîya gotinên pêşîyan, bi tecrûbeyên sed salan, hezar salan hatine ceribandin. Divê em îro jî rûmetê bidin wan gotinan û di jîyana xwe da wek mînak bibînin û bikar-bînin.

Ji wan gotinên zêrîn yek jî; „Aqilê sivik, barê giran“ e!
Mirov dikare vê gotinê bi hezar awayî şirove bike.

Mînak:

Mirovê ku aqilê xwe bikarneyne, barê xwe giran dike...

Mirovê serhişk, berê zirar û zîyanê dide xwe...

Mirovê pozbilind, ber pozê xwe nabîne...

Mirovê bêhesab, kar û barê xwe tevlihev dike...

Mirov dema ku gotinên pêşîyan dixwîne û li rewşa Kurdên Bakûr dinihêre, dibêje qey ev pêşgotin, „Aqilê sivik, barê giran“, ji bo Kurdên Bakûrî ya îroyîn hatîye gotin.

Bi taybetî serok û rêvebirên sazî û rexistinan, .endam û alîgirên wan, aqilsivik û bargiran in...

Sedem vê yekê ye ku ew, xwe û hevalên xwe mezin, kesên wek wan nafikirin û bi wan ra tevnagerin, piçûk û nezan dibînin.

Hemû pozbilindin û di ser pozê xwe ra tu kesî nabînin.

Hemû bêhesab tevdigerin, kar û barên xwe tevlihev dikin û di bin wan da dimînin. Mirov dibêje qey aqilê xwe dane kirê û bi aqilên neyarên xwe li rê û dirban digerin.

Li alîkî daw û doza Kurd û Kurdistanê dikin, di wê daw û dozê da bi zimanê neyarên xwe difikirin û diaxifin.

Daxwaza mafê zimanê zikmakî dikin, lê di her xalên jîyanê da zimanê neyarên xwe bikartînin û roj bi roj ji zimanê xwe yên zikmakî dûr dikevin.

Salê da carê girîngîya zimanê zikmakî tînin bîra xwe û di wê rojê da dibêjin û dinivîsînin;

„Zimanê me nasnameya me ye!“

„Zimanê me hebûna me ye!“

„Zimanê me rûmeta me ye!“

Mixabin, zimanê xwe yên zikmakî nizanin, ji bo hînbûna wê jî tu car gavek navêjin.

Hinek Kurdistaneke serbixwe û yekgirtî...

Hinek Kurdistaneke federal û sosyalist...

Hinek Kurdistaneke otonom...

Hinek jî rêvebireyeke xwe(lîli)ser dixwazin.

Sedem van daxwazên xwe, hinek derdikevin serê çol û çîyan.

Hinek dikevin heps û zîndanan.

Hinek dikujin, hinek tînin kuştin.

Hinek ji canê xwe, hinek ji mal û mulkên xwe...

Hinek jî ji welatê xwe dûr dikevin û li seranserê dinê pîran pîran dibin.

Lê di hemû kirin û kiryarên xwe da, ji hîmê hebûn û nasnameya xwe dûr disekin û li ser hîmê hebûna neyarên xwe, li dû avakirina avahîyeke nû digerin.

Her carê, bi aqilên xwe yên sivik, di bin barên xwe yên giran da ji qidûmda dikevin û di bin lingên dagirkerên xwe da dipelixin.

19.05.2016

„Xalo, ez kulaba diçinim!“

Li hêla me wek meselokek dihat gotin...

Rêwîyek rojeke havînê li hespê xwe yê kumêt sîwar dibe û berê xwe dide bajêr. Li ser rîya xwe, rastî xortekî xama tê. Xort di nav darên li devê çem da, serê xwe kirye ber xwe û bi das a xwe ya tûj daran diçine. Rêwî dema ku nêzikî xort dibe, dinihêre ku xort xortekî ne xerîb e. Li xort vedigere û bi dengê bilind dibêje:

- Selam û aleykûm, xortê delal...

Xortê ku di nav daran da das a xwe li ba dike û daran diçine, bi silava rewî va ji nişkêva serê xwe bilind dike û bersiva rêwî dide:

- Xalo wele ez kulaba diçinim...

Rêwî hinekî nêzikî xort dibe û dibêje:

- Xorto, dê û bavê te çawan in, silamet in?

Xort, das a xwe datîne erdê, bi destê xwe yê çepê enîya xwe ya bi xwîdan paqij dike, bi destê xwe yê rastê jî darên ku çinîye ravayê rêwî dide û dibêje:

- Xalo, wele hinek xwar, hinek jî rast in.

Di civata gundîyan da, dema ku mirovekî di nav civatê da tişteki bi xeletî fam bikira û gor famkirina xwe bersiv bida, kesên derdora wî, ev meseloka li jor hatîye nivîsandin weke nimûne nîşan didan û digotin:

- Kî çî dibê bila bibê, tu hê kulaba diçinî.

Heta 50-60 sal berê, li Kurdistanê zîraat bi quweta ga û gamêşan va dihat kirin. Zevî bi cotê ku ga û gamêş dikişandin va dihat cotkirin, piştî çinandina merg û zevîyan, mahsûlê wan jî bi erebeyên ga û gamêşan va dihat

kişandin. Ji bo girêdana cot û ereban jî nîr û kulabe pêwîst bûn. Wê demê li seranserî Kurdistanê hebûna traktor û patosan qasî hêjmara tilfyan bûn.

Mixabin, îro ne ga man, nê jî gamêş.

Cot û erebeyên dar jî, nîr û kulabe jî hatin jîbîrkirin.

Lê mesela xort û kulabeyên xwar û rast hê jî di nav civata gundan da tê gotin. Lewra di wê meselê da, ji xwarbûn û rastbûna kulaban zêdetir, fam û fereseta mirovan te gengeşi kirin.

Weke mîsal, îro jî li civatê dinêrî, kî çî dibê bila bîbê, hinek bi hev ra radibin ser pîyên xwe û bi yek dengekî bilind diqêrin û dibêjin:

- Em kulaba diçinin...

Tu dibêjî:

- Dem û dewran guherî, gere em jî xwe biguherînin û gor rewşa dinê ya nû bijîn û ji bo mafên xwe li rêyeke nû bigerin û bîbînin...

Ew dîsa bi hev ra diqêrin û dibêjin:

- Wele hinek xwar, hinek jî rast in...

Ji bo vê yekê ye ku Kurdên li çarnikalên Kurdistanê dijîn, ne ji guhartinên derdora xwe, ne jî ji guhartinên dinê hayîdar in.

Ne bixwe li rastîyê digerin, ne jî li kesekî rastgo guhdarî dikin.

Gavên xwe bi lez û bez davêjin, lê ji sibê hata êvarê li derdora xwe difitilin.

Ne gavek pêşta, ne jî gavek şûnda diçin...

Gava ku ji derva tişteki bibêjî û rewşa wan bidî ber çavên wan, bersiva wan jî di bêrika wan da hazir û nazir e:

- Em çî bikim rê qîyameye û xil û xwar e...

Rêyeke rast ravayê wan bidî, wê gavê jî eciz dibîn û dibêjin:

- Rêya ku tu rava didî raste, lê belê tu xwarî...

Di nav 50-60 salên derbasbûyî da li seranserî dinê di

warê aborî û sîyasetê da guhartinên mezin qewimîn.
Sovyeta ku nivê dinyayê kontrol dikir, hilweşîya.
Dema şerê sar, bu dîrok.
Pêşveçûna teknîkî piranîya dek û dolabên serdestan
eşkere kir û derewên wan pûç kir.
Piranîya rejimên bi warê dîktatoriyê birêve diçûn, yek û
yek hilweşîyan.
Li Rohilata Navîn firsendên mezin ketin destê Kurdan û
Kurdên Başûr bûn xwedî nîvdewlet...
Dewleta Tirk jî ji wan guhartinan, bi kêmasî be jî, para
xwe girt. Sîyaseta xwe ya bi “kart û kurt” guhart.
Îro zimanê Kurdî ne tenê di nav malan da û di kûçe û ko-
lanan da, di radio û televîzyonên dewletê da jî tê bika-
ranîn.
Lê tu dinêrî Kurdên Bakûr, hê gor şert û şûrtên sed sal
berê sîyaseta xwe didomînin û bi siloganên tûj û tund
demên xwe derbas dikin.
Tu bibêjî guhartin...
Ew dibêjin:
- Xalo, wele em kulaba diçinin.
Tu bibêjî demoqrasî...
Ew dibêjin;
- Wele, hinek xwar, hinek jî rast in...
25.05.2010

„Ax pišta min...!“

Di nav Kurdan da wek mîsal tê gotin.

Di gundekî Kurdan da rojek li ser tişteke pûç û vala pe-
vçûnek derdikeve.

Li alîkî kesên xwedî mêr û mêrxas, li aliyê din jî tenê ka-
lekî bêkes û belengaz...

Koma mêr û mêrxasan(!), dor li kalê bêkes û belengaz
digrin û bi dar û keviran êrişî wî dikin. Li kalê belengez
dixin û ser û guhê wî diqelişînin.

Li ser û guhê kalê dixin.

Kalê belengaz dibêje; „ax pišta min, ax pišta min...“

Bi pehîna li qûna kalê dixin.

Kalê belengaz dibêje; „ax pišta min, ax pišta min...“

Dest û piyê kalê dişkînin.

Kalê belengaz bi kelogirî diqêre û dîsa dibêje; „ax pišta
min, ax pišta min...“

Li ser van gotînên kalê birîndar, hemû êrişker di cîhê xwe
disekin, bi hêrs ji kalê bêkes ra dibêjin; „malxirab, em
li serê te dixin, tu dibêjî ax pišta min, em li qûna te dixin
tu dibêjî ax pišta min, em dest û piyê te dişkînin, tu dîsa
dibêjî ax pišta min...“

Ma çî bi pišta te hatîye, xêncî pišta te tu cîhekî te yê din
naysê?“

Kalê bêkes, serê xwe yê di nav xwînê da maye, hêdîka
ji erdê bilind dike, weke kesekî bêçare yekoyek li rûyê
hemûyan dinihêre û dû ra bi dilekî xemgîn ji wan ra dibê-
je; „heger li pišta min mêrxasek heba, îro we jî nikarîbû
wuha li min bixista...“

Li Kobanîyê Kurd jî îro wek kalê bêkes û belengaz bê pişt û bê xwedî ne.

Îro leyîstoka dewletên dagirker DAÎŞ, bi alîkarîya xwe-dîyên xwe dor li Kobanîyê girtîye û xwîna Kurdan dirijî-ne...

Dinya alem ji dûr va li êrişên dewleta dagirger û li bêçaretîya Kurdan temaşe dike...

Xêncî Kurdên bêkes û belengaz, tu kes hawara Kobanîyê nabihîze...

Kobanî destê xwe dirêjî kê dikê, destên wî vala dimîne. Enternasyonalîst û sosyalîstên navnetewî bédeng û bêzar in...

Misilmanên cîhanê ji binî va kerr û lal in...

Mijar Kurd û Kurdistan be, ne ayetên di derbarê biratîyâ olî da, ne jî teorîyên sîyasîyên li ser biratîya gelan pere dike...

Gor enternasyonalist û sosyalîstên Tirk û Ereb, Kurd birayên bêpar, gor olperestên misilman jî ew gunehkar in...

Lê dîsa jî Kurd vê rastîyê nabînin û hê li pêy ayet û teorîyên kevneşopî diçin...

Ne êşa dest û pîyên xwe dibhîzin, ne jî xwîna ji ser û guhê wan da tê xwarê, dibînin...

Gor êş û bêçaretîya xwe hinek Kurd hê jî daw û doza biratîya olî dikin û bi xewn û xeyalên bihuştê va xwe dixapînin...

Hinek jî bi eşqa biratîya gelan ya yekalî hê daxwaza federasyon û konferedasyonê dikin û Kurdên belengaz, ew Kurdên ku duh li Şengalê, îro li Kobanîyê, sibê jî li Bakûr û Rojhilatê, di bin lingên xwînxweran da mane û dimînin, dixapînin...

Ne gotinên ku Ehmedê Xanî bi sedan salan berê gotibûn tê bîra wan, nê jî barê li pişt Kobanê giran bûye, aqilê wan tîne serê wan...

Çi gotibû Ehmedê Xanî:

*„Eger hebûya jibo me padîshahek
Xwedê lîyaq bidîya jibo wî kulahek
Û bihata dîyarkirin jibo wî textek
Eşkera eşkera dê vebibûya jibo me jî bextek
Bi dest biketa ji bo wî tacek
Bê guman ji me ra jî dê çêbibûya rewacek
Wî dê xemxwarî bikira li me bêkes û sêwîyan
Dê em derxistina ji destê bêesl û liştok û çavbirçîyan
Dê xalib nebûya li ser me ev Rom
Emê nebûna kaviil û wêran, kund dê li me nebûna kom
Emê nebûna belengaz û xizan, bindest û binferman
Zorbirî û stûxwarên Tirkan û Eceman...“*

Mixabin êşa Kobanîyê ne êşa yekemîn, ne jî ya dawîyê ye.
Li seranserî Kurdistanê êş jî, derman jî yek e...
Êş êşa bêxwedîtîyê, dermanê wê jî daxwazên Xanî ye...
07.10.2014

„Hêk bê pîvaz tê xwerin!“

Gotinek pêşîya ye.

Dibêjin; „Mirovên Kerr nabihîzin, lê lihev tînin!“

Ev pêşgotin ne tenê ji bo mirovên kerr hatîye gotin. Gelek kes hene ku guhê wan bibihîzin jî, her tiştî gor dil û mêjûyê xwe fam dikin.

Loma rastî û çewtîyê pirîcaran tevlihev dikin.

Mirov dibeje qey strana govendê ya bi navê; „Çep lêxîne, rast derîne“ ji bo wan kesan hatîye gotin.

Mirov dema qala demoqrasîyê bike, ew dîktatorîyê fam dikin.

Mirov qala aşî û azadîyê bike, ew qala şervantîya xwe dikin pesnê mêrxasîya xwe didin.

Mirov qala wekhevîyê bike, ew kar û zerara xwe hesab dikin...

Mirov qala xizanî û nezanîyê bike, ew zanebûna xwe derdixin pêş...

Mirov bibêje reş, ew dibêjin golika beş!..

Ew demoqrasîyê tenê ji bo xwe dixwazin. Dema ku firsend bikeve destê wan, wê gavê hata ku ji wan were ew dijbertîya aşî û wekhevîyê dikin...

Di wêjeyên wan kesan da empatî cîh nagre, tu car xwe nakin şûna kesekî din û li kuleka xweya teng da li dinê û mirovatîyê dinihêrin. Ji ber vê yekê ye ku ne ji zanebûnê, ne jî ji mirovatîyê hayîdar in.

Ev şaş bîhîstin û şaş dîtin jî, nexwaşîyeke civakî ye û dermanê wê hebe jî, kême.

Wek mîsal tê gotin; di dema Yewnan a Kevn da, Kurd û

Yewnan cînarê hevdû bû ne. Jîyana gelê Yewnan bi demoqrasî û zanyarîyê dimeşe, ya Kurdan jî bi şert û şûrtên eşîrtîyê. Gelê Yewnan bi filozof û dibistanên xwe va tên nasîn, Kurd jî bi axa û şexan...

Rojek filozofekê Yewnan ji şagirtên xwe ra dibêje;

„Em û Kurd cînarên hev in. Lêbelê ne em wan, ne jî ew me baş nas dikin.“

Ji bo hevdîtîn û hevnasînê şagirtêk xwe weke qasid hil-dibijêre û jê ra dibêje; „here ba cînaren me yên Kurd, ji wan ra bibêje bila rojek ew ji alî xwe va, em jî ji alî xwe va birêkevin û li ser xeta sînor, hevdîtinek pêk bînin.

Qasid diçe, daxwaza filozof ji axayekî Kurdan ra dibêje û şûnda vedigere. Roj derbas dibin, dema hevdîtînê tê.

Fîlozof û şagirtên xwe ji alîkî va, axa û xulamên xwe jî ji alîkî va li ser xeta sînor tên rû hev.

Fîlozof destê xwe yê rastê dide ser dilê xwe, bejna xwe ji navê da hinek xwar dike û bi serê xwe silavê dide axa. Axa jî wek filozof destê xwe yê rastê dide ser dilê xwe û bi serê xwe silava wî digre.

Piştî silavdayînê axa û filozof hinek li rû û rûçikên hev mêze dikin, dû ra bi zimanê xwe hinek tiştan ji hev ra dibêjin. Mixabin ziman ji hev cûda ne û ne axa ji gotinên filozof, ne jî filozof ji gotinên axa tiştêkî fam dike...

Fîlozof hêkek ji berika xwe dertîne û ravayî axa dide, axa li hêka filozof dinihêre û tenê serê xwe di ber xwe da dihejîne. Dû ra destê xwe diavêje berika xwe û pîvazêke glover ji berika xwe derdixe. Çawa ku filozof hêk ravadabû, ew jî pîvazê ravayê filozof dide. Fîlozof jî weke axa tenê serê xwe di ber xwe da dihejîne. Axa çok dide erdê, pîvazê dide ser kevirekî, kulmek li pîvazê dixê û di-hincirîne. Wê gavê filozof li şagirtên xwe dinihêre û careke din sere xwe di ber xwe da dihejîne...

Hevdîtina wan bi vî awayî diqede. Her du alî berê xwe didin welatê xwe û şûnda bi rê dikevin.

Di rê da xulamên axa hêka filozof, şagirtên filozof jî pîvaza axa meraq dikin.

Ji şagirtan yek ji filozof dipirse:

- Mamoste, me tu tişt ji vê hevdîtinê fam nekir. Te ji bo çi hêk ravayî axa da, axa çima wek bersiva te pîvaz hincirand?

Fîlozof:

- Kurên min, mexseda min ev bû ku min ji axa ra got, dinya glover e, lê ne weke gog, mîna şiklê hêkê elîps e. Lê birastî min ew bersiva wan a bi zanyarî jî ji berê da texmîn nedikir. Ew jî di alîyê zanyarî da gelek pêşta çûne û ji me kêma nema ne. Axa bi hincirandina pîvazê ji me ra got ku, raste dinya wek elîpsê glover ê, lê belê hundurê wî jî wek hundurê pîvazê qat bi qat e.

Li alîyê din jî xulam ji axa dipirsin:

- Axa, filozof ji bo çi hêk ji berika xwe derxist û ravayê te da, te ji bo çi pîvaz derxist û hincirand?

Axa:

- Oro, kurê kerê ewqas rê hatîye, tenê hêkekî bi xwe ra anîye û ji min ra dibêje were em bi hev ra bixwin. Min jî bi hincirandina pîvazê jê ra got ku, hêk bê pîvaz nayê xwerin. Ez bawerim dîsa jî wî mexseda min fam nekir... Hevdîtina duyemîn jî heye, lêbelê ne hewceye ku em weke çoroz drêj bikin.

Ev mîsal çiqwas ji bo Kurd û Yewnan hatibe gotinê jî, rastîya wê ne tenê ji bo herdu alîyan e.

Li vir alîyek Rojhilata Navîn e, alîyê din jî Rojava yê.

Rojhilat, Kurd e, Tirk e, Erebia û Ecem, rojava jî, Yewnan e, Fransiz e, Îngilîz û Alman e, Europa ye.

Herkes dikareew navên ku di vê meselokê da derbas dibe, gor dilê xwe biguherîne, lê disa jî encam yek e.

Ew dibêjin demoqrasî, em dibêjin tenê ji bo me!

Ew dibêjin aşitî û wekhevî, em dibêjin ew tenê para me!

02.07.2009

Ronakbîr û xwerina qapusqayê...

Ji kuderê tê nizanim. Dema ku rojnameyekê bigrim destê xwe, ji serî heta binî, ger ku tê da hebin îlanan jî dixwînim.

Nav û pênasên mirovan, bi taybetî jî ew nav û pênasên di bin kampanyayên sîyasî da cîh digrin, bêtir bala min dikişînin. Jiber ku, ew kesên ku beşdarî kampanyayên sîyasî dibin, hemû xwedî pênas in. Di nav wan da mirovek bê pênas nayê dîtin. Bi piranî nivîskar, şair, rojnamevan, sîyasetvan û hunermend in. Kesên bazirgan, karmend hwd hebin jî kê in.

Lê ji hemûyan zêdetir pîşe ya azad bala min dikişîne. Jiber ku, pênaseke bêpîvan e û her kes dikare xwe bi wê binav bike.

Weke mîsal, di nav wan pênasan da pijîşk, parêzer, mimar, endezyar, aborînas, jeolog, sosyolog û psikolog jixwe qet cîh nagrin. Lewra ji bo van pênasan hinek şert pêwîst in. Yê ku bi rasti xwedî van pênasan nebin, nikarin gorî dilê xwe bi kar binin. Lê nivîskarî, hunermendî û karmendî di berika kesî da nîne. Weke mînak, tu kes nikare ji keseke din ra bibêje, tu nivîskar, an jî karmend ninî.

Lê carcaran hin tiştên ji van zêdetir jî he ne. Min çend mehan berê di bin ilanekê da navê hevalekî xwe dîtibû. Bi roj û mehan ez fikirîm, di nav rûpelên ferhengên da gerîyam, lê min kurdiya wê sererast nekir. Bi Tirkî xwe wek, „profesyonel yönetici“ binavkiribû.

Min bi Tirkî; „profesyonel futbolci“, „profesyonel sanatçı“ yan jî „profesyonel siyasetçi“ bîhîstîbu, lê profesyonel yö-

netici hata wê rojê nebîhîstîbu. Hê jî dema ilanek dibînim ev pênas û xwedîyê wê pênasê tê bîra min, bixwe ji xwe ra dibêjim, hevalê min profesyonel yönetici be, gelo „amator yönetici“ tişteki çawa ye?

Bi rastî xwedîpênasbûn tişteki ne xirab e. Pênasê mirovan çiqwas zêde bin, mirov ji derdora xwe ewqas hurmet û rûmetê dibîne. Lê pênasên ku tên bikaranîn ji mirovan mezin bin, yekcar kara wî were dîtinê jî, pirî caran zirarê jî dide mirov.

Ronakbîrî jî wusa nîne?

Di civatê paşdemayî da, ev pênas jî weke benîşt di devê herkesi da ye. Di civînek, ya jî di sohbetake taybetî da tu dinihêrî hemû kes, bi ronakbîrîya xwe dest bi axaftina xwe dikin û bi wî diqedînin.

Lê nafikirin ku guhdarvan gelo di derheqê ronakbîrîya wan da çi difikirin...

Çend sal berê bi amadekarîya Komela Navend, gelek Kurd li bajarê Bonnê civîyabûn.

Civîn du roj kûdîya û gelek kes axifîn. Ji wan hinek bi rastî jî kesên bi nav û deng, hinek jî berpîrsîyarên hêz û komeleên Kurdan bûn.

Roja yekemin, akademîsyenek Kurd û sê kesên din li ser dîkê cîhê xwe girtin. Qasî dused kes mevan jî li benda wan sekinîbûn ku li gotinên wan guhdarî bikin.

Akademîsyenê Kurd, di destpêka axaftina xwe da got; “Geli guhdarvanên hêja, ez ne ronakbîr im, lê akademîsyen im. Wek akadenmisyeneke Kurd dixwazim gorî zanebûna xwe ji gelê xwe ra xizmetê bikim”.

Pişt ra dest bi axaftina xwe kir, qasî saetek axifi, lê di salonê da tu dengê ji kesî derneket. Hemû guhdarvanan wek bi dil û can guhdarîya wî kirin.

Piştî wî, berpîrsîyarê hêzeki Kurd bi Tirkî dest bi axaftina xwe kir û got; „Ez wek ronakbîrekî Kurd...“ û ket navê...

Hê dest bi hevoka xwe ya duyem nekiribû, min ji hevalê

kêlaka xwe ra têbinîyek li ser kaxizê nivîsî û tê da got; „ez derdikevim der“.

Hevalê min sedema çûyîna min pirsî. Min careke din, ji bo sedema çûyîna xwe, mîsalek li ser kaxizê nivîsî û berbi wî dirêj kir. Li hêvîya bersiva wî jî nesekinîm û ji cîyê xwe ra-bûm, hêdî hêdî ji salonê derketim. Mîsala min jî wuha bû; „Piştî Peqlewê Qapusqe nayê xwerin!“

Ez derketim derva. Destê xwe avêt pakêta cixara xwe, cixarekî vêxist û çend gurmik lêxist. Hê cixara min nivî nebibû, min nihêrî ku guhdarvânen civînê yekoyek ji salonê derdikevin û dest davên cixarên xwe. Deh deqe şûnda xêncî 9-10 kesan tu kes di salonê da nema. Ew kesên ku mabûn, ji wan hinek hevalên berpîrsîyar û ronakbîr, hinek jî guhdarvanên bêçare bûn.

Hevalê ku di civînê da li kêleka min rûniştîbû, ew jî hat ba min û bi rûken ji min ra got;

„Rast e, qapusqe ne berî baqlawê, ne jî piştî baqlawê tê xwerin!“

05.04.2006

Çoyê şivan û qoçê bizinê!

Di gundê me da mirovek sêwi hebû.

Jê ra digotin Galo...

Kesên ji wî piçûktir navê wî yê rastî nizanîbûn, yê ji wî mezintir jî navê wî yê rastî bizanîbana jî, wî bikar nedianîn...

Ji piçûkan heta mezinan, hemû gundîyan jê ra digotin Galo...

Serî Galo, binî Galo...

Sedem wê yekê Galoyê belengaz ne ji mezinan dixeyîdfî ne jî ji gotinên piçûkan eciz dibû.

Li ber gotinên wan histuyê xwe xwar dikir û di ber xwe da hurik hurik dikenîya...

Galo wek piranîya gundîyan xwendin û nivîsandinê nizanîbû, lewra di dema wî û hemsalên wî da, di gund da dibistan tune bû.

Di jîyana xwe da ji gund gava xwe neavêtibû der, sedem wê yekê ne haya wî ji welat û bajêren cûda, ne jî ji zimanên cûda hebû...

Hemsalên Galo jî wek wî neçûbûn dibistanê, lê belê ew, ji dê û bavên xwe an jî ji meleyên gund xwendina Quranê, bi çûyîn û hatina bajêr jî çend peyvên Tirkî hînbibûn. Pişt ra çûbûn ji dewletê ra leşkerî kiribûn, li wir hînî xwendin û nivîsandina çend peyvên bibûn, tirkîya xwe jî hinek pêşda biribûn.

Galoyê belengaz eskerî jî nekiribû. Qasî ku ez dizanim, di çil salîya wî da carek girtibûn û şandibûn eskerîyê, lê di nav çend hefteyan da şûnda vegeşîyabû...

Tiştên ku Galo baş dizanîbû, ew jî şivanî û gavanî, di merg û zevîyan da paletî bû.

Weke xwendin û nivîsandinê, haya wî ji ayet û duayê nimêjê jî tunebû. Lê dîsa jî rojê pênc wext nimêja xwe dikir û tu wextek derbas nedikir...

Sedem wê yekê nimêjkirina Galo di gund da bibû çîrok... Êvarên dirêj, bi taybetî di êvarên payîz û zivistanê da hemû mêrên gund di oda mêran da dicivîyan. Heta nîvê şevê di odê da dema xwe bi ken û henek, bi kilam û çîrokan va derbas dikirin. Ji ber ku civat sar nebe, ji bo nimêja êvar û eşayê tu kes nediçû camîyê. Ji cemaatê hinek kes radibûn di kuncikekî odê da nimêja xwe dikirin, hinek jî lîstik û henekên xwe didomandin.

Ji wan kesên ku nimêj dikirin, yek jî Galo ba, piştî nimêja wî di cemaatê da dîsa qilf û qal, ken û henek dest pê dikir...

Yekî jê dipirsî û digot; „Galo, xêra dê û bavê te be, tu dema radibî ser secdê û berê xwe didî qulbê, çawa nîyeta xwe ya nimêjê tîni û pişt ra kîjan ayetê dixwîni?“

Galoyê belengaz histûyê xwe xwar dikir, di ber xwe da dikenîya û bi dengê nerm bersiva wan dida û digot;

„Yaho, kar û barê we tune, hûn çî bi ser min dikevin. Ji we ra çî, ez çawa nîyeta xwe tînim û kîjan ayetê dixwînim. Ew yek, di navbera min û Xwedayê min da ye.“

Ew disekinî yekî din dest pê dikir. Di encamê da Galo têdigihîşt ku pêşîra xwe ji wan xilas nake. Di ber xwe da hurik hurik dikenîya û digot; „Ez radibim berê xwe didim qulbê, destê xwe ber bi jor vedikim, dû ra di şûna nîyetê da, „çoyê şivan û qoçê bizinê’ dibêjim û tabî cemaatê dibim.“

Bi van gotinên Galo ra pilqîn diket nav civata odê û dengê kenên wan li seranserî gund belav dibû. Ew bi gotinên Galo dikenîyan, Galo jî bi kenên wan...

Galo yê gundê me mirovek nezan û belengaz bû, di dilê

wî da tu xirabîyek cîh nedigirt. Ji nezanî û xizanîya xwe ra rêyek dîtîbû û gor wê dijîya...

Tu zirar û zîyana wî nedigîhîşt kesî.

Lê dema ku mirov îro li civata Kurd û Tirkan dinihêre, bi hezaran kesên wek Galo dibîne...

Galo yê me mirovekî sêwî û nezan bû, Galoyên ku îro derketine kûçe û kolanan jî zana û hunermend, ronakbîr û pispor in...

Dema ku mirov li ba wan qala şert û şûrtên demoqrasîyê û dadîyê bike, ew dibêjin; „çoyê min...”

Qala aşitîyê û wekhevîyê bike, wê gavê jî dibêjin; „li serê şivan û gavan...”

05.07.2013

„Ya dizanim ew e ku, ez tu tişteki nizanim!„

Ji filizofê Yûnanî deng Sokrates dipirsin; „Tu çi dizani?“
Ew jî dibêje: „Ya ez dizanim ew e ku, ez tu tişteki nizan-
im.“

Rojek, Kurdên li Almanyayê dijîn, ji bo çareserkirina pirsê Kurd civînek lidardixin. Ji gotarvanên civîne yek jî sîyasetmedarê Alman e. Guhdarvanên civînê jî bi piranî Kurd in. Sîyasetmedarê Alman li ser pirsgerêka Kurd dût û dirêj diaxife. Kîngê ku peyva Kurd û Kurdistan di axaftina wî da derbas dibe, Kurd bi çepikên xwe kêfxweşîya xwe nîşan didin. Axaftina wî diqede, ji ser dîkê peya dibe û di nav guhdarvanan da rûdinê.

Piştî axaftina sîyasetmedarê Alman, hinek Kurd jî wek berpîrsîyarê komel û partîyên Kurdan derdikevin ser dîkê û diaxifin. Civîn diqede. Hemû guhdarvanên civînê jî radibin berê xwe didin malên xwe. Ji wan du kes, hinek bi hev ra dimeşin, diçin, li cafeteryayekê rûdinên û di navbera xwe da civînê dinirxînin.

Ji wan yek ji yê din dipirse:

- Heval, min baş fam nekir, sîyasetmedarê Alman di axaftina xwe da ji bo me qet çi got?

Yê din bersiva wî dide:

- Heval wele min jî jê tişt fam nekir.

- Çawa heval, ka te digot Almanîya min pir baş e?

- Başbûnê başe, lê ez çi bikim heval, kurê kerê bi Almanîya bilind (Hochdeutsch) neaxîfî ku ez jê fam bikim. Bi dîyalekta Bayernê axîfî, ez jî wê dîyalektê nizanim.

Sîyasetmedarekî Tirk di dema hilibijartinê da diçe baja-
rekî Kurdistanê. Berî çûyîna wî aligirên wî di meydana
bajêr ya herî mezin da mitîngekî mezin lidardixin.

Jin û mêrên bajêr, gundîyên derdora bajêr bi saetan berê
tên, li meydana cîhê xwe digrin û li benda siyasetmedar
disekinin. Sîyasetmedarê Tirk tê û derdikeve ser dîkê.
Mîkrofonê digre destê xwe û bi dengê bilind, dût û dirêj
diaxife. Bi çepik û sloganan va mitîng diqede. Bajêrî diçin
malên xwe, gundî jî berê xwe didin gundê xwe.

Ji wan gundîyan yek dema ku digîhîje gundê xwe, bi
awayekî behsa sîyasetmedarê Tirk û axaftina wî dike.

Cînarên derdora wî jê dipirsin:

- Di axaftina xwe da qe ji bo me çi got?

Gundî:

- Ê çi ne got, hema qala her tiştî kir.

Hinek Kurd li ser înternetê gengeşîya axaftin û nivîsandî-
na bi zimanê zikmakî dikin.

Yên ku bi Kurdî diaxifin û dinivîsînin, dibêjin:

- Kurd, qasî ku dikarin bila bi zimanê xwe yê zikmakî
biaxifin û binivîsînin. Yê ku bi Tirkî diaxifin û dinivîsînin
ew jî wuha bersiva wan didin:

- Rast e, em bi Tirkî diaxifin û dinivîsînin, lewra em kurdîya
akademîk nizanin.

Kurd, almanî nizane, lê sebebê nezanîbûna xwe, axaftina
sîyasetmedarê Alman nişan dide...

Kurd, Tirkî nizane, lê ji pesnê axaftina sîyasetmedarê
Tirk xwe şûnda nagre...

Kurd, Kurdî nizane, doza kurdîya akademîk dike...

Dibe ku Sokrates bi eslê xwe Kurd be û ev pirsaxwe ya
meşhûr jî ji bo Kurdan gotibe... Kî dizane...

11.01.2011

Bavê min û Şivan, ez û Şakiro...

Zaroktîya min li gund derbas bû. Di dema me da, ne ku li gundan, li bajaran jî inernet û telefon, heta televizyon jî tune bûn.

Bi navê tiştên elektronîk tenê radyo û teyîp dihatin zanîn, ew jî di her malekî da nedihatî dîtin.

Lîstokên zarokan ji kevir û daran, ji kap û vizikan, ji gogên ji rîs û ji hiriyê pêkdihatî.

Ji sînema û tîyatroyê, ji roman û pirtûkan haya tu kesî ne bû. Kesî ne Elvis Presley, ne jî Marilyn Monroe nasdikir. Bi navê huner û hunermendiyê tiştên ku dihatin zanîn, ew jî, dengbêj û klam û stranên wan bûn.

Kilam û stran jî ya dengbêjek bihata gund, ya jî heftê da carê malên ku tê da radyo hebûn, radyoya Rewanê vekiribana, şênîyên gund jî bi wî awayî navê dengbêjan dibihîstin û klam û starên wan ji dûr va be jî guhdarî dikirin.

Qasî ku tê bîra min, di gundê me da sê radyo hebûn. Ji wan yek jî mala apê min bû.

Ew jî di royê da carê, ji bo ajansên xebera, heftê da carê jî ji bo radyo ya Rewanê dihatin vekirin.

Ji ber ku hê elektrîk negihîştibû gundan. Radyo bi pîlan dixebitî, pîl jî buha bûn û tenê li bajêr dihatin firotan.

Ji bo guhdarîkirina ajansê zarok û jinan guh nedidan radyoyê û ji bo wê jî ber bi malên radyo tê da hebûn, nedîçûn.

Lê heftê da carê kîngê radyo ya Rewanê dest pê bikira, jin û mêr, keç û xort û zarokên gund li ber derê malên ku tê da radyo hebûn, dicivîyan û bê deng û bê seda, guh didan kilam û stranên. Bi dil û can li dengê dengbêjan, li

dengê Kaus Axa, Meyremxan, Şeroyê Biro, Karapêtê Xaço û li dengê bilûra Egîdê Cimo guhdarî dikirin.

Radyoya mala apê min di dolabeke piçûk da bû. Dolab jî di nav dîwarê odê yê li rexta kulekê da hatibû bicîhkirin. Derê dolabê jî hergav girtî, anaxtara kilîtê jî bi apê min ra bû.

Heger roja pêncşemê apê min li mal ba, çend deqe berî destpêka bernameya Kurdî ya radyoya Rewanê, derê dolaba ku radyo tê da vedikir û bişkovka radyoyê li alî rastê hêdîka dizivirand. Berê ji radyoyê çûse çûsik dihat. Apê min bi bişkovka din va hêdî hêdi dilîst, heta ku deng zelal derdiket...

Jinê û mêrên ji malbatê û cinar li odê ya jî li berderê malê, zarokên taxê jî derdiketin ser banî xanî û diçûn li derdora kuleka odê rûdiniştin. Guhê xwe didan ber devê kulekê û bi dil û can li kilam û stranên radyoyê guhdarî dikirin...

Kilamên dila dest pê bikiraba, dev û lêvên keç û xortan dilivîn, birî û bijangên wan di cîhê xwe da direqisîn. Lê dema ku kilamê cemaatê dest pê bikira, wê gavê jî hêsir di çavên pîrejînan da dihatin xwarê. Di dilê xwe da dikil-kilîn û dest diavêtên serê laçikên xwe û bi destên xwe yê weke hehecok dihecîyan, dizîka hêsirên xwe paqij dikirin.

Ji ber vê yekê kîngê qala hunermend û stranên bihata kirin, berê radyoya Rewanê û hunermendên di wê radyoyê da distiran, paşê jî dengbêjên hêla me, yê weke Zilkoyê Çawirmê, Şakiroyê Qereyazîyê, Huseynoyê Muşê, Sidî-qoyê Bîngolê, Zahiro û Reso dihatin bîra me...

Hata danzdeh salîya xwe, min ji wan dengbêjan Zilkoyê Çawirmê tenê dîtibû û dengê wî bi zindî guhdarî kiribû. Zilkoyê Çawirmê zavayê gundê me bû. Ew, bi kêmasî di salê da carê dihat li gundê me dibû mêvan. Roja ku Zilko bihata gund, wê êvarê cemaata gund di oda mala kalikê min da dicivîya.

Heger payîz an jî zivistan ba, jin û zarok li hewlîya odê, havîn an jî derê biharê ba li ser xanî kom dibûn û guhê xwe didan kuleka odê...

Dema ku Zilkoyê dengbêj dest bi stranê dikir, ji kuleka odê dengê wî û dûyê cixarê, dûyê ku weke kulfika tendûrê derdiket, li hev diqelibûn û bilind dibûn.

Dengbêjên din jî, di dawetek da an jî di şahîyekî da kesî kilamek bigota, mezinan digotin ev kilam ya Şakiro, an jî ya Zahiro ye. Bi wî awayî me fêhm dikir ku ew jî weke Zilkoyê Çavirmê dengbêjên bi nav û deng in.

Piştî danzdeh salîya min, mala me ji gund koç bû û em hatin li bajêr bi cîh bûn... Şert û îmkanên bajêr ji yê gundan cûdatirbûn. Em jî di demeke kurt da bûn xwedîyê teyîb û radyoyê...

Hemû êvarên me bi guhdarîkirina teyîbê ra derbas dibû. Bavê min teyîp dida kêleka xwe, kasetek ji berîka xwe derdixist û di teyîbê da bi cîh dikir. Pêlî bişkoka teyîbê dikir û gor dile xwe dengê wê vedikir. Em jî li dora wî kom dibûn, me dengê xwe dibirî û guh dida kilam û stranên dengbêjan.

Bavê min kîngê biçûya sûkê ji dost û hevalên xwe, bi emanetî kasêtek digirt û bi xwe ra dianî malê. Heger îmkan heba me ew kaset berê kopî dikir, tune ba, çend roj lê guhdarî dikir, pişt ra jî bavê min ew dibir û yekî din dianî. Bi vî awayî carcaran kasetek di navbera hezar kesan da diçû û dihat.

Piştî koçberîya me ya bajêr min dest bi xwendinê kir. Li alîkî tesîra xwendina li dibistanê, li alîkî jî têkilîyên bi hinê kesên ku di taxa me da rûdiniştin, min jî di piçûktîya xwe da xwe di nav sîyaseta çep da dit.

Bi xwendina pirtûka bi navê Alfabeya Sozyalîzmê, min jî weke hevalên xwe yên gire gir, xwe şoreşger û pêşverû dihesiband, kesên derdora xwe; dê û bav, ap û xalê xwe, şêx û mele, axa û beg, çîrokvan û dengbêjên Kurd weke

kesên nezan û paşverû didît û bi nav dikir. Piştî têkilbûna min a sîyasetê kasêtên hunermenden Tirk û Kurd yên şoreşger, wek Şivan, Aşîq Îhsanî û hwd. diketin destê min... Sedem hebûna wan kasêtan di mala me da jî dubendîyek derket.

Li alîkî kasêt û dengbêjên min, li alîyê din jî yên bavê min. Li alîkî dengê Şakiro, Zilko, Huseyno û Zahiro, li alîyê din jî Şivan, Aşîq Îhsanî, Abdula Papur û Aşîq Zamanî...

Dema ku dengbêjan distira ez, dema ku min ji kasêtên xwe yekê biavêta ser teyîbê û deng ji teyîbê derketa bavê min diqehirî...

Bavê min xwe Kurd dihesiband û her tim li muzîka Kurdî guhdarî dikir, min xwe Kurd bihesibanda jî, muzîka ku min lê guhdarî dikir, muzîka şoreşgerî bû.

Ew hunermendên ku min şoreşger bi nav dikirin û li dengê wan guhdarî dikirin, piranîya wan jî weke Şivan, Kurd bûn. Mixabin ji kurdîtîyê zêdetir, weke her kesên şoreşger, min jî ji bo xatirê kilamên ku li ser Marx û Engels, Lênin û Stalîn û Apê Ho digot, li stranên Şivan guhdarî dikir.

Bavê min çiqas Şivan nasbikira jî wê demê li stranên wî guhdarî nedikir. Guhdarî bikira jî, ji gotinê stranên wî tu tiştêkî fam nedikir.

Carcaran bi hêrs diket û ji min ra digot; „Kuro, ew Kurdî bibêje jî, ez tu tiştêk jê fam nakim“.

Min jî bersiva wî wusa dida û digot; „Dengbêjên te jî Kurdî distirên, lê belê ew di bin baskên axa û began da dijîn û bi kilam û stranên xwe, di nav Kurdan da dubendîtîyê dikin.“

Di wan salan da min bi awayekî Şakiro jî bi şexsî dît û naskir.

Dema ku min Şakiro dît, ez xortekî 15-16 salî, ew jî di salên bavê min da bû. Ji nêrînên şoreşgerîyê ez jê diqehirîm û ji salên wî û hunermendîya wî ra jî tu car hurmet

nedikir. Halbûkî hevnasîna bi wî ra ji bo min şanseke mezin bû, mixabin min ew şansê xwe, wê demê bikarneanî... Bi poşmanîya salan şûnda jî ew şansê min ê revîyayî û kêmsîya min a di wî warî da tu car nehat telafîkirin...

Ji ber ku min xwe mirovekî şoreşger û zana, Şakiro jî dengbêjekî feodal û xizmetkarê axa û began dihesiband. Ne ku bi şexsî guhdarkirina stranên wî, dema ku rastî min bihata, min pozê xwe bilind dikir û rêya xwe duguhart ku, ne ez silav bidimê, ne jî silava wî bigrim...

Ji wê demê vir da şev û roj, meh û demsal derbas bûn. Dem hat ez bûm guhdarvanê Şakiro û dengbêjên ku, bavê min her tim li wan guhdarî dikir...

Bavê min jî bû guhdarvanê Şivan, Şivanê ku di destpêkê da hemû kilamên xwe li ser Apê Ho, Lênin û Stalîn digot û bavê min jê tu peyvek fam nedikir...

Kîngê li dengê Şakiro ya jî li dengbêjeki ji dengbêjên bavê xwe guhdarî bikim, piçûktîya min, gund, radyoya Rewanê û bavê min tên bîra min. Xemgîn dibim û berxwe dikevim...

Bavê min di xortanîya xwe da jî, di kaltîya xwe da jî ne şoreşger ne jî peşmerge bû, lê di hemû jîyana xwe da ji kurdayetîya xwe dûr neket û bi neyarên Kurdan ra hevaltî nekir û bi wan ra nebû dost.

Di her şert û mercan da xwe Kurd hesiband, gor orf û edetên Kurdan jîyana xwe domand, heta roja mirinê jî li kilam û stranên dengbêjan guhdarî kir.

Kîngê Şivan, dest ji stranên li ser Apê Ho, Lênin û Stalîn, Marx û Enges berda û dest bi kilam û stranên wek Bavê Fexrîya, Zembilfiroş û Çemê Çetelê kir, wê demê bavê min jî di nav cîhê dengbêjên xwe da ji Şivan ra cihekî sereke ava kir.

Min jî kîngê qasî ku pirtûkên li ser Stalîn, Lenîn, Marx û Engels dixwend, ewqas jî dest bi xwendina Mem û Zîn a Ehmedê Xanî, Şerefnameya Şerefxan û pirtûkên Mewla-

na Xalid û Melayê Cizîrî kir, ji wê demê vir da qasî ku li stranên Şivan guhdarî dikim, ewqas jî li yên Şakiro, Zahi-ro, Huseyno û hemû dengbêjên Kurd guhdarî dikim. Bi deng û awazên hemû dengbêjan kêfxweş dibim û ji dengê awazên wan tama zimanê xwe şerîn digrim. Bi awayekî din, Şivan stil û stranên xwe guhart, di nav cemaata dengbêjên bavê min da cîhê xwe girt, ray û ramanên min guherîn Şakiro jî bû şahê dengbêjên min... Lê mixabin di civat û civakê da hinek tişt jî hene ku mirov û civat ji serî hata binî werin guhartinê jî hinek tişt bi hêsanî nayên telafîkirin... Weke mirina keç û xortan... Weke xewnên zarokan û hêsirên çavê dayîkan... 25.10.2012

Awazên Şakiro û rewîtiya min...

Carcaran mirov dixwaze ji qirêj û gemarîya civatê û ji derd û kulên jîyana rojane dût bikeve. Ji bo vê yekê daxwaz tenê ne bes e.

Mirov çiqwas xwe biparêze jî, carcaran bêhemdi xwe di nav wê qirêjîyê da dibîne. Lewra tekîlîyên civatê û jîyan, qasî başî û paqijîyê, qirêj û gemarîyê jî di nav xwe da disitînin.

Ji ber vê yekê ye ku, divê mirov carcaran xwe jî têkilîyên civatê jî dût bixîne. Herkes nikare weke Robînson xwe bavêje doravêkî û heta dawîya emrê xwe, bi tena serê xwe bijî...

Lê heger ki mirov bixwaze dikare bi saetan an jî bi çend rojan ji derd û kulên civatê dût bikeve û gor dilê xwe bijî. Dema ku ji têkilîyên civatê eciz dibim, ez berê xwe didim malê û derbasî oda xwe dibim. Destê xwe daivêjim copûtera xwe û bi deng û awazên Şahê Dengbêjan ra dikevim nav xewn û xeyalan û ji xwe ra jîyaneke bê sînora ava dikim...

Jîyaneke ji hemû têkilîyên rojane dût û azad...

Çavê xwe digrim û bi her stranekî Şakiro ra derdikevim rêwîtiyê, rêwîtiyeke dirêj û dîrokî...

Şakiro dest bi stranên dike û dibêje:

„Eman herê lê.....

Delalyê hêy hêy,

Sibeye min ji te ra nego di rê da ha di rê da, ca tu rabe çava bişkêne birîya pê da pê da,

Emê destê hevdu bigrin bimeşin ber gola miradê, gilî û ga-
 zinên xwe bikin bi avê da
 Hela rabe emê kaxitekî binivînin ji Xaliqê Alemê Rebê
 Jorîn ji terefî di Xwedê da
 Emê bavênê gola hêşîn delxê di avê da, belkî miradê
 miradxwazan hasil bike,
 Mirazê min û muhuba dilê min, meha Remezanê Şeva Ley-
 le-tul Qedir...
 Di mala bavê piş perdê da herê lê...
 Lê lê delalyê sibeye li me sûra sibê bîhna bê tê,
 Ezê li piştta konê mala bavê muhuba xwe fitilîm min dît
 narîna min ji jêr tê...
 Kawa min a kubar û nazik û nazelîn fena kehêla ji kehêlê
 diyarbekir,
 Pêşîr bi rext serî bi rişm e,
 Merî gemek ji gemê dîyarbekir lê bixîne, zînek ji zînî Şamê
 namilê bîne,
 Lingê xwe bikê rikêfê destê xwe bavê dizgînê, rabe orta zîn
 û ssewqû lêkeve,
 Di kerawîyê va, di seqawîyê va, çar buhurê Çawirma Xelîl
 Axa va
 Tu seyr bike xwe bavê zozanê Xamirpêtê herê lêêê...”

Stranek diqede yekî din dest pê dike...

Bi strana “Emro” ra ez ji Zozanê Xamirpêtê radibim û
 berê xwe didim Çemê Muradê, pişt ra xwe davêjim etegên
 Çîyayê Sinê û Sinegê, nav berf û qiraxê...

Bi strana “Qazê” ra, carek din bi rê dikevim, di nav zo-
 zanên Bingol û Şûşar û Takmanê, li welatê Serhedê he-
 spê xwe dibezînim û diçim li çîyayê Şahwelat konê xwe
 diçikînim...

Bi strana “Saliho” ra, wek bayê ku ji başûrê tê, banz didim
 û xwe diavêjim ber Behra Wanê. Bi qayix û gemîyan ra
 digihîjim peravên Tetwanê...

Bi strana “Neçîrvano” ra, demsal duguhure, dibe bihar.
Bi berbanga sibê ra radibim, li hespê “Bozî Rehwan”
sîwar dibim, beşliya Romê davêjime mile çepê, coteke ta-
jîyê reşê xezalî davêjim merezê, bi Şemo yê sîwarê Çacanî
Kavrêşî Çavreş ra berê xwe didime bêlanê bilind û derdi-
kevim nêçîra Xezalan...

Bi strana “Serayê” ra, demsal dibe zivistan. Di qonaxên
mîr û hakimî da civat saz dibe...

Mîr û hakim li serê civatê rûniştine û pesnê dost û yar ên
xwe didin. Ez jî yek û yek li pesnê gotinên wan guhdarî
dikim. Pişt ra kum û kolozê xwe xwar dikim û tenê pesnê
Seray a Mamed Axa didim...

Dû ra berê xwe didim koşka Surmeli Mehmed Paşayê
Millî û di nav cemaata wî da cîhê xwe digrim. Bi şev û
rojan li pêşbirkîya di nav Evdalê Zeynikê û Gulê, Gula File
da derbas dibe, guhdarî dikim.

Dema ku Ewdalê Zeynikê di dawîya kilama xwe da dibê-
je; „Temo lawo mirin çêtir e ji feqîrîyê“ û dilorîne...

Ez jî ji xewnên xwe yên şêrîn hişyar dibeim û rêwîtiya
min a bi deng û awazên Şahê Dengbêjan va destpêkiribû,
diqede...

Heger hûn jî dixwazin rêwîtiyeke wusa bikin, ne hewce
ye xwedî mal û mulkê dinê û dewlemend bin.

Ji bo wê rêwîtiyê çend stran û deng û awazên Şakiro ji bo
we jî bes in...

01.05.2010

Mirov di dinyayek piçûk de xwe mezin dibîne

Salan berê min jî wek gelek kesan ji xwe ra dinyayek piçûk avakiribû û di navenda wê dinyayê da konê xwe çikandibû. Heval û hogirên ku cînartîya min dikirin, ew jî wek min difikirîn û dijîyan.

Ji kesên jixwe dûr va ra derîyê xwe girtibû, bi wan ra têkilîyê xwe birrî bû, di navbera xwe û wan da sînorek ji kevirên pûç kişandibû. Min û hevalên xwe bi çavê neyartîyê li wan mêze dikir. Ew jî me ji xwe ra wek neyar didîtin. Carcaran jî nav û nûçikên ku me ji dûr va lihev dikir, dihatin guhartin. Lê sînorê di navbera me da hatibû kişandin, di cîhê xwe dima. Nezanî û belengazî rojek para me ba, roja din dibû para wan.

Di dinya min a piçûk da du reng û du deng tenê cîh digirtin. Konê min û yên wek min difikirîn sipî, konên din jî reş û tarî bûn. Dengê min û hevalên min rast, dengê kesên din jî şaş û çewt bûn. Bi salan di wê dinya xwe ya piçûk da li derdora xwe çû û hatim. Ne dixwest rengên din bibînim, ne jî dengên cûda bibihîzim. Ji rengên cûda ra çavên xwe, ji dengên cûda ra jî guhên xwe digirt.

Sedem vê yekê bû ku, çiqas di piçûktîya xwe da navê wan bihîstiba jî, di sîsalîya xwe da Alî Şerîatî, Cemil Meriç û Mewlana Xalid naskir.

Bi nasînan wan û kesên weke wan va ji reng û dengên cûda hayîdar bûm. Piştî xwendina kitêba Alî Şerîatî ya bi navê „Çar Zîndanên Mirovan“ ra têgihîştim ku ew dinya min a piçûk a bê derd û kul, ji bo min girtîgeh, konê min jî zîndaneke vekirîbû ye...

Bi kitêba Cemil Merîç ya bi navê „Jîyana Şikeftê“ ra, min dewlemendîya dengên ji hev cûda ferq kir.

Bi nasîna Mewlana Xalid ra, qasî oldarên paşverû, oldarên welatparêz, zana û pêşverû hene, dît.

Bi nasîn û bihîstina deng û rengên cûda ra dinya min a piçûk hilweşîya, konê min ji yekdeng û yekrengêkî pêk dihat, di bin kavlê dinya min a piçûk da ma.

Min ji nû va dinyayeke bêserî û bêbinî ji xwe ra ava kir...

Konê xwe bi rengên cûrbecûr xemiland û derê wê ji dengbêjên ku heryek bi awazekî distirên ra vekir...

Li kêleka konê min, koşk û serayên rengîn avabûn, li dora min kesên zana û xweşbîn cîh girtin...

Ev dinya min a rengîn, îro jîyana min jî dixemlîne û bêhna min fireh, ronîya çavên min zêde dibe. Dûr û dirêj dinihêrim, reng û dangan zelal û paqij dibînim û dibîzîm...

Dengê jin û mêran, dengê teyr û tîran, dengê ba û bagerê, deng û rengên pel û daran bala min sivik dikin.

Şev û roj, bi guhadarîkirina her dengêkî melodîyeke nû kişf dikim. Carcaran bi kêf û eşq direqisim, carcaran dikanim û carcaran jî li ser sal û demsalên vik û vala derbasbûyî dikewicim û di dilê xwe digrîm.

Bi reqsê bejna min, bi ken hestên min, bi kewicandin û girî jî wijdana min azad dibe û ji nû va dijîm...

Dema ku rastî hin kesên ku hê di dinyayeke piçûk da xwe giregir dibînin û dijîn, têm, li kîrin û kiryarên wan dinihêrim, çavkorî û kerrbûna wan dinya min a piçûk tînin bîra min.

Bê lome berê xwe diguherînim, bi rûken gavên xwe diavêjim û ji wan dûr dikevim...

Di dinya xwe ya mezin da weke misqalek piçûk xwe bibînim jî, bi bihîstina dengêkî nû coş, bi ditîna rengêkî nû jî kêfxweş û serbilind dibim...

30.05.2012

Rêwîtiya di nav çend pirtûkên Kurdî da!..

Di piçûktîya xwe da, min dest bi xwendina Quranê kir. Di demsala payîz û zivistanê da rojên min bi xwendinê derbas dibûn, xwendina bi zimanekî bîyanî û ezber. Xêncî navê Xwedê û navên pêxemberên ku di Qûranê da derbas dibûn, tu tişteki jê fam nedikir. Lê dîsa jî her roj, danê sibê û danê esrê, li kêleka bavê xwe rûdiniştim, bi deng û bi meqamê ku ji bavê xwe hînbibûm, Qûran dixwend. Hevsalên min li ser cemedê çemê gund, ya jî di gomên pêz da kap dilîstîn, ez li ber soba germ rûdiniştim û pelê Qûranê di ser hev ra diquluband....

Piştî dibistana seretayî min dest ji xwendina Quranê berda û berê xwe da pirtûkên cûrbecûr. Pirtûkên ku ji xwendina wan fam dikir û jê sûd werdigirt...

Bi taybetî jî roman û çîrok bala min dikişandin. Li qalînî û ziravîya wan mêze nedikir, kîjan roman û çîrok biketa destê min, bi dil û can dixwend. Ger ku kêfa min ji pirtûkeke bihata, heta ku dawî lê nehata, dest jê ber nedida.

Carcaran bi pirtûkekî qalind derbasî kuncikekî odê dibûm, şev û roj, bi çayekî bi dem û bi cixareyek ji titûna Mûşe, xwandina xwe bê navber didomand. Ne çav diêşîyan, ne jî pişt û pal diqerimî...

Nuha jî zêde dixwînim, bi taybetî roman û çîrokên Kurdî. Herçi qas pirtûkên Kurdî hê jî zêde nebin, bixwe jixwe ra dibêjim:

„Bila bi Kurdî be, çi dibe bila bibe!“

Roman ya jî çîrok, çi rastî min were, digrim nav û destê xwe û di nav rûpelên wan da dikevim rêwîtiyê.

Ji bo min pirtûka her baş ew e ku, dema mirov dest pê dike, dixwaze ji zû va bigihîje dawîyê, lê dema ku ber bi dawîyê diçe jî, naxwaze dawî lê were û dibêje xwezila qet xilas nebe, ye!

Di van salên dawîyê da pirtûkên qalind –roman û çîrokên bi Kurdî yên qalind herçiqas kêr bin jî- çavê min di-tirsînin. Jiber vê yekê, heger di destên min da çend pirtûk hebin, berê ji yên zirav dest pê dikim û dixwînim.

Di meha Cotmeh û Mijdarê da jî min wusa kir...

Ji pirtûka Elî Şerîetî ya bi navê „Çar Zîndanên Însan“ va dest bi xwendinê kir. Min sî sal berê jî ev pirtûk bi zimanê Tirkî xwendibû. Tahma ku wê demê jê girtibû, ji wergera wê ya Kurdî negirt. Piştî çend rûpelan, ferq kir ku zimanê nivîskar ya jî yê wergervan zimanekî şêlû be, mijar jî şêlû dibe, tama xwendinê direve.

Loma min bi lez û bez ew xwend û xwe ji çar zîndanên tarî avêt der.

Min ew danê ser refên pirtûkan, Keştîya Bayê, pirtûka Selîm Temo bala min kişand.

Di nav rûpelên wê da gerîyam.

Bi bayê keştîyê va tama zimanê min ê şêrîn vegerîya ser dev û lêvên min...

Selîm Temo ji dûr va diqêrîya û digot:

„(...)

here tava xwe di şevê de bixewîne

çemê xwe bi nava deryayê ve bibezîne

(...)“

Dawî li helbestê hat û pirtûk qedîya. Min Keştîya Bayê di nav pirtûkan da bi cîh kir, Sylvia, romana Lokman Polat derket pêşîya min.

Bi meraq min dest bi çîroka Sylviayê kir û xwend. Çîroka ku bi zimanê zelal hatibû nivîsandin, dibe ku ji mijara wê ya xerîb û wegotina nivîskar ya rasterast be, germahîyek neda min. Lê herikbarîya zimanê Lokman Polat,

min bi xwe ra di nav rûpelên pirtûkê da gerand û heta dawîya çîrokê bir. Dawî li romanê hat, çavê min li pirtûkeke zirav ket. Merîya digot qey serê xwe ji nav pirtûkan dirêj kirîye û gazî merîya dike...

Pêsîrên Dayê, pirtûka Hesenê Metê...

Destê min bêhemdî çû ser pirtûkê. Ji nav çend pirtûkên qalind kişand û da ber xwe... Qasî ziravîya pirtûkê, sadebûna berg û dîzayna wê jî bala min kişand. Bi çîorka yekemîn va ketim nav xewn û xeyalên xwe yên zarakatîyê... Bi qulibandina pelan va ez firîyam û li serê çol û çîyan gerîyam... Çîrokek qedîya, yekî din dest pê kir. Çîrokên kin û bi zîmaneke zelal û bi hevokên xemîlandî... Tahma zîmanê dayê ji pêsîrên wê dihat...

Piştî tahma ku min ji „Pêsîrên Dayê“ girt, tîrsa çavê min jî revîya. Ê ez li pirtûkeke qalind gerîyam. Di nav pirtûkên li benda xwendinê da, ya herî qalind kişand û girt.

Aştîyago... Romana Ferqîn Melîk Aykoç.

Çîroka Derwerîya Medan, çîroka têkçûyîne...

Bi xwendina pirtûkê va di nav pelên dîrokê da wenda bûm. Di nav dîroka wendayî da rastî Aştîyago û Kuroşên hemdem, bi taybetî Aştîyago yên ku heta roja îro bi cînartî û hevaltîya kujerên xwe xapîyan û hê jî dixapin, hatim...

Bi xwendina dîroka Medan ku ji alî nivîskar bi tewna romanê û bi zîmanekî herikbar hatîye nivîsandin, bextewar, bi têkçûna Aştîyago yê ku ji alî nebîyê xwe va hate kuştin jî ewqas xemgîn bûm... Tekçûyînen dúbarekirî, Kerkûk û Efrîn, bêbextîyên navxweyî, şerê xal û xwarzîyan careke din hatin ber çavên min...

Ji tesîra çîroka dîrokî, min berê xwe da bayê başûr û derbasî binxetê bûm. Ji Qamişloyê dest pê kir û heta Amûdê li şopa Wehşê Di Hundurê Helîm Yusiv da gerîyam. Wehşê ku Helîm Yusiv ji hundurê xwe derdixê û bi peyv û hevokên weke gulîyên qîz û bûkan hûnandî, tarîf dike û dide nasîn. Mirov bi dîtîna û nasîna Wehşê Di Hundurê

Helîm Yusiv ra têdigihîje ku, derd û kulên hemû Kurdistan jî weşên di hundurê wan da jî yek in û wekhev in... Ha li serxetê û ha li binxetê tu car ferq nake.

Dema ku bi rûpela dawîyê va, gera min li Qamişlo û Amûdê qedîya, bixwe jixwe ra got, her ku ketime nav bajarên binxetê, serîkî li Kobanîyê nexim, nabe... Min berê xwe da Kobanîyê û bûm mêvanê Jan Dost. Pirtûka wi ya qalind girt nav destê xwe û ji rûpela serî da xwe di nav bajarê wêranbûyî da dît. Di nav kûçe û kolanên birîndar da gav bi gav gerîyam.

Di bin kaviên avahîyan da rastî keç û xortên rûken, ew keç û xortên ku di bihara emrê xwe da canê xwe ji dest dabûn, hatim.

Kal û pîr, jin û zaroken ku di bin çenkên wan da tûrikê nan, bi dilekî xemgîn û bi çavên hêsir jê dibarîyan, bere xwe dabûn xetê û derbasî serxetê dibûn, dit.

Binxeta ku bi salan bibû stargeha Kurdên serxetê, êdî starî li Kurdên binxetê jî nedikir. Keç û xort li alîkî, kal û pîr, jin û zarok her yek li alîkî pîran pîran dibûn...

Bi zelalîya zimanê nivîskar dilşa, bi naveroka pirtûkê ku, tê da eş û jan a birînen ku xwîn ji diniqitin jî, ewqas xemgîn bûm...

Bi xwendina rûpela dawîyê va pirtûk qedîya, xemgînîya min zêde bû.

Ketim nav xewn û xeyalan, kaviên bajarê wêranbûyî weke filmek di ber çavên min ra derbas bûn...

Bistek şûnda pirtûk ji destê min da ket û bixwe hatim, lê dilê min li bin xetê, di nav kûçe û kolanên Kobanîyê da ma...

01.12.2018

Kurd Îdol

Demeke dûr û dirêje, her heftê, roja şemîyê bi bend dikişînim. Saet heyştê êvarê, rûdinê, pişt a xwe didim palkursîyê xwe, berê xwe didim ekranê televîzyona Kurdsatê û li bername Kurd Îdol temaşe dikim.

Na, ne tenê temaşe dikim.

Derdikevim rêwîtîyê... rêwitîyeke dûr û dirêj...

Di nav bîranînên xwe da wenda dibim...

Diçim piçûktîya xwe...

Li gund, her rojên pêncşemê, ew rojên ku jin û mêr li ber derê malên ku radyo tê da kom dibûn û guhê xwe didan bername radyoya Rewanê...

Bavê min û kasetên dengbêjên wî, ew kasetên ku herdem di berîka xwe da, li ser dilê xwe û bi xwe ra digerland û kîngê eciz biba, diavêt ser teyîbê û guhdarî dikir...

Şevên zivistanê, ew şevên ku mêr li odeyên mêran rûdiniştin, jin jî li paş derî, di tarîyê da disekinin û bi saetan li dengbêjên ku di odê da kilam û stran digotin, guhdarî dikirin...

Hemû wek li ser ekraneke duyemîn di ber çavên min da derbas dibin...

Çavekî min li ekrana Kurdsatê, yê din jî li wê ekranê...

Bi dengê Wedat, bi dengên wî yê zelal ji şabûna digirîm.

Bi stranên Cengîz ra xwe di nav salên heyştêyî da û li Stenbolê dibinîm.

Kasêta Koma Wetan çawa ketibû destê min û bi hevalên xwe ra, di bin kîjan şert û mercan da guhdarî kiribû û ji xwe çûbûn, dibînim û xemgîn dibim...

Bi gotinên Ronî û tevgera wî ra dikenim, kêfxweş dibim û bîr û bawerîyên min xurt dibin...

Bi deng û stranên Bane Şîrwan şazdeh salî ra, ji bo pêşeroja ziman û muzîka Kurdî dilşa û serbilind dibim.

Bi dengê Jînda Qenco ra xwe li Kobanîyê li Kurdistanê Rojava...

Bi dengê Xezal Mistefa ra li Kurdistanê Rojhilat...

Bi dengê; Aştî Ezîz, Tanya Aso, Ferzad Mehdînya, Rawan Îbrahîm û Zêrevan Casim ra xwe di nav Gulîstana Kurdistanê da, ew baxçeyê ku bi reng û dengên cûda û bi aheng xemilandî da dibînim û nêzikî xewn û xeyalên xwe yên li ser Kurdistanê azad dibim...

Difikirim û dibêjim; çawa ku bi saya dengbêj û medreseyên Kurd zimanê me jîya û heta roja îro hat, ji vir şûnda jî bi saya keçû xortên ku di rîya dengbêjan da diçîn û ji îmkanên zanyarî û teknolojîyê îstifade dikin ra, îro roj bi roj dewlemend dibe û pêşda diçe.

Di vê pêşveçûyînê da, barekî giran dikeve ser milê hemû dezgeyên Kurd û Kurdistanê ku ji wan dezgeyan yek jî KurdSat e...

Bê şik, Kurdsat bi bernama Kurd Îdol va, hem barê xwe, hem jî barê me hemûyan sivik kir û dike...

Di navbera paşeroj û pêşeroja me da, di navbera herçar parçeyên Kurdistanê û di navbera herçar zaravayên Kurdî da pireyeke zêrin çêkir ku, ew beşdarvanên ku ji destpêkê heta roja îro, bi kilam û stranên xwe û bi hûnerên xwe cîh girtin, ew jî ev pire xemilandin û dixemilînin...

Duh êvarê ji neh kesên mayîn, şeş kes derbasî qonaxê nû bûn û derketin fînalê.

Bane Şîrwan

Wedat Akarsu

Jînda Kanco

Cengiz Yazgi

Xezal Mistefa

Ferzad Mehdînya

Hefteya pêşîya me jî, ji van şeş kesan yek wê bibe yekemîn.

Mixabin gor raya min û ez bawerim gor raya hemû temaşevanên bernama Kurd Îdol, ev kesên ku min navê wan daye û nedaye, hemû di asta yekemîn da ne...

Bi sedan keç û xort, bi destpêka bernama Kurd Îdol va gavekî hunermendî avêtin û ewê ji vir şûnda jî di rîya hunermendîyê da bimeşin.

Di dawîya bernameyê da ji wan yek dê bibe yekemîn...

Ewê xelata xwe bigre û şa û dilşa be...

Lê belê Kurd Îdol bi xwe bernameyeke yekemîn e û hemû beşdarvanên wê jî di dilê gelê Kurd da yekemîn in...

Jiber ku bi beşdarbûna vê bernameyê va hemû bi dil û can, bi bîr bawerîyeke xurt barekî giran avêtin ser milên xwe. Ez bawerim ewê di bin barê xwe da bi serkeftî derkevin û bi hunerên xwe, ziman û muzîka Kurdî pêş ve bibin...

Qala her çar hunêrmendên ku di bernamê da rê û rêbazên hunermendîyê dan û didin ber beşdarvanan. Bi rexne û pêşniyarên xwe, astêngên li ser pêşîya rîya wan ji holê radikin, neyê kirin, ev nivîs kêr dimîne...

Herçar hunermendên hêja;

Xatûn Kanî

Nîzameddîn Ariç

Ednan Kerim

Bijar Kamkar

Di rexne û şiroveyên xwe da, gor şert û mercên hunermendîyê û bi hestên Kurd û Kurdistanî tevgerîyan û karekî qedirbilind û giranbûha anîn û tînin çih ku, ez bi dil û can wan pîroz dikim.

08.07.2017

Dikana Evdo...

Di dikana Evdo da du qalib sabûna reqî, du çewal kartol, torbekî şekirê sipî, kasekî mewucên bi dendik, telisek pîvaz, çend serî sîr, çend pakêtên titûna tekelê, şûşekî benîştê nêrbend, destekî ftil ji bo lambeyên qazyaxîyê, ji bo zarokan jî çend kîlo şekirê sor (aqîde) û torbeyek balonê rengîn hebûn.

Evdo bi dengê melê sibê radibû, diçû dikana xwe vedikir, hata nivê şevê li ber dikanê dima.

Li kuncikê dikanê alî jor kursîyek dadanî û li ser wê rûdinişt, heta êvarê li rîya mişterîyan dipa.

Dema li ser kursîyê nerm rûdinişt û piştta xwe dida dîwar, xewroşkî dibû, hêdî hêdî çavê wî diçûn hev û di ber xwe da hûr û kûr dihênijî.

Bi sîya mirovekî, an jî bi dengê zarokekî va ji cîhê xwe qildibû û ber bi derî diçû. Heger ku kes nehata hundir, Evdo dîsa wek kor û poşman vedigerîya û li cîhê xwe rûdinişt, heta ku dengêkî din ji der va bihata ji cîhê xwe nedilivî... Kingê Evdo bihênijîya, xewnên wî yên nivco dest pê dikir...

Hemû xewnên wî li ser dikan û markêtên mezin derbas dibûn.

Carcaran di xewna xwe didît ku, mişterî li ber derê dikana wî ketinê rêzê. Li alîkî pêşwazî li mişterîyan dikir, li alîkî jî diqêrîya, gazî jin û zarên xwe dikir ku bila werin alîkarîya wî bikin. Ji sibê heta êvarê mişterîyek diçû yekî din dihat. Bi destê sibê ra refê dikanê tijî dikir, ber bi êvarê ref vala dibûn... Kar û barê wî roj bi roj giran, qezenca wî

jî zêde dibû. Bi kêfxweşî û şabûnê ji bo markêteke mezin dest bi hesab û kitêban dikir...

Bi bi teq û reqa zarên taxê va ji cîhê xwe qildibû û ji xewna xwe hişyar dibû...

Li derdora xwe dinihêrî, ne mişterî, ne refên tijî ne jî dikaneke nû xûya dikir...

Di dilê xwe da, ji bavên zarokan dest pê dikir û heta dîya wan diçû û ji bo dawîya xewnê careke din çavê xwe dida hev...

Carcaran jî bê xewn û xeyal mişterî dihatin û diketin hundir. Li refên dikanê û rewşa Evdo dûr û dirêj dinihêrîn û ji nişkêva vedigerîyan. Dû ra bi lez û bez ji Evdo û ji dikana Evdo dûr diketin.

Ew tiştên ku di dikana Evdo da mabûn, ji wan tiştêkî bihata firotanê jî, şûna wî vala dima. Ji ber ku destê Evdo da ne, pere ne jî sermaye mabû...

Dost û hevalên Evdo carcaran jê ra digotin; malxirab madem tu vî karî dikî, refên dikana xwe tijî bike ku bila der û cînar werin ji te dan û standinê bikin...

Evdo bi dengêkî kelogirî dûr û dirêj diaxifî û digot; „perê min heye ku ez refên vala tijî bikim...”

Yekî bigota, „madem perê te tune, here ba tomerîfiroşan, ji wan kel û pelan bi deyn bistîne. Wan bîne pêşin bifroşe, here deynê xwe bide û danûstandina xwe bidomîne. Carek, du car qewlê xwe bînî cîh, tu yê bikaribî hertim bi vî awayî karê xwe bimeşîni...”

Evdo axineke kûr dikişand û digot; „berî her tiştî kes deyn nade min, heger bidin jî der û cînar bi perê peşin tiştêkî ji min nastînin. Perê wan ê pêşin hebe, berê terin ji marketên navkafir danûstandina xwe dikin...”

Yekî din jê ra bigota, „madem ev jî çare nîne, eşyayê destê xwe bifroşe, kilîtê li derê dikanê bixe û here karekî din bike. Bi vî awayî hem ji kirêya dikanê difilitî, hem jî çend quruş qezenç dikî ku, ew jî dibe risqê zar û zêçen te...”

Evdo, ji van pêşnîyaran gelek aciz dibû û bi dilekî xemgîn û şikestî digot; „ahan min kilît li derê dikanê xist, lê keda min a bist salan çawa dibe. Emrê min li ber derê vê dikanê derbas bû. Ez derê dikanê bigrim, dost û dijminan li xwe şa bikim...”

Evdo, ne gotina kesî dikiir, ne jî li karekî din digerîya. Roj hat, Evdo li kuncikê dikanê koça xwe ya dawî kir û çû ber rihma Xwedê. Ji zar û zêçên wî ra, tenê tabeleya dikanê û qilûlkên li ser dikana wî ya wala hatibûn kirin, mîrat ma...

Hinek dikarin bibêjîn, xelq û alem çûn ser hive, tu jî hê qala Evdo û dikana wî dikî...

Rast ê, lê mixabin yên ku wek li ser erdê, li ezmanan digerin, ew ne Kurd in.

Kurd hê îro jî wek Evdo karê xwe bi rê va dibin.

Ha karê sîyasî, ha jî karê bazirganî...

03.02.2011

Tucarê têk diçe, dest davêje defterên kevn

Gotineke pêşiya ye, dibêjin; „Tucarê têk diçe, dest davêje defterên kevn.“

Hinek siyasetvan û ronakbîr û rojnamevanên Kurd jî wek wan tucaran li defterên kevn digerin, di nav rûpelên kevn da, kirinên xwe yên salan berê dibînin û bi wan pesnê xwe didin. Di nav wan rûpelan da kiryareke xirab hebe, jibo wan jî heval û hogirên xwe gunekar dikin. Li hemû kar û xebatên baş xwedî derdikevin, sebebê xeletîyên xwe jî heval û hogirên xwe nîşan didin.

Siyasetvanek dibêje; „Pêncî salê min di daw û doza Kurdistanê da derbas bû, min di vî pêncî salî da tu xeletîyek nekir...“.

Hunermendek dibêje; „Min karekî din bikira nuha teqawut bibûm, lê disa jî dest ji hunermendîya xwe bernadim ...“.

Ronakbîrek dibêje; „Di ser min ra mêrxasek tune bû, karê ku min dikir tu kesî nedikir...“.

Rojnamevanek bersiva wî dide û dibêje; „Belê rast e, lê mêrxasîya te jî bi saya min bû... „

Gotin wusa direj dibin û diçin...

Lê tu kesek ji cîhê xwe ranabe û nabêje bavê min, çima, ji bo çi we karekî din nekir?

We ev karên xwe ji bo kê kirin û deyndarê we kî ne?

Heger ji van kar û barên we zirarek we hebe, ew jî ke-masîya we ye, lewra kesî bi destê zorê ev kar nedaye ser milê we û ji îro şûn va jî nade.

Hata nuha tu kesî ji bo kesekî din karekî nekiriye û nake.

Ev tiştên ku di navbera ronakbîr û sîyasetvanên Kurdan da tèn munaqesekirin, heneka ku min salan berê bi hevalekî xwe ra kiribu anî bîra.

Rojek ji rojan ez û hevalekî xwe li kahwexaneyek rûniştibûn. Bi vexwerina kahwê û bi kişandina cixarê ketibûn nav sohbetake kûr û dûr.

Hevalê min gilî û gazinek xwe ji kurdîtîya xwe dikir û pirs li ser pirsê weke çoroz dirêj dikir.

Hevalê min digot:

- Ev rewşa me wê çawa be?
- Heta kingê emê di bin lîngan da bipelixin?
- Em bawerîya xwe bi kê bînin, ew pûç û vala derdikeve.
- Gelo paşeroja me wê çawa be?

Li ser van gilî û gazinek wî, min henekên xwe pê kir û jê ra got:

- Hevalê delal min şeva borî xewnek dîtibû, heger tu dixwazî ez wê xewna xwe bi te parve bikim. Tu yê di wir da bersiva hinek pirsên xwe jî bibînî.

Bi gotinên min ra rû û rûçikên hevalê min guherî, bala wî hinek sivik bû û got:

- De min neteqîne û ji zû va xewna xwe bibêje.

Min berê xewna xwe hinek di sere xwe da xemiland û jê ra got:

- Di xewnê da Xwedê hêz û quwetek wusa dabû min ku, ne guleyên tivingan, ne yê top û tankan, ne jî bombeyê balafiran tesir li min dikir. Ez ji alîkî Tirkîyê da ketim rê û ji alîyê din ra derketim. Min hemû leşker û polêsên Tirk yekoyek qir kir û dû ra berê xwe da Enqerê. Li wir berê çûm parlamentoya Tirk, hemû parlamenter, wezîr û serokwezîr jî kuşt û pişt ra derbasî Koşka Çanqayayê bûm. Dest û lingên nobedarên ber derê koşkê û parêzerên serokkomar girêda, serokkomar û berdevkên wî kuşt û desthilatîya Tikîyê kir bin destê xwe. Hemû nivîskar û

nûnerên ajans û rojnameyan li Koşka Çanqayayê kom kir. Ez derketim ser dîkê û min li hizûra wan damezrandina dewleteke nû îlan kir. Bi hêz û quweta xwe ya Xwedayî, hemû heval û hogirên xwe anî û bi wan ra hukumeteke nê saz kir...

Min hê dawî li gotinên xwe neanîbû, hevalê min gotina min di devê min da birî û got:

- Ez dawîya xewna te dizanim, te felankesê jî kir serokkomar, ne wusa?

Li ser gotina wî ya dawîyê min dest ji xewna xwe, xewna ku hê nedîtibû, berda û bersiva hevalê xwe da û got:

- Çima ez dîn im. Bi serê xwe tenê dewleta Tirk hildiweşînim û dewleteke nû ava dikim, paşê jî radibim mirovekî din tînim, bi destê xwe dikim serokkomar û dikevim xizmeta wî...

Hevalê min li min nihêrî û gotina xwe ya dawîyê şûnda girt û got:

- Rast e, heger dewlet te ava kiribe, serokkomarî jî bêguman heqê te ye...

Hinek kes dikarin bibêjin, ev xewn ji ku derket, xilasbûna me li benda xewna ma ye?

Na wele, bîlakîs em îro wek duh ne bindestî ne, hinek alîyên me hê bindest bin jî alîyek me azad e û em jî bi vê serkeftinê va dilşa ne.

Lê dema ku dor were muhasebeyê, mirov dikare bibêje, li Kurdistana Bakûr jî gelek gavên balkêş hatin avêtin. Di gelek xalan da em Kurd jî îro xwedî maf in. Lê dîsa jî ji bo serkeftinê ev yek tenê ne bes e. Ji ber wê yekê jî kes bi serê xwe tenê nikare bibêje, „ez serketi me û gel jî deyndarê min e.“

Kî çi kiribe, ji serî da ji bo xwe, pişt ra jî ji bo heval û hogirên xwe û welatê xwe kirîye.

Bi hezaran Kurd di rîya tekoşînê da can û malên xwe ji dest dan. Bi hezaran kes, ji zar û zêçen xwe, ji axa bav û

kalên xwe dûr ketin, di heps û zîndanên da man, ezîyet û tade dîtin.

Tu kesî ji bo kesî ew derd û êş nekişandin. Şîrîkatîya eş û derdên hemû Kurdan jî ji pirsgireka wan a netewî tîn. Ji ber wê yekê qelibandina rûpelên defterên kevn, birînên gelê Kurd derman nake, bîlakîs bi wan defteran birîn bê-tir kûr dibin...

Dermanê têkçûnê çî ye?

Gor raya min, ew pozbilindî, dermanê wî jî nefsbîçûktî ye. Bes e ku Kurd li jiyana xwe binêrin, heger hebe xeletîyên xwe bibînin û ji wan dersan derînin. Wê gavê ancax dikarin bi hev ra bimeşin û gavek pêşda bavêjin.

Jiber ku, girîngayî, xebatên bi salan nîne, encam e. Heger di encamê da serkeftin hebe, kes xeletîyan nabîne, xebata bê serkeftin pûç û vala nebe jî, kes li wê xebatê mêze nake...

01.09.2006

Tirk û biratî...

Tirk û biratî, an jî Tirk û hevaltî, gelo çiqas mimkûn e.

Kingê ku Yekitîya Europa an jî organîzasyoneke biyanî ji bo Kurdên Bakûr tiştek bîne ziman, hemû Tirk dest bi çîrokan dikin û dibêjin, „Kurd birayê me ne û ew jî qasî me xwedîyê dewletê ne!“

Lê dema ku Kurd daw û doza mafê xwe bikin, wê demê jî hemû Tirk bi hev ra û bi dengêkî dijwar diqêrin û dibêjin; „Kurd xayînin û neyarê dewleta me ne!“

Tirk û dewleta Tirk, heya îro gelek nav li Kurdan kirin. Ew nav carcaran dibû „Tirkên Çîyayî“, carcaran dibû „êş-qîya“, îro jî bûye „terorîst“.

Bi saya dewletên Europî careke din navê Kurdan hate guhartin.

Hinek Kurdên ji duh da Kemalîst, bi dest û lingan xwe davêjin ser vê sîyasetê, daxwazên xwe yê duh didin alîkî û Tirkatîya xwe îlan dikin. Hinek jî li dijî wan derdikevin û navek din li xwe û li Kurdan dikin.

Bi rastî pîrsgîreka Kurd û Kurdistanê ne bi navekî va girêdayî ye, ne jî bi naveke nû va çareser dibe. Tiştên ku Europî ji bo Kurdan dixwazin, ev jî nîne. Yekitîya Europî dibêje, Kurd jî weke Tirkan divê xwedî maf û dezgeyen xwe bin. Kurd jî weke Tirkan bi zimanê xwe yê zikmakî bi axifin û xwe perwerde bikin. Ev daxwaz, pîrsgîrêka Kurd ji binî va çareser nake, lê belê gelek tiştan jî zelal û hêsantir dike.

Mixabin, ne tenê dewleta Tirk, ronakbîr, rojnamevan û nivîskarên Tirk, jî sedem ew şertên ku ji bo endametîyê,

Yekitîya Europî ji dewleta Tirk dixwaze, wek heqaret qebûl dikin û li dijî wan daxwazan derdikevin.

Nerazîbûna xwe jî li ser navê biratî û hevaltîyê tînin ziman!

Li ser navê demoqrati û aştxwazîyê dikin, biratîya bê rûmet û hevaltîya bê heq û bê hiquq!

Tirk kingê bikevin tengasîyê, dest bi biratiya Kurdan, piştî xilasbûna ji tengasîyê jî dest bi diwartîya Kurdan dikin.

Kurd ne li dijî biratîya wan in, lê ew cînartî û hemwelatîyeke bi heq û hiquq dixwazin. Kingê ku ew nasname û mafên birayên xwe yên Kurd bi durustî qebûl bikin, wê demê Kurd jî bi dil û can biratîya wan qebûl dikin û wan ji xwe ra bira û heval, dost û cînar dihesibînin.

Lê îro ji çepên Tirk heta olperestên wan, ji gundîyên wan heta ronakbîrên wan, kîngê ku navê Kurd û Kurdistanê bibihîsin, bi cina dikevin û hişê xwe wenda dikin. Ew kesen ku pirsgirêka Kurd tînin ziman, weke rêvebir û berpîrsîyarên Yekitîya Europî, wan jî tehdît dikin û peyva Kurd û Kurdistanê ji bo wan jî qedexe dikin. Bi vî awayî dixwazin bi nave „Hêmana Esasî ya Dewlata Kemalîst“ careke din Kurdan bixapînin.

Tecrûbeyên Kurdan yên ku di derheqê Tirkan da he ne, ne kêmin. Heya îro Kurd bi olperestîya wan jî, bi demoqratiya wan jî hatin xapandin. Gelê Kurd heta roja îro bi caran û bi dil û can daxwaza biratî û hevaltîyê li Tirkan kir, lêbelê her carê jî wan ne bi Kurdan ra biratî, ne jî hevaltî kir.

Tirk herdem li dijberî daxwazên Gelê Kurd derketin û wan bi navê dîn û demaqrasiyê xapandin, ku şert û şurtên dîn û demaqrasiyê jî tenê ji bo xwe bikaranîn.

Hevalekî min, salan berê digot „Tirk nikarin bibin demoqrati!“

Wê demê ev gotin li zora min û yên weke min difikirîn, diçû. Me dema ku îtiraz dikir û bi rastî jî hinek ronakbîr û

nivîskarên Tirkên demoqrat nîşan dida, ew bêtir diqahirî û wusa digot:

– Raste, lê mirovên ku hûn dibêjin, ew ne Tirk in, hinekê wan digihêjin Rûm û Çerkez û Ermenîyan, hinekê wan jî ji alî bavû kalên xwe va Kurd in.

Sal û zeman derbas bûn, lê rewşa Tirkan, bi taybetî jî ya ronakbîr û nivîskarên wan, gotina hevalê min rast derxistin.

Bi salane ez medya Tirk dişopinim, ji çepên wan bigre heta nijadperestên wan, ji olperestên wan heta liberalên wan, di derheqê gelek pirsgirekên civakî û siyasî da bi warekî demoqratîk ray û ramanên xwe tînin ziman, xwe pîr û pak nîşan didin. Mijar pirsgireka Kurd be, wê gavê jî hemû dibin nijadperest û êrîşkar.

Tirkên Qibrîsê bidin alîkî, tiştên ku ji bo Tirkên ku ji salên 60î wir da ji bo xebatê hatine welatên Europî bicîh bûne ra, dixwazin, wan ji Kurdên li ser axa xwe dijîn ra zêde dibînin. Tirkên ku li welatê xelkê, bi mêvantî dijîn xwedî heq dihesibînin, lê Kurdên ku li welatê xwe, li ser axa xwe dijîn, mafdar nabînin.

Daxwazên ku ew ji bo koçber û karkerên xwe ji Europîyan dixwazin, bi rastî ne xirabin.

Xirabî ewe ku Tirk di dinê da xêncî xwe ne kesî dibînin, ne jî wan xwedî heq dihesibînin.

Gorî rewşa jiyana wan û daxwazên wan, mirov dikare bêje, ne demoqratên Tirk demoqratîk in, ne jî misilmanên Tirk misilman in.

Di pirsgireka Kurdan da gunê wan qat bi qat ji gunê dewleta Tirk zêdetir e.

Sedem vê yekê ye ku, divê Kurd jî li kîderê dijîn bila bijîn, bila ji kurdîtîya xwe fereqet nekin û bi biratîya Tirkan va xwe dixapînin.

18.12.2004

Bawerî mîna evînê ye, bi zorê nabe

Fîlozofê Alman Arthur Schopenhauer dibêje; „Bawerî mîna evînê ye, bi zorê nabe.“

Jîyana bê bîr û bawerî jîyaneke vik û vala ye.

Weke nanê bê tam, di gewrîya mirov da dimîne.

Weke ava bê armanc diherike û wenda dibe.

Mirovê bê bîr û bawerî jî, weke rêwîyê rîya xwe wenda bike, ba li kîjan alî were, ew li wî alî va diçe.

Bê qeyd û qîrar, bê rê û rêbaz e.

Mirov ancax bi bawerîyeke têkuz rêyek rast ji xwe ra dibîne û di wê rê da dimeşe.

Ji bo bîr û bawerîyen xwe dixebite, biserketina xebata xwe ra bextewar û dilşa dibe.

Di wê rê da bikeve tengasîyê jî, ji bîr û bawerîyên xwe derbas nabe.

Xirabîyê ji kesî ra naxwaze, bi serfrazîya dost û hevalên xwe va kêfxweş dibe.

Ji destê wî were jî, li kesî zilm û zordarîyê nake, di her şert û mercan da li dijî neheqîyê derdikeve.

Heqê cînarê xwe naxwe û ji heqê xwe derbas nabe.

Ji dostên xwe ra dost, ji neyarên xwe ra durust e.

Aştîxwaz e û şerê kesî nake.

Canik û camêr e, çavê wî/wê li malê kesî nîne.

Qasî ku rumetê dide bawerîyên xwe, ji bawerîyên kesên din ra jî rêzdar e.

Ji bo armanca xwe her tiştî mubah nabîne û ji bo gihîştina armanca xwe her gav li rêyeke rast û durust digere.

Bindestîyê qebul nake û ji bo azadîya xwe dixebite.

Li jîyaneke rengîn û dewlemend digere.
 Di jîyana xwe da tu car gulekî naçilmisîne û ji bo hawê-
 keke rengin wan av dide û diparêz e.
 Ji bo heval û dostên xwe, ji bo cînarên xwe, keseke bê
 zêzar û zîyan e.
 Dema ku ez li tirk û Kurdan dinêrim, di vî warî da dike-
 vim şikê. Li ser bîr û bawerîyan xwe carek din difikirim,
 pirsan li xwe dikim û bixwe jixwe dipirsim:
 Gelê Tirk û Kurd bawerîya xwe bi tu tiştêkî tînin?
 Hemû bêbîr û bêbawer in?
 An jî di bir û bawerîyên xwe da çiqwas rast û durust in?
 Di vî warî da ne pirsên min kêm dibin ne jî bersiveke wa-
 tedar dibînim.
 Jiber ku di pirsgireka Kurdî da ne Tirkên oldar, ne yên
 ateist, ne jî yên lîberal gor bîr û bawerîyên xwe dijîn.
 Hemû kor in, ya jî çavên xwe digrin, bûyerên der dora xwe
 nabînin û weke serdestên xwe li vê pirsgirekê dinihêrîn.
 Ew heta roja îro tu carekî li dijî neheqîya dewleta xwe
 dernektin, hemû kirin û kiryarên wê yên bi xwîn û qirêj,
 bi dijbertîya terorê va binav kirin û dikin.
 Ji bo kuştina xortên xwe hêsiran dirijînin û ji bo girtina
 intiqama wan sond dixwin.
 Mixabin, bi kuştina xort û keçên Kurdan va jî şa dibin.
 Ji hawar û gazîya Kurdan ra guhê xwe digrin.
 Dostî û hevaltîya xwe, cînartî û eqrebatîya xwe jibîr dikin.
 Bi van kirin û kiryarên xwe ne tenê ji bîr û bawerîyên
 xwe, ji qewlên mirovatîyê jî dûr dikevin.
 Ji ber vê yekê ye ku ji bo çareserkirina pirsê Kurdî û ra-
 westandina şer, qasî dewletê ji gelê Tirk ra jî guhartineke
 mezin pêwîst e.
 Guhartina bi bîr û bawerîyeke rast û durust...
 01.07.2010

Kurd bi bêdengiya xwe dibin şîrikê qatilên xwe!

Meha Rojîyê qedîya.

Li Rojavayê Kurdistanê cejna rojîyê jî bi xwîn û şer dest pê kir. Şîn û şahî tevlihev bû.

Hê ji misilmanan tu dengê dernakeve, hemû bê deng in. Ne çavên wan trajedîya Kurdên Rojava dibinin, ne dilê wan dişewite. Kurdên oldar jî şîrikatîya oldarên Tirk û Ereb û Eceman dikin, ne kêmasîyên wan dibînin, ne jî ji bo bêdengîya wan dengê xwe derdixin.

Rojî qedîya îro cejna rojîyê dest pê kir.

Hemû kesên oldar îro bi berbanga sibê ra berê xwe dan mizgeftan, çûn di mizgeftên Tirkan da limêja cejna rojîyê kirin û ji bo xwe û jibo misilmanan dua kirin.

Di mizgeftên Tirkan da, ew mizgeftên ku Kurdên di bajar-
ran da dijîn û diçin li dû meleyên Tirk limêj dikin, hemû misilmanên bindest û belengaz hatin bibîranîn.

Ji bo azadî û serkeftina wan dua hate kirin.

Kurdên oldar jî wek hertim, bi birayên xwe yên Tirk ra ji bo gelê Filistîn û Gelê Misrê dua kirin. Piştewanîya xwe anîn ziman û bi dilekî şad, cejna hev pîroz kirin û berê xwe dan malên xwe. Ez bawerim, ne meleyên Tirk qala Rojava û zilm û zordarîya ku çeteyên îslamî li dijberî Kurdên Rojava dikin, kirin, ne jî kurdekî oldar sedema bêdengîyê dengê xwe derxist.

Bi rastî mirov mele û oldarên Tirk fam dike û ji bêdengîya wan a ji bo Gelê Kurd jî naqahire. Ji ber ku ew, wek rabûn û rûnişkandina xwe, di îbadetên xwe da jî menfaatên dewleta xwe diparêzin.

Mele û oldarên Tirk bi zanayî, îbadetên xwe jî gor sîyaseta dewleta xwe tînin cîh û gor wê sîyasetê xutbê dixwînin û waaz didin.

Yên ku nayên fam kirin Kurd bi xwe ne. Kurd, dema ku bîr û bawerîya xwe bi tiştêkî bînin, bê îtiraz û bê lêpîrsîn li pey wî tiştî diçin. Ol ya jî îdolojî, ferq nake...

Ev sed sal e Kurd diçin, di mizgeftên Tirkan da, li dû meleyên tirk ên ku wan nas nakin û dijbertîya wan dikin, destê xwe li ber xwe girê didin. Bi ruh û can, tabîî meleyên ew meleyên hanefî dibin û gor şert û şûrtên wan nîyeta xwe tînin. Dû ra jî ji belengazîya xwe ya li vê dinê bêhayîdar, li ser cîhê xwe yê li dinya wîyalî xewnên li ser horîyan dibinîn...

Ji mizgeftê derdikevin, berê xwe didin malên xwe, tên di nav zar û zêçên xwe da wek mîrê mîran rûdinên, dûr û dirêj pesnê meleyên ku li dû limêj kirine, dikin.

Gor gotinên meleyên Tirkan radibin û rûdinên, zar û zêçên xwe terbiye dikin.

Ne kurdayetîya wan, ne jî însanetîya wan tê bîra wan.

Ne xwe nas dikin, ne jî dost û neyarên xwe.

Ne şert û şûrtên olî dizanin, ne jî wan bi zanayî bikartînin. Halbûkî di dema zarokatîya min da mezin û melyên Kurdan, ew mele yên ku di medreseyên Kurdî da hatibûn perwerdekirin, ji me ra digotin; „Hûn li vê dinê bi kê ra hevaltîyê bikin, bi kê ra rabin û rûnên, hûnê li dinya wîyalî jî bi wan ra bin“.

Ez bawerim oldarên me yên Kurd jî çiqas di rîya olî da diçin bila biçin, hata ku têkilîyên xwe bi Tirkan ra nebirin û li ber wan histuyê xwe xwar bikin û li pey wan biçin, ewê li dinya wîyalî jî dîsa bê war û mal bimînin.

Ewê di nav newala waweylê da bê xwedî û bê xwedan, hêsîr û belengaz bin...

08.08.2013

Kesên nezan weke mîh ên kol in...

Kesên nezan wek mîhê kol in. Guhê wan li hêlehêla şivan, çavên wan jî li çoyê şivan e. Şivan bixwaze, wan di kaşê gelî û newalan da tîne xwarê, bixwaze wan tî dibe ser avê û tî şûnda vedigerîne.

Ji bo vê yekê dengê bilûreke bi hostayî jî ne hewce ye, hêlehêla şivan û çoyê şivan bi serê xwe tenê bes in.

Ew Kurdên ku bi nezanî xwe olperest dihesibînin û daw û doza olperestiyê dikin, ew jî wek mîh ên kol Erdoxan ji xwe ra weke serşivan dibînin û li pey wî diçin. Gor gotin û kiryarên wî dijîn, gor daxwazên wî xwe dikujin.

Bese ku hêlehêla Erdoxan bibhîzin, hemû kar û barên xwe di cîh da dihêlin û xwe di gelî û newalan da davêjin xwarê. Ne li rewşa xwe dinihêrin, ne jî li der dora xwe...

Ne dostên xwe nas dikin, ne jî neyarên xwe. Ne ji gotinên xwe hayîdar in, ne jî ji kirin û kiryarên xwe...

Dibêjin „çoyê şivan û qoçê bizinê“ û ji xwe va diçin...

Serşivan bi Xiristîyanan ra bibe heval, ew pesnê Xiristîyanan didin. Bi Cihûyan ra bibe dost, ew methê Cihûyan dikin...

Demek bibû destbirakê Esed, ew bibûn koleyê Esed...

Serşivan demek bibû hevalbendê Fetullah, ew jî bibûn mirûdê Fetullah...

Serşivan berê xwe bide kîjan alî, ew çavên xwe digrin û bi lez û bez li wî alî dibezin. Ne gotinên xwe diwezînin, ne jî kiryarên serşivanên xwe. Dostanî û hevaltîya serşivan bi Xiristîyan û Cihûyan ra, bi Esed û Fetullah ra hate birîn, îro ew jî ji wan hemûyan ra neyartiyê dikin.

Ji destpêka rocîyê vir da li kîderê radibîn û rûdinên, li dijberî kiryarên Cihûyan derdikevin û bi navê olperestîyê piştevanîya Filistînîyan dikin.

Filistînîyan ji xwe ra wek dost û yar, Cihûyan jî wek neyarên xwe dihesibînin. Li dijberî zilm û zordarîya dewleta Îsraîl derdikevin û diqêrin. Ji bo Filistînîyan digrîn û hêsirên xwe dirijînin.

Mixabin, ne zilm û zordarîya ku heta îro ji dewletên misilman dîtine tên bîra wan, ne jî misilmata wan...

Li ber zilm û zordarîya dewletên Tirk û Ereb û Ecem wek mîh ên kol histûyê xwe di ber xwe da xwar dikin û bê deng û bê seda dimînin.

Ji bo zarokên ku li Gazeyê, bi guleyên dewleta Îsraîl va canê xwe ji dest dane fitr û zekatan didin û selewatan dixwînin, ji bo zarokên ku li Roboskîyê bi guleyên dewleta Tirk va hatine kuştin, xwendina fatiheyekê jî zêde dibînin.

Ji bo Gazeyê şînê dikin, ji jenosîda Helepçeyê bêhayîdar, ji xelkê ra misilman û mirovhiz, ji xwe ra nezan û xizan in...

Misilmanên Tirk jî piştevanîya filistînîyan dikin, lê ez bi xwe di piştevanîya wan da tu xeletîyek nabînim.

Ji ber ku ew ne tenê ji bo filistînîyan, li kîjan devera dinê dibe bila bibe, pozê esiltirkek xwîn bibe, ew dighîjin he-wara wan.

Ha Çeçen û Ecem û Tirkmen, ha Filsitîn û Qazax û Pomak, ji bo wan ferq nake.

Tenê li ba Kurdan bê deng û bê wijdan in, ji ber ku zilumkarên Kurdan yek jî ew bi xwe ne.

Kurdên nezan û xizan çî dikin?

Ew ji şert û mercên olî û mirovatîyê bêhayîdar, bi çavên zulumkarên xwe, li xwe û li dinê dinhêrin, didin pey wan û di nav newal û gelîyan da kaş dibin...

22.07.2014

Pereyê di berikê da û îman a di dil da!

Tu kes nizane, di bêrika kê da çiqas pere, di dilê kê da jî çiqas îman he ye.

Ev gotineke pêşîyan e.

Dibe ku sed, ya jî hezar sal berê hatibe gotin...

Lê ya ku tê zanîn, rastî ya vê bixwe ye.

Ev rastî ye ku, bi cêribandina salan weke mîrateke çandî heta roja îro hatîye û gêhîştîye me.

Gor rastîya vê hevokê îro jî mirov dikare bibêje, iman an jî bawerî ji dil va nebe, şûna îman û bawerîyê rîyakarî dig-re...

Mirovên rîyakar jî du rû ne.

Kirin û kiryarên wan, dev û dilê wan hevdû nagrin.

Dilê wan bi awayekî lêdixe, ziman wan jî bi awayekî din dilive.

Ev nexwaşîyeke civakî ye.

Bi taybetî di civakên şûndamayî da zêde tê dîtînê û der-manê wê jî nîne...

Mirovê rîyakar, bawerîya xwe bi tiştêkî nayne, lê bi hinek gotin, an jî bi hinek kirinên xwe, wek xwedîbawer xwe nîşan dide...

Weke mîsal:

Gelek kes hene ku, bawerîya xwe bi Xwedê naynin. Lê ji bo der û cînarên xwe rîya camîyê dikin weke rîya avê...

Gelek kes jî hene ku, ew bi kirin û kiryarên xwe nîşan nedin jî, ji dil va xwedî bîr û bawerî ne...

Lewra ji bo mirovên mûmîn jî, berî her tiştî bîr û bawerî, pişt ra jî bikaranîna şert û mercên bîr û bawerîyê tên...

Weke bîr û bawerîyê, mirov hene ku berika wan vik û vala ne, lê tiştê li wan biqewime, ji mêranî û camêrtîya xwe gavek şûnda navêjin.

Mirov jî hene, weke Karûn dewlemend û xwedî mal û mulk in, mixabin kesên xesîs û necamêr in.

Qiyamet rabe, destê wan tu car naçe berika wan. Mirov dibêje qey dûpişk di berika wan da ye...

Welatperwerî jî wusa ye...

Îro kî/kê welatperwer e û kî/kê nîne, kes nikare biryara vê yekê bide...

Mijar sîyaset û sîyasetvanî be, ev yek hê jî zehmet dibe...

Wek bîr û bawerîya olî, welatperwerî jî di hestên mirovan da cîh digre.

Ne bi endametîya partîyekê va, ne jî bi avêtina çend sloganên tund û tûj va tê pîvan...

Lê mirov dikare bibêje, kî/kê ku axa xwe biparêze, bi zimanê xwe yê zikmakî bi axife, li dîrok û çand û hunera xwe xwedî derbikeve û di wî warî da çî ji destê wî/wê tê bike, ew kesekî/ê welatperwer e.

Ji bilî van şert û mercan tu pîvanek din jî nîne...

05.04.2011

Tirs...

Gelo tirs çî ye?

Mirov çima ditirse?

Gelo tirs a mirovan ya herî mezin mirin e?

Gor raya min, çawa ku jiyan û bîr û bawerîyên mirovan ne yek in, tirs û xofê wan jî yek nînin û ji hev cûda ne...

Gava ku qala tirsê tê kirin, piçûktîya min tê bîra min...

Ez di piçûktîya xwe da ji gelek tiştan ditirsîyam.

Wek zarokên hemsalê xwe zêdetir jî ji cin û perîyan, lewra hemû mezinên me, bi wê tirsê me mezin dikirin û ditirsandin.

Qasî cin û perîyan ez ji tarîyê û ji kûçikan jî gelek ditirsîyam. Di ser wan rojan ra sal û demsal derbas bûn.

Îro êdî ji cin û pêrîyan natirsim, lê hê jî ji tarîtîyê û ji kûçikan ditirsim...

Mirov çiqas mezin bibe jî, ji hinek tirsên xwe xilas nabe. Lewra, tirs jî, wek fikr û raman, wek nan û av, perçeyek ji jîyana mirovan e...

Lê tirs a zêde carcaran mirovan ji jîyanê dûrdixe û nêzîkî mirinê dike. Weke jîyana kesên li Tirkîyê dijîn...

Rêvebirên dewletê ji generalan, general jî ji poşîyên serê jinan ditirsin...

Kesên sivil ji çekdaran, çekdar jî ji sîya xwe...

Tirk ji parçebûna welat û ji cîranên xwe...

Kemalîst ji hatina şerîatê...

Oldar, ji putên Ataturk...

Mirovên çep, ji heps û zîndanên...

Kurd ji dagirkerên xwe, ji Tirk û Ecem û Ereban...

Kurdên sîyasetmedar, ji serokên xwe ditirsin!..
Jin ji mêrên xwe, mêr ji axa û began...
Zarok ji mirûzên dê û bavên xwe ditirsin...
Gundî ji xelayê, ji bager û tîpîyê, ji av û lehîyê...
Bajêrî ji birçîbûn û ji xizanîyê ditirsin.
Feqîr ji dewlemendan, karker ji karmendan...
Hemû zindî ji mirinê ditirsin.
Mirov dikare sedemên tirsên mirovan bi hezar mînanan dirêj bike.
Lê belê tirsê zêde ne zindîya ji mirinê, ne jî mazlûman ji zaliman xilas dike...
Tirs, pirî çaran tirsê diwelidîne...
Mirinê nêzîk dike...
Gelo mirov çawa dikare xwe ji tirs û xofên xwe, xwe biparêze!
Gelo ji bo vê yekê cesarat tenê bes e!
Ya jî rev mirovan ji tirs û xofên xwe çiqwas dûr dixîne.
Ez bawerim, tiştê ku mirovan ji heywanan vediqetîne yek jî ewe ku, mirov gor zindîyên din hinek xeterên ku derkeve pêşîya wan, ji berê da texmîn dikin ya jî dibhîzin û gorî wê dikarin xwe ji wan biparêzin...
Bi fikr û ramanên xwe dikarin tedbîra xwe bigrin û bi aqil û cesareta xwe jî dikarin ser tirsên xwe da biçin...
Lê mirovên bê fikr û raman, çiqwas xwedî cesareteke bi pola bin jî, wek hinek ajalan xeterên li pêşîya xwe nabinin û nikarin xwe ji wan biparêzin.
Çiqas gavê xwe şûnda bavêjin, tirs û xofa wan jî ewqas zêde dibe...
Jiber ku dermanê tirsê cesareta bi aqil e û bi avêtina gavên bi zanayî va jî derbas dibe. Ew jî bi nasîna jîyaneke realist û bi tecrûbeyên dîrokî va mimkûn e...
Yên ku ji van dûr in û rojane difikirin, dibin hêsîrên tirsên xwe...

05.04.2008

Şivan û huner...

Di civata Kurdan da hemû Kurd dikarin şivantiyê bikin, le tu car nikarin bibin serşivan.

Ji bo serşivantîyê huner û cesaret lazim e.

Ji bo şivantî û gavantîya pez û dewarên gundeki kes li serşivanan nagere. Li wir sînore şivantîyê, sînore derdora gund e. Cîyê pez çêrandin û şevînê, ji serîda tê zanînê û xeternakên hebin, ew jî ji pêş da tîn texmîn kirin.

Serşivantî, ji bo pez û dewarên celep, pez û dewarên ku bi mehan li serê çîyan dimînin û bi şev û roj di bin êrişên gur û hurçan da, diz û çilpizan da dijîn, pêwîst e.

Ew kar jî, kêmasî bi alîkarîyan du kesên alîkar va, ku ji wan ra dawaco dibêjin, mimkûn e.

Dawaco, alîgirên serşivan in, gorî şert û şûrtên ku serşivan dide pêşîya wan, ew bi rê ve diçin, gorî hunerê serşivan karê xwe tînin cîh.

Ji bo serşivantîyê ajotin û xwedîkirina pez û dewar tenê ne bes e, gelek şertên din jî hene ku, ew jî huner û cesaret in.

Gor tarîfên celepçîyan, serşivanê herî baş ewe ku pez û dewarên xwe, bê qeza û bê bela di navbera zevî û mergan da, di sînore gund û bajaran da derbas dike, wan ji gur û hurçan diparêze.

Serşivanê baş ewe ku, piştî xoyêdanê, pez û dewarê xwe dikare tî bibe ser avê û tî şûnda bîne.

Serşivanê baş ewe ku, bi zimanê pezê xwe diaxife û gori hunerê xwe wan bi rêve dibe û wan ji diz û çilpizan diparêze.

Ew jî, ne bi darê zorê, ne jî bi hêrs û qêre qêrê dibe.
Tilsima wî karî, huner e, hunerê şivan e.
Ew huner carcaran fîtikeke baş, carcaran jî dengê bilûra
bi hostayî ye.
Dengê bilûra şivan ya bi hostayî aqil û hiş ji serê pez digre,
wan gêj dike û li dora şivan dicivîne.

Têkilîyeke wusa di nav civatên hemdem û modern da
nayê dîtin. Ne dengê bilûra bi hostayî, ne jî cesareta xam,
hewce ye. Ji bo rêvebirîya civatê, zanîn û xebateke durust
pêwîst e. Ev du tişt ku bi mirov ra tune be, mirov ne dikare
xwe îdare bike, ne jî dikare civatê bi rê ve bibe.

Gelo rewşa civatên paşdemayî jî wusa nin?

Ji bo rêvebirîya civatên paşdemayî, gelo çi pêwîst e?

Bi rastî dema ku mirov li der dora xwe dinihêre, dikare bi
hêsanî bibêje:

Di civatên paşdemayî ne ne kes li huner û zanîne dinihêre,
ne jî li dengê bilûra bi hostayî guhdarî dike.

Di destê kê da darê hesin, di devê kê da fîtikeke tîz hebe,
ew gorî kefa dilê xwe mirovan ji pez û dewar hêsantir jî
bi rêve dibe. Bi fîtika xwe berê wan gêj dike, dû ra jî bi
îşareta serê çoyê xwe, wan li derdora xwe dicivîne.

Ji ber wê yekê ye ku kemasîyên gelên bindest û yên paş-
demayîn tişên pîşadî nînin. Ew çiqwas bi darê zorê lihev
bicivin û bi rê ve biçin jî, tu car nikarin qedera xwe ya
bêyom biguherînin.

Ji bo guhartinê, aqilê kamil û metodên zanyariyê pêwîst
in, ku ew jî li ba wan nayên dîtin...

17.03.2007

Jiyana bi hesûdî...

Di nav Gel da weke mîsal tê gotin.

Di demên derbasbûyî da mirovekî Kurd dixwaze dewlemend bibe. Lêbelê dinhêre ku daxwaza wî ya ji bo dewlemendîyê bi xebat û tîcaretê va nayê çîh. Lê dîsa jî ji bo dewlemendîyê bîr û bawerîya xwe wenda nake. Li rê û dirbên nû digere, kar û barên nû dicêribîne. Her ku dem derbas dibe, di daxwazên xwe da biser nakeve. Dest ji kar û barê xwe berdide û berê xwe dide Xwedê...

Ji sibê heta êvarê radibe û rûdinê lavayê Xwedê dike û dibêje:

– Xwedayê min, tu li herderê hazir û nazir î. Bi hêz û quwet î. Heger tu mal û mulk bidî min û dewlemendîya min zêde bikî, ezê destê xwe ji vî dinya derewîn şûnda bikişînim. Heta dawîya emrê xwe, rojê pênc wext ji bo te ibadetê bikim û rêça ku te day ber me, di wê rê da jîyana xwe derbas bikim.

Hûn jî dizanin ku Xwedê li her derê hazir û nazir e. Duayê Kurd ê me jî hercarê dibihîse. Çawa ku tu kes badilhewa tişteki nade kesi, Xwedê jî bêberanber mal û mulk nade kesî. Jibo vê yekê Xwedê dixwaze berê qûlê xwe yê bi daxwaza dewlemendîyê hişê xwe wenda kirîye, bicêribîne.

Gazî Cebraîl dike û jê ra dibêje:

– Cebraîl, here ba filankesê û silava min jê ra bibêje. Ez daxwaza wî ya ji bo dewlemendîyê qebûl dikim, çiqwasî ku dixwaze ezê mal û mulk bidimê. Lê jê ra bêjê ku, ji bo mal û mulk dayîne yek şertek min he ye ku, ew jî; ji

daxwaza wî dehan yekî jî didim cîranê wî yê wek wî belengaz.

Cebraîl radibe, baskê xwe li ba dike û bi rê dikeve. Diçe Kurdê ku ji bo mal û mulk dua kirîye, di bin dara biyê da li ser nimêjê dibîne. Cebraîl, berê xwe pê dide nasîn û silava Xwedê jê ra dibêje. Kurdê me, bi mizgînîya Cebraîl şadibe û ji xwe diçe. Nizane çî bike û çî bibêje...

Gavek şûnda bixwe tê, careke din gotinê Cebraîl dibihîze û ji kêf û şabûnê lingê wî erd nagre. Lê dema ku Cebraîl şertê Xwedê jê ra dibêje, şabûna wî jî, kêfa wî jî direve. Serê xwe dike nav herdu destê xwe û hinek diponije, ji nişkêva ji cîyê xwe qildibe, bi dengê bilind û bi mirûz, biryara xwe ji Cebraîl ra dibêje:

– Ja Cebraîl, silav û hurmeta min ji Xwedê ra bibêje, ez şert û şûrtên wî qebûl nakim û ji daxwaza dewlemendîyê jî derbas dibim. Min tenê ji bo xwe mal û mulk xwestibû, cîranê min ji ku derket. Ez ne hewceyê mal û mulkê bi şert û şûrt im. Ez daxwaza xwe şûnda digirim û daw û doza tu tiştêkî jî ji Xwedê nakim. Bila ne mal û mulk bide min, ne jî ji mal û mulkên ku dide min, ji wîdehan yekî bide cîranê min...

Bila ev meselok ji bo dijwarîya Xwedê neyê fam kirin. Ev Ev bi taybetî ji alî mele û oldarên Kurd va dihat gotin. Min bi xwe jî ji meleyekî Kurd bihîst. Ciqwas weke meselok were gotinê jî, di bingeha wê da rastîyek jî çîh digre Di meselokê da ew şertê ku Xwedê daye pêş çiqwas ji bo Kurdekî hatibe gotinê jî, ji bo hemû însanan derbas dibe û pivanek ji şert û mercên mirovatîyê ye. Mixabin tu kes gor vê pîvanê najî û tevnagere.

Bi taybetî jî kesên ku di civatên paştamayî da dijîn, ji helwesta parvekirinê dûr in. Ji xwe ra xêrxwaz, ji heval û hogirên xwe ra, ji cînar û hemwelatîyên xwe ra jî ewqas xêrnexwaz in.

Sedem vê yekê ye ku, Kurd roj bi roj ji hev dûr dikevin,

di civatê da têkilîyên hevaltîyê kê m dibin, hesûdî û xê-
nexwazî jî zêde dibe.

Heger tiştên ku em ji bo xwe dixwazin, ji wan dehan yekê
jî ji heval û hogirên xwe ra, ji cînar û hemwelatîyên xwe
ra bixwezîn, wê gavê ji xizanî û nezanîyê jî xilas dibin.

Kurd qasî ku şaşî û xeletîyên hevalên xwe dibînin û qîlf û
henekên xwe bi wan dikin, şaşî û xeletîyên xwe jî bibînin
û bidin ber çav, ji xizanî û nezanîya xwe jî ewqas zû xilas
dibin.

Mixabin, Kurdan ev yek duh jî nekirin, îro jî nakin. Di her
pirsgirekên şexsî û civakî de pivana, hê jî ya reş ya jî sipî
ye...

Bûyerek biqewime, ew jî ya baş ya xirab e.

Jiber ku her tiştî bi du rengan û du dangan tarîf dikin.
Halbûkî di xwezayê da bi hezaran reng û tonên rengan
cîh digrin. Mixabin Kurd di nav wan da rengên sereke jî
nabînin.

Kêmasîyên xweyên rojane ji bîr dikin, lê kêmasîyên ku he-
valên xwe yên salan berê kirine, dixemilînin û didin rûyê
wan.

Xeletîyên hêz û partîyên xwe rast, rastîyên hêz û partîyên
derdora xwe xelet nişan didin.

Xwe û hevalên xwe welatparêz, yê ku wek wan nafikirîn,
xayîn û çav binav dikin.

Hevalê ku ji wan dûr dikevin, tirsonek û xayîn, yên ji hêz
û partîyên xwe dûr dikevin û ber bi wan tên, welatparêz
û sîyasetmedarên bi nav û deng pêşkêşî kesên derdora
xwe dikin.

Serok û rêberên ji xwe dûr kesên dîktator û birakuj îlan
dikin, yên nêzikî xwe jî demoqrat û mirovhiz dibînin.
Dem demsal derbas dibe, dinya diguhure, lê dîsa jî çav“e
xwe digrin û di nav herîyê da xwe dipirpitînin...

01.09.2005

Ajansa 19ê êvarê...

Di salên 60î da bi navê radyoyê amûrek di nav jîyana gundîyan cîh girtibû. Radyoyên weke sandiqê bûkan, ji hesin û textên biriqandî û mezin. Wê demê radyo li her gundekî bi awayekî dihat binavkirin. Hinekan digot Qutîya Şeytan, hinekan ya digot Tûtika Cinan...

Kalemêr û pîrejinên gundan jî radyo weke alametê qiyametê didîtin. Dengê ku jê derdiket, bi taybetî dengê jinan weke guneh dihesibandin.

Radyo bi pîlan dixebitî û di serê her saetê da bi navê ajansê, agahiyên ji dûr va didan. Hunermendên jin û mêr tê da kilam û stran distiran.

Radyo tenê di qonaxê axa û began da û di malên xwedî ode û avahî da dihatin dîtin. Di wan odeyan da ji bo radyoyê cîhekî taybet dihat çêkirin, di wî cîyê taybet da dihat bi cîh kirin û bi cêhêzên bûk û qîzên xama va dihat nixamtin. Jiber ku pîlên wê zû neqedin, tenê di dem û rojên taybet da dihatin vekirin.

Ji wan demên taybet yek ajansa 19ê êvarê, yek jî roja pêncemê, dema bername Kurdî ya Radyoya Rewanê bû.

Şevên payîz û zivistanê, di wan şevên sar û dirêj da, gundî di hinek odeyan da dihatin ba hev û dema xwe bi hev ra derbas dikirin.

Li gundê me jî sê ode, odayên mêran, hebûn. Kalemêr li odeya tê da radyo hebû dicivîyan, ku ji wan odeyan yek jî, oda mala Hecî bû.

Berî ajansa 19ê êvarê kalemêrên gund berê xwe didan ber bi mala Hecî û diçûn di oda wî da lihev dicivîyan. Bi

serê çavan lihev dinêrîn û îşaretên bi birî û bijangan ji hev dipirsîn:

„Gelo Hecî radyoyê veke ya na?“

Heger Hecî carcaran destê xwe biavêta kosteka saeta xwe, ji berika êlegê xwe derxista û lê mêze bikira, ew dihat wê wateyê ku ewê radyoyê vebike.

Bêdengî diket odê, dem bi bêdengîyê derbas dibû. Ji saet heftê êvarê ra çar-pênc deqe dima, Hecî ji cîhê xwe radibû, ber bi pencera ku radyo li ber, diçû, bişkoka radyoyê vedikir û guhê xwe dida ber hoparloyê. Ji radyoyê axaftinên li ser reklaman diht, lê tu kesî ji van qisedanan tişt fam nedikir. Sedem wê yekê Heci dengê radyoyê kêmdikir, li benda dengê tutika ajansê disekinî.

Kesên ku saeten wan heba, ew jî saetên xwe ji berika xwe derdixistin û li benda tûtika ajansê diman. Wexta tutika serê saetê sê caran li ser hev lêdixist, hemûyan, saetên xwe ravayê hevdu didan. Bi axaftina pêşkêşkerê ajansê va dîsa bêdengîyek diket nav odê, hemû kesan xwe tux, guhên xwe jî fit dikirin û bi dil û can li gotinên wî guhdarî dikirin, ku tiştêk jê fam bikin...

Jiber ku pîlê radyoyê zêde xerc nebin, Hecî dengê radyoyê zêde venedikir. Gotinê pêşkêşkerê ajansê baş nehata bihîstin jî tu kesî dengê xwe dernedixist. Lê Hecî guhê xwe dida ber radyoyê û heta dawîya ajansê serê xwe jî carcaran ber bi jêr û ber bi jor dihejand û jixwe bawer li civatê mêze dikir.

Kalemêrên di odê da rûniştî jî guhê xwe didan radyoyê, çavê xwe jî dinurçuqandin û li serê Hecî mêze dikirin. Ne ji dengê radyoyê ne jî ji hejandina serê Hecî tiştêkî fam dikirin. Bêdengîya di odê da kêmasî niv saetî dikudand. Ajans diqedîya, Hecî jî dengê radyoyê dibirî û dihat li şûna xwe rûdinişt. Pişt ra, hemû kalemêrên di odê da rûniştî, bihev ra ji Hecî dipirsîn:

– Êêê Hecî di xebera da qe çi hebû?

Hecî jî weke kesê jixwebawer xwe qure dikir û pirsên wan dibersivand:

– Ê çi tune bû.

– Qe kî qise kir?

– Ê kî qise nekir, Ecewit, Demirel, Erbakan, Turkeş, hemûyan qise kir. Ma we jî bi guhê xwe nebihîst.

– Ê qe çi gotin?

– Ê çi ne gotin, derheqê her tiştî da qise kirin.

Piştî diyaloga ku di navbera wan da derbas dibû, hemû kesên di civata Hecî da rûnişti, têdigihîştin ku ew jî weke wan tu tiştêkî ji ajansê fam nekirîye.

Ji wan weatrê Hecî xwedîyê radyoyê ye û ji zimanê radyoya xwe fam dike. Dema gumana xwe ji famkirina wî dibirîn, yekoyek radibûn, xatir jê dixwastin û berê xwe didan malên xwe. Dema ku diçûn mal, wê gavê pirsên ku wan ji Hecî pirsîbûn, îjar jî jin û zarokên wan ji wan dipirsîn. Tiştên ku Hecî ji wan ra gotibû, wan jî ew gotin ji jin û zarokên xwe ra dubare dikirin.

Ev mesela radyo û ajansên Tirkî di gunda hertim dihat qisedan. Ji gundîyanyekî qîlfê xwe bi yekî din bikira, dîyaloga di navbera Hecî û cemaata wî da derbasbûye, weke mînak nîşan dida.

Ji wê demê vir da sal û demsal derbas bûn.

Ne ku radyo û telewizyon, îro, gundê bê internet neman.

Dinya hate guhartin, mirovatî pêşta çû. Bi saya pêşveçûna teknolojîyê دنیا bû gundekî piçûk. Lê zîhnîyeta Kurdan hê jî di cîhê xwe da sekinîye û nayê guhartin.

Duh, sedemê nezanîbûna ziman tiştên ku ji ajansa Tirkan fam nedikirin û ji hev ra dubare dikirin. Îro jî du, sê kes li ser navê civaka Kurd diaxifin, kesên ku wan fam dikin ji tirsê dengê xwe nakin. Kesên ku fam nakin, ew jî wek gundîyên me, tiştên ku dibihîzin, ji derûdora xwe ra dubare dikin.

05.07.2004

Xalê Resûl û kap a gur...

Kingê demsal bibe zivistan, berf bibare û kurşe bigre, Xalê Resûl û mesela wî ya li ser kapa gur tê bîra min.

Xalê Resûl mirovekî rûspî, xwedîyê ken û henekên civakî û çirokvanekî bi nav û deng bû.

Di hemû çîrokên wî da, lehengên çîrokê yek jî ew bixwe bû. Di hemû çîrokên xwe da bila bê îstisna qala xwe dikir û jîyana xwe bi çîrokên xwe va girê dida. Ji bo wê yekê jî hinek kes jî çîrokbêjtîya wî zêde eciz dibûn û qedr û qîmet nedidan wî û çîrokên wî.

Lê ew tu car xem nedikir û ji kesî nedixeyîdî. Gor gotinên hin kesên derdora xwe tevnedigerîya û dest ji çîrokbêjîya xwe bernedida. Li kîderê civatek saz biba, Xalê Resûl jî têkilî wê civatê dibû. Kîngê fesal bidîta, gorî rewşa civatê dest bi çîrokekî dikir û bala guhdarvanên dora xwe dikişandser xwe. Carcaran bi çîrokên xwe yê dirêj wan bêzar, carcaran jî bi mesele metelokên kin wan bi kenan mest dikir. Di nav dirêjîya çîrokê da pirsra xwe dibir û dianî, hercarê di nav guhdarvanan da ji xwe ra şahidek didît, rastîya çîroka xwe bi şahidîtîya wî pesend dikir û çîroka xwe bi wî awayî diqedand.

Xalê Resûl rojek ji rojên zivistanê hatibû li gundê me jî bibû mêvan. Ji xortên panzdeh salî heta kalmêrên heftê heştê salî, hemû gundî di oda mala kalikê min da, li dora wî civîyabûn. Xalê Resûl weke hercarê dest bi çîrokan kirirbû, hemû kes jî weke kesên kerr û lal di cîhê xwe da mût bîbûn û bi dil û can li wî guhdarî dikirin.

Ew jî ji bêdengîya cemaatê kêfxweşîya xwe nîşan dida û

çîrok li ser çîrokê girê dida û vedigot. Di dawîya şevê da dor hatibû çîroka li ser nêçîrvanîya wî.

Xalê Resûl çend caran li ser hev kuxiya, qultek ava sar di gewrîya xwe da vala kir û dû ra çîroka xwe vegot:

– Çend roj berê berfa ku ji êvar da dest pê kiribû, heta berbanga sibê barîya. Bi berbanga sibê ra ez rabûm û derketim derva. Dema ku min derê der vekir, merîya digot qey gund û derdora gund bi çarşeveke sipî hatîye nixamtin. Vegerîyam alî malê, destmêja xwe girt û nimêja xwe kir. Piştî nimêjê rabûm û derketim ser banê xanî. Hemû kulek û kozîyên me di bin berfê da mabûn. Ez bibêjim berfe dabû çokê, hûn bibêjin dabû navikê...

Heta ku min bêrfa li ser banê xanî paqij kir, kiras û derpê min di nav xwîdanê da man. Ez daketim xwarê û derbasî malê bûm. Berê kiras û derpê xwe yê merîya digot qey li nav gola avê xistine û derxistine, ji xwe derxist û kincên xwe guherî. Dû ra taştêya xwe kir û careke din derketim ser banê xanî. Bi çavên xwe yên şaş derdora gund qoleçan kir, ji nişkêva min dît ku çawa dît, gureki har li rextê gundê me berê xwe daye çîyê û dimeşe...

Bi dîtina gur va, ez bi lez û bez careke din ji banê xanî daketim xwarê û derbasî odê bûm. Bêşlîya Alman ji nav histêrê nivîna kişand, pênc gule tê da bicîh kir û dîsa derketim ser banê xanî.

Li ber kuleka odê min çok da erdê û nişana gurê har girt. Bê derew, di navbera min û gur da ez bibêjim pêncsed, hûn bibêjin hezar mêtro hebû. Min tilîya xwe da ser tetika bêşlîyê û gule berda. Gule wek bayê brûskê ji namlûya tivinga min derket û çû li çîpa gur ket. Gurê har, berê hinekî tewişî û di cîhê xwe da sekinî, dû ra dîsa berê xwe da çîyê û bi revşekî topal meşa xwe domand. Lazek şûnda jî li ber çavên min wenda bû. Bi wendabûna wî ra, ez careke din ji ser banê xani daketim xwarê û çûm alî malê. Min lekanên xwe yên berfê girt, li bin solê xwe va girêda,

Bêşlîya Alman jî avêt pişta xwe û li ser berfa pûk li pey gur ketim.

Dema ku ez gihîştim cîyê ku gur bi tesîra gula min tewişbû, nihêrîm ku ez çî bibînim, gula ku min berdabû gur, tam li çoka gur ketiye û kapa wî ji çoka wî firyaye, bi qewlê Pêxabmer çûye li ser berfa kurşê mir hatiye. Min kap girt destê xwe û çavê xwe li der dora xwe gerand, mixabin ne gur dixwîya ne jî rêça wî. Gurê min ji zû va rêça xwe wenda kiribû. Gur bixwe ji destê min xilas bibû, lê kapa wî di destê min da mabû.

Di destê min da kapa gur, li milê min Beşlîya Alman, kor û poşman min berê xwe da gund û şûnda vegeŕiyam. Lê ji wê rojê heta roja iro difikirim ku gelo ew kap çawa li ser berfê mîr hatibû, hê îro jî aqilê min nagre. Ji bo bîranîna wê rojê min ew kapa gur di nav pîneyekê da pêça û bi bêşlîya xwe ra kir nav histêrê nivînan. Ji zarên xwe ra jî wesîyet kir ku bila ew kapa gur û beşlîya min ji nebîyê minê piçûk ra weke mîrat bimîne.

Gotinên Xalê Resûl hê neqedîya bûn, apê min weke şahidê Xalê Resûl, xwe ber bi pêş tux kir û got:

– Xalê Resûl, çend roj berê ez jî li ser banê vê odê sekinibûm. Li serê Girê Sêgira tiştêkî bala min kişand. Ez ji banê xanî daketim xwarê û çûm alî malê. Dûrbîna bavê xwe ji mal girt û vegeŕiyam. Dûrbîn da ber çavê xwe û lê mêze kir ku, ez çî bibînim. Gurê çîle, weke mîha kulek hêdi hêdi ber bi Çîyayê Şawelat dimeşe. Ez jî bi dîtina xwe ra şaş û metal mabûm, ku gelo gur çima dikule... Nuha têdigihîjim ku, Xwedê dizane ew gurê ku te gule berdabûyê ew bixwe bû ye. Bi gotina apê min ra Xalê Resûl bi rûken li derdora xwe nihêrî, dû ra li apê min vegeŕiya û got:

– Bila rehmet li dê û bavê te be. Ew gurê ku ez qal dikim te wê rojê nedîba û dîtina xwe neanîba ziman, wê yê bigota, gelo Resûl di vî emrê xwe da derewan dike!..

24.02.2005

Mesela kivkark û biroşê...

Zargotina Kurdi, zargotineke gelek dewlemend e. Lê belê qasî dewlemendîya wê, tê da hunerê zêderoyî yê jî cîh digre.

Zederoyîyeke zêde û bêpîvan...

Weke mînak:

Yek, dibe çil...

Çemê miçiqandî, dibe ro û robareke mezin...

Gol, dibe behreke bê serî û bê binî...

Girê picûk, dibe çiyayeke bilind...

Misqal, dibe ton...

Di civata Kurdan da ev zêderoyî ya bêpîvan ne tenê di çîrok û kilaman da, di jîyana rojane da jî tê dîtin

Bi raya min, ev jî ji du tiştan pêk tê.

Ya yekemin, dewlemedîya zargotinê ye ku bingeha vê dewlemendîyê jî ji qedexekirina zimanê Kurdî tê.

Ya duyemîn jî, civata Kurd civateke paşdemayî ye.

Di civatên paşdemayî da pîvanên modern cih nagirin û nayên hebandin. Her tişt bi zêderoyîyê tê tarîf kirin...

Salên berê di gundan da televîzyon û radyo tunebûn. Di şevên zivistanê, ew şevên dirêj da, dem bi çîrok û stran û ken û henekan va derbas dibû.

Civata gundîyan di odeyên mêran da saz dibû. Kesên ku dengxên wan xweş, bi dengbêjîya xwe, kesên xweşsohbet bi çîrokên xwe, yên kenawer jî bi henekên xwe civat coş dikirin.

Hinekên wan jî diketin pêspazîyê û heta ji wan dihat tiştên piçûk bi zêderoyîyên bêpîvan li hev dianîn.

Ji wan yek jî meseloka li ser kivkark û biroşe ye.

Çîyayên hêla me gelek bilind in.

Ji wan yek jî Çîyayê Şahwelat e.

Çîyayê Şahwelat, di demsala payîz û zivistanê da, bi berfê tê xemilandin, di demsala bihar û havînê da jî ji Koçeran ra dibe war û yar...

Qasî zozan û berfa xwe, Çîyayê Şahwelat yek jî bi kivkarkên xwe yên tamxweş û mezin va tê nasîn. Li ser kivkarkên wê gelek mesele û metelok hatine gotin. Ji wan yek jî mesela girbûna kivkark û biroşê ye.

Rojek di civatê da yek dibêje:

- Min par li zonanên Şahwelat kivkarkek wusa mezin dît, di bin sîya wê da sê bir pez mexel bibûn. Şivanê her birêkê bi tewnekî li bilûra xwe dixist. Lê dîsa jî dengê bilûra yekî nedîçû yekî din.

Yekî din xwe pêşda dide, pirsê ji devê xwedîyê kivkarkê digre û didomîne;

- Ez jî par çûm Erzîrumê û di nav sûka baxircîyan da gerîyam ku ji xwe ra biroşek bistînim. Lê ez nihêrim çî bibînim, di dikanekê da biroşek dihat çêkirin. Di hundirê biroşê da çil hoste bi kakuçên xwe dixebitin, lê tu dengê çakuçê yekî nedihat yê din.

Xwedîyê kivkarkê bi dengêkî bilind dikene û dibêje;

- Wey mala te xirab nebe, te vî derewî çawa lihev anî.

Xwedîyê biroşê jî di bin gotina yê din da namîne û dibêje;

- Ê malneket, ew kivkarka ku te li çîyayê Şahwelat dîtibû ancak di vê biroşa min da dikele...

Mînakeke din jî ya law û bav e:

Law ji bavê xwe ra dibêje;

- Bavo, min duh li li ser rîya Kanîya Berana çil gur dîtîn. Hemû li pey hev ketibûn rêzê û ber bi Erzîrumê diçûn. Bawer bike, Xwedê min ji wan xilas kir.

Bav:

- Kurê min derewên wusa meke, tu car çil gur li dû hev nakevin rêzê û bi hev ra nagerin.

Lav:

- Çil heb nebûn, lê bêkêmasî ji bistan zêdetir bûn.

Bav:

- Kurê min, cîhê bîla bê sebeb xwe jî, min jî newestîne, bîst gur jî bi hev ra nagerin.

Bav û law bi vî awayî hevdu dibin û tînin.

Law hêjmara guran kêr nake.

Bav, gotina lawê xwe qebûl nake...

Di encamê da law bêçare dimîne û hêjmara guran heta sisîyan tine xwarê.

Bav, dîsa jî israra dike û dibêje:

- Kurê min, sê gur jî bi hevra nikarin bigerin.

Li ser israra bav, law jî hinek ji bavê xwe dûr dikeve û dibêje:

- Bavo, wele tu bawer bikî, nekî, ez êdî ji sisîyan tu carî nayême xwarê.

02.04.2010

Daweta cinan û qafikê pîvazan...

Di salên 1970yî da dema ku ez 10-12 salî bûm, emrê Kalê jî ji sed salî zêdetir bû. Kalê kalemêrekî nûranî bû. Rûyê wî yê sipî çîl, li ser bejna wî ya kin û zirav, heta ser navikê wî dirêj bibû. Rûyê wî yê sipî û dirêj, sûretê wî yê glover û zerîn dixemiland.

Gor gotina gundîya, digotin wî emrê xwe bi şivantîyê, bi şivantîya pezê mala Şêx, li Qerekilîsê derbas kirîye. Qerekilîs, li bin gundê me gundekî piçûk û ji du malbatan pêk dihat. Ji wan yek mala Şex Ehmed, ya din jî mala Budax Axa bû. Xêncî wan çend malên mirêbe yên ji mala Budax Axa ra xulamtî dikirin, ew jî di gund da dijîyan.

Di navbera gundê me û Qerekilîsê da newaleka mezin û fireh cîh digirt, jê ra Newala Kevrê Gewr digotin. Li herdu kirên newalê zevî, li deşta newalê jî mêrga mala Şex...

Li serê newalê alî jêr çemê ku ji Şahwelat, Şahwelat beşek ji çîyayê Paltokan e, dest pê dikir û digihîşt çemê Erez, derbas dibû. Li jorî newalê jî tirbeyek bê nav, jê ra Tirba Şehîdê Kevrê Gewr digotin, li rexta tirbê jî tenê ji kevirên gewr gireke bilind û di nav gira keviran da jî şikeftê mezin cîh digirt. Dema ku li gundên derdorê şahîyek çê biba, weke lingvekirina bûkan û suneta zarokên lawîn, qîz û xort, jin û zarokên gund bi biryan û xwerin û vexwerinên cûrbecûr diçûn ser Tirba Kevrê Gewr. Ji alîkî va jinan xwerin û vexwarin amade dikirin, ji alîyê din va jî qîz û xort diketin milê hev, ji sibê heta êvarê govend digerdin. Zarok, bi taybetî zarokên lawîn jî diçûn di şikeftê da çavçirtonek dilîstin.

Gor gotinên mezinan, di destpêka salên 1900î da Kalê dîsa wek hersal şivantîya pezê mala Şêx dike û biroj pezê xwe li der dora gund diçêrîne, êvaran jî derdixîne şevînê. Ji wan şevan şevêkê Kalê li ser girê newalê pezê xwe di guherê da mexel dike, pizbenda xwe bi lingê bizinekî va girê dide, xwe di nav kulavê xwe da dirêj dike û radizê. Ber bi nivê şevê, Kalê bi dengê stranan va hişyar dibe. Radibe ser xwe, çaven xwe yên bi xew mistide û li alîyê ku deng jê tê dinihêre. Bi dîtina xwe ra ji çavên xwe bawer nake. Bi dehan mêr û jin li ser piştê hespan, hatine û li kêleka guherê sekinîne. Kalê ditirse, qidûm lê dişikê, çîpên wî di bin wî da diricifin. Ricafa wî disekinê, çend gav ber bi wan diçe û di cîhê xwe da weke kesên kerr û lal dimîne. Ji alaya dawetê du kes ji hespên xwe peya dibin û ber bi Kalê tên, hêdîka dikevin milê wî û vedigerin, terin li rexta mezinê alaya dawetê disekinîn. Mezinê wan ji Kalê re dipirse:

- Xortê Delal li van deran tu şikeftek tune, em heta serê sibê tê da rawestin.

Dema ku Kalê van gotinan dibihîze, tirsê wî hinek derbas dibe. Dev û lêvên wî vedibin, hişê wî tê serê wî. Her du destê xwe li ser navika xwe girê dide û dibêje:

- Ma qey gund wêran bûne, vê şevê hûn li şikeftan digerin. Gundê li jêrî me gundê mala Şêx e, yê li jor jî gundê me ye. Hûn dikarin li herdu gundan jî bibin mêvan.

Mezinê alaya dawetê ji pêşnîyara Kalê ra spasîya xwe dike û dibêje:

- Vê nivê şevê em naxwazin kesî eciz bikin, em ji rêyekî dûr tên, rîya me ya mayîn jî hê zêde ye. Jiber vê yekê şikefteke hebe, emê li wir çend saetan razên û pişt ra têkevin serê rîya xwe û birêkevin.

Kalê:

- Li jorî vê newalê şikeftek heye, lê belê ez nikarim pezê xwe bêxwedî bihêlim û bi we ra werim. Ezê ji we ra rîya

şikêftê tarîf bikim, gor tarîfa min hûn dikarin bi hêsanî herin û bighîjin şikêftê.

Mezinê dawate:

- Xorto, em xerîbin, naxwazin di nav zevî û mêrgên xelkê ra derbas bibin. Ez du mirovên xwe li ba pezê te dihêlim, tu jî bi me ra were heta ber derê şikêftê were û dû ra vegere. Metirse, mirovên min wê pêze te baş biparêzin.

Kalê bêçare, pêşnîyara mezinê alaya dawetê qebûl dike, dide pêşîyê û wan heta pêşîya şikefta Kevrê Gewr dibe. Bûk û berbû, xwendî hemû ji hespên xwe peya dibin û derbasî hundurê şikêftê dibin. Kalê ji bo vegere destûrê dixwaze, lê mezinê alaya dawetê bi milê Kalê digre, heta hundurê şikêftê dibe û jê ra dibêje:

- Bi navê xwedê ez te bernadim. Madem te me heta vêdera anî, hinek li ba me bisekine, emê hinek govendê bigrin û bi hev ra bilîzin, dû ra tu vegere, em jî rawestin.

Kale bêçare careke din pêşnîyara mezinê alaya dawetê qebûl dike û li cem wan dimîne.

Gor gotina Kalê, xwendî û berbû dikevin milê hev, wek cergobezî govênde digerînin, kilam û stranên dibêjin û gor rîtmê stranên direqisin. Pişt ra, govend sar dibe, mezinê alaya dawetê dikeve milê Kalê, heta ber derê şikêftê bi Kalê ra dimeşe. Li ber derê şikêftê destê xwe davêje berîka xwe, kulmek tijî qafikê pîvazan ji berîka xwe derdixe, dike berîka Kalê û wî bi rê dike.

Kalê hinek ji şikêftê dût dikeve, bixwe jixwe ra dibêje; „Kurê kerê qîmîşî çerez nebû, kulmek qafikê pîvaza kir berîka min.“

Hemû qafikan ji berîka xwe derdixe û di tarîya şevê da li erdê direşîne. Bi lez û bez vedigere guhera pezê xwe, dinihêre ku çawa hîştîye, pezê wî bi wî awayî di cîhê xwe da sekinîne. Tere cem herdû mirovên ku pezê wî parastine, ji wan ra rîya şikêftê tarîf dike û wan dişîne. Mixabin, şev li Kalê diherime û xew nakeve çavê wî...

Wê şevê di derheqê dawetê da, govend û reqşa berbû û xwendîyan da, li ser qafikê pîvazan kûr û dûr difikire.

Xewa wî bêtir direve. Heta destê sibê li dora guherê tere û tê. Bi berbanga sibê re pezê xwe ji mexel radike, heta nîvroyê diçêrîne û berê pez dide gund. Pez dibe, di berîyê da dihêle û diçe mala Şêx. Çawa ku Şêx Kalê dibîne, dinihêre ku, rû û rûçikên kalê ne di cîh da ne. Kalê wek ne Kalê hertim e. Bang li Kalê dike û dibê:

- Kuro îşev çi bû, çi li te qewimî? Rû û rûçikên te baş xûya nakin.

Kalê ji tirsan bêdeng dimîne û qala tiştên ku hatine serê wî, nake. Lê Şêx pêsîra wî bernade, israr dike û dibêje: -

- Helbet tiştêk hatîye serê te ku, çavên te sor, rû û ruçikên te jî weke berfa serê çîyê sipî bû ne...

Kalê dinihêre, ji destê Şêx xilas nabe, xwe davê ber lingên Şex û bi dilekî xemgîn û bi dengêkî nizm dibêje:

- Ez qurban min bibaxşîne, îşev tiştêkî hate serê min. Heta destê sibê li dora pez û çum û hatim. Ji tirsê ranezam û bêxew mam. Loma xwîn ketîye çavê min...

Şêx sedemê bêxewmayîna wî dipirse. Kalê jî destûrê ji Şêx dixwaze û wê şevê çi hatîye serê wî, yekoyek ji Şêx ra dibêje.

Gotinên Kalê diqedin, Şêx di berxwe da hûrik hûrik dike-ne û ji kalê dipirse:

- Kuro, te çima qafilê pîvazan avêt.

Kalê;

- Ez gurban, ez qafilê pîvazan çi bikim, ne tînen xwerin, ne jî tînen vexwerin.

Şêx dîsa di ber xwe da dikene û dibêje;

- Hela berîka xwe binêre, di binê berîka te da qet qafil mane, ya na.

Kalê destê xwe davêje berîka xwe, tiştêk dikeve destê wî. Destê xwe ji berîka xwe derdixe, lê dinihêre ku yek zêrekî Reşad e.

Careke din bi tirs û xof lavayê Şêx dike û dibêje;

- Ez qurban, wele haya min ji vî zêrî nîne, ne min ji kesî zêr xwestîye, ne jî tu kesî zêr daye min.

Şêx îjar bi dengekî bilind dikene û dibêje;

- Gêjo, ew daweta ku tu qalê dikî, daweta cinan bû. Ew qafilê pîvazan jî hemû zêr bûn. Eger te ew neavêtana, nuha ew hemû wek zêr di berîka te da diman. Dema ku kalê van gotinên Şêx, ew gotinên ku tê da cin û daweta cinan derbas dibe, dibhîze, qafikê pîvazan û zêran ji bîr dike, ji tirsê bedena wî ji serî heta lingan dilerize û di ser xwe da dixeriqe. Çiqas li erdê dimîne, Kalê bi xwe jî nizane. Gava ku çavê xwe vedike, dinihêre ku Şêx li ser wî yasîne dixwîne.

Kalê ji erdê radibe, dest û rûyê xwe bi ava sar dişo û tê li rexta Şêx disekine. Şêx jê ra nivîstek dinivîse, nivîştê qat qat dike, dide kalê û dibêje;

- Gêjo, vê nivîstê tu carî ji histûyê xwe dernexîne. Heta ku ev nivîst bi te ra be, tu li kîderê dibî bila bibî, ne şev, ne jî roj tu carî cin û pêrî nêzikî te nabin. Lê kîngê ku wek cara îjar alaya dawetek rastî te hat û qafilên pîvazan dan te, tu wan nevêje û di berîka xwe da bihêle.

Kalê nivîstê digre û ber bi bêrîyê diçe, ji wê rojê şûnda dîsa bi salan şivantîyê dike, lê ne rastî cinan tê, ne jî daweta wan dibîne...

Li ser şivantîya Kalê û daweta cinan ra sed sal derbas bû. Ne cin û pêrî man ne jî dawet û tirs û xofa ji wan.

Îro li her bajar û gundên Kurdan da cinên modern digerin ku, bi çek û rextên xwe yê modern gund û bajaran vêran dikin. Ji xwe ra zêrên Reşad digrin, ji gelê herêmê ra jî dihêlin qafikê pîvazan...

Li dijberî wan, ne nivîstên şêxan, ne jî hunerê şivanan çare dike...

17.10.2015

Xalê Qero û çîroka ruhustîn

Xalê Qero mirovekî kin û qelew, mirovekî rûken û rûqemer bû. Sedem rengê rûyê jê ra digotin, Qeroyê çîrokvan. Di demsala payîz û zivistanê da gund bi gund digeriya û di cemaata gundan da çîrok vedigot. Biçûya li kîjan gund û li wir biba mêvan, hemû şênîyên wî gundî li der dora wî dicivîyan û şevên zivistanê, ew şevên sar û dirêj bi çîrokên wî va germ dibûb. Kesên li derdora wi dicivîyan, bi dil û can guh didan çîrokên wî, dema çîrok diqedîya wê gavê bi ken û henekan kêfxweşîya xwe nîşan didan. Carcaran jî gor her çîrokên wî, nav û nûçikekî lê dikirin. Dema ku Xalê Qero bi dilê gundîyan bi rê va biçûya û çîrokên wî li guhdarvanan xweş bihata, navê wî dibû Qeroyê çîrokvan, dema ku gorî dilê xwe çîrok bigota û çîrokên wî li guhdarvanan xweş nehata, wê gavê jî navê wî dibû Qeroyê virek...

Di kîjan cemaatê da cîh bigirta, ji danê êvarê da, bi çîrokekî dest pê dikir, heta nivê şevê vedigot, çîrok bi çîrokeke din va girê dida û vegotina xwe dikudand. Dev û lêvên wî zuha dibû, qirika wî dixitimî, dikuxîya, qultek ava sar vedixwer û axaftina xwe didomand. Jixwe tu kesî jî nedixwest ew dev ji vegotina xwe berde. Hata ku dawî li çîrokên wî nehata, qiyamet jî rabiba, tu kes ji cîyê xwe nedilivî û deng ji tu kesî dernediket. Dema ku Xalê Qero bêhna xwe digirt û dev û lêvên xwe paqîş dikir, kî ku firsend bidîta dest bi pesnê wî dikir û digot; „bila siheta te xweş be, wele tu çîrokvanekî mezin û bêhempayî“. Hinek caran jî kîngê dest bi vegotina çîrokekê bikira, hi-

nek kesên henekvan berê xwe didan kulekê û ji yê kêleka xwe ra digotin; „Kerema xwe tu jî li kulekê binihêre, gelo ba û bahoza ku dest pê kirîye, tu jî dibînî. Di vê tarî û fizildûmanê da, emê çawa herin malên xwe!“

Bi vî awayî dixwestin Xalê Qero dev ji çîrokê berde û ji qilf henekan ra rê vebe. Ji gotinên cemaatê Xalê Qero jî têdigihîşt ku, ew êdî çîrokan naxwazin. Ji ber wê yekê, wî jî dev ji çîroka xwe berdida, dest davit qutîya xwe ya titûnê, ji xwe ra hêdî hêdî cixareyek ji titûna Mûşê ya qaçax dipêça û dikir nav lêvên xwe. Li alîkî gurmik li cixara xwe dixist, li alîkî jî li kesên derdora xwe dinihêrî û bertekên wan dipîva. Di cemaatê da bêdengîyek çêdibu, tu deng ji kesî dernediket. Yekî bi mesele û metelokek dawî li bêdengîya cemaatê bianîya jî, ew zêde nedikudîya. Dema ku cixara Xalê Qero diqedîya, careke din çavê herkesî vedigerîya ser wî, lê wê gavê jî wî guh nedida cemaatê û gor dilê xwe dest bi qilf û henekan dikir. Her qilf û henek xwe jî bi kurteçîrokekê va girê dida û dixemiland. Di hemû kurteçîrokên wî da, weke Xalê Resûl, lehengê wî yê sereke jî ew bixwe bû...

Tê zanîn ku di civatên paşdemayî da mirovên herî pêşverû; mele, dengbêj û çîrokvan in. Pêşverûtîya melan ji îlmên wan, ya dengbêj û çîrokvanan jî ji huner û gera wan pêk tê. Şev û rojên dengbêj û çîrokvanan bi gerê derbaz dibûn. Dîtinên wan ji wan ra dibûn tecrûbeyên zanebûnê. Gor gundîyan, dengbêj û çîrokvan di warê olî da kêmbawerbûn. Ji ber wê yekê jî, bi taybetî çîrokvan, ne ku tenê bi gundîyan ra, bi bîr û bawerîyên wan ên oli ra jî qilf û henekên xwe dikirin. Li ser bîr û bawerîyên olî mesele û metelok li hev dianîn û vedigotin...

Xalê Qero jî wexta dest bi henek û kurteçîrokên xwe dikir, ne parastina Xwedê, ne jî ya Pêxember diket bîra gundîyan...

Xalê Qero jî mîna çîrokvanên din vê yekê baş dizanî bu.

Loma, bê tirs û xof laqirdîyên xwe bi herkesî dikir. Di mesele û metelokên wî da, bervêderên (muxatab) wî carcaran mezinên gund, carcaran şêxê tarîqatê, carcaran jî qasidên Xwedê bu. Lê bawerîya wî çiqas bi Xwedê ra tune ba jî, zêde ber bi Xwedê nedîçû...

Ji wan meselokên wî yek jî ya li ser ruhustîn bû. Dema ku wî dest bi mesela xwe û ruhustîn kir, sîya tirs û xofê di navbera cemaatê da derbas bû. Hinekan bi dengî, hinekan jî bi pispisî li çavê hev nihêrîn, tilya xwe ya îşaretê bilindkirin û eşheda xwe anîn. Lê dîsa jî li dijî Xalê Qero derneketin û li hêvîya gotinên wî sekinîn. Xalê Qero jî bi hêsanî dest bi kurteçîroka xwe ya di navbera wî û ruhustîn da derbas bûye, kir û got:

- Ez isal payizê ji bo hêrandina genim bi ereba ga çûm aşê Abo. Dema ku min li ber derê aş ereba xwe rawestand, serê ga girt û nîr ji histuyên wan berda, baranê dest pê kir. Baran, îjar baraneke çawa, merîya digot qey ezman qelişîne û ji ezmanan bi elban li ser min û ga yên min da avê dirijînin. Ez serê we zêde bi baranê ra neêşînim, min ga yên xwe berda, barê genimê xwe kişand hundir, tarî jî ket erdê. Li ber aş jî wek hertim Mihemedê Abo tenê bû, ji min ra çayek wek mîna xwîna kêrgûşkê çêkir û danî ber min. Paşê jî lavayê min kir û ji min ra got; ,Qeroyê min, dora aş dora te ye. Bixêrik weke ku tu dibînî, dişewite, demligê çayê jî li ser agire û dikele. Min eyarê çeççeçê jî saz kir. Hêdî hêdî genimê xwe bihêre, ez jî xêra serê te îro herim malê û vê şevê di nav zar û zêçên xwe da derbas bikim.'

Bi bahaneya zar û zêçan, Mihemed aş li hêvîya min hîşt û berê xwe da mala xwe. Min jî derfîyê xwe yê der girt û çûm li ber bixêrikê rûniştim. Li alîkî gurmikan li cixara xwe dixim, li alîkî jî çaya xwe, çaya ku wek mîna xwîna kêrgûşkê hêdî hêdî dadîqultînim. Li derva jî dîsa baranê dest pê kirîye, ewrê reş tijî bûne. Baran dibare, lê barane-

ke çawa, merîya digot qey ezman qelişîne, weke zembera kanîyê ji jor da av tê xwarê û weke lehîya derê biharê ber bi jêr diherike.

Gelek wext derbas bû, ez hinek xewroşkî bibûm ku, bi dengê vekirina derê pêşîyê ra, ji nişkêva ji cîyê xwe vecinîqîm. Min çavê xwe vekir ku ez çi bibînim, kaleki tîr û dirêj, ji derî ra ket hundir. Kalekî rûspî û nûranî. Li serê wî pêçekî sipî û glover, rûyê wî yê qerqaş heta ser navika wî dirêj... Weke dêrîyê jinan, dêrîyekî ji qumaşê spî û heta ser lingên wî dirêj lê... Di bin çengê wî yê çepê da jî deftereke reş û qalind, bi destê xwe yê çepê deftera xwe zexm girtîye û hêdî hêdî ber bi min tê. Dema ku du sê gav avêt û nêzikî min bû, bi dengeke nerm û nizm silav li min kir û got:

- Ez ruhistînim. Bi emrê Xwedê hatime ku îşev li vir ruhê te bistînim.“

Çawa Kalê xwe da nasîn û qala ruhgirtinê kir, bi derbekî va min dest avêt lagana xwe ya Êriz û ji ber xwe kişand. Lûla laganê ber bi ser natika wî dirêj kir. Hûn bawer bikin, min çawa devê lûla laganê da enîya wî, ji tirsê dev û lêvên wî ricifin. Rû û rûçên wî hatin guhartin. Dest û lepên wî lihev ketin, deftera wî ya reş jî ji destê wî pekya û ket ber lingê wî. Bi dengekî xemgîn lavayê min kir û ji min ra got:

- Qeroyê min, wek mîna piling ji cîyê xwe qil nebe û zêde hêrs nekeve, ezê careki din li defterê binêrim, dibe ku min navê te û hinekan tevlihev kiribe.

Sedem wê yekê min jî jê ra got:

- Ez ruhistîn muhistîn nas nakim, li kê digerî bigere, zû bibîne û sebra min careke din necêribîne.

Feqîrê xwedê ji tirsê di cîhê xwe da diricifî û bi destên ricaf zûbizû rûpelên deftera xwe li hev qeliband, heta dawîya defterê çû û bi rûyekî tirsnak li min nihêrû got:

- Qeroyê min, bibaxşîne, min navê te û yekî din li hev qelibandîye. Mirovê ku ez hatime ruhê wî bigrim, ew tu

ninî. Lûla lagana xwe jî berjêr bike ku, hê qeza û belayek ji destê te dernektiye. Li ser lêborîn û gotinên wî min lagana xwe şûnda kişand û jê ra got, tu ruhistînî, kî yî ez nizanim, lê carek din wusa dernekeve pêşîya min. Îro qezayek ji destê min derneket, lê careke din, bi rastî an jî bi xeletî derkevî serê rîya min, tu sax ji destê min nafilîtî.

Kalê minê rûspî û nûranî, weke kesên qidûmşikestî bere xwe guhart, piştî xwe da min û ji nişkêva wenda bû. Piştî wendabûna wî êdî ne xew kete çavên min, ne jî çayê di qewrîya min ra çû xwarê. Hata sibê min cixare li ser cixarê kişand û di ber xwe da poncîm. Piştî azana melê sibê Mihemedê aşvançî ji derî da ket hundir, hêrandina genimê min jî hêdî hêdî diqedîya. Min ardê xwe valayî çewalên xwe kir, devê çewalan jî yek û yek dirût û avêt ser erebê. Ga yê xwe li ber erebê girêda, xatirê xwe ji Mihemedê Abo xwest û berê xwe da gund. Ji wê rojê virda jî çûyîna aşê Abo li xwe heram kir.

Piştî kurteçîroka Xalê Qero, di cemaatê da tevlihevîyek çêbû. Hinekan ji tirs û xofa ruhistîn û ji bo gotinên Xalê Qero, xwe gunekar dihasibandin û tobedarîya xwe dianîn ziman. Hinekan jî bi kêf û bê tirs, qîlfê xwe bi Xalê Qero dikirin û jê ra digotin;

- Malxirab madem ku te ruhistîn di tarîya şevê û di Aşê Abo da bêçare dîtibû û lagana xwe lê kişandibû, heft derb li ser hev di natika wî da valabikira, îro em jî jê xilas dibûn, tu jî...

Careke din ken û duayên ji cemaatê derdiketin tevlihev dibûn. Li alîki tobedarîya kalemêran, li aliyê din jî ken û henekên xortan...

Ew ken û henekên ku ji kûranîya dil derdiketin û di nav cemaatê da belav dibûn...

10.01.2006

Bavfile!..

Îro 100 salîya komkujîya Ermenîyan e. Ji vir sed sal berê dewleta Osmanî ji milyonek zêdetir Ermenî qirkirin û koka wan qeland. Ew kesên ku ji komkujîyê xilasbûn, nasnameyên xwe veşartin û bi nav û nasnameyên nû jîyana xwe domandin. Zarokên ku sêwî mabûn, ew jî di sêwîxaneyan da mezinbûn, dû ra ji wan hinek di malên Tirkan da bûn xulam û berdestî, hinekên wan jî weke Bavfileya gundê me bi mêrebîyan ra zewicîn...

Ew, bê dil ji ola xwe, ji zimanê xwe, ji çanda xwe dûr ketin û navên nû li xwe kirin. Mixabin, dîsa jî di jîyana xwe da rûmet nedîtin. Ji alî malbatên xwe yên nû va jî biçûk hatin dîtin, bi navê ola dê û bavên xwe hatin bi nav kirin.

Ji wan yek jî Bavfile ya gundê me bû.

Ew jî wek jinên hemsalên xwe, xwedî zar û zêç û xwedî mal û mulk bû.

Jîyana hemû jinên gund çawa ba, ya wê jî wusa bû.

Tu kêmasîyeke wê ji jinên hemsalên wê tune bû, ji wan behredartir, ji wan paqij û bedew bû...

Di mala xwe da xalî û xalîçe çê dikir. Dêrî û delmên jinên gund wê dibirî û didirût.

Xwedîyê du zimanan bû. Qasî ku bi Kurdî diaxiffi ewqas baş jî bi Tirkî diaxiffi.

Piranîya jinên gund ê hemsalên wê, di emrê xwe da dibe ku carek ji gund derneketibûn, ew qasî ku jineke gundî, ewqas jî jineke bajêrî bû.

Wê jî weke jin û mêrên gund, di rojê da pênc wext nimêj dikir û di meha remezanê da rojî digirt. Di warê olî da

xwedî bîr û bawerî, bi limêj û teat bû. Di salên 1970 yî da çûbû Meke û Medine tewaf kiribû û wezîfa xwe ya hecê jî anîbu çîh.

Lê dîsa ne bi hecîtîya xwe, ne jî bi navê xwe dihat nasîn. Jinikeka bênav bû. Xêncî çend kalemêr û pîrejinên gund, di gund da tu kesî navê wê yê rastî nedizanîbû. Ew kal û pîrên ji navê wê hayîdar, wan jî wek gundîyên din wê bi koka wê, bi dinê dê û bavê wê va girê didan û binav dikirin.

Bavfile...

Bavfile ya Tirk...

Li ber çavê gundîyan sûc û gunê wê ne tenê Filetîya dê û bavê wê û zanebûna wê ya Tirkî jî wek kêmasîyeke mezin dihat dîtin

Bernavka wê ya Bavfile dîsa dihat famkirin, lewra ji zarokên gund hata kal û pîrên gund, bi kemasî be jî ji kirinên Tirkan yên ku li Fileyan hatibûn kirin, agahdar bûn. Di derheqê komkujî û talankirina mal û mulkên Filan da, ji dê û bavên xwe, ji kal û pîrên xwe gelek tişt bihîstibûn. Ji neyartîya herdu alîyan jî bêhayîdar nebûn. Lê dîsa jî, ew jinikeka bê nav li ber çavên wan hem Bav file, hem jî Tirk bû...

Çiqas, bi bernavka Bavfile bihata binavkirin, ew jî qasî hemû jin û mêrên gund, ji jîyan û dîrok û ji zimanê Ermenîyan dûr bû. Jiber ku ew jî wek zarokên hemwelatîyên xwe di piçûktîya xwe da ji dê û bavê xwe, ji heval û hogirên xwe qetîyabû û li ber destê neyarên bav û kalên xwe mezin bibû. Li ba gundîya, ne hecîtiya wê, ne jî nimêj û taeta wê têra misilmanîya wê dikir.

Cînareka baş, jinikeka bi huner û ji derdora xwe ra alîkar bû. Lê dîsa jî ew gor şênîyên gund jinikeka bênav a Bavfile bû...

Di derheqê jîyana wê da kesî zêde tiştek nedizanibû.

Tenê çend kalemêr û pîrejinên gund digotin; ew berîya

şerê cîhanê ya yekemîn, dê û bavê xwe wenda dike. Dû ra li Erzîrumê, di sêwîxanê da mezin dibe. Gundîyek me jî, wê wek jina xwe ya duyemîn li xwe mar dike û tîne gund. Gundîyê me li ku wê naskirîye û bi çi awayî pê ra zewicîye nedihat zanîn. Di derheqê pêşîya wê da tiştê ku dihat zanin ew bû ku, digotin dê û bavê wê File bûne û piştî mirina wan, ew sêwî maye û di sêwîxanê da mezin bûye.

Bavfile, kême zêde çil sal berê, di hêştê salîya xwe da çû ser dilovanîya xwe, lê piştî mirina wê jî navê wê nehat guhartin. Hê jî bi koka xwe va tê bi nav kirin û tê bibîranîn... Bavfile...

Bavfila Tirk...

Belê dewleta Osmanî 100 sal berê komkujîya Ermenîya kir, dewleta ku li ser hîmê wê ava bû, ew îro jî hê gunehkarîya ecdadê xwe qebûl nake û hê îro jî neyartîya Ermenîyan dike.

Bi sedema 100 sala komkujîya Ermenîyan, cînara bav û kalê min careke din hate bîra min. Ji bo bîranîna wê, min ji hinek kal û pîrên gund navê wê pirsî, bi salan şûnda be jî, ez navê wê yê rastî hîn bûm.

Lê dîsa jî ez weke gundîyên me wê bi Bavfiletiya wê bi nav dikim. Lewra Bavfile ji navê wê yê fermî çêtir e û wê bi koka wê va girê dide...

24.04.2015

Mifreze û bejna Naso ya xil û xwar...

Saet dehê sibê bû. Li kêleka mekteba gund bi dehan cemseyên leşkerî û bi sedan leşker... Hinek ji alîyê newala kevrê gewr, hinek jî ji alî bihurê çemê jêr va hatibûn û avêtibûn ser gund. Mêr û jinên gund weke pezên gêj, matmayî mabûn û li der dora xwe diçûn û dihatin. Li ber derê malan û li ber kanîyê, qîz û bûk, silmik û elbên di destê xwe da danîbûn erdê, bi herdu destên xwe li çokên xwe dixistin û di ber xwe da dilorandin.

Cara yekemîn bu ku hemû gundî, bi hev ra weke reşêlekên ku zarokên gund di meha çile da nêçîra wan dikirin, ketibûn dafikê, dafika Nazmî Çawûş...

Ne dikarîbûn birevin, ne jî dikarîbûn xwe veşêrin. Pênce, şêst, sed, dused esker..

Di destên wan da tivingên modolî, namliyên tivingên xwe ber bi gund û gundîyan dirêj kiribûn û li benda fermana Nazmî Çawûş sekinîbûn. Komek esker jî, li binê taxa jêr, ji çem derbas dibûn û ber bi dibistanê, ber bi Nazmî Çawûş diçûn...

Nazmî Çawûş, ji ser kursî rabibû, herdu destê xwe dabû ser qûna xwe, li gund û rewşa gundîyan dinihêrî. Dema ku esker gîhiştin ba wî, ew û muxtar li pêşîyê, li pey wan jî komek esker, ji mala muxtar va dest pê kirin û ketin nava gund. Diketin nav kîjan malê, ode, aşxane, kulîn, axur û kadîna kayê, li ber derîyê malê heba qelax, ser û binê hev dikirin û di herderê da li çek û rextan digerîyan. Diketin odê malan, histêrê nivînan dadixistin xwarê. Li nav lihêf û doşeg û balgîyan digerîyan, hemû nivîn li ser

hev diqelibandin û bi serê singûyên tivingên xwe rûyê wan diqelişandin.

Diketin kulînê, bi zanayî sîtilên mast, tenekêyên rûn û postên toraqê werdigerandin û tevlihev dikirin.

Di aşxaneyan da, bi pozê xençerên xwe çewalên ard û torbeyên genim û sawar diqelaştin û li ser erdê dirijandin. Dema ku jin û jinepîr kirin û kiryarên eskeran didîtin, agir bi kezeba wan diket. Ji kerba bêdengîyê bêhna wan di ber wan da diçikîya. Serê laçikên xwe dikirin devê xwe û di dilê xwe da nifir dikirin, di ber xwe da digirîyan û hêsir dirijandin. Ji danê sibê û ji mala Muxtar va dest pê kiribûn û piştî navroyê ji serê taxa jorîn ra derketibûn.

Hemû şênîyên gund, jin û mêr, kal û pîr bi xwe ra anîbûn û li binê taxa jêr, li hemberî dibistanê li hev komkiribûn. Pişt ra jin û mêr ji hev veqetandin. Jin û zarokên piçûk li ber devê çem, li alîyê gund hîştin. Hemû mêrên gund jî, ji avê derbasî alîyê dibistanê kirin û berê wan ber bi gund, ber bi jin û zarokên wan wegerandin û wek îştimaya eskerîyê li kêleka hev rêz kirin. Zarokên xwendekar li ber derê dibistanê, yên piçûk jî li kêleka rêza jinan sekinîbûn û bi matmayî li dê û bavên xwe û li zilma ku esker li wan dikirin, dinihêrîn.

Nazmî Çawûş, li rexta rêza mêran sekinîbû, herdu destê xwe li ser qûna xwe dabû serhev, di cîhê xwe da xwe li ba dikir û ferman dida. Hemû mêrên gund, kal û xort, bi fermana Nazmî Çawûş ra xwe tazî dikirin. Çend kal, bi kiras û derpê mabûn ku, ew jî bi dengê Nazmî Çawûş ra, bêçare kiras û derpê xwe jî hêdî hêdî ji xwe derdixistin.

Li binê gund Nazmî Çawûş li tûtikê xistibû, qiyamet rabibû...

Bi tûtika wî ra hemû mêr, li meydana gund û li kêleka hev rût û tazî...

Çawa ku Mele di derbarê roja qiyametê da weaz dida û wê rojê tarîf dikir, hemû gundî jî li ber devê çem û li kêle-

ka hev, bêkiras û derpê sekinîbûn. Di navbera wan û jin û zarokên wan da, çem, li ser çem jî pira siratê.

Ji serî heta lîngan, rut û tazî, her tiştên wan li meydanaê...

Di nav mêran da bejneki xil û xwar ji dûr va kifş dikir û bala jin û zarokan dikişand ku, ew jî bejna Naso bû.

Bejneke dirêj û xil û xwar...

Li ser bejna rût û tazî, serîki bi serpêçeke gilover. Te digot qey dinya gilover anîne, danîne ser serê wî û bejna wî jî di bin giraniya dinyayê da xil û xwar bûye. Kesên ku di bin çavan da li aliyê wî mêze dikirin, rewşa xwe ji bîr dikirin û di ber xwe da dikenîyan. Bi dengê Nazmî Çawûş ra dengê xwe dibirrîn, ken di dilê wan da dikelîya...

Bejna Naso, bejneke dirêj û xil û xwar.

Cesedekî bê goşt...

Ji çerm û hestî...

Hestiyên dirêj û çermê reşê birqandî...

Li ser bejna wî ya xil û xwar jî serpêça wî ya mezin û gilover...

Bejn û bala Naso û serpêça wî, bala Nazmî Çawûş jî kişandibû ku, ber bi Naso çû, şiva destê xwe li serpêça wî xist û ji serê wî da anî xwarê...

Nazmî Çawûş çî bikira, ji kesî tu dengêk dernediket, bêdengîya ji bêçaretîyê ketibû dilê gundiyan. Ne ji jin û mêran, ne jî ji kal û pîran deng derdiket. Xêncî dengê ava çem û dengê Nazmî Çawûş, her der û her tişt kerr û lal...

Nazmî Çawûş talîmat dida, eskerên di bin fermana wî da jî zilm û zordariya bêsinor û bêpîvan li gundiyan dikirin. Hemû mêt, xort ya jî kal, rût û tazî, berê wan li aliyê gund, kincên wan jî li pêşiya wan, li erdê û tevlihev...

Li paş wan û kêleka wan jî eskerê Nazmî Çawûş rêzkerî... Bi fermana Nazmî Çawûş ra dema ku tazî dibûn, berê herdu destê xwe li pêşiya xwe girê didan, dîpçikeki şidyayî ji leşkerê pişt xwe dixwarin, bêçare û bê îtiraz, destê xwe ji hev vedikirin û di ber xwe da berdidan. Hemû taxim û

taxlawatên wan ên bi wan va girêdayî, derdiketin meydanê û li ba dibûn. Ji tirs û xofa ku Nazmî Çawûş kiribû dilê wan, tu kes ji cîyê xwe nedilivî, li dijberî zilma wî dernediket. Hemû mêr rût û tazî, serê xwe di ber xwe da xwar kiribûn, di bin çavan da li alîyê wîyalî çem mêze dikirin û di dilê xwe da difikirîn ku, gelo ya anîne serê wan, wê bînin serê jinan jî..?

Gundî, di serma derê baharê da, demekî dirêj, rût û tazî di cîhê xwe da man. Bi fermana Nazmî Çawûş ra, elbeke avê anîn, elbeke dar, ji darê şimşîr... Elb berê dan destê Hemîd, Hemîdê li serê rêza mêr ên rût û tazî di cîhê xwe da diricifî...

Bi fermana Nazmî Çawûş ra, Hemîd elba vala girt, çû ber çem. Ji ava çem elb tijî ava sar kir û di ser serê xwe da vala kir, pişt ra jî elb dîsa bi avê tijî kir û anî di ser serê mirovê ku li kêleka wi sekinîbû, rijand û dora xwe derbas kir. Piştî wî îjar yê kêlaka wî elba vala digirt diçû ber çem, elb bi ava sar tijî dikir, wek Hemîd, berê di ser serê xwe da diquliband, cardin tijî dikir û dihat di ser serê mirovê ku di kêleka wî da li ber dora xwe sekinîye, vala dikir, diçû û di cîhê xwe da heta dawî li îşkenceya bi avê were, bêdeng disekinî.

Bi îşkenceya avê ya ku bi xwe li xwe dikirin, ne kesî ji kesîra îtiraz dikir, ne jî dengê xwe derdixist.

Li alîyê gund jî hemû jinên gund, ji zarokên qîzîn heta jinepîrên heftê-heystê salî, ew jî li kêleka hev rêz bibûn, berê wan jî ber bi rêza mêran. Dev û lêvên wan bi laçik û şarên rengîn va girtî, çavên wan bi hêsir û bi dilekî xemgîn, li zilm û zordarîya bêsînor û bêpîvan temaşe dikirin. Di nav jinan da jî hinek jin hebûn ku, ew jî bi hev ra ketibûn nav qîlf û henekan. Bi dengekî nizm di derheqa mêran da, bi taybetî jî li ser kinbûn û dirêjîya canê wan ên piçûk diaxifîn û henekên xwe bi wan dikirin û di ber xwe da dikenîyan. Dema ku eskerek li wan mêze bikira,

wê gavê jî serê laçikên xwe dikirin devê xwe, ya jî lêvên xwe, di nav diranê xwe da kit dikirin û li ber kenên xwe disekinîn.

Danê êvarê, Nazmî Çawûş kirina xwe kiribû, li derdora xwe dinihêrî û bi kêf û eşq dikenîya. Kenên wî qedîyan, ferman da û bi fermana wî ra hemû esker derbasî alîyê dibistanê bûn û li dora wî civîyan. Piştî çend xulekan li cîp û cemseyên xwe sîyar bûn û vegeîyan. Bi vegeîya wan ra, mêr ên gund jî bi lez û bez kincên xwe, rast ya jî vaca, li xwe dikirin. Solên xwe çep û rast dikirin lingên xwe, serê xwe di ber xwe da xwar dikirin û ber bi malên xwe va diçûn. Weke kesên kerr û lal bêdeng û bê seda...

Di ser wê rojê da, sal û demsal derbas dibûn, ew zilm û tadeya ku gundîyan wê rojê dîtibûn, weke hercarê li paş mabû. Ew bûyerên ku cara ewil li wan qewimîbûn, bi salan jibîr nedikirin. Bi taybetî jî zarok, zarokên lawîn...

Mêr û jinên gund jî di şevên payîz û zivistanê, ew şevên sar û dirêj da, kirin û kiryarên ku wê rojê qewimîbûn, bi qîlf û henekan bibîr dianîn. Ji ber xwe hinek tişt didan ser, kêr û zêde dikirin, gotinên xwe weke çîrokvanan dixemilandin û di tama çîrokê da ji hev ra vedigotin.

Sedem qîlf û henekên li ser wê rojê di navbera hinek jin û mêran da û di nav hinek malên gund da, ji sibê hata êvarê şer û pevçûn kêr nedibû. Ji wan malan yek jî mala Nasoyê xwedîyê bejna dirêj a xil û xwar bû. Bejna Naso bi kêmasî duh mêtro, lê ne bejneke rast û xurt. Bejna wî weke darê mazîyê, bejneke xil û xwar û ji çerm û hestî pêkdihat. Çermê wî, ji xebata di nav mêrg û zevîyan da û li ber tavê, weke qîr û qetranê reş, qurçimên çermê wî jî wek komira Cizîrê şax şaxî dibriqîn. Dest û pîyê wî û amûrên wî yên bi laşê wî va girêdayî jî, gor bejna wî dirêj û xil û xwar... Ne tenê di nav civata mêran da, di nav civata jinan da jî qîlf û hanekên ku li ser wê rojê dihatin kirin, ew jî, bi pirranî li ser bejn û bala Naso bûn.

Naso sedem qîlf û henekên ku mêran li rûyên wî, jinan jî li paş wî dikirin, dibihîst û bi wan dîn û har dibû. Ji gundîyan ra dida xebera û dixeyîdî. Ne xeberên wî, ne jî xeyîdandina wî çare dikir. Mixabin tişteki din jî ji destê wî nedihat. Ne dikaribû rojeva jin û mêran biguherîne, ne jî dikaribû devê wan girê bide. Hemû hêrs û kîn û nefreta xwe ji jina xwe derdixist. Ji sibê hata êvarê, ji jina xwe ra dida xebera û şerê wê dikir. Bi dar û beran li jina xwe dixist, ser û guhê wê diqelaşt û birîndar dikir. Zilma ku ji Nazmî Çawûş dîtibû, bi xwe li jina xwe dikir. Ji ber zilm û zordariya Naso, jina wî çareya xilasbûnê li derveyî malê didît. Bi pêxasî û serqot, ji destê Naso difilitî û derdiket derva, bi qêrîn û qîjîn, xwe diavêt ber bextê cînanan. Cînar diketin navberê, Naso û jina wî ji hev dûr dixistin... Mixabin, dengê Naso nedihat birîn, dengê wî yê zirav, yekcar zirav, qêrîn û qîjîna wî jî tevlihev dibû. Ji dûr va, ji jina xwe ra dida xebera û digot:

„Qîza kurê kerê... ev çil sal e, di paşla te da me, te hê canê min nas nekirîye ku, tu bi jinên gund ra kinbûn û dirêjîya wî munaqaşe dikî..“

Naso bi van gotinên xwe yên watedar, li alîkî jina xwe ditirsand, li alîyê din jî mesajeke dîplomatîk dida hemû cînanan...

01.05.2006

Navê kerên Hemê

Hemê navê mirovekî sêwî û lal, Şemê jî navê gundê wî bû. Mal û mulkên wî yên li rû dinê tenê du kerê wî bûn, ji wan navê yekî Îsmetê kerr, yê din jî Kemalê kor bû. Di dawîya demsala havînê û di destpêka karên bêderan da, Hemê herdu kerên xwe dida pêşiya xwe, gund bi gund li zikata genim digerîya.

Hemû zarokên li gundên derdorê, bi taybetî zarokên ku diçûn dibistanê, navê Îsmet û Kemal bihîstibûn, lê haya wan ji kerr û korbûna wan tunebûn. Jiber ku, pirtûkên ku di dibistanê da xwendibûn, di wan da ne qala korbûna Kemal ne jî kerrbûna Îsmet dihat kirin. Sedem vê yekê tu wate nedidan navê kerên Hemê. Lê mirovên mezin mexseda Hemê dizanîbûn. Kî rastî Hemê bihata, berê hinekî henekê xwe bi Hemê dikir û dû ra jî navê kerên wî jê dipirsî. Dema ku Hemê nave kerên xwe bigota, wê gave jî jê ra digot;

- Hemê, çima te navekî din nedît, te ev navên bêteşe li kerên xwe kir?

Hemê berê ji vê pirsê hinekî eciz dibû, dû ra li der dora xwe dinihêrî û pirsê wan wuha dibersivand.

- Kemalê kor û Îsmetê kerr bi salan li pişta me sîyarbûn û zulm û tade li me kirin. Îro jî ez li wan sîyar dibim û heyfa me hemûyan ji wan digrim.

Wan salên ku Hemê nav li kerê xwe kiribû, zarokên Kurdan jî hinek nav li kûçikan dikirin. Ji wan yên bi nav û deng polês û cendirme bûn. Zarokên di gundan da dijîyan, demên xwe yên vala bi lîstikan derbas dikirin. Lîs-

tikên wan jî pirî caran „birr“ û lîstika bi „kap“an bû. Carcaran jî dema dihatin ba hev, di navbera xwe da dadgehek saz dikirin. Yek dibû dozger (sawcî), yek dibû parêzer (abuqat), sê kes jî dibûn dadger (hakim). Kûçikên ku navê wan polês an jî cendirme lêhatibûnkirin, ew digirtin, bendekî dirêj diavêtin histuyê wan û yekoyek danîn hizura dadgehê. Berê îfada wan dikirtin, dû ra jî cezayê wan dibirîn.

Ceza, bi piranî dûrxistina kûçik ya ji gund dibû. Bi kevir û daran berê kûçik didan û wî ji gund dûr dûrdixistin. Hegeger kûçikekî bê xwedî ba, wê gavê jî cezayê mirinê didanê û wî darda dikirin.

Ez jî di piçûktîya xwe da bûm şahidê dardakirina kûçikekî, ku ew jî kûçikê mala apê min, navê wî jî polês bû.

Min jî wek zarokên wê demê mexseda Hemê nizanîbû, lê mexseda me zarokan ji tirs û xofa ji cendirme û polêsan dihat. Me ji mezinên xwe zilm û zordarîya ku polês û cendirmeyan li wan kiribû, ji devê wan bihîstibû, ji kilam û stranên dengbêjan jî dardakirin û îşkencekirina rêberên gelê Kurd guhdarî kiribû.

Ji bo wê yekê me jî di lîstikên xwe da bi vî awayî heyfa bav û kalên xwe, heyfa rêberên xwe ji polês û cendirman digirt û agirê ku di dilê me da koz girtibû, sar dikir.

05.03.2005

Kurd û nasnameyên li ber mirinê!

Nasname çi ye?

Ji kîderê tê?

Di derbarê vê yekê da tarîf pir in û ji hev cûda cûda ne.

Bi îfadeyeke hesan mirov dikare bibêjê, nasname, bersivdayîna kes û kom û civatên li dijberî pirsên „hûn kî ne û ji çi eslî ne“ ye.

Her mirovek, jin ya jî mêr, bi hin nasnameyên pevrayî tîr û dinê.

Ji wan yê sereke, nasnameya mirovahî, netewî û olî ye.

Nasnameya netewî û olî ji dê û bav tîr. Dê û bav ji kîjan neteweyê bîr bawerîya xwe bi kîjan olî bîrîn, zarokên wan jî wek endamên wê netewê û bawermendên wî olî mezin dibin û di civatê da cîhê xwe digrin.

Nasnameyên piştî ji dayîkbûnê, di nav jîyanê da tîr bi-destxistin, pir in û hêjmara wan jî gor jîyana her mirovekî tîr guhartin.

Weke nasnameya pêşeyî, gundî, bajarî hwd...

Nasnameyên guherbar, di nav jîyanê da tîr guhartin, kêr an jî zêde dibin. Herwiha bi pêşveçûna zanarî û teknolojîyê, mirov dikare hinek nasnameyên xwe yêr mayînde jî biguherîne.

Weke mîsal, jinek di nav jîyana xwe da dikare bibe mêr, mêrek jî dikare bibe jin. Dîsa her mirovek dikare di nav jîyana xwe da bawerîya xwe ya olî jî biguherîne.

Xiristîyan hatibe dinê, dû ra dikare bibe Misilman, an jî Misilman hatibe dinê, dû ra dikare bibe miroveke bêbawer...

Lê di nasnameyên zikmakî yên mayînde da yên ku neyên guhartin, ew jî, nasnameya netewî ye ku, bingeha wê jî ziman e, zimanê zikmakî ye...

Nasnameya netewî, bikeve ber mirinê û bimre jî, tu nasnameyek şûna wî nagre. Ji ber ku gor daxwaz û hewesta mirovan nayê guhartin.

Mirovek gor nasnameya xwe ya netewî jîyana xwe nedomîne û lê xwedî dernekeve jî, ji alî kesên din va weke endamê wê netewê tê bi nav kirin.

Mîsal, kurdek çiqwas xwe wek Tirk, Ereb, an jî Ecem tarîf bike jî, ne dibe Tirk û Ereb û Faris, ne jî ew wî/wê qebûl dikin.

Mixabin dema mirov li rewşa Kurdan, bi taybetî Kurdên Bakûr dininêre, di helwesta wan da tu pîvaneke zanyarî nabîne.

Cendek Kurd, mêjû tevlihev e...

Kurd, ne gor pîvanên zanistî, ne jî gor pîvanên olî tevdi-ger in...

Ji wan beşek, nasnameya xwe ya netewîtiyê didin alîkî û berî her tiştî xwe weke sosyalîst, enternasyonalîst û demokrat bi nav dikin.

Beşek jî xwe tenê gor bawerîyên xwe yên olî tarîf dikin.

Her du beş çiqwas ji hev cûda bin jî, di vî warî da rîya wan dikeve ser hev û dibin yek.

Kurdên sosyalîst dibêjin; „em mirov in, sosyalîst û enternasyonalîst in.“

Yên xwedî bawer jî dibêjin; „em qûlê Xwedê û ji ometa Mihamed in.“

Ne sosyalîst û enternasyonalîst gor pîvanên zanistîyê xwe tarîf dikin, ne jî olperest gor pîvanên olî.

Halbûkî, di demên borî da, Kurdên oldar digotin, „em qûlê Xwedê, ji qewmê Îbrahîm û ji ometa Mihamed in.“

Mixabin Kurdên oldar ketin bin bandora Tirkên misilman û ji nasnameya xwe ya qewmî dûr ketin.

Kurdên sosyalîst jî bi salan di bin tesîra çepên Tirk û kemalîstan da man, ew jî bese ku ji alî heval û hogirên xwe yên Tirk va, bi nijadperestîyê neyên tawanbarkirin, nasnameya xwe ya netewî dan alîkî û bi bendê biratîya gelan va xwe girê dan.

Her dû beş jî ne Kurd man, ne jî bûn Tirk û Ereb û Ecem...
Bi destê xwe berê ziman û nasnameya xwe kuştin, îro jî bêxwedî û bêxwedan, li dû heval û hogirên xwe ketine û ber bi mirinê diçin!..

06.12.2016

Newala waweylê!

Weke anekdotek di bîra min da ma ye. Salên borî, di sohbetên olî da hin kesan digotin; di dinê da sê cûre mirov hene. Ji wan cûreyan ya yekem, ew kesên bawermendin ku, gor bîr û bawerîyên xwe dijîn. Ew ne li kesî xirabîyê dikin, ne jî ji kesî ra xirabîyê dixwazin. Ew weke jîyana xwe ya vê dinê, li dinya wîyalî jî jîyana xwe ya bê dawî di bihûştê da derbas dikin.

Cûreya duyem jî ji kesên xwedî bîr û bawerî pêk tên, ku ew ji kesên di cûreya yekem da cîh digrin cûdatirin, li kesî xirabîyê nekin jî xêncî xwe ji kesî ra çêyîyê jî naxwazin. Bîr û baweriyên xwe ji bo berjewendîyên xwe yên rojane bikar tînin û gor bîr û bawerîyên xwe najîn. Ew, kesên gunehkar in. Sedem vê yekê ew, gor guneyên xwe yên vê dinê beşek ji jîyana xwe ya ji wîyalî, di dogehê (cehen-nem) da derbas dikin.

Ew kesên di cûreyan sêyem da cîh digrin, ne bîr û bawerîyên wan, ne jî kirin û gotinên wan hevdu digrin. Ew kesên tevlihev in. Ne qîbleya wan kifş e, ne jî bîr û bawerîya wan yek e. Berjewendîyên wan li kîjan alî be, ew jî gor wê yekê qîbleya xwe li wî alî diguherînin. Sedem vê yekê, li dinya wîyalî jî cîhê wan ne bihuşt, ne jî dogeh e. Ew di navbera bihuşt û dogehê da, di Newala Waweylê da jîyana xwe ya mayînde derbas dikin.

Dema ku ez îsal çûm welat û rewşa Kurdên ku di gund û bajaran da dijîn, dît, ev anekdota ku min salan berê bihîstibû, hate bîra min. Mirov dibêje qey ew anekdot ji bo Kurdên Bakûr hatîye gotin.

Mirov dikare bêje Kurdên Bakûr jî îro ji sê cûreyan pêk tîn.

Ya yekem gundî...

Ya duyem bajêrî...

Ya sêyem jî ne gundî ne jî bajêrî, kesên tevlihev in.

Di van salên dawî da jîyana Kurdên Bakûr jî di gelek xalan da pêşta çû. Bi taybetî ew Kurdên ku di gundan da dijîn, îro, ji berê zedêtir li nasnameya xwe û zimanê xwe xwedî derdikevin, bê tirs û xof xwe wek Kurd bi nav dikin. Sîyaseteke tûj û tund nekin jî, di vî warî da tercîhên xwe, bi piranî gor nasnameya xwe bikartînin.

Kurdên bajêrî jî ji du beşan pêk tîn. Ji wan beşek di bajaran da hatine dinê û li wir mezin bûne, ku piranîya wan zimanên xwe yên zikmakî nizanin û ji orf û edetên kurdayetîyê dûr in.

Di jîyana xwe ya rojane da Tirk, di warê sîyasetê da jî Kurd in. Çiqas ji zimanên xwe yên zikmakî û ji kurdayetîyê dûr bin, ew jî xwe Kurd dihesibînin, di nav sîyaseta Kurdî da cîh digrin û bi zimanê Tirkî sîyasetê dikin. Nezanîbûna zimanê xwe yên zikmakî wek kêmasî nabînin û ji bo hînbûna ziman jî xwe zêde naêşînin. Heger bixwazin, dikarin di demeke kurt da bi hêsanî fêrî zimanê xwe bibin. Ji ber ku kesên derdora wan Kurd in û ew jî di nav Kurdan da sîyasetê dikin.

Lê hinek Kurdên bajêri hene ku ew di her warî da tevlihev in.

Ne Tirk, ne jî Kurd in...

Ne bajarî, ne jî gundî ne...

Di hemû xalên jîyanê da, çeperast lêdixin û dijîn.

Piranîya wan di salên dawî da ji gundan koç kirine û li bajarên herêmê bicîh bûne. Berê şikl û şemalên xwe, dû ra jî ziman û axaftina xwe guhartine.

Gor cîranên xwe yên oldar bi awayekî, gor yên din jî bi awayekî din dijîn û diaxifin.

Roj bi roj ji nasnameyên xwe yên neteweyî dûr dikevin û bi zimanên xwe yên tevlihev li pey nasnameyên nû digerin.

Xwe weke Tirk bi nav dikin û bi kesên derdora xwe ra bi tirkîyeke nîvco diaxifin.

Heta ku ji destên wan were ji Kurd û kurdayetîyê dûr di-sekinin.

Mixabin, bi kirin û kiryarên xwe li ba tikan jî rûmetê nabînin. Ew çiqas xwe Tirk bibînin û bi nav bikin jî, Tirkên derdora wan, kurdbûna wan hergav li rûyê wan dixin û piçûk dibînin.

Ew ne xwe Kurd dibînin, ne jî weke Tirk tên qebûl kirin.

Ez ji wan ra dibêjim Kurdên nîvbajêrî...

Wek kesên ku li dinya wîyalî, di nav newala waweylê da dimînin, Kurdên nîvbajêrî jî li vê dinê di navbera Kurd û Tirkan da diçin û tên.

Carekî xwe avêtinê nava newalê, ne dikarin pêşta herin, ne jî dikarin şûnda vegerin...

06.09.2014

Gelo Kurd li neynikê mêze nakin!

Miroven ku li neynikê mêze nekin û xwe tê da nebînin, herdem xwe bedew û çeleng dihesibînin.

Ne xil û xwarîya dev û pozên xwe, ne şaşî û kortîya çavên xwe dibînin. Ne ji qûrçimên rû yên xwe, ne jî ji keçelîya porên xwe hayîdar in...

Mirovên ku li neynikê nanêrin, hemû kêmasî û qisûrên kesên der dora xwe dibînin û qîlfê xwe bi wan dikin, lê tu carî kêmasî û qisûrên xwe nabînin.

Ji ber vê yekê jî herdem pozbilind û xweperest in.

Dema ku ez li rewşa Kurdan dinihêrim, bixwe jixwe ra dibêjim. Gelo di malên Kurdan da neynik cîh nagre û ew li şekl û şemalên xwe, li bejn û bala xwe mêze nakîn.

Çima, gor daxwaz û gotinên xwe najîn?

Çima, her tiştî reş, an jî sipî dinirxînin?

Weke mîsal, demoqrasî û wekhevî rêbazên gerdûnî ne, gor welatan, an jî mirovan ne wateya wan, ne jî tarîfa wan tê guhartin. Şert û şûrtên demoqrasîyê li Amerîkayê çi be, li Afrîka û Asya yê jî ew e.

Di bin kîjan şert û mercan da ji mirovek rojavayî ra demoqrat bê gotin, ancax di bin wan şert û mercan da mirovek rojhilatî jî wek demoqrat tên binavkirin.

Ew şert çi ne?

Mirovê demoqrat ray û ramanên xwe vekirî û zelal tîne ziman û ji ray û ramanên kesên din ra hurmetkar e.

Li ber tu kesî histûyê xwe xwar nake û xwedî cesaret e... Xwe gor cemaata xwe, tarif nake, bi endametiya xwe ya bi hêz û partîyekê va ray û ramanên xwe yên şexsî na-

guherîne. Bîlakîs ew bi şexsîyeta xwe, hêz û partiya xwe dewlemend, bi ray û ramanên xwe jî wan pirdengî û pî-rengîn dike.

Mirovê demoqrat aştîxwaz e...

Dema were rojevê, hemû Kurd xwe weke demoqratên se-reke binav dikin û di ser xwe ra kesekî demoqrat nabînin. Lê kesên ku wek wan nafikirin, ne tenê ji fikrên wan, ji hebûna wan jî eciz dibin.

Aştîxwaz in, lê ne ji bo kesên din, tenê ji bo xwe û hevalên aştîyê dixwazin. Ji destên wan were, yen ku wek wan nafikirin, di tasek av da dixeniqînin.

Mirovhiz in, lê belê xwe tenê mirov dihesibînin û tenê ji xwe hez dikin.

Xwe weke ronakbîr binav dikin, lê ne dixwînin ne jî dinivînin...

Li devê şêx û melayên xwe dinihêrin, qasî ku ji wan fam dikin, gotinên wan weke benîştê nêrbend, ji sibê hata êvarê dicûn.

Sîyasetmedar in, lê xêncî rêç û rêbazên xwe tu rîya kesî rast nabînin. Yê ku di rêça wan da neçin û nekevin milên wan, xayîn û neyar îlan dikin.

Dîndarên Kurd jî wusa nin...

Bi oldarîya xwe difirin, lê xêncî mûridên ji tarîqata xwe, oldarîya tu kesî qebûl nakin.

Gor dîtîna min, hemû Kurd bi gotinên xwe şoreşwan, bi kirin û kiryarên xwe jî muhafazakar in.

Ne xwe diguherînin, ne jî guhartina kesî dixwezin.

Jibo vê yekê ye ku dibêjim, ji her Kurdekî ra neynikek pêwîst e.

Kîngê ku di rojê da carê li neynikê binihêrin û wek kesên din qûrçimên rûyên xwe û keçelîya porên xwe tê da bibînin, wê demê dikarin li ser ray û ramanên xwe jî bifikirin û xwe bigûherînin...

12.08.2010

Kurdên Bakûr!

Carcaran li ser rewşa Kurdan, bi taybeti Kurdên Bakûr, dûr û dirêj difikirim, mixabin di kirin û kiryarên wan da tu car encameke balkêş nabînim.

Li kîjan alî dinihêrim asteng û derd û kulên wan derdikevin pêşîya min.

Ne kirin û kiryarên wan, ne jî gotin û gotarên wan hevdu digrin

Li allîkî dinhêrî jîyaneke pîr û pak, li alîyê din jîyaneke tevlihev û qirêj...

Di karên xwe yên sîyasî da, di bazirganî û jîyana xwe ya civakî da jî tevlihev in...

Di warê mêrxasîyê da, ez bawerim ne li Rojhilata Navîn, li seranserî cîhanê jî li ser Kurdan mêrxas nayên dîtin. Mixabin ew mêrxasîyeke navxweyîye ku, tenê li dijberî hev mêr û mêrxas in.

Di warê xîretê da jî Kurd ji gelek neteweyan bi xîret in. Bese ku dest bi tişteki nekin, li rastî û xeletîya wî nanihêrin, hata wi tiştî nebin serî, dest jê ber nadin.

Xwedî bawer in, bawerîya xwe bi tişteki ya jî bi kesekî bînin, ji bin tesîra wê tiştê, ya jî ji gotinên wî kesî tu car dernakevin.

Xêncî xwe, ji herkesî ra bi rûmet û hurmetkar in û di hurmeta xwe da tu car qisûrek nakin.

Mêvanperwer in, naxwin, li xwe nakin, li zar û zêçên xwe xwedî dernakevin. Lê ji bo mêvanên xwe, ne tenê mal û mulkên xwe, cane xwe jî feda dîkin.

Sozdar in, sozên wan wek sened in. Heger di van demên

dawî da nehatibe guhartin, zerar û zîyana wan jî tê da hebe, hata ku ji destên wan were, li ser sozên xwe disekinin û wan bi cîh tînin...

Camêr in, bêrika wan û zikên wan vala be jî, çavên wan têr in.

Ji hev ra kîndar in. Dema bi kesekî ra bikevin rikê, hata roja mirinê dikudînin û tu car ji bîr nakin.

Mixabin, ji neyarên xwe ra, ya jî ji bîyanîyan ra dilgerm û rûnerm in...

Alîkar in, dema ku li serê heval û hogirên wan bûyerek biqewime, kar û barên xwe li erdê dihêlin, alîkarîya heval û hogirên xwe dikin. Lê ji eqrebayên xwe yên nêzîk ra wê yekê nakin...

Dengbêj û lîstikvan in. Kê bûk be, jinên wan berbû, kî zava be, ew bixwe jî xwendî û qasid in. Dîsa jî ji dengbêj û hunermendên xwe zêdetir li stranbêjên bîyanî guhdarî dikin...

Di warê sîyasetê da piranîya wan sosyalîst û enternasyonalîst in. Sedom vê yekê mafê dewletbûnê ji hemû gelên cîhanê ra gavekî pêşverû, tenê ji bo xwe neheq û paşverû dibînin.

Ji dayîkên xwe hazdikin û wan li ser piştta xwe digerînin. Lê ji zimanê wan fam nakin, ji bo famkirinê qiyamet rabe jî xwe naêşînin...

Oldar in, bawerîya xwe bi Xwedê û Pêxamber tînin. Lê kîngê ji yekî hêrs bikevin, bi Xweda û Pêxamberê wî va dest pê dikin û terin...

Di jîyana wan da rê û rêbaz cîh nagrin...

Loma bê war, hêsîr û belengaz in...

08.05.2012

Teknolojî û Kurdên binerd...

Di nav çend salên dawî da, di warê teknolojiyê da pêşveçûnên gelek mezin çêbûn. Ev ji alî zanyaran va wek şoreşa teknîkî tê bi nav kirin.

Bi saya vê şoreşê dinya guherî...

Dinya piçûk bû, têkilîyên mirovan bi hev ra xurt, dan û sitandinên wan zêde bûn.

Di navbera gund û bajaran da ferq nema...

Karker û xebatkarên li bajêr dijîn, bidin alîkî, şivan û gavanên li serê çiyê jî îro dikarin qasî ronakbîr, sîyasetmedar û nivîskaran ji bûyerên dinê agahdar bibin.

Di berika her şivan û gavanekî da jî telefona destan heye û heger bixwaze, şivan jî li serê çiyê li alîkî dikare pez biçêrîne, li aliyê din jî dikare têkeve inernetê û bûyerên di dinê da qewimîne, bibîne û agahiyên di derbarên wan da hatine gotin û nivîsandin, guhdarî bike û bixwîne.

Gundîyek jî îro dikare di mala xwe da rûnê û hemû rojnameyên ku di zimanê wî da çap dibin, hê ji çapxanê derneketine, bi alîkarîya inernetê bibîne.

Ev pêşveçûna ku di warê teknolojiyê da pêk hatîye, jîyana mirovan hêsan dike û wan diguherîne.

Yên ku vê realîte nabînin û xwe naguherînin, tenê hinek Kurdên binerd in...

Serê xwe kirinê nav qûmê û qûna xwe jî li derva hîştine...

Were ser gotinê, ew xwe demoqrat, aştîxwaz û mirovhiz dibînin...

Lê di jîyana wan da ne demoqrasî, ne aştî ne jî mirovatî çîh digre...

Kî ku wek wan nefikire, gor wan, ya xayîn, ya jî ajan û paşverû ye...

Nivîskarek gor dilê wan nenivîse, wî diz, hunermendek gor dilê wan nestirê, wî çilpiz dibînin.

Jiber ku, ew di dinya xwe ya piçûk da hê jî binerd in. Bi navên leqeb dijîn û deng didin. Ji xwe ra çend navên qelp dibînin û bi wan navan di nav dinya sanal da digerin. Dû ra çavê xwe digrin û devê xwe vedikin. Çi were ser dev û lêvên wan, bi peyvên qirêj û bi hevokên şaş li pey hev rêzdidin û ji mirovan ra dişînin.

Bikaranîna leqebên ku li xwe kirine, xwe vedişêrin, jiber ku ji cesareta medenî bêpar in.

Tu bersiva wan bidî, wê gavê jî hinek peyvên xwe yên qirêj diguherînin û bi navek din û careke din dîsa dişînin. Lê ji jîyan û realîta jîyane ewqas dûr in, tiştêkî girîng ji bîr dikin, ku ew jî nezanî û xizanîya wan nîşan dide...

Nizanin ku, bi navên xweyên sexte, tenê xwe û der-dora xwe dixapînin. Ji wan wetrê computer û sîstema internetê jî weke wan tê xapandin...

Tu dinihêrî bi pênc, deh, panzdeh nav û navnîşanên sexte ji te ra peyamên cûda cûda dişînin, lê nafikirin ku çiqwas nav û navnîşan werin guhartinê jî, dema ku ji compute-rekê were şandin, hemû bi çavkanîyekî tîn xûyakirin.

Ew çiqwas serê xwe di nav qûmê da çik bikin jî, qûna wan wek ala Tirkan li her derê tê dîtin.

Pêşiyên me cîhê bîla bê sebeb negotîne; „çêleka ku dizî were ga, eşkere dizê...”

25.05.2011

Doza pênaverîyê û navê çayikê...

Heta îro li ser pênaverîyê û pênaveran gelek tişt hatine nivisandin. Di piranîya wan nivîsan da, kesên nivîskar bi helwesteke sîyasî li pirsgirekên penaberan û pênavertîyê mêzekerine û nêrînên xwe anîne ziman. Lê rûyekî wî yê din jî heye ku, heta nuha tu kes li ser wê yekê nese kinîye. Heger ew tiştên ku hatine serê pênaveran, werin nivîsandin, bêguman ewê bibin bingeha dewlemendîya edebîyatê jî.

Hinek tişt hene ku mirov dema wan dibhîse, li alîkî digrî, li alîkî jî dikene. Heger ku ew ken û girî neyên nivîsandin, di cîhe xwe da dimînin û di demek kurt da jî tînen jibîrkirin. Sedem wê yekê ye ku qasî rûyê pênaverîyê yê sîyasî, rûyê wî yê din jî hene ku tesîran wan bi salan derbas nabin.

Ji bo nivîsandinê jî barê herî giran dikeve ser milên wergervanan. Tiştên ku di dadgehyan da diqewimin, nivîsandin û belavkirina wan çiqwas qedexe be jî, wergervan dikarin wan bi tewneke din binivîsînin û bînin ziman. Heta nuha min jî gelek tişt bihîstin, lê van demên dawîyê da îfadeya keçikeke Kurd bihîst ku, ji kena dilê min êşîya.

Piştira jî meseleyek gundîyekî me hate bîra min, dema ku min ew ji hevalê xwe yê wergervan ra got, îjar ew ji kenan ji xwe çû.

Tiştên ku ewqas em pê kenîyan çî bûn?

Ez bawerim we jî ji nuha da gelek meraq kirîye.

Ji bo ku meraqa we zêde nebe, ezê berê bi kurtayî mesela keçîka pênaver, piştira jî mesela gundîyê me ji we ra bibêjim.

Keçika penaber li bajarekî Tirkîyê mezin bûye û gor gotinên wê xûyaye ku ji sîyasetê dûr sekinîye. Çend sal berê hatiye welatek Europayê û li wir daw û doza mafê pêneraberîyê kirîye.

Piştî serlêdana wê roj û meh derbas dibin. Doza wê di dadgehê da tê dîtin. Hakim bi alîkarîya wergervanek sebebê hatina wê ya Europayê jê dipirse.

Keçik jî bersiva hakim dide wuha dibêje:

- Ez endamê partiyeka binerdî me û ji ber wê yekê jî jîyana min a li welat di bin xeterek mezin da derbas dibû, loma ez ji welatê xwe revîyam û min bêhna xwe li vir girt.

Hakim_

- Navê partîya we û armanca wê çî ye?"

Keçik:

- Ê Hekim Beg welle partîya me partiya komunîst e. Hem Markist hem jî Lenist e. Li welatê me çiqwas koministi û markîstî xirab were tarîfkirinê jî ew tiştên ne xirabin û gelek baş in. Hekim Beg, heger hûn mexseda partîya me ji min bipirsin, ez nikarim dûr û dirêj li ser vê yekê bisekinim, qasî ku ez dizanim ezê bi hinek mînakên ji we ra bi kurtayî tarîf bikim.

Partîya me heqê gundîyan diparêze. Mesela gundîyek were ba partîya me û bibêje, 'traktora min tune', partî traktorekî didê û mesela wî çareser dike.

Yan jî, karkerek bibêje, 'xanîyê min tune', partî jê ra xanîyek çêdike, tapî û kilîta xanî dide destê wî û derdê wî derman dike.

Xwendevanek bibêje, 'computera min tune', partî jê ra computerek dikire, didê wî û pêdivîya wî jî hal dike.

Ev gotinên keçika panaber gelek bala hakim dikêşînin. Hakim têdigihîje ku gotinên wê nerast in û hinek tiştên ku ji derdora xwe bihîstîye, wan jî tevlihev kirîye. Sedem wê yekê gotinên keçikê dibire û pîrsekî din jê dipirse.

- Keçika delal, xortekî ya jî keçikeka ezeb bixwaze bize-

wice û ji bo zewacê jî serî li partîya we bixe, partîya we ji bo zewaca wan rêyeke çawa dibîne?

Keçik hinek di ber xwe da difikire û dibêje:

- Hekim Beg, wele min di derheqê vê meselê da tu tiştêkî nexwend. Ji hevalan jî tu pirsgirêkeke wusa nebihîst. Lê bêguman ji bo mesela zewacê ra jî çareyek dibînin, lê çareyek çawa ye ez jî nizanim.

Bi vegotina hevalê min ê wergervan ra em têr û tijî kenîyan. Kenê me qedîya, dû ra min dest bi mesela gundîyê me kir û ji hevalê xwe ra got.

Salan berê gundîyekî me diçe esker, wezîfa xwe ya eskerîyê diqedîne û şûnda vedigere. Roja ku tê gund, hemû mên û jinên gund terin mala bavê wî û li dora wî dicivin. Lê dinihêrin ku xortê me yê Kurd çûyê şûna wî da xortekî nîvtirk hatîye. Gundî pê ra bi Kurdî diaxifin, -ji xwe zimanek din jî nizanin- lê ew ger bi Kurdî ger bi Tirkî tevlihev dike bersiva wan dide. Gundî ji gotinên wî tu tiştêkî fam nakin.

Muxtarê gund, mirovekî rûspî û xwedî tecrûbe ye, li rewşa xort dinihêre û jê ra dibêje:

- Kurê min em dizanin ev du sale tu li xerîbîyê bû yî. Te ji dewletê ra eskerî kir û gelek tiştên ku te li wir dît, me hê û neditîye. Gelek tiştên te bihîstibe me hê nebihîstî ye. Maşalah tu Tirkî jî gelek baş hînbûyî û gelek xweş jî diaxifi. Gelo tiştên ku em nizanin, tu dikarî tirkîya wan ji me ra bibêjî?

Xortê jixwe bawer, xwe di cîhê xwe da tux dike, dû ra hinek li derdora xwe dinihêre û li benda pirsên muxtar di-sekine.

Muxtar, navê pîvaz, kartol, nan û avê jê dipirse, xort bersiva hemû pirsan bi Tirkî dide. Muxtar, navê ker û hesp jê dipirse, xort wan jî yekoyek dibersivîne.

Muxtar hinek di ber xwe da dikene û dibêje:

- Xorto, bi rastî jî tu gelek tiştan dizanî, hela ez t tiştêk

din jî ji te bipirsim. Gelo tu dizanî, bi Tirkî ji çavîkê ra çî dibêjin?

Xort, xwe hinek şûnda dikişîne û di cîhê xwe da mût dibe, lê naxwaze di bin vê pirsê da jî bimîne.

Muxtar cardin lê vedigere û dibêje:

- Xorto, dibe ku we dersa çavîkê nedîtibe?

Xort serê xwe di ber xwe da hinek xwar dike û pirsar muxtar wuha dibersivîne:

- Xalo, çawa me dersa çavîkê nedît, ji me ra her roj qala çavîkê dikirin. Lê di Tirkî da navê çavîkê tune. Tirk di alî ajalan da gelek cahil mane û zimanê wan jî di vî warî da gelek feqîr e. Sedem vê yekê çavîkên Tirk weke bênav mezin dibin, heta ku dibin ker, wê gavê jê ra dibêjin Êşek...

Muxtar:

- Haah jixwe min jî dixwest ez vê yekê bizanibim ku, gelo tu mezin bûyî, ya na!

Mirov nezan be û muhetabê xwe jî nezan bihesibîne, heta ku ziman bigere davêje, kê ku xwer...

Ha doza penaberîyê, ha navê çavîkê, ferq nake...

30.04.2007

„Zêdeyîya keviran davêjim, peyker dimîne“

Dema ku Kurd li ser pirsgirekên xwe mijûl dibîn û diaxifin, ji hev ra gilî û gazinên xwe dikin û dibêjin:

Em bêxwedî ne, di rûyê dinê da tu dewletek tune piştgirîya me bike.

Kêmasîyên me zêde, dagirkerên me bi hêz û quwet in.

Hemû rê û dirb li ber me girtî û em bêçare ne.

Heger mirov ji dûr va li rewşa Kurdan binihêre, di van gilî gazinên wan da tu şaşîyek jî nabîne. Lê mirov nêzikî wan bibe û li jîyan û kirinên wan binihêre, wê demê têdigihîje ku çiqas kêmasîyên Kurdan hebin, ewqas jî zêdeyîyên wan jî hene û astengên li pêşîya wan jî, bi piranî ji zêdeyîyên wan pêk tên.

Ew çi û çi ne?

Gor raya min, ew ji du beşan pêk tên.

Ji van yek, ideolojî û sîyaseta çewt e.

Ya din jî, bîr û bawerîyên wan ên olî ne.

Ev her du tişt jî zêde ne û wan ji Kurd û kurdayetîyê dûr dixînin, nêzikî dagirker û neyarên wan dikin.

Kurdên ku ji salan vir da li ser hîmê sosyalîzmê sîyasetê dikin û hê wê sîyasetê didomînin, duh jî xwe wek kesên entarnasyonalîst bi nav dikirin, îro jî wusa xwe bi nav dikin.

Duh tenê ji bo Kurdistaneke sosyalist dixwestin û sîyaset dikirin. Îro jî ew daxwaza xwe dane alîkî, bi gelên serdestên xwe ra daw û doza biratîyê, ji bo seranserê dinê jî daw û doza demoqrasîyê dikin.

Mixabin hê ji bindest in û di bin lingên dagirkerên xwe

da dipelixin, Roj bi roj ji ziman û çanda xwe, ji welat û nasnameya xwe dûr dikevin.

Ne dikarin Kurd bimînin, ne jî dikarin dibin Tirk. Di nav kurdayetîyê û tirkayetîyê da diçin û tên...

Dema gavek pêşda bavêjin, hevalbendên wan ên sosyalîst û enternasyonalîst, wan bi nijadperestîyê tawanbar dikin, sosyalîstîya wan dikeve bîra wan, şûnda vedigerin û du gavan paşda davêjin. Sedem vê yekê jî wan bêtir dirêj dibe û astengên nû derdikevin pêiya wan.

Kurdên oldar jî ji du beşan pêk tên, ku ew jî ji sosyalîstan şûnda namînin.

Kurdên Elewî xwe bi mezheba xwe bi nav dikin û wî didin pêşîya nasnameyên xwe û ziman û dîroka xwe didin alîkî hebûna xwe bi Elîyê Ereba va girê didin.

Tu nasname wan bipirsî, ew dibêjin; „Em elewî ne“.

Tu ol a wan bipirsî, ew dîsa dibêjin; „Em Elewî ne“.

Tu hinek zorê bidî wan û rê li ber wan bigrî, wê gavê jî dibêjin; „Em ji Xorasanê hatin e“;

Li Kurdên Şafî dinihêrî, ew jî ji Kurdên Elewî kêma namînin. Tu bibêjî, tu kî yî, ew dibêjin; „Elhemdulîlah em misilman in“.

Tu bibêjî, ji kîjan miletîyî, ew dibêjin; „Em ji ometa Mihemed in“.

Tu hinek zorê bidî wan û rê li ber wan jî bigrî, wê gavê ew jî dibêjin; „Dîn û dîyaneta me yek e, em hemû ji xalîyê çê bûne û di dawîya emrê xwe da jî dîsa dibin xalî“.

Ji bo her sê beşan jî ne ziman, ne nasname, ne jî welat û azadîya welat gring e.

Ji bo kesên sosyalîst hê rêça Marx û Lenîn, ji bo kesên Elewî şûrê Alî, ji bo kesên Şafî jî dîn û dîyaneta Mihemed...

Lê ne sosyalîstan bi rêça Marx û Lenîn rîya xwe sererast kirin, ne Elewîyan xwe bi şûrê Alî parastin, ne jî Şafî bi dîn û dîyaneta Mihemed ji bindestî û xizanîyê xilas bûn.

Loma ez dibêjim, Kurd kîngê van zêdeyîyên xwe bidin

alîkî, ancax wê gavê dikarin li ziman û nasnama xwe xwe-
dî derkevin, dikarin azad û serfiraz bin.

Sedem vê yekê ye ku, mirov dikare bêje, astengên li pêşîya
Kurdan ne tenê ji kêmasîyên wan, ji zêdeyîyên wan pêk
tên.

Ev zêdeyî jî ancax bi tewna Rodînê peykersaz va tèn kê-
kirin.

Rojek ji Rodîn dipirsin:

- Tu van peykeran çawa çê dikî?

Rodîn dibêje:

- Ez zêdeyîya keviran davêjim, peyker dimîne.

Kurd jî kîngê ji van zêdeyîyên xwe derxînin û bavêjin , ser
sergoyê xwe, wê gavê tenê Kurd dimînin û ji bindestîyê jî
xilas dibin...

06.06.2014

Kurdên Bakûr û rexneyên vala...

Piştî hatin û çûyîna Barzanî ya Amedê, hinek Kurdên Bakûr bi hestên neyartîyê rêvebirên Kurdistana Başûr rexne dikin. Ji wan hinek dibêjin, hemû dahatîyên Başûr malbata Barzanî dixwe, hinek jî dibêjin hemû bazirganîya Başûr di destê nijadperestên Tirkan da ye hwd...

Rast e, piranîya kar û barên Kurdistana Başûr ji alî firmeyên Tirk va tên kirin û di bazara wan da jî dîsa bi piranî eşyayên ku ji Tirkîyê diçin, tên firotin.

Mixabin ev yek bêsebeb nîne û çîroka wê jî kûr û dirêj e... Bist sal berê, şerê li dijberî rejima Sedam qedîyabû.

Cara yekemîn Kurd biserketibûn.

Leşkerên Sedam, top û tankên xwe di cîh da hîştibûn û ber bi Bexdayê revîyabûn. Di navbera PDK û YNKê da yekîtîyeke xurt çêbibû.

Ji rêvebirên herdu partîyên başûr, parlamentoya Kurdistanê ava bibû û Herêma Kurdistan a Federal hatibû îlan-kirin...

Pêşmerge ji serê çîyayên Kurdistanê daketibûn xwarê û nav gund û bajaran da bi cîh bibûn. Lê ji destên wan ne karê ajaldarîyê, ne jî yê çandîyarî yê dihat.

Leşkerên Sedam di dema çûyînê da hemû dek û dezgehên dewletê xirab kiribûn, kargehên vala û welateke wêran li paş xwe hîştibûn.

Tiştê ku di destê Kurdan da mabû û pere dikir, ew jî petrol bû. Wê petrolê jî bi bîdonan li kêleka rê û di nav kuçeyên bajaran da difrotin. Pere jî qezenç dikirin, lêbêle pereyên ku qezenc dikirin, bi tena serê xwe zikê wan têr nedikir.

Ji wan ra nan û av lazim bû, çêkirina nan jî ji destê wan nedihat...

Rêvebirên Kurdên Başûr welat bi welat digerîyan, ji Kurdên ku li her sê parçeyên din dijîyan, alîkarî dixwastin û ji bo karê bazirganîyê pêşnîyarên xwe pêşkêşî wan dikirin. Kurdên ji dervayî Başûr guh nedidan pêşnîyarên başûrîyan. Daxwazên ku ji bo karê bazirganîyê ji wan dihat kirin, didan alîkî û aqil difrotin, aqilê ku heta wê rojê tu xêr jê nedîtibûn...

Di payîza 93an da Ehmed Bamernî hatibû Îstenbolê, ku ew, wê demê cîgirê Celal Talabanî bû. Ji bo wi li navenda Kurd-Kavê civînek hatibû lidarxistin. Di civînê da rêvebirên Kurd-Kavê û berpîrsîyar û rêvebirên partî û komelên Kurd amade bibûn. Wek roja îro tê bîra min, Ehmed Bamernî di destpêka civînê da li ser rewşa Kurdistana Başûr sekinî û di derheqê pîrsgirêkan Başûr da agahî da û ji bo çareserîya wan pîrsgirêkan jî alîkari xwest, alîkarîyeke bi berdêl...

Piştî axaftina Ehmed Bamernî, bi dehan kes axifîn û nêrînên xwe anîn ziman.

Yekî digot, hûn çima serxwebûnê îlan nakin. Sedam koka we anî, hûn hê jî yekitîya Iraqê diparêzin...

Yek din, bi aqilê xwe yê sivik, aqilê ku heta wê rojê tu faydeyek jê nedîtibû, xewn û xeyalên xwe dixemiland û dida ber Bamernî...

Civîn bi wî awayî bi demjimêran kudîya. Di encama civînê da Ehmed Bamernî ji cîhê xwe rabû, ji bo amadekirina civînê û gotinê me hemûyan spasîya xwe anî ziman û got: „Em ji we ne aqil, ne jî fikrên we yên sîyasî dixwezîn. Aqilê me jî, sîyaseta me jî tê ra me dike. Axa me û perê me hene, lê nanê me tune. Em birçîne, ji ber ku em nizanin nan çêbikin. Heger hûn dixwazin pere qezenç bikin, werin em erd û pera bidin we, hûn jî ji me ra nan çêkin. Em ji birçîbûnê xilas bin, hûn jî ji xwe ra pere qezenç bikin...”

Civîn qedîya û Ehmed Bamernî wê rojê, destvala vegeerîya Başûr. Kurdên Bakûr jî ji dûr va li rewşa Başûr nihêrîn û li ser kêmasî û pirsgirekên wan pir û pir axifin û nivîsandin...

Kurdên Bakûr neçûn Başûr, Kurdên Başûr bê nan û av neman. Jiber ku bi hezaran Laz û Çerkezên ku li derdora Deryaya Reş dijîn, çûn li Başûr firin û aşxane vekirin. Di demek kurt da bûn xwedî dek û dezgeh, dewlemend bûn. Îro jî kargehên mezin saz dikin û wek li Tirkîyê, li Başûr jî Kurdên Bakûr li ber destê xwe didin xebatê...

Li ser wê demê ra gelek sal û demsal derbas bûn, dem û dewran guherîn. Kurdistanê Başûr di warê siyasî û aborî da pêşda çû. Îro, ne tenê Tirk, ji her deverên dinê kardêr berê xwe didin Kurdistanê û diçin li wir karê bazirganîyê dikin.

Kurdên ku bist sal berê aqil difrotin, ew jî, gotinên ku ji salan berê kirbûn, danîn alîkî û çûn ji bo îmtiyazên diravî li ber derê partiyên Kurd û parlamena Kurdistanê ketin rêzê...

Ji wan hinek, bê ked û xebat îmtiyazên diravî bidest xistin û ji wê rojê vir da tenê ji Kurdên Başûr ra dua dikin û pesnê wan didin...

Yên ku destvala vegeerîyan, ya jî îmtiyazên ku bidestxistibûn, hatin birrîn, ew jî, bi rexnekirina Barzanî rojên xwe yê vala derbas dikin...

11.12.2013

Ferqa Kurdên Bakûr û Başûr...

Ji Kurdên Bakûr gelek kes hene ku dîroka dinê ser û binê hev dikin, diroka mirovatîyê bi ezber tînin ziman, lê ji diroka gelê xwe hê bê hayîdar in.

Navê dê û bavên serokên bîyanî yekoyek dizanin û çîrokên wan bi saetan tînin ziman, lê navê kal û pîrên xwe meraq nakin.

Navê dostên Castro û dilketîyên Che Guwera dizanin, lê Qadi Mihemed û Qasimlo hê nas nakin...

Wek he, welatîyên dewleta Tirk, di bin rêvebirîya Baxçelî, Axar, Baykal û Erdoxan da dijîn, lê jîyana di bin serokatîya Barzanî û Talabanî da ji bo xwe weke kemasiyeke mezin dibînin.

Sedem şal û şepikê wî, Barzanî mirovek „paşverû“, yekî wek Erdoxan û Sezer jî pêşverû dinirxînin...

Talabanî, sîyasetvanekî „sîmsar“, yekî wek Demirel jî sîyasetwanekî aqilmend bi nav dikin.

Ne ku tenê di şaxe sîyasetê da, Kurdên Bakûr di warê edebîyatê da jî ji hev dûr in.

Hemû şîrê ku Mayakowskî, Paplo Neruda û Nazim Hikmet nivîsandine, rêz bi rêz ezbere dixwînin, xêncî Memû Zîne navê pirtûkekî Ehmedê Xanê nizanin.

Xwe ji Kurdên ji dervayî Bakûr mezin û pêşketî dibinin, û bi taybetî li ser ferqa xwe Kurdên Başûr bi rojan diaxifin û teorîyên nû icat dikin.

Ez bi xwe ji teorîyên wan ên nû ra tişteki nabêjim, lê tiştê ku ez dizanim, di navbera Kurdên Bakûr û Başûr da yek ferqek he ye, ku ew jî:

Kurdên Başûr çiqwas Kurd in, yê Bakûr jî ewqas ji Kurd
û kurdayetîyê dûr in...

Jiber ku:

Kurdên Başûr bi jîyana xwe va...

Bi şal û şepikên xwe va...

Bi ziman û hestên xwe va Kurd in...

Kurdên Bakûr jî bi jiyana xwe va tevlihev...

Bi zimanê xwe va tirk...

Bi hestên xwe va enternasyonalist...

Bi sîyaseta xwe va jî sosyalist û ji welatparêzîyê dûr in.

Ji ber wê yeke ye ku Kurdên Başûr îro li ser axa xwe azad
û serbest, yê Bakûr jî hê bindest û belengaz in.

Kurdên Başûr îro li ser axa xwe xwedî nîvdewlet, yê
Bakûr jî hê koçber û li ber derê xelkê bê rûmet in.

Kurdên Başûr li rû dinê xwedî dost û heval, Kurdên Bakûr
jî bi biratîya gelan hê xwe dixapînin...

16.10.2009

Kurdistan hêdî hêdî mezin dibe...

Yunus û Elîf, li gundekî girêdayî Hîlwanê dijîn. Sê sal berê bi hev ra dizewicin. Di sala 2011an da zarokek qîzîn ji wan ra dibe. Ew navê keça xwe Kurdsitan lê dikin.

Yunus radibe, berê xwe dide Hîlwanê, diçe li daîra gelheyê (nûfus dairesî) qîza xwe bi navê Kurdistan qeyd dike û nasnama wê digre, dike berîka xwe û berê xwe dide mala xwe. Di navberê da çend roj derbas dibe, ji daîra gelheyê nameyek ji Yunus û Elîfê ra tê. Di nameyê da tê gotin; „biborin, me şaşîyek kir, navê ku we li keçîka xwe kirîye, ew, navekî qedexeye, ji kerema xwe werin, em şûna Kurdistanê da navê keça we bikin Hêlîn“.

Dê û bavê Kurdistanê pêşnîyara daîra gelheyê qebûl nakin û li ser biryara xwe ya ewil disekin. Sedem vê yekê di derheqê wan da dawê vedibe, dadgeha Hîlwanê jî wek daîra gelheyê navê Kurdistanê qebûl nake û gor wê biryara xwe dide.

Dê û bavê Kurdistanê dîsa jî ji biryara xwe ya ewil gavekî şûnda navêjin û ji bo pûçkirina biryara dadgeha Hîlwanê serlêdana dadgeha bilind dikin. Bi wî awayî dawa Kurdistanê radibe Enqerê û li dadgeha Bilind (Yargitay) tê dîtin. Dadgeha bilind malbatê mafdar dibinê û navê Kurdistanê dipesînê. Bi biryara dadgeha bilind va dê û bavê Kurdistanê digihîjin armanca xwe, Kurdistan jî hêdî hêdî mezin dibe...

Ev nûçe çend roj berê di hemû rojnameyên Tirkîyê da hatibû weşandin. Min bi xwe jî ev nûçe ji wan rojnameyan yekî girt û di Navkurdê da jî weşand.

Ev biryara dadgeha bilind ya Tirkîyê, ne ku tenê ji bo malbata Kurdistanê, ji bo hemû Kurd û Kurdistanîyan jî serfirazîyeke balkêş û bi rûmete...

Bi rastî dema ku min ev nûçe xwend, ez jî qasî dê û bavê Kurdistanê kêfxweş bûm. Ez bawerim, Kurdên ku ev nûçe xwendine, ew jî weke min, bi navê Kurdistanê va dilşa û kêfxweş bû ne.

Mirov dema ku xwedî daw û doz be û li pey doza xwe bikeve, weke malbata Kurdistanê, zû ya jî dereng, di encamê da digihîje armanca xwe.

Armanç, çi dibe bila bibe, ferq nake...

Bese ku di serê mirov da mêtû, di dilê mirov da jî bîr û bawerî kêm nebe ...

Ji vir bist-sî sal berê, Dewleta Tirk ne ku Kurdistan, navên weke Helîn, Şevîn, Berfîn, Şîlan û Zozan, Azad, Welat, Rizgar, Şîyar û Zinar jî qebl nedikir.

Dewlet û berpîrsîyarên dewletê wê demê jî ji malbatên Kurd ra digotin; „Helîn, Şevîn, Berfîn, Şîlan û Zozan nabe, em di şûna wan da Lale û Jale, di şûna Azad, Welat, Rizgar, Şîyar û Zinar da jî Tanju û Tolga bidin“.

Kesên xwedî bîr û bawer, ne Lale û Jale, ne jî Tanju û Tolga qebûl dikirin.

Sedem wê yekê daw û doz dest pê dikir, zarok bi salan bê nav û nasname diman...

Sirf ji bo navên zarokên xwe bi hezaran dê û bavên Kurd ji Dewleta Tirk û polês û memûrên Tirkan zilm û zordarî didîtin. Lê dîsa jî gavên xwe şûnda nediyavêtin, wek dê û bavê Kurdistanê berxwe didan û di encamê da biserdiketin.

Bi saya wan û bi bîr û bawerîyên wan ên xurt va, rê li lêkirina navên Kurdî vebûn.

Ji îro şûnda jî êdî tu kes nikare rê li Kurdistanê û navê wê jî bigre...

Di warê sîyasî da jî Kurd bi piranî wek dê û bavê Kurdis-

tanê difikirin û daxwazên wan ji daxwazên hêz û partîyên Kurd cûdatir in.

Dilê wan ji bo Kurdistaneke serbixwe lêdixe.

Mixabin ew kesên ku li ser navê wan sîyasetê dikin û derdikevin kûçe û kolanan, daxwaz û nêrînên wan didin alîkî, gor dilê xwe diaxifin û tenê daxwazên xwe tînin ziman.

Jibo vê yekê ye ku, gavêk pêşda bavêjin, du gav jî şûnda vedigerin.

Elîf û Yunus bi bîr û bawerîyeke xurt qîmê xwe bi Hêlînê neanîn û Kurdistana xwe bidest xistin!

Hêz û partîyên Kurd jî hê li pey xwe(lî)serîyê ketinê û xwe dixapînin...

19.07.2013

Roj roja serxwebûnê ye!..

Bi destpêka sedsala 21an va bextê Kurdên Başûr guherî,
dawî li bextreşîya wan hat.

Hemû astengên ku ji salan vir da rê li wan girtibûn, roj bi
roj ji holê rabûn.

Çîyayên li pêşîya wan derketibûn, newal û gelîyên kûr bi-
bûn, îro li ber lingên wan dibin deşt û zozan.

Rîya wan rast, bextê wan ve bû...

Bi salan şerê azadî û serxebûnê kirin.

Di her carê da têk çûn û biser neketin.

Mal û milkên xwe, li paş xwe hîştin û bi zar û zêçên xwe
va koçber bûn...

Derketin serê çol û çîyan.

Di rê û dirbên koçberîyê da jîyana xwe derbas kirin.

Ne cîranên wan, ne jî hemolên wan gazî û hewara wan
bihîst.

Di her tengasîyê da, tenê çîyayên Kurdistanê li wan starî
kir...

Kurdên Başûr bi salan tî û birçî man.

Xwe avêtin ber bextê çîyan.

Şev û rojên wan di paşilên çîyan da derbas bûn.

Erd ji wan ra bûn mitêl, asîman jî bûn lihêf.

Lê dîsa jî ji daw û doza xwe derbas nebûn.

Tu car serê xwe li ber neyarên xwe xwar û bîr û ba-
werîyên xwe jî wenda nekirin.

Di her tekçûnê da, dest ji berxwedanê bernedan...

Jin û va hêz û quweta xwe dan ser hev û careke din serî
hildan.

Roj hat, dem û dewran guherî.
Dawî li bextreşîya wan hat.
Şev û rojên ku di tengasîyê da derbas bibûn, li paş man...
Nakokîyên xwe dan alîkî û di bin ala rengîn da bûn yek û
biser ketin...
Sazûmaneke hemdem damezrandin.
Di her xalên jîyanê da, roj bi roj pêş da çûn.
Îro li ser axa xwe, xwedî soz û biryar..
Xwedî jîyaneke dewlemend û bextewar in.
Li pêşîya wan tenê avakirina dewleteke serbixwe maye
ku, ew jî îro bê şer û bê kuştin, wek goga futbolê, hatîyê û
li ber lingên wan sekinîye.
Heger ew vê firsendê bi zanayî bikarbînin û gor wê birya-
ra xwe bidin, ne tenê dîroka xwe, wê dîroka Rojhilata Na-
vîn a qirêj jî ji nûva binivînin...
Dîrok rûpela xwe ya vala vekirîye û li benda biryara rê-
vebirên Kurd sekinîye...
Ji ber ku roj roja biryara dîrokî...
Dem dema serxwebûnê ye!..
26.06.2014

Şahîyek çandî û civakî: Dawet

Di nav Kurdan da şahîya dawetê xwedî cîhekî girîng e. Bi taybetî jî ji bo dê û bavê zava. Her dê û bav, bi xewn û xeyalên zewicandinê zarên xwe yên lawîn mezin dikin. Di jîyana gundan ya salan berê da kîjan dê û bav bibana xwedî zarokêkî lawîn, ji roja ewil da xewn û xeyalên wan ên li ser şahîya sunet û daweta lawê wan dest pê dikir. Gelo lawê xwe di hembêza kî dabidin sunetkirinê û bi kê ra bizewicînin. Daxwazên wan weke daxwazên dê û bavên îro ne xwendineke bilind ne jî bidestxistina karekî baş bû...

Ji bo wê yekê piranîya zarên lawîn hê çavê xwe li dinê venedikirin, qedera wan ji alî dê û bavê wan va dihat nivîsandin. Dê û bav bêşîga lawê xwe, ya bi ya dotmameka wî ra ya jî bi ya qîza hevalêkî xwe ra kert dikirin û di 14-15 salîya wî da jî, ew dizewicandin. Ji der dora xwe ra jî digotin: „Hê çavê wî vnebûye, me ew bi serî û go kir.“

Dema ku demsala payîzê deqedîya û zivistan dest pê dikir, kar û barê giran xilas dibûn, dê û bavê xortan li der dora xwe digerîyan. Heger li der dora wan keçikeka bi dilê wan heba, ji lawê xwe ra dixwestin û di payîza pêş da jî daweta wî dikirin. Li derdora wan qîzek gor dilê wan tuneba, wê gavê jî li hêvîya zivistaneka din diman.

Ji bo vê yekê jî digotin, zivistan demsala qîzxwestinê, bihar demsala nîşanê, payîz jî demsala dawetê ye. Demsala zivistanê qîz dixwestin û qelinê wê dibirîn, di demsala biharê da şîranîya wan didan. Malbata zava, heger heta dawîya havînê qelin berhev bikira û daxwazên malbata

bûkê bianîya cîh, dê û bavê bûkê jî dest bi amadekirina dawetê dikirin.

Piştî amadebûna dawetê, herdu alî dihatin ba hev û di navbera xwe da roja dawetê dibirîn. Malbatên herdu alîyan, ji bo vexwendina dawetê ji hemû eqreba, nas û cînarên xwe ra mûm dişandin. Ji kuderê tê nizanim, ji dawetnameyê ra mûm dıgotin. Mûm carcaran şekirekî papîroz, carcaran paketek cixare, ji bo eqrebayên giregir jî pez û dewar bûn...

Şahîya dawetê, gorî rewşa aboriya herdu alîya dihat amadekirin. Carcaran heftekî, carcaran jî mehekî pêşta li mala bûkê hevalên bûkê, li mala zava jî hevalên wî, êvaran dihatin ba hev û govend digerandin. Heger mala bûk û zava di gundekî da ba, roja hinê, lê ji dûr ve ba duh roj berê xwendî û berbûyên dawetê li derê mala bavê zava dihatin ba hev, li hespên xwe sîyar dibûn û diçûn gundê mala bavê bûkê. Li wir, xwendi li malên eqrebayên bûkê, berbû jî li mala bavê bûkê dibûn mevan. Roja yekem bi çûyin û hatinê ve derbas dibû. Roja duyem, ji danê sibê va şahîya dawetê li mala ku serê bûkê tê da dihat şûstin, dest pê dikir. Ber bi danê êvarê bûk ji ji mala serşûştinê derdixistin û dianîn mala bavê wî, dû ra li wir şahî berde-wam dikir û destê bûkê dihat hinekirin. Desthinekirina zava jî di eynî rojê da li mala birazava, dest pê dikir.

Piştî hinê li mala bûkê sinîyek ji bo xelatan dihat xemilandin. Berê, dê û bavê bûk û zava, pişt ra berbû, li pê berbûyan jî eqreba û nas û cînarên malbata bûkê xelatên xwe diavêtin ser sinîya xemilandî. Xelatên eqrebeyan bi piranî zêr û pere, xelatên din jî ji qûmaş û eşyayên malan pêk dihatin. Dema ku dayîna xelatan diqedîya, disa govend dîsa saz dibû û heya nivê şevê dikudand.

Sibetirê berbû û hevalên bûkê, bûk dixemilandin, kincê wê yê herî baş lêdikirin. Ser kincên wê da xêliya wê, xêliya ku ji şarên sor û zer û kesk pêk dihatin, diavêtin

ser serê bûkê û bûk amade dikirin. Dema ku bûk ber bi derîyê pêş dihat, birayekî wê diket pişt derî û ji bo vekirina derî, ji bavê zava ya jî ji xwendîyek xelatek dixwest. Ji wê xelatê ra jî digotin xelata pişt derî. Xelat dihat dayîn, derî vedibû, bûk bi berbûyan ra derdiket derva û bi alîkarîya hevalên wê, li hespê xemilandî dihat sîyarkirin. Ji danê sibê va hemû xwendî û eqrebayên bûkê li derê mala bavê bûkê dicivîyan û bi klam û stranên bûk ji mala bavê wê derdixistin, li hespa xemilandî sîyar dikirin û berê xwe didan ber bi gundê zava û bi rê diketin. Dema ku rê nivî dibû, li ser kanîyekê ya jî li ber devê çemekî radiwestîyan û xwerina ku jê ra biryan dogotin dixwêrin. Piştî xwerinê careke din li hespên xwe sîyar dibûn û bi rê diketin. Di nav xwendîya da yê ku sîyarê hespên herî bibeze, ji bo qasidîya dawetê didan berhev û ber bi gundê zava hespên xwe dibezandin. Yê ku berê xwe digihîşt gund, agahîya nêzîkbûna alaya dawetê dida zava û birazava. Ji malbata zava qîzekê sê şahr – ji rengên kesk û sor û zer- li hev badida û li histûyê hespê qasid girê dida. Qasid jî xelata xwe ji birazava digirt û şûn va ber bi alaya dawetê vedigerîya û hespê xwe dibezand.

Gava ku bûk nêzîkî mala zava dibû, hevalên zava jî wî derdixistin ser xanî û li benda hatina bûkê disekinîn. Ji malbata zava jinekê sîtileka mezin devarû dadanî ber derî û kevçîyek dar dida ser sîtilê. Bûk dihat, ji hesp peya dibû û derdiket ser sîtilê. Bi lingekî xwe li kevçî dixist û dişikand.

Di heman demê da, zava li ser sivderê sêva zavatiyê diavêt li serê bûkê dixist, birazava jî sahaneka ku çerez tê da, di ser serê bûkê ra dirişand. Bûk derbasî malê dibû, zava û hevalên xwe jî ber bi mala birazava direvîyan. Zarokên gund parçeyên sêvê û çerezê ku di ser serê bûkê ra hatibû rişandin, ji erdê berhev dikirin. Xwendî jî şeşagirên xwe ji ber xwe dikişandin, guleyên di şarjorê da, ber bi ezman-

an berdidan û vala dikirin. Pişt ra li dû zava û hevalên wî diketin û wan ditirsandin.

Qîz û bûkê gund li ba bûkê, xort jî li ba zava dicivîyan, govend digerlandin û heta nivê şevê dileyîstî. Bi nivê seve ra hemû beşdervanên şahîyê dikişîyan malên xwe. Hevalên zava jî diketin milê wî ew heta derê mala bavê wî dibirin. Derî vedibû, zava derbasî hundurê malê dibû û ew jî şûnda vedigerîyan. Ji wê seve ra digotin şeva gerdegê.

Roja din sandîqa cêhêzê bûkê dihate vekirin. Xwesîya bûkê cêhêzê ku di sanduqa bûkê da bicîhkirî yekoyek derdixist, bi berbûyan ra biryar digirt û ji her xwendîyekî ra tişteki dişand.

Xelatên xwendîya, gorî eqrebatî û rûmetîya wan dihat guhartin. Ji para hinekan ra cotek goreyê rîs, ji para hinekan ra jî ji bo kiras û derpê çend mêtire qumaşê sipî yê ku jê ra kaxitbêzî digotin, diket.

Xwedîye davetê û xwendîyan tu carî hesabê xelatan nedikirin. Carcaran gilî û gazin ji hev bikirabana jî, di demeke kurt da dihat jibîrkin.

Dawetên berê yên Kurdên ku di gundan da dijîyan, kêm zêde bi vî awayî bûn. Dawetên Kurdên bajêrî jî ji yên gundan zêde cûdatir nebûn...

Li welêt îro jî ji bingeha wan zêde tişt nehatîye guhartin. Tenê îro şûna dengbêjan teyîb û orkestra girtîye, ji bo çûyîn û hatinê jî, şûna hespan otomobîl tînen bikar anîn.

Lê ji bo pîranîya Kurden li derveyî welat dijîn, ev şahîya çandî û civakî bûye weke şahîyekî bazirganî.

Dawetên Kurdên li derveyî welat çawa dibin, ezê bi kurtayî qala wan jî bikim.

Heger bûk û zava herdu jî li dervayî welat bin, carek, jî wan yek li welat be, dawetê dubare dikin. Dema dawetê jî ne gorî rewşa aborîya herdu alîyan, gorî rewşa dawetvanan tê kifş kirin. Ji bo wê yekê jî dawetên li dervayî welat

di mehên biharê, an jî di mehên payîzê da tîn kirin. Weke mîsal, tu kes di demsala havînê da dawetê nake, ji ber ku di wan mehan da herkes diçe betlanê, ya jî diçe welat...

Roja dawetê, ji mehan berê tê kifş kirin. Malbata zava dawetnameyên (mûmê) xwe belav dike û gorî listeya dawetvanan, kesên ku tîn û çî xelatan tînin beri dawetê yekoyek hesab dike.

Dawet di saloneke mezin da, roja inê ya jî roja şemîyê, danê êvarê dest pê dike û di nivê şevê da jî diqedê.

Muzîka dawetê jî gorî rewşa xwedîyên dawetê Kurdî û tirkî tevlihev ya jî tenê Kurdî ye. Lê ziman çî dibe bila bibe, bê istîsna komên muzîkê berê bi kilamê gelêrî dest pê dikin.

Bi hatina bûk û zava ra mûzîkê diguherînin ser meqamê walsê. Piştî dansa bûk û zava hêdî hêdî bi Tirkî ya jî bi Kurdî hinek kilamên tuj tîn gotin û dawîya wan bi hinek marşên siyasî va tê girêdan. Kesên ku di govendê da direqisîn, tu tiştêkî ji muzîkê fam nekin jî, gorî rîtmê muzîkê xwe çep û rast dihejînin.

Piştî xelatdayînê, meqam û zimanê muzîkê jî tê guhartin. Di dawîya şahîyê da muzîka mirtiban (roman) dest pê dike. Hemû kes li ser dîkê cîyê xwe digrin û gorî reqsa mirtiban xwe li ba dikin.

Ber bi nivê şevê herkes berê xwe dide mala xwe, lê karê dê û bavê zava heya destê sibê didome. Ew, weke bûk û zava nakevin gerdegê, le belê karê wan ji karê bûk zava jî girantir e!

Dema ku dayîna xelatan dest pê dike, mirovekî navê xwedîyê xelatan û çî anîne li ser kaxizekê dinivîse, heger xelat bazin be, mirovekî din jî li ser du etîketên piçûk reqemek dinivîse, yekî li ser bazina zêr dixê, ya din jî li ser lista xelata, li ber navê ku kê anîye, dizeliqîne.

Dê û bavê zava piştî xelatdayînê tûrik û listeya xelatan û kasêtên kamerayê digrin, berê xwe didin mala xwe. Tû-

rikê xelatan li ser masa nanxwerinê vala dikin û xelatan didin ser alîyekî masê, terazîya zêr û makîna ku perê sexte pê tèn kifşkirin jî tînin, datinin ser alîyekî din ê masê! Lîsteya xelatan didin ber xwe.

Berê bazinan (zêran) yekoyek diwezinînin, yên ku bazinên avzêrkirî ya jî yên sivik anîne, gorî reqema ku li ser bazin xistine, tespît dikin û li ser kaxizeka vala dinivîsînin. Dû ra perê xwe yek û yek di makînê ra derbas dikin. Heger di nav da pereyên qelb derkevin, wan ji gorî têkilîyên xwe û dawetvanan, kî anîbe texmîn dikin û li alîkî din dinivîsînin. Piştî karê xwe yê jibo tomarkirina zêr û pereyan kaseta videoyê ya ku di dawetê da hatîye kişandin, diavêjin ser televizyonê û ji serê dawetê heya dawîya dawetê lê temaşe dikin. Bi temaşekirina kasêtê va, dawetvanên ku hatibin û xelat nedabin, wan jî bi temaşekirina kasetê va tespît dikin.

Bi destpêka danê sibê ra, dest diavêjin telefonê û li eqreba û nas û cînarên xwe digerin. Kî ku telefonê rabike, rasterast di derheqê dawetvanên ku gor dilê wan xelat neanîne da, çavê xwe digrin û devê xwe vedikin...

Roja bazarê, bê xew, bê xwerin û vexwerin derbas dikin. Dawet diqede, sal û demsal derbas dibin, bûk û zava dibin xwedî zar û zêç, şahîya daweta wan tê ji bîr kirin, lê lîsta xelatan, heta roja mirinê jî, ji alî dê û bavê bûk û zava va tê parastin...

01.07.2005

Cejna qurbanê û civat...

Piçûktîya min li gund derbas bû. Cejnên cîvakî yên olî, bi taybetî cejna qurbanê di van salên dawî da çawa derbas dibe, nizanim. Lê berê ew di civat gundan da xwedî cîhekî gring bûn. Ji bo hemu kesan wateyek wan hebûn.

Ji bo jinan, roja çêkirina xwerinên xweş...

Ji bo mêran, roja lihevhatinê...

Ji bo kal û pîran roja tobedarîyê û serjêkirina qurbanê...

Ji bo zarokan jî bidestxistina kincên nû, berhevkirina fêkî û lîstikê bû.

Dema ku cejna qurbanê nêzik dibû, hemû kesan roj dijmartin û ji bo derbasbûna cejneke bi kêf û xweş xwe amade dikirin.

Daxwazên kal û pîran ji bo qurbanîyê beranek qerqaş, yên zarokan jî, ji dê û bavan daxwaza kincên nû bûn. Ji bo bicîhanîna daxwazên xwe kal û pîran ji xwedê ra dua, zarokan jî lavayê dê û bavê xwe dikirin.

Roja berîya eydê, roja erefatê, xew nediket çavê tu kesî.

Malîvan ji êvar da tendûr dadidan û ji êvarê hata berbanga serê sibê xwerin çê dikirin û nan dipêjandin. Serê sibê bi ava ku li ser tendûrê dikelîya, ser û guhê zarokan dişûştin.

Kal û pîr wê şevê, beranên ku ji bo wan dihatin serjêkirin, dianîn li pişt derîyê odê an jî li kuncukekî aşxanê girê didan û wê şevê bi qurbana xwe ra derbas dikirin.

Zarok jî kincên xwe yên nû digirtin bi tewnek qat qat dikirin û didan kêleka nivînên xwe. Dû ra sere xwe didan ser balgîyê û diketin nav xewn û xeyalan. Xeyalên li ser

roja cejnê xewa wan direvand û di nav nivînên xwe da heta serê sibê dilivîyan.

Bi dengê dîkê sibê ra hemû zar û zêç, kal û pîr û jin û mêr radibûn, dest û rûyê xwe dişûştin û ji bo pîrozkirina cejna qurbanê xwe amade dikirin.

Mezinan ji bo nimêja eydê berê xwe didan mizgeftê.

Jinan mal berhev dikirin û ji bo xwerin û vexwerinê hazirîya xwe dikirin.

Zarok jî, ji bo destpêkirina gera nav gund bê sebr û bê tebat li der dora xwe diçûn û dihatin.

Piştî nimêja eydê mêr ji mizgeftê derdiketin û pîrozbahîya cejnê jî dest pê dikir. Li ber derê camîyê pîrozbahîya cejnê li hev dikirin û qefle bi qefle berê xwe didan malên mezinan.

Piştî xwerin û vexwerinê, zarok ji malan derdiketin û li hev dicivîyan. Kom bi kom bi rê diketin û ji alîkî gund va dest pê dikirin, mal bi mal digerrîyan û ji aliyê din ra derdiketin. Dema ku gera wan diqedîya, dihatin ba hev û rewşa jinên gund dinirxandin.

Yekî digot; „jina filankesê pir tema ye, hêcîrek nîvi kir û nîvê wê dirêjî min kir, min jî nivê hêcîrê girt û şûnda avêt ser serê wê û bi lez û bez revîyam“.

Yekî din jî digot; „jina bêvankêsê gelek baş bû, kulma xwe tijî guz kir û anî avêt nav torbê eydanîya min“.

Ev pesn û laqirdîyên di derheqê jinên gund da dihatin kirin, di nav gund da wek ajansên radyoyê belav dibûn.

Piştî nîvroyê beran bi şarên kesk û sor û zer va dihatin xemilandin û pişt ra di nav gund da dihatin gerandin. Xwedîyê qurbanan kêrên xwe tûj dikirin û ji bo serjêkirina beranan amade dibûn.

Beran dianîn ber derê malê û berê bi hevsar lingên wi bihev ra girê didan. Cendekî wî davêtin erdê û berê wî didan qulbê. Wê demê hemû zarokên malê li der dora beran dicivîyan. Yê ku beran serjêdikir, di guhê wî da hinek

ayet dixwand û kêr davêt qirika beran.

Di nav çen sanîyeyan da xwîn ji qirka beran dikişîya, mezinê malê dihat tilîya xwe ya eşhedê di xwîna beran da dikir û yekoyek enîya zarokan bi xwîna gewez dideqand. Qurban berê dihat gurandin û pişt ra goştê wî bi hestîyan va dihat parçekirin.

Di gund da çiqwas mal hebûna, goştê qurbanê gor hêjmarra wan dihat parve kirin û para her malekî dihat dayîn.

Piştî belavkirinê goştê qurbanê, zarok li ser xanîyan, an jî li ber derê malan dihatin ba hev û li ser guzên eydanîyê dest bi lîstikê dikirin.

Listîka li ser guzan heta êvarê dikudîya. Zarokên ku di encama listîkê da biser diketin, guzên xwe digirtin û bi rûken berê xwe didan malên xwe. Yên ku wenda dikirin ew jî, bi kor û poşman kortika histuyê xwe dixwirandin û bi gavên sivik û bi dilekî xemgîn hêdî hêdî ber bi malên xwe diçûn û ji bo cejna ku salek şûnda were, dest bi xeyala li ser lîstikên nû dikirin...

Cejnên berê bi kurtayî wusa derbas dibûn. Lê îro çawa tîrên pîrozkirin, ez nizanîm.

Lê ez bawerîm îro ji bo zarokan jî tu qedr û qîmeta guz û hêcîran ne maye. Li ba wan jî şûna guz û hêcîran dîyarîyên elektronîk û pere girtî ne...

16.11.2010

Cejna remezanê û piçûktîya min...

Gelek rojnamevan û nivîskar di van rojên taybet da qala piçûktîya xwe dikin û bîranînên xwe, bi derdorên xwe û xwendevanên xwe ra parva dikin. Ji van rojên taybet yek jî roja cejna rojîyê (remezanê) ye. Îsal jî min ev cejn li der-vayî welat derbas kir û tu haya min ji hatina wê jî, ji pîrozkirina wê jî nebû. Gor kesên bawermend cejn, sê rojan tê pîrozkirin. Di roja yekemîn da, ji destê sibê va zengilê telefona min dest pê kir û hata evarê lêxist.

Li welatê xerîb û ji pîrozkirina cejnê dûr, ketim nav xewn xeyalan. Xewn û xeyalên li ser rojên zarokatîya xwe...

Sedem vê yekê, min xwest ku, ez jî bîranînên xwe yên di derheqê cejna rojîyê ya di dema zaroktîya xwe da, bini-vîsnim û parve bikim, ew çiqas wek bîranînên nivîskar û rijnamevanên bi nav û deng, dewlemend û rengîn nebin jî...

Qasî ku tê bîra min, meha remezanê ji bo mezinan meha ibadetê, ji bo zarokan jî meha lîstik û şahîyê bu. Em zarok jî weke mezinan her şev radibûn paşîvê û paşîv dixwer. Weke mirovên rojî digirt, êvarê jî li ber sifra fitarê rûdiniştin û ji bo xwerina fitarê, bê sebr û tebat li benda azana mele disekinîn.

Di meha rojîyê da, heger demsal havîn ba, gundi kêr dixebitîn. Ji sedem birçîbûnê ji qidûm da diketin û karê xwe zû berdidan. Dema ku mezin kêr bixebitîyana, zarokên ku bi dê û bavê xwe ra kar dikirin, ew jî kêr dixebitîn û dema wan a vala zêde dibû, ku wê jî bi lîstikê derbas dikirin.

Di navbera rojê da heger heba, kar û barên xwe yên pêwîst dianîn cîh û dest bi listîkê dikirin, listîka bi kap an. Ber bi êvarê listîka bi navê „birr“ ê, piştî vekirina fitarê, di tarîya şevê da jî çavçirtonek dilîstin. Ji bo çavçirtonekê zarok dibûn du kom. Komek ji zarokan çavê xwe digirtin, yên din jî xwe vedişartin. Piştra yên çavgirtî, çavê xwe vedikirin û li yên xwe veşartibûn, digerîyan. Kîjan kom berê bihata cîyê destpêka listîkê, ew kom di listîkê da biser diket. Ev listîk heta dema paşîvê dikudîya.

Mer û xort jî piştî fitarê diçûn, di camîya gund da nimêja terawîyan dikirin û piştî nimêjê jî li odeyên mêra kom dibûn. Dema wan a heta paşîvê jî wek bi kêf û eşq derbas dibû. Ji wan hinekan kişik dileyîstin, hinekan jî listîkên nû ji xwe ra icat dikirin û dema xwe pê derbas dikirin.

Di wan salan da, weke nuha kesî rojî li zarokên xwe ferz nedikir. Zarokên ku hê kamil nebibûn, gor nerazîbûna dê û bavê xwe rojî digirtin ku, wê yekê jî ji bo xwe girîng didîtin. Di navbera zarokan da girtina rojîyê, wek şertê mezinahîyê dihat hesibandin. Jibo zêdegirtina rojîyê bi hev ra diketin berebezîyê.

Heger ku pêbîhesîyana, dê û bav, gazî zarokên xwe dikirin û bi destê zorê nan û av didan wan û ji wan ra digotin; „hûn kîngê reşît bûn, wê demê rojîyê bigrin, lewra girtina rojîyê hê ji we ra ferz nîne.“

Dîsa jî ji bo îspatkirina mezinahîya xwe hinek zarokên gund rojî ne girtibana jî, ji hevalên xwe ra digotin; „em bi rojîne.“

Lê piranîya zarokan du rojên dawîyê, ji wan ra jî digotin, roja şerefat û erefatê, rojî digirtin, ku dê û bavê tu kesî jî ji bo du rojên dawîyê li dijberî rojîgirtina wan dernediketin.

Di her du rojên dawîyê da ji bo hemû zarokan kelecaneke dest pê dikir ku ev jî tu car nayê tarîf kirin...

Sedema kelecana wan yek ew bû, ku di di roja şerefatê

da, berîya nanê êvarê ji mezinan wek dîyarîya fitarê, fêkî digirtin û di mal da jî jî bo wan xwerinên herî xweş dihat çêkirin.

Roja erefatê jî dê û bav kincên nû dîyarî zarokên xwe dikirin, ku ew bi kincên xwe yên nû di roja cejnê da xwe dixemilandin.

Kelecaneke zarokan yek jî xewn û xeyalên li ser fêkîyên ku roja cejnê ji jinên gund weke dîyarî bigirin, bûn. Ji bo vê yekê rojên dawîyê zû derbas nedibûn. Heta dema paşîvê dilîstin, piştî paşîvê jî xew nediket çavê wan. Dema biketana nav nivînan, wê gavê jî xewnên li ser dîyarîyên cejnê dest pê dikir.

Roja dawîyê, roja erefatê, jinên gund ji bo amadekirina xwerin û vexwerina cejnê, tendûrên xwe ji zû va dadidan, dest bi çêkirina zad û şêrînayîyan dikirin. Mêr û xortan jî ser û gohên xwe dişûştin û ji zû va berê xwe didan camîyê û ji bo nimêja cejnê bi rê diketin.

Zarok jî kincên xwe yên nû, yên ku kincên wan yên nû tu-neba, ew jî kincên xwe yên şûştî li xwe dikirin û li benda dawîlihatina nimêja cejnê disekinîn.

Piştî nimeja cejnê, pîrozbahî dest pê dikir, ku berê mêr û xortên ku ji camîyê derdiketin pîrozbahî li hev dikirin, dû ra jî zarok jî diçûn destê wan û li nav gund belav dibûn. Ji serîkî gund va dest pê dikirin, mal bi mal digerîyan û ji serê din va derdiketin.

Gera nav gund kom bi kom dest pê dikir. Hinekan ji alî jorî gund va dest bi gerê dikir, hinekan jî ji alî jêrî gund va. Mal bi mal digerîyan, di ser tu malekî ra derbas nedibûn...

Ji berê da, di navbera xwe da biryar digirtin ku ewê destê kîjan jinên gund ramûsin, ji kîjan jinan dûr bisekinin. Ji bo vê yekê, carcaran di navbera xwe da diketin gengeşîyê. Jiber ku, pîvana destramûsana wan, gorî fêkiyên ku malîvana malê dide wan, dihat guhartin. Lê berî destpêkirina

gera cejnê, dizanibûn ku ewê ji kîjan malê û ji destê kîjan jinê çi bistînin.

Ji bo jinên tima navbera xwe da pîlan û programên cûda çê dikirin. Ji hev ra digotin, "heger jina felankesê dîsa serê me heryekê hêcîrek genî bide, emê hêcîrên wê yên genî bigrin û ser serên wê ra bireşinin."

Carcaran jî temîyên xwe li hev dikirin û ji hev ra digotin; „ji bîr meke heger tu herî destê jina bêvankesê ewê lepa xwe tijî gûz bike û di tûrikê te da vala bike."

Hemû axaftinên zarokan yên di roja cejnê da dihatin kirin, li ser timatî û destvekirîtîya jinên gund bûn.

Piştî gera cejnê, fêkîyên ku berhevkiribûn, di kuncikekî malê da vedişartin û bi lez û bez xwe diavêtin meydana gûnd û digihîşin hev.

Di derheqê dîyarîyên xwe û jinên gund da diketin nav axaftineke kûr û dûr. Pesnê jinên destvekirî didan, ji bo jinên tima jî çi bihata devê wan digotin û ji wan ra didan xebera.

Heger demsal payîz û zivistan ba, li ser cemed a çem, bihar û havîn ba, li ser xanîyan û li ber derê malan kom dibûn. Di her sê rojên cejnê da, li ser guzên ku ji nav gund berhevkiribûn, dileyîstin...

Bê tirs û xofa ji dê û bavan....

05.11.2005

Destpêk û dawî...

Her destpêk bi dawîyeke diqede.

Ne destpêk bê dawî dibe, ne jî dawî bê despêk dest pêdike.

Destpêk û dawî bi hev ra girêdayî ne.

Ev zagonêk ji zagonên sirûştî (tabiet) ye.

Wek bûyîn û mirin.

Hemû tiştên ku di xwezayê da tînan ew jî, wek bûyîna mirovan, destpêkekî wan he ye.

Ew jî bi awayekî dibin, gor xisûsîyetên xwe jîyaneke kin ya dirêj didomînin û dimrin.

Di navbera wan da cûdatîyek hebe ew jî, zemanê di navbera destpêk û dawîya wan da ye.

Ji bo mirovan ew dem, li hinek cîhan kêmasî penceh sal, herî dirêj jî sed sal e.

Ji bo nebatan demsalek e.

Weke tiştên zindî, organîzasyonên civakî jî xwedî destpêk û dawî ne.

Ji wan organîzasyonan yek jî dewlet e.

Ji bo dewletek damezrandin bûyin be, hilweşandina wê jî mirin e.

Di dîroka mirovatîyê da heta roja îro bi hezaran dewlet hatin damezrandin. Bihêz bûn, sînoren xwe fireh kirin. Roj hat doza desthilatdarîya cîhanê kirin. Roj hat, dema wan qedîya û yekoyek hilweşîyan.

Ji wan dewletan yek jî Imparatorîya Osmanîyan bû. Wek dewletekî piçûk hate damezrandin, roj bi roj, sal bi sal mezin bû. Desthilatdarîya wî şesed salî zêdetir kudîya. Lê

rojek hat emrê wî jî qedîya û hilweşîya. Piştî hilweşandi-
na wê, li ser beşek axa wê dewleta Tirk hate damezran-
din.

Ew jî 90 sale, bi zilm û zordarîyê hebûna xwe didomîne.
Ji destpêka wê hata roja îro zilma herî mezin gelê Kurd
jê dit.

Ew zilm û zordarîya bê pîvan dest pê kir, îro jî bi awayeke
din didome.

Li dijî vê zilmê gelê Kurd tu car bê deng nema. Di her
demê da sere xwe ra kir û dijî wê zilmê derket. Di vî warî
da bedelekî mezin da û di gelek xalan da jî bi ser ket.

Lê ji bo jîyaneke azad û bi rûmet hê rêyek dûr û dirêj li
pêşîya gelê Kurd he ye. Ji bo gihîştina encamê jî bir û ba-
werîyeke xurt pêwîst e.

Lewra weke destpêka wê, dawîya zilm û zordarîye wê jî
he ye

Tenê ji bo Xwedê dibêjin, bê destpêk û bê dawî ye. Ew
hertim, li her derê hazir û nazir e. Ev xisûsiyeta ji bo Xwe-
dê tê gotin, ne tenê di ola islamê da, di hemû kitêbên mu-
qwdes da jî cîh digre. Hemû ol bi vî awayî Xwedê bi nav
dikin, ku, ji bo rastî û nerastîya vê mijarê jî lekolînek kûr
û dûr pêwîst e.

Ez ji bo Xwedê tiştê nabêjim, lê gor nêrîna min ji bilî
Xwedê li vê dinê tiştêkî bê destpêk û dawî hebe ew jî, bîr
û bawerî ne.

Ji ber vê yekê ye ku dibêjin bir û bawerî hîmê hebûna
mirov û sedema jîyanê ye.

Kurdno, bîr û bawerîyên xwe wenda nekin...

Emê jî rojek azad û rûken bin!..

31.12.2010

Serê salê binê salê...

Îro ji emrê me salek dîsa kêr dibe. Sala kevn diqede û saleke nû dest pê dike, bi bîr û bawerîyên nû û bi daxwazên nû...

Qasi ku tê zanîn, ji destpêka dîroka mirovatîyê vir da, serê salê li her deverên dinê bi şahîyan va tê pîroz kirin. Mexseda vê pîrozbahîyê jî ewe ku, dibêjin, destpêk bi çi awayî derbas bibe, hemû rojên heta dawîyê jî jî bi wî awayî derbas dibin...

Halbûkî roja 31ê meha Kanunê çiqwas serê salê be, ewqas jî dawîya salê ye.

Lê mirov her tim piştî xwe dide paşerojê û li pêşerojê dinihêr e...

Lewra pêşeroj, bingeha bîr û bawerîyê ye.

Jiber ku jîyana bê bîr û bawerî, çiqwas vik û vala be, bîr û bawerîyên ji pêşerojê dûr jî ewqas bê wate ne.

Sedem vê yekê ye ku zar û zêç, qîz û xort, jin û mêr û kal û pîr, bi bîr û bawerîyên xweyên nû şahîya serê salê dixemlînin...

Mixabin hinek bi qedandina sala kevn va xemgîn, hinek jî bi destpêka sala nû va kêfxweş û dilşa dibin.

Hinek di malên xwe da, li ber televîzyonê rûdinên, hinek jî bi mabesta betlana serê salê li peravên germ, an jî li serê çîyayên bilind pêşwazî li sala nû dikin...

Bi destpêka sala nû va bîr û bawerî xurt dibin.

Xewn û xeyalên nû dest pê dikin...

Kurd jî weke gele cîhanê roja serê salê pîroz dikin.

Ez li ku dibim bila bibim, dema ku serê salê tê, piçûktîya

min dikeve bîra min û şahîyên ku wê demê, di nav gunda, ji alî xortên gund va dihatin lidarxistin di ber çavên min ra derbas dibin.

Ew şahîyên bi kêf û eşq...

Kilam û stranên wan û lîstikên wan ên bi ken û henek...

Xortên gundan ji bo pîrozbahîya serê salê bi rojan berê xwe amade dikirin.

Roja dawîya sala kevn hemû xortên gund di malekê da kom dibûn. Şikl û şemalê xwe diguherandin, ji bo pêşandina hunerên xwe bi dil û can dixebitîn.

Hinekan kincên pîrejînan li xwe dikirin, dev û lêvên xwe digirtin û bi laçik û egalan serê xwe girê didan. Hinekan jî şal û şapikên kalemêran li xwe dikirin, ji postên bizinan ji xwe ra simêl û rûyê dirêj çêdikirin û kolozên ji hirîya tiftik çêkirî, didan serê xwe. Silmikên ji qirş û qalan, li serê darên dirêj va çik dikirin. Her yekî darekî dikir destê xwe, mal bi mal digerîyan û gund ser û binê hev dikirin.

Biçûyana ber derê kîjan malê, berê diketin destê hev, bi hev ra kilam û stran digotin û direqisîn. Zarok li derdora wan kom dibûn, kal û pîr xwe didan ber pencerê odeyan, guhê xwe didan kilam û stranên wan û li reqasa wan temaşê dikirin.

Bermalîya malê jî diket kulînê, xwerin û vexwerin dianî û dîyarî wan dikir.

Ji hinek malan mirîşk, ji hinek malan hêk, ji hinek malan jî rûn û ard, nan û mast werdigirtin û berê xwe didan maleke din.

Heger dîyarî ya bermalîya malê gor dilê wan ba, kêfxweş dibûn. Kêfxweşîya xwe, bi dengê bilind dianîn ziman û digotin:

„Serê salê, bine salê, Xwede bihelê kevaniya vê malê...“

Heger dîyarî bi dilê wan neba, wê gavê jî ji derî dûr diketin û diqêrîyan:

„Serê salê, binê salê, Xwedê hêwîyê bine ser jina vê malê...“

Heger di malê da qizên xama û xortên ezeb hebana, gor wê yekê jî dogotin:

„Serê salê, binê salê, Xwedê veke qedera qîz û xortên vê malê...”

Carcaran jî qîlf û henekên xwe bi malîvan û malxoyê malê dikirin û digotin:

„Serê salê, bine salê, em bi qurbana kalê vê malê...”

Serê salê, binê salê, Xwedê kûpekî zêr bide jina vê malê...”

Bi vî awayî, xortên gund bi tarîya êvarê ra dest bi gera nav gund dikirin û hata nîvê şevê mal bi mal digerîyan.

Di dawîya şevê da, diçûn di malekî da lihev dicivîyan. Ji xwe ra, bi tiştên ku ji nav gund berhev kiribûn xwerin û vexwerin çê dikirin, heta serê sibê bi kilam û stranan, bi lîstik û bi ken û henekan şahîya serê salê didomandin.

Şahîya serê salê wê şevê diqedîya, lê ew xortên ku mal bi mal digerîyan û di derheqê pîrejî û kalemêrên gund da qîlf û henekên nû derdixistin û di nav gund da vedigotin, heta dawîya sala nû dikudîya...

Sal û demsal derbas bûn, ew şahîyen berê jî hêdî hêdî hatin jibîrkin û wenda bûn...

Weke gelek orf û edetên civakî şahîya serê salê, di gundan da jî hate guhartin.

Kurdên gundî jî îro weke Kurdên bajarî di malên xwe da, li ber qutîya televîzyonê rudinên û bi temaşekirina bernameyên televîzyonê sersala xwe derbas dikin.

Sedem vê yekê ye ku, ne şahîyên taybetî ne jî qîlf û henekên berê man...

Ji bo bîranên ew rojên bi kêf û hinek derbas dibûn, dibêjim:

Serê salê, binê salê, di sala nû da Xwedê fam û ferasetê bide ew Kurdên ku hê bi zimanê neyarên xwe diaxifin û wî dikin nav malê...

31.12.2013

Newroz

Meha Adarê di dîroka gelê Kurd de mehegî gelek girîng e.

Adar meha şin û şahîyê...

Meha serhildan û berxwedanê ye...

Meha jenosîd û koçberîyê...

Meha newrozê ye...

Newroz, destpêka jîyanek nû ye...

Adar meha şinê ye.

Jiber ku, di vê mehê da Berzanîyê nemir, di yekê Adarê sala 1979an da ji welatê xwe dûr, li sirgûnê çû ser dilovanîya xwe...

Serokê serhildana Agirî Îhsan Nûrî Paşa, di roja 25ê Adar a 1976an da li Îranê hate kuştin.

Serokê Komara Mahabad Qazî Mihemed û sê hevalên wî 31ê Adar a 1947an da, li meydana Çarçira bi destê rejima

Îranê ya qirêj hatin dardakirin

Adar meha jenosîdê ye...

Jiber ku, roja 16ê Adar a 1988an da li bajarê Helepçê 5000 Kurd ji alî Saddam Huseyn, bi çekên kimyewî va hatin kuştin, bi hezaran zarok, jin û mêr jî hatin birîndarkirin.

Di Adar a 18991an da bi hezaran kurd ji zilm û zordarîya rejima Baas mal û milkê xwe li paş xwe hîştin û xwe avêtên serê çol û çîyan.

Adar meha serhildan û berxwedanê ye...

Jiber ku, Gelê Kurd roja 21ê Adarê, di bin serokatîya Kawayê Hesinkar da, li dijî zilma Dehaqê xwînxwer serî hilda û dawî li zordarîya wî anî. Ew roj bi agirê newrozê, li

kolanên bajaran, li gundan û li serê çîyan wek roja dest-
pêka jîyaneke nû hate pîrozkirin.

Ji wê demê vir da roja 21ê Adarê her sal bi kilam û stran-
an, bi dîlana mêr û jinan, bi reqasa keç û xortan, di bin
ronahîya agirê newrozê da tê pîrozkirin.

Serhildana Koçgirî û serhildana Dersimê di vê mehê da
destpêkir in.

Adar meha newrozê ye...

Ji sedsalan vir da Gelê Kurd kîngê ku hewl dida xwe û ji
bo şahîya newrozê dest bi kar û xebatê dikir, hemû rê lê
dihatîn girtin.

Zilm û zordarî dest pê dikir...

Xwîn dirijîya...

Şîn û şahî tevlihev dibû, hêsirên çavên dayikên Kurd
weke barana biharê diherikîn...

Şahîya nêwrozê bi xwîna keç û xortan va dihat xemilan-
din...

Mizgînîya biharê di dilê wan dima...

Qedera wan a reş pêsîra wan digirt û bernedida...

Roja 21ê Adarê bi rengên biharê va dest pê dikir, bi tarîya
severêş va diqedîya...

Kûçe û kolanên bajaran li Gelê Kurd diherimî, bêçare di-
man û xwe davêtin serê çol û çîyan...

Erd û ezman li wan sitarî nedikir.

Gazî û hewara wan digihîşt erşê ala...

Dinya kerr û lal, li bêçaretîya wan temaşê dikir, ne kesî
gazî û hewara wan dibihîst, ne jî destê xwe dirêjî wan
dikir...

Tenê çîya paşla xwe vedikir û starî li wan dikir...

Bi starîya çîyayên qedîm berxwe didan...

Bi destpêka salên du hezarî va qedera Gelê Kurd a reş
guherî...

Li Başur ewrên reş û tarî pişkifîn, di nav ezmanên çit ên
sipî da rojeke nû derket.

Tîrêja rojê da ser çîya û banîyan.
 Kurd hişyar bun, tîna rojê dilên wan germ kir, ken hat ser
 dev û lêvên wan...
 Şîn û şer, xwîn û hêsir li paş man, bûn dîrok...
 Li pey şîna Helepçê, şahîya Newrozê, li ser axa Başûr ji nû
 va dest pê kir...
 Tîrêja ku duh li Başur çûrisî, îro li Rojava diçûrise...
 Wê li alî Bakûr biqulube û berê xwe bide Rojhilat.
 Jiber ku, ewrên reş û tarî êdî dipişkifn.
 Rojên şereş hêdî hêdî ronî dibin...
 Ne zilm û zordarîya li ser Amedê, ne jî şewitandin û xer-
 abkirina Cizîra Botan pêşî li vê yekê digre...
 Wê li Bakûr û Rojhilat jî dengê gulên domdomê bèn
 birîn...
 Ji kûçe û kolanên bajarên dengê kilam û stranên bilind
 bibin...
 Ji gundan, ji serê çol û çîyan avazên dengbêjan bela bi-
 bin...
 Newroz li seranserî Kurdistanê, bê xwîn û bê girî, bi ken
 û bi eşq bê pîrozkirin.
 Keç û xort, jin û mêr, kal û pîr wê bê tirs û xof bikevin milê
 hev...
 Di şahîyên Newrozê da cîhê xwe bigrin û bi hev ra go-
 vendê bigerînin...
 Li dora agirê Nevrozê kilam û stranên azadîyê bibêjin û
 bi hev ra bireqisin...
 Jiber ku Newroz xemla meha Adarê...
 Roja serhildan û berxwedanê ye...
 Dîlana keç û xortan...
 Cejna Gelê Kurd e...
 Li hemû Kurdan pîroz û bimbarek be!..
 20.03.2016

Zarok wekî firîşte çavên xwe li dinê vedikin...

Salan berê min pirtûkeke Murathan Mungan ya bi navê, „Cinên Bavê min-Babamın Cinleri“ xwendibû.

Mungan di wê pirtûkê da li ser têgihîştina mirovan disekine û gelek tiştên balkêş tîne ziman. Ji wan tiştan yek jî ew e ku Mungan dibêje; „Hemû xirabî û tiştên nebaş ji mirovan tên, ji ber ku ew bi şîrê xawî mijîyane“.

Di vî gotina wî da rastîyeke zanyarî he ye, an jî tune, ez bi xwe nizamim. Lê mirov dikare bibêje, heger rastîyek hebe, sedemê hemû xirabî û şaşîyên mirovan ne tenê şîrê xawî ye. Tê zanîn ku hemû zarok, jî kîjan dê û bavan, an jî li kîderê dibin bila bibin, wek firîşte (melaîke) pîr û pak çavên xwe li dinê vedikin.

Ne jî xeyb û derewan, ne ji şer û neyartîyê, ne jî ji diz û çilpizîyê hayîdar in. Piştî bûyînê, berê di nav malbatên xwe da, di bin tesîra dê û bavên xwe da, dû ra jî di bin tesîra civakê da dimînin. Gor rewşa malbat û civaka xwe kamil dibin, an jî nezan û xizan emrê xwe derbas dikin...

Başî û xirabîyê jî, rastî û derewan jî, berê ji dê û bavên xwe, dû ra jî ji malbat û civaka xwe hîn dibin, gor wê hînbûnê mezin dibin û dijîn...

Di destpêkê da dê û bav, dû ra jî civak çî bide ber zarakon û wan bi çî awayî perwerde bike, ew jî gor wê yekê mezin dibin. Çêyî û xirabîya wan, têgihîştin û nezanîya wan girêdayî malbat û civaka wan e.

Di piçûktîya xwe da, ji dê û bavên xwe ziman, xwerin û vexwerinê, rabûn û rûniştinê hîn dibin. Bi jîyana xwe ya di nav civakê da nasnameyên nû bi dest dixin.

Dibin jin û mêt, dê û bav, sofi û hecî, şivan û gavan, karker û karmend...

Zarok, dê û bavên wan ji kîjan netewê bin, ew jî wek endamê wê netewê di civatê da cîhe xwe digrin.

Bîr û bawerîya dê û bavên wan çî be, ew jî gor wan bîr û bawerîyan têdigîhîjin. Dê û bav misilman bin, zarokên wan jî dibin misilman, ew cuhî bin, zarokên wan jî dibin cuhî, ew file bin, zarokên wan jî dibin file...

Heta nuha ne ji dê û bavên cuhî zarokeke misilman hatîye dinê, ne jî ji dê û bavên misilman zarokeke fileh çêbû ye...

Nasnameyên wan yên olî jî, weke yên din, di nav malbat û civakê da pêk tên. Heger di malbateke têgihîştî da û di nav civakeke demokrat da mezin bibin, ji wan mirovên xweşbîn, heger di nav malbateke nezan û di civakeke paşverû da mezin bibin, wê gavê jî ji wan mirovên nezan û hov derdikevin.

Hîmê nezantîyê û hovîtîyê bi serê xwe tenê ji nasnameya olî nayê, lê nasnameya olî jî gor rewşa malbat û civakê tesîrê li mirovan dike...

Ew malbat û civata ku zarok tê da mezin dibin, di wê malbat û civatê da nasnameya olî nasnameyeke sereke be, tesîra wî zêde, nasnameyeke qels be, tesîra wî jî ewqas kêr dibê.

Mirov gava ku li seranserî dinê dinihêre, ji kîjan netewê, an jî li kîdera dinê dibin bila bibin, bawerîyên wan yên olî kêr bin jî, nasnameya olî, di nav hemû misilmanan da wek nasnameyeke sereke tê bikaranîn.

Sedem vê yekê ye ku mirov dikare bibêje, kesên misilman gorî fileh û cuhîyan bêtir bi nasnameya olî, xwe bi nav dikin û ol'a xwe heq, yên din jî neheq dibînin.

Li ber bîr û bawerîyên cûda û fikr û ramanên cûda ra hemû derîyan digrin û tenê ji bîr û bawerîyên xwe û ji fikr û ramanên xwe ra rêzgir in.

Li alîkî sedem nasnameya olî bi çavgirtî xwîne dirijînin,

li alîyê din jî, jibo berjewendîyên xwe yên şexsî û netewî şerê hemolîyên xwe dikin.

Gava ku mirov vê nakokîyê bînî mijarê, xwe pîr û pak, dijberên xwe jî bi çil awayî bi nav dikin.

Weke mînak, mirov qala kujerên Charlie Hebdo bikî.

Wê gavê dibêjin; „Ew misilmanan temsîl nakin!“

Tu kirinên DAÎŞê ku li ser navê îslamê dikin, bidî berçavên wan, wê gavê jî dibêjin; „Ew jî îslamê temsîl nakin!“

Bêguman ev yek bi awayekî rast e.

Ne kujerên Charlie Hebdo, ne DAÎŞ, ne El-Qaide, ne jî Îran û Erebia û Tirk bi serê xwe tenê îslamê temsîl dikin.

Mixabin, kesên ku xwe misilman dihesibînin û xirabî û qetlîamên hin kesên misilman û dewletên misilman napêjirînin, divê berî herkesî ew li dijberî wan kesan û dewletan derkevin û kirin wan şermezar bikin.

Lê li realîte dinihêrî, divî warî da jî hemû misilman kerr û lal in. Bêdengîya wan, bersivên wan ên li jor pûç dikin û wan dikin şîrîgê kujer û qetlîamkeran.

Wek gotina dawîyê, mirov dikare bi hêsanî bibêje, hemû zarok, ha yê lawîn ha yê qîzîn, wek firîşte çavên xwe li dinê vedikin û şîrê xawî dimêjin.

Heger hemû xirabîyên mirovan ji mêjandina şîrê xawî bihata, di dinê da tu miroveke çê dervediket.

Ya ku şîrê xawî li mirovan diherimîne û wan ji mirovatîyê dertîne, ew jî pergala perwerdeyîyê û hindekarîya malbat û civakê ye.

Weke mîsal: Şîr baş were meyandin dibe mestekî weke kezeb, baş neyê meyandinê jî diquse û dibe toraq...

Ji zarokên ku bi şîrê xawî dimêjin û di malbatên têgihîştî û civatên demoqrat da mezin dibin, ji wan mirovên kamil, yên di malbatên nezan û civakên paşverû da mezin dibin, ji wan jî mirovên dîn û har derdikevin...

15.01.2015

Bi çavê Ronî Kurd û Kurdistan!

Ronî birazîyê min ê hêrî piçûk e. Ew jî wek bi hezaran zarokên Kurd ji Kurdistanê dûr, li xerîbîyê, li bajarekî Alman hate dinê. Bi kilam û stranên Kurdî û bi hesreta Kurdistanê mezin bû. Ji dê bavê xwe Kurdî hîn bû, di nav malê da bi wan ra Kurdî, li kûçe û kolanên Alman û li dibistanê jî bi almanî axifi...

Di zarokatîya xwe da Alman û Kurdan, zimanê Kurdî û zimanê almanî ji hev veqetand. Xwe zarokekî Kurd hesiband, Kurdistana ku di pirtûk û ansîklopedîyan da nedidît, wek welatê xwe, di dilê xwe da ava kir. Ji roja ku qelem û kaxiz kir destê xwe, ji wê rojê vir da bi rengên kesk û sor û zer ala Kurdistanê neqîşand û bi wan nexşên rengîn diwarê oda xwe xemiland.

Dest bi dibistanê kir, di dibistanê da xwe wek zarokekî Kurd da nasîn. Ji heval û mamosteyên xwe ra pesnê Kurdistana ku di dilê xwe da avakiribû, da. Li gel mamoste û hevalên xwe hebûna Kurdistanê îspat nekiriba jî, ew ji hebûna Kurdistanê nediket şikê...

Ronî, îsal neh salên xwe qedand ket sala dehan. Vê havînê wek cara yekemîn bi dîya xwe ra çû welêt. Qederê mehekî li Erzurumê û li gundê me ma. Li malên ap û xalên xwe bû mêvan, şev û rojên xwe bi pismam û dotmamên xwe ra derbas kir.

Kurdistana ku di dilê xwe da bi gul û sosinên rengîn xemilandî ava kiribû, wî, ew ne li Erzurumê ne jî li gund dît. Xewn û xeyalên wî yên di derheqê Kurdistanê da, pûç û vala derketin. Di nav mehekî da nêrînên wî guherin...

Bi dileki xemgîn şûnda vegerîya. Nuha jî rastî kê were jê ra dibêje, „ez carek din ne diçim Erzurumê, ne jî gund“.

Sebebê nexwestina çûyîna xwe jî ne kê, ne jî zêde bi gotinên xwe yên zelal û xweşik wuha tîne ziman; „Erzurum Kurdistan nîne. Li wir tu kesî bi Kurdî qise nedikir. Bi min ra jî Tirkî qise dikirin, min ji wan tu tiştêkî fam nedikir. Zarokên li wir qet Kurdî nedizanîbûn, bi dê û bavên xwe ra jî Tirkî qise dikirin. Bi qisedana min a bi Kurdî dikenîyan û ji min ra digotin, „tu çima Tirkî nizanî?“

Ez çûm gund. Min ji gund jî hez nekir. Xaniyên gund giştik xirabe, her der jî qilêr bû. Zarokên gund hemû rût û tazîbûn. Tenê pez û dewarên wan pir bûn...“

Ronî ne tenê kêmasiyên wan, di nav mehekî da sebebê kêmasî û nezaniya wan jî gor nêrînên xwe tespît kiribû.

Tiştên ku li wir bala wî kişandiyê, bi peyvên xwe yên xweşik, wan li pê hev rêz dikir û ji min ra digot:

„Apo, tu zanî çima xaniyê wan xirabe ne û zarokên wan çima rut û tazî ne?“

Paşê jî bersiva pirsên xwe, bi xwe dida û digot:

„Min ji wan ra jî got. Pez û dewarên wan jî, perê wan jî pir in, tenê mêjiyên wan kê in...“

Cîhê bîla bê sebeb nabêjin, heger tu dixwazî gotinên rast bibîzî, li filozofan, heger filozofan nabînin li zarokan guhdarî bike. Ji ber ku filozof jî zarok jî derewan nakin. Çi bibînin wî dibêjin. Rastî çibe wî tînin ziman. Encama gotinên xwe gor der dora xwe û gor berjewendiyên xwe napîvin û wan naguherînin. Filozof gor zanebûna xwe dixifin û rastiyê dibêjin, zarok jî derewan nizanin. Ew çî bibînin û di dilê wan da çî derbas bibe, wî dibêjin.

Ronî jî li Kurdistanê çî dîtibe wî dibêje, ne kê ne jî zêde...

Rewşa hemû bajarên Kurdistanê, kê ya jî zêde wek Erzurumê ne. Di warê xizaniyê da navbera bajarên Kurdan da cûdayetîyek hebe jî, di warê Kurd û kurdayetiyê da hemû wekhev in. Li hemû bajarên Kurdistanê piraniya

zarokên Kurd, zimanê xwe yên zikmakî nizanin. Kesên mezin jî tu qey dibêjî sond xwerine, radibin û rûdinên, ji sibê hata êvarê bi hev ra Tirkî diaxifin. Sedem wê yekê ye ku çavdêrîyên Ronî ne tenê ji bo rewşa Erzîrumîyan, ji bo rewşa hemû Kurdan tiştên balkêş in.

Di civaka Kurdî da hata nuha filozofek derneket. Ronakbîr û zanayên rastgo jî kêmin. Lê zarokên ku wek Ronî dîtinên xwe rast e rast tînin ziman gelek in. Mixabin Kurd jî li zarokên xwe guhdarî nakin. Dema ku zarokên wan tiştêkî bînin ziman, dê û bavê wan, ya jî mezinên wan dibêjin; „pîrsên ji bejna xwe mezintir neke“ û şîrmaqek li serê guhê wan dixin. Halbukî Kurd, bi taybetî jî rêvebirên hêz û partîyên Kurd, qasî ku şîreta li zarokên xwe dikin, ewqas jî guh bidin gotinên wan û di salê da carê bi çavên wan li Kurd û Kurdistanê binihêrin, ez bawerim ewê bi awayekî din pîrs û pîrsgirekên civatê binirxînin û wan bi hêsanî çareser bikin.

Ji ber ku weke çavdêrîyên Ronî, îro Kurd di her warî da xwedî îmkân in. Bi hêz û quwet in.

Kurdên di gundan da dijîn jî îro weke Kurdên bajêrî, bi sîyasetê ra têkildar in, mixabin li zimanê xwe yên zikmakî xwedî dernakevin. Bi heval û hogirên xwe ra, bi zar û zêçên xwe ra Tirkî diaxifin...

Ronakbîr û pisporên Kurd bi serê pozên xwe li civatê dinihêrin, qasî kû ji civatê dûr disekinin, ewqas jî ji hev dûr in û di tu warî da bi hev nakin...

Hêz û partîyên Kurd ji neyarên xwe zêdetir dijbertîya hev dikin. Dû ra jî dibêjin; „em çima bisernakevin...“

Ez jî wek Ronîyê birazîyê xwe dibêjim; yek kêmasîyeke hez û partîyên Kurd he ye, ku ew jî ruhê kurdayetîyê ye!.. Heta ku mêjîyê xwe neguherînin, tu car biser nakevin!..

06.09.2013

Bu kafir xwe, bu misilman hevalê xwe xilaskir

Weke meselok tê gotin. Di dema Çar Xelifeyan da, rojek du heval, ji wan yek belengaz û yek jî fêlbaz, di meha rojîyê da dixwazin rojîya xwe bişkînin. Lê di bajêr da ne aşxane ne jî çayxaneke vekirî dibînin.

Di nav bajêr da weke pezên gêj didin dû hev û difitilin.

Di ber derê dikanekî ra derbas dibin, bêhna nanê germ tê pozê wan. Serê xwe di navbera derî ra dirêj dikin, li ser refên dikanê nanê teze, penîrê qerqas û xwerin û vexwerinên cûrbecûr... Derbasî nav dikanê dibin û du nanê destik û hinek jî xwerin û vexwerinê dikirin. Ji dikanê derdikevin, jibo cîhekî ku tê da xwerina xwe bixwen, qasî nîv saetê digerin. Gor dilê xwe cîhekê aram nabînin û tûrê xwerin û vexwerina wan di destê wan da dimîne. Dema ku di ber derê camiyekî ra derbas dibin, yê fêlbaz hevalê xwe yê belengaz dide sekinandinê û bi kelecana jê ra dibêje:

– Kuro, min cîh dît. Were em derkevin ser minara camîyê, li cîhê ku mele lê azan dide rûnên û bê tirs û xof zikê xwe têr bikin. Li wir ne tu kes me dibîne, ne jî tu kes ji wir dikeve şikê.

Yê belengaz, pêşnîyara hevalê xwe dipejirîne û li pey wî dikeve. Herdu bihev ra derdikevin şerefeya minarê, sifra xwe radixin û dest bi xwerin û vexwerinê dikin. Herdu heval bi kêf û eşq li alikî xwerina xwe dixwin, li alikî jî bi hev ra henekan dikin.

Lazek şûnda melê camîyê, ji bo azandina limêja nivroye derdikeve şerefa minarê. Mele dinihêre ku çi bibîne, du

mirovên mezin di meha rojîyê da, li mala Xwedê rûniştine û xwerinê dixwen.

Mele, dema ku wan dibîne, şûnda vedigere, hêdîkapeyayî jêrê dibe û gazî inzibatane dike. Çend inzibat bi lez û bez derdikevin ser minarê, herdu mirovan digrin û dibin davêjin zîndanê. Derê zîndanê li ser wan da zexm digrin û diçin. Gava ku herdu heval tenê dimînin, yê belengaz gilî gazinên xwe ji yê fêlbaz dike.

Yê fêlbaz jî bi ken û henek bersiva belengaz dide û jê ra dibêje:

– Kuro çî hundirê te qetîya ye. Min çawa bi fen û fût zikê te têr kir, ezê dîsa bi fenû fûtan te jî, xwe jî ji vir xilas bikim. Tu qet xem neke, ez birayê te me. Bese ku tu li ba Qadî dengê xwe dernexe û ji gotinên min ra îtiraz neke. Çend saet şûnda inzibat tên, herdu mirovan digrin û dibin hizûra Qadî yê bajêr.

Qadî li rewşa fêlbaz û belengaz dinihêre, serê xwe di ber xwe da dihecîne û dest bi lêpirsînê dike.

Qadî:

– Ma hûn ji Xwedê natirsin, hem rojîyê nagrin, hem jî di meha rojîyê da diçin, di mala Xwedê da xwerinê dixwin. Fêlbaz herdu destê xwe li ser navika xwe dide serhev, histûyê xwe di ber xwe da xwar dike û bi dengê xemgîn pirsra Qadî dibersivîne:

– Belê Qadîyê min, ez jî dizanin ev tişt gune yê, lêbelê ji bo misilmanan, ne ji bo min.

Qadî:

- Çima tu misilman ninî?

Fêlbaz:

- Na, ez ne misilman im?

Qadî:

- Lê hevalê te, ew jî misilman nîne?

Fêlbaz:

– Hevalê min misilman e.

Qadî:

– Madem ku tu ne misilmanî, ji bo te cezayek bidim nîne û tu azadî. Lê cezayê hevalê te cezayeke giran e.

Gotina Qadî diqede, fêlbaz ji Qadî destûrê dixwaze û dibêje:

– Qadî efendi, gelo mirovek kafir dema ku bixwaze, dikare bibe misilman?

Qadi bi vê pirsê ra kefxweş dibe û dibêje:

– Ki bixwaze, dikare bibe misilman. Jibo vê yekê jî divê bi besmeleyê bawerîya xwe bi Xwedê û pêxemberê wi bîne.

Fêlbaz:

– Lêbelê dema ku ez derbasî ser dinê we bim û daxwazek ji we bikim, hûnê daxwaza min bînin çîh?

Qadî:

– Ger ku bikaribim, daxwaza te serseran û serçavan.

Fêlbaz:

– Daxwaza min ewe ku, ezê vegerim ser dînê we, lê hûn jî ji bo xatirê min, gunê hevalê min efû bikin û wî serbest berdin.

Qadî di ber xwe da hinek difikire, di encamê da daxwaza fêlbaz qebûl dike. Fêlbaz şhadeta xwe tîne û dibe misilman. Qadî jî daxwaza wi tinê çîh û hevalê wî yê belengaz jî azad dike. Herdu heval bi hevra derdikevin derva, belengaz ji fêlbaz ra dide xebera û dibêje:

– Kuro, ez bi van fen û fûtên te şaş û metal mam. Xwedê pêşîra mirovan ji te û derewên te xilas bike. Te çawa ew derew li hev anî û Qadî îkna kir, ez hê jî bawer nakim.

Fêlbaz di ber xwe da dikene û ji belengaz ra dibêje:

– Kero, jibo famkirinê aqil pêwîst e. Ew jî li ba te nîne. Min di nezaretza da ji te ra negotibû ez te xilas dikim. Li hizûra Qadî bûm kafir xwe, şûnda vegerîyam bûm misilman, te xilas kir.

10.11.2004

Ji Şêxan ra paletî ji serokan ra koletî...

Gundîyê me jî wek kesên herêmê murîdê mala Şêx Saîd bûn.

Kesên xwedî bîr û bawer, di ware olî da li pey mala Şêx diçûn û ji gotinên wan dernediketin. Di navbera wan û cînarek wan da pîrsgirêkeke civakî derketaba, berî dadgehê xwe diavêtin mala Şêx û ji bo çaresrîya wê pîrsgirêkê alîkarîya wî dixwestin.

Şêx jî gor şert û mercên xwe civînek saz dikir û di derbarê wê pîrsgirêkê da kî tişteki bizanibîya, li wan guhdarî dikir û pişt ra biryara xwe dida. Ew biryar bê qewl û qirar dihat cîh û tu kesî îtiraza wê biryarê nedikir.

Ji murîdan hinekan jî murîdîtîya xwe bi awayeke din dianîn cîh.

Bi destpêka havînê ra tirpanên xwe didan ser milê xwe, berê xwe didan gundê Şêx û diçûn, badilhewa ji mala Şêx ra paletî dikirin. Berê merg û zevîyên Şêx, dû ra jî vedigerîyan mêrg û zevîyên xwe diçinîn. Carcaran mêrg û zevîyên wan hişk dibûn, zirar û zîyaneke mezin didîtin, lê dîsa jî xem nedikirin.

Bi destpêka payîzê ra pez û dewarên mala Şêx di navbera xwe da jibo xwedîkirina heta biharê di navbera xwe da parve dikirin, ku ji vê yekê ra “pûtî” digotin.

Di salên şêstî da, ji gundê me jî hinek kes, wek hercarê dîsa bi tirpan û dirmixên xwe va berê xwe didin ber bi gundê Şêx û dikevin serê rê. Ji wan kesan yek jî apekî min bû ye.

Wê salê koma gundîyên me bi hevaltî ji gund derdikevin,

di mêrga Şêx da, sedem kersekek rêxa di nav penîr da, pevdîçin û wek neyar vedigerin gund.

Gor gotina apê min, ew terin di mêrga Şêx da gihê diçinin. Rojek ji bo xwerina taştê tirpan û dirmixên xwe datînin erdê û tèn li ser lasên gihê rûdinên. Sifra xwe radixin û dest bi xwerinê dikin. Li ser sifrê jî nan û mast, toraq û penîr hwd...

Dema dest bi xwerinê dikin, apê min di nav parçeyek penîr da kersekeke piçûk a ji rêxê dibîne. Hêdika destê xwe dirêjî ser sifrê dike, perçê penîr digre û bi dizîka dûr davêje, ku bîzê kesî jê neyê.

Helwesta apê min bala gundîyekî me dikişîne. Berê mirûzê xwe dike û hinek pirsan ji apê min dipirse, dû ra di navbera wan da diyalogek wuha derbas dibe:

Gundî dipirse:

- Ew çi bû te avêt?

Apê min dibersivîne:

- Tişt nebû, tenê perçeyek penîr bu“.

- Çima?

- Di nav da kersekek rêx hebû, loma.

- Tu şerm nakî penîrê mala Şêx diavêjî?

- Malxirab, di nav penîr da kersekek rêx hebû, loma min avêt.

- Rêx be jî rêxa mala Şêx e û teberik e. Tu şerm nakî wê teberikê digrî û davêjî erdê.

- Kero, madem rêxa mala Şex jî teberik e, ha mêze bike Şêx wa ye li ber çem tahareta xwe digre. Here gûyê Şex jî bixwe...

Li ser vê dîyalogê, gundîyê me ji cîhê xwe radibê û êrişî apê min dike.

Paleyên din dikevin navbera wan û wan ji hev vediqetînin. Bi qêrîn û qîjîna wan ra Şex tê cem wan û di derheqê pe-
vçûna wan da ji paleyên din agahîyê digre. Pişt ra gazî herduyan dike, bi wan ra diaxife û dibêje;

„Hey malxirabno, rêx û teberik, ewqas jî nabe. Bi rastî ex-meqîya wusa jî hinekî zêde ye!“

Li ser van gotinên Şêx, gundîyê me ji Şêx û apê min lêborîna xwe dixwaze, lê ji wê rojê şûnda bi apê min ra neyartîyê dike û pê ra qise nake.

Ji wan salan vir da, di civata me da jî gelek tişt hatin guhartin.

Tê da kêmasî û xeletî hebin jî, civat pêşda çû.

Tesîra Şêx û melan kêmbûn.

Tarîqatên olî jî ji wê pêşveçûnê para xwe girtin.

Mixabin, îro di şûna tarîqatên olî da, tarîqatên nû peyda bûn.

Bi navên mezin û giran.

Bi armancên pak û pîroz...

Sedem vê yekê îro tu kes ne gotinên wan ên pûç û vala, ne jî kirin û kiryarên wan ên xelet rexne dike. Ew çi bibêjin, gotinên wan wek ayetên muqedes, kirinên wan jî wek ferz û sunet tên qebûlkirin...

Kurdên belengaz ji paletîya Şêx û meleyan filitîn, mixabin îro ji serok û rêberên tarîqatên modern ra paletîyê dikin...

17.07.2011

Mele Mahmûd û gotina rast...

Ji bo gotina rast pirî caran zanebûn tenê ne bes e, cesaret û risk jî pêwîst e...

Weke gotineke Tirkan; "Kî rastîyê bibêje, ji neh gundan tê dûrxistin".

Mirovê sîyasetvan gor rewşa alîgir û dijberên xwe berî axaftinê li ser gotinên xwe difikirin, wan yekoyek dipîvin û pişt ra tînin ziman.

Mirovên karsaz gor nêrînên mişterîyê xwe û gor kar û zirara xwe diaxifin.

Mirovên oldar (dîndar) jî gor rewşa cemaatên xwe waaz didin, kîngê ku di varê olî da nebe sebebê nakokîyek, ancax wê demê li rastîyê xwedî derdikevin û wê rastîyê tînin ziman...

Îro dehê rojîya remezanê ye. Destpêka rojîyê her sal deh roj pêşda tê. Di sî û şeş salan da carekî roji dikeve meha herî germ ya demsala havînê. Li alikî germahî, li alîyê din şevên kin û rojên dirêj...

Bi xebata di nav mêrg û zevîyan da jîyana nêzikî 16 saetan bê xwerin û vexwerin, bi rastî jî gelekî zahmet e...

Ji bo girtina rocjyê ya di wê mehê da, berî her tiştî bawerî, dû ra jî hêz û îradeyek xurt pêwîst e.

Weke tê zanîn ji pênc şertên Îslamê yek jî rojî ye. Rojî di salê da mehekî tê girtin. Ji wê mehê ra jî dibêjin meha Remezanê...

Peyva Remezanê ji Erebî tê û di nav hemû miletên misilman da bi wî navî tê binav kirîn.

Weke şertên Îslamê yên din, ji bo girtina rojîyê jî hinek

şert û merc pêwîst in ku, ew jî, gor mezheban û pisporên olî tîn guhartin.

Weke mîsal, hinek mele û pispor dibêjin, rojî ji zarokan ra ferz nîne, heger ew bixwazin jî bila dê û bavên wan nehêlin ew rojîyê bigrin. Lewra ji bo gihîştina wan birçîbûn zirar e.

Hinek mele jî dibêjin bila dê û bav di piçûktîya zarokên xwe wan hînî girtina rojîyê bikin ku di mezinahîya xwe da jî ew vî şertê Îslamê bi hêsanî bînin cîh.

Mirov dikare van nakokîyan zêde bike. Lê ji bo min tişteke girîng heye, ku ew jî di meha rojîyê da dema paşîv û fitarê ye. Bi awayekî din, gelo kîngê dema xwarina paşîvê diqede, kîngê dema fitarê dest pê dike?

Gor hadîs û kitêban, tê gotin ku dema paşîvê di mesafeyek taybetî da kîngê ku bendê spî û reş ji hev were veqetandin, dema paşîvê diqede û dema rojîgirtinê dest pê dike. Ber bi êvarê jî dîsa di wê mesafa taybet da kîngê her du bend ji hev neyên weqetandin, rojîya wê rojê diqede û dema fitarê dest pê dike. Lewra di destpêka Îslamê da ne saet, ne jî tiştên demjimêr hebûn. Wext gor rewşa hîv û royê dihat hesapkirin. Tê zanîn, heta sed sal berê dinya jî ji alî oldaran ne wek gog, wek sinîyek dim û dûz dihat hesibandin. Haya kesî ne ji cemsara (kutup) başûr ne jî ji ya bakûr hebû...

Lê îro hemû kes jî dizanin ku li derdora cemsaran jîyanek heye û li wir jî mirov dijîn. Lê belê şev û roj ne wek cîhê din in. Mirov dikare bêje li cemsarek şeş meh ronahî, şeş meh jî tarî ye.

Gor hadîs û kitêban şertên olî wek şertên gerdûnî li her derê yek in û gor rewşa erdnîgarîyê jî nayên guhartin. Hemû olên îlahî jî ne tenê ji hinek kesan ra, ji hemû mirovan ra hatine xwarê û yen ku wan qebûl dikin, li kudera dinê dijîn bila bijîn, divê ew jî wan şertan bînin cîh.

Gelo ew mirovên ku li derdora cemsaran dijîn, ku ji wan

ra Eskîmo tê gotin, ew bibin misliman û rojîyê bigrin, weke demên berê saeta wan jî tunebe, ewê kîngê rabin paşivê û kîngê fitara xwe vekin?

Heger gor tayê spî û reş tevbigerin, bila Xwedê bîr û bawerîyeke xurt û îradeyeke pola bide wan...

Dema ku ez xwendekarê zanîngehê bûm, di betlanê da diçûm welat. Nas û dost ji bo min dihatin û em di gelek xalan da diketin gengeşî yê...

Wê ndemê navê me bi kurdayetî û çeptîyê derketibû. Yên ku dihatin serlêdana min, gelek tişt ji min dipirsîn. Pirañya pirsên wan jî li ser şert û şûrtên olî bûn. Bi wan pirsên xwe li alikî min dicêribandin, ku gelo di nav bîr bawerîyên min da guhartinek çê bûyê ya na. Li alîyê din jî dixwestin zanebûna xwe ya di warê olî da bi awayekî nişanî cemaatê bidin...

Ji wan kesên ku dihatin mala me, yek jî, Xwedê rihma xwe lê bike Mele Mahmûd bû. Mele Mahmûd, kurê Mele Silêman, Mele Silêman jî ji zarokên Şêx Said ra meletî kiribû. Di malbata wan da gelek mela derketibûn. Ji wan yek jî Mele Mahmûd bû, ku ew xwedîyê gotina rast, mirovekî rastgo bû. Carcaran ev helwesta wî li kesî xweş nedihat û ji ber wê yekê jî jê ra digotin, Melayê delodîn.

Mele Mahmûd jî weke cînarên me yên din gelek pirs ji min pirsîn. Gor zanebûna xwe min pirsên wî bersivand, pişt ra min jê destûr xwest û ji bo pirsgireka li ser dema paşiv û fitarê nêrîna wî pirsî û got:

„Seyda, mirovên li derdora cemsarê dijîn, ji wan yek bibe misliman û bixwaze rojîyê bigre, wek dema sahabeyan saeta wî jî tunebe, ewê bi çi awayî rabe paşivê û fitara xwe vebike?“

Berîya Mele Mahmûd, ji cemaatê hinek kes pêş û paş axiffîn, lê ew jî, bi wan gotinên xwe bawer nebûn.

Mele Mahmûd hinek di ber xwe da ponijî û yekoyek li kesên li çep û rastê xwe rûniştîbûn, mêze kir û got;

„Birazîyê min pirsî te pîrsekî pîr girîng e û bersiva wî jî heye. Ne ku ev cemaat, ew melayên ku bavê te rojê pênc wext li paş wan limêj dike û qîmeta wan giranbiha dibîne, vê pîrsê jî wan bipîrse, ew jî dikarin weke mirovên li vê cemaatê hinek tiştan bibêjin. Mixabin gotinên wan jî ji pîrsa te ra tu car nabin bersiv. Bi navê Xwedê, ez bersiva pîrsa te dizanim, lê dîsa jî naxwazim bibersivînim. Lewra bi wê bersivê mirov ji dîn derdikeve ku, ew jî li hesabê min nayê...

Wek gotina Mele Mahmûd, mirov rastîya hinek tiştan bizanibe jî, her kes nikare bi hêsanî wê rastiyê bine ziman. Jiber ku, kesên nezan emrê xwe bi nezanî û xizanîyê ra derbas dikin, yê ku rastîyê dizanin û nabêjin, ew jî weke Mele Mahmûd jî hinek tîrs û xofên xwe, an jî ji bo hurmeta bîr û bawerîyên xwe bêdeng dimînin û rastîya xwe ji xwe ra dihêlin...

10.08.2011

Saeta Bavê min...

Bavê min, mamosteyê min ê herî ewil, mamosteyê min ê dersa Quranê bû.

Ew di piçûktîya xwe da li ba şêx û meleyan, bi Erebî xwendina Qûranê hîn bibû. Di jîyana xwe da bi hezarcaran Qûran xetim kiribû. Herf bi herf, peyv bi peyv hemû ayetên Qûrane ezber dixwend. Di mal da ya jî di dema rêwîtîyê da, kingê firsend bidîta di ber xwe da dixwend... Mewlûda Mele Ehmedê Batê û Nûbihara Ehmedê Xanê jî, bi tîpên erebî dixwend û dida xwendinê...

Em heft xwîşk û bira bûn. Du xwîşk û birayên min ji min mezintir, du xwîşkên min jî ji min piçûktir bûn.

Xwîska min a mezin û her du birayên min di pênc salîya xwe da dersa xwendina Qûranê ji bavê min girtibûn û Qûran xetim kiribûn. Dema ku ez bûm pênc salî, dora fêrbûnê hatibû min.

Di demsala payîz û ziwistanê, di wan rojên sar û seqemê da, dema me bi xwendina Qûranê derbas dibû...

Danê sibê, bavê min li kêleka soba ku bi gunî û sergînan dişewitî û tîna germ dida odê, rûdinişt, ez jî li ber çokên wî...

Di destê min da cizûya Qûranê, di destê wî da „dodo“ ya ji kaxiza birqandi çêkirî...

Herf bi herf alfabeya Erebî bi min dida nasîn û min fêrî xwendinê dikir.

Xwendekarên wî yên wek min pênc salî, di çil rojan da Qûran xetim dikirin, yên xort û ezeb jî ancax di sê-çar mehnan da...

Bavê min, weke her bavekî bi merhamet û mamosteyekî zana, gor bîr û bawerîyên xwe şîret li me dikir û rêyekî rast dida ber me, rêyekî bê hîle û bê xurde...

Gor ruknê Îslamê û gor orf û edetên Kurdî dijîya. Jîyana wî jîyaneke pak û sade bû. Ji pesindayîne dûr disekinî û tu car reklama kar û kirinên xwe nedikir. Ji bo xwe, ji bo bîr û bawerîyên xwe dijîya.

Weke mîsal, di dema zaroktîya me da nedihîşt em rocîyê bigrin. Li dijberî rocîgirtina me derdiket û digot;

„Hûn hê kamil nebûne, rojî jî li ser kesên ku hê kamil nebûne, ferz nîne. Min di warê olî da ji bo we wezîfa xwe anî cîh, Qûran bi we da xwendinê, we fêrî şert û mercên dîn û îmanê kir û dikim. Hûn wan şert û mercan îro hîn bibin, dema ku hûn kamilîn, wê gavê jî wan şert û mercan bi kirinên xwe bînin cîh. Eger ku li vê dinê ji bo xwe îbadetê bikin, ji xirabî û xeletîyan dûr bisekinin, tiştên helal û haram ji hev veqetînin û durust bijîn, hûnê li dinya wîyalî jî mukafata wê bibînin...

Li wê dinê ne ez di ber we da tîm cezakirin, ne jî hûn di ber min da. Li hizûra Xwedê her kes gor kirin û kiryarên xwe yê wê dinê muamelê dibîne, ku ceza an jî mukafata xwe digre ...“

Bavê min qasî ku dixwest em Qûrane bixwînin, ewqas jî li dijberî xwendina me ya li dibistana Tirkî derdiket. Sebebê dijbertîya wî ya yek, di şert û mercên gundan da îmkana xwendinê nebû. Ya dîn jî di bin tesîra şex û melan da mabû. Dema me daxwaza xwendina dibistanê lê bikira, dûr û dirêj diaxifi û digot; „Dibastanên dewleta Mistoyê kor we ji dîn îmanê dûr dixîne!..“

Sedem vê yekê piştî mekteba ewlîn, li ber xwendina me derdiket û nedixwest em xwendina xwe ya dibistanê bidomînin. Salekî şûnda, em bi malbatî ji gund koçberî bajêr bûn. Bi piştgirî û alîkarîya her du birayên min ên mezin, min xwendina xwe domand.

Lê wan ew îmkân bikar neanîn, jiber ku salên wan mezin bibûn, dema xwendinê ji bo wan li paş mabû.

Di şert û mercên bajêr da em fêrî rê û rêbazên nû bûn. Îmkânên nû derketin peşîya me. Ez û birayên xwe yê ji min mezintir, em di xortanîya xwe da ketin nav karên sîyasetê, sîyaseta Kurdî ya çep...

Xêncî bavê min, hemû eqreba û nas û dostên me, li dijberî me û sîyaseta me derdiketin. Di derheqê me da gelek tiştên xirab û tiştên bêbingeh dianîn ziman. Gotinên xwe, bi xeybên ku wê demê di derheqê sîyaseta çep da dihatin kirin, dixemilandin û di herêmê da belav dikirin. Ji wan kesan yek jî xalêkî min bû.

Rojek di civata gunda gotibû; „Ez çûm bajêr li mala zavayê xwe bûm mêvan. Ez û herdu xwarzîyên xwe yên piçûk di odeyekî da razan. Bi berbanga sibê ra, ez ji bo nimêja sibê rabûm. Berî destmêjê min li berîka xwarzîyekî xwe nihêrî. Di berîka çakêtê wî da kaxizeke qatkirî hebû. Min kaxiz derxist, qatên wî ji hev vekir. Li ser kaxizê, xêncî zavayên min, navê hemû kesên malbatê û resmên wan hebûn. Di binê nav û resman da jî dinivîsand ku gor kesên malbatê, dewleta Uris her mehê ji wan ra pere dişîne...”

Ev fantezîyên xalê min di demeke kurt da, di nav nas û dostan da belav bûn, dê û bavê min jî bi van gotinên wî hesîyan. Dîya min diqahirî, sedem gotinên birayê xwe hêrs dibû û digirîya.

Bavê min jî di ber xwe da dikenîya û bi dîya min ra diaxiff û digot; „Tu ji gotinên birayê xwe yê pûç û vala bawer dikî, ya jî ji xwe û ji kirinên zarên xwe...”

Dema ku nas û dostên bavê min li rûyê wî di derheqê me da tiştên xirab bigotana, wî bersiva wan dida û digot; „Rast e, herdu lawên min ji bo destxistina mafê Kurdan sîyasetê dikin. Sedem sîyaseta wan a çep ez jî eciz im û şîretên xwe li wan dikim. Lê di derheqa dirustîya wan da, ez tu car nakevim şikê. Eger tiştên ku ew dikin, ji

bo destxistina mal û mulk ba, ji bo pul û pereyan ba, ew kesên ku xeyba zarên min dikin, berîya wan dest bi sîyasetê dikirin û diketin nav sîyasetê...”

Carcaran em li ser rewşa xwe û şîretên ku wî li me dikir, dixafîn û pê ra diketin gengeşîyê.

Bi sebr û xweşbîni li me û gotinên me guhdarî dikir û digot; „Ez dizanim hûn bawerîya xwe bi hebûna dinya wîyalî jî naynin, hûn tenê ji bo vê dinê difikirin û dixebitin. Sedem vê yekê ji nimêj û îbadetan dûr disekin. Ji bo vê yekê jî ez zorê li we nakim, lê tenê ber keda xwe dikevim ku, bi zor û zehmet min Qûran bi we da xwendinê, we ew jî da alîkî. Eger fikr û ramanên we rast be û gor bîr û bawerîyên we dinya wîyalî tûnebe, ez bi nimêj û îbadetên xwe, bi xwendina xwe ya Qûranê tu car zerar û zîyanê nabînim. Lê eger ku bîr û bawerîyên we rast dernekevin, wê gavê jî hûn li halê xwe binihêrin...”

Di xalên siyasî da jî rîya me ji hev cûda bû, lê têkilîyên me yên xurt, tu car kêr nebûn û neqetîyan. Me rûmeteke mezin dida bavê xwe û di hurmeta xwe da qisûreke piçûk nedikir, wî jî hezkirin û merhameta xwe ji me teksîr nedikir.

Sedem siyaseta me û kiryarên me yên siyasî, wî jî gelek ezîyet û cefa kişand. Şev û roj ji bo me qilqilî, li pey me gerîya. Li derê heps û zîndan da tade dît, ji alî dost û eqrebayên xwe va hate rexnekirin, lê dîsa jî di derheqê durustîya me da tu car neket şikê û dibin her şert û mercan da li pişt me sekinî û me parast...

Sal 1979 bu. Hilbijartina parlamentoyê nêzik bibû. Me wê demê ji bo pêşveçûna demoqrasîyê û sîyaseta çep alîkarîya CHPê dikir. Daxwaza alîkarîyê li dê û bavê xwe jî dikir û piştgirîya wan dixwest. Ji bo vê yekê bavê min hinek madê xwe sar dikir û digot; „Ez ji we û ji sîyaseta we tu tiştekî fam nakim. Li alîkî daw û doza kurdayetîyê dikin, li alîyê din jî li pey neyarê bav û kalên xwe diçin.

Hûn dizanin ku, ez rîya we û sîyaseta we rast nabînim, lê dîsa jî naxwezim dilê we bişkînim. Hûn ji min çî dixwazin, bixwazin, lê tenê ji min ra nebêjin ku dengê xwe bide partîya Mistoyê kor. Qasî ku ez dizanim, gelek partî têkilî vê hîlbijartinê dibin. Ji wan yek jî dibêjin partîya kominîstana e û serokê wê jî Marîcek e (Perîncek). Çiqas xirab be jî, me hê tu zerarek ji Merîcek nedîtîye. Lê partîya Mistoyê kor mala me xirab kir. Eger hûn bixwazin, ji bo xatirê we ezê dengê xwe bidim partîya Merîcek, lê kainat ji cîhê xwe rabe, ez tu car dengê xwe nadim partîya Misto...”

Dem û demsal derbasbûn. Bi teq û req, kin û dirêj min piştî dibistana ewil xwendina xwe domand û zanîngeh qedand. Dû ra li Îstebolê bi cîh bûm, zewicîm, bûm xwedî mal. Bavê min hat serlêdana min û li mala min bû mêvan. Em hemû êvaran rûdiniştin, dûr û dirêj li ser paşeroj û pêşeroja xwe diaxifîn.

Di wan rojan da, di dawîya emrê xwe da ji min ra wuha got: „Ez li ber xwendina te jî derketim. Lê we hemû rê li ber min girtin. Sedem wê yekê, êdî li hemberî biryara we tişt ku min bikira nebabû. Min xwe da alîkî û te jî dest bi xwendina xwe kir û domand. Bi salan şûnda ez bi neheqîya xwe hesîyam û min xeletîya xwe ya di vî warî da dît. Mixabin îmkana vegeerê nema bû. Ez îro gelek dilşa me ku te gotina min nekir û tu gihîştî armanca xwe. Xwezila ez li ber xwendina her du birayên te jî derneketama, bila îro ronîya her du çavên min jî ne ba!...”

Di derheqê sîyaseta me da jî her tim wuha digot; „Ez li dijberî armanca we dernakevim. Lê ez ditirsim hûn biser nekevin. Ji bo serkeftinê quwet lazim e. Neyarê we dewlet e û nayerekî bi hêz û quwet e. Bi şer û kuştinê mirov dewlêtê têk nabe. Heta nuha Kurd biser neketin, ez ditirsim hûnê jî biser nekevin. Ji bo serkeftinê du tişt lazim in, ew jî, hêz û yekîtî ne. Hêz û quweta we kêm e, di nav Kurdan da jî dubendîtî zêde ye...”

Di navberê salên 1990î da berê ez, dûr ra jî birayê min, em ji zilm û zordariya dewletê revîyan û gihîştin Europa... Kîngê me telefon vebikira; bi dengeke xemgîn û bi dilşewat ji me ra digot; „Li xwe baş binêrin û me ji bîr nekin. Çer hebe em careke din hevdu nabînin...”

Bi peyva xwe ya dawîyê ra, dengê wî duguherî, qirika wî tijî dibû, li benda gotinên me nedisekinî û ahîza telefonê dida dîya min...

Ew gotinên wî jî rast derket in û me careke din bi saxî hevdu nedît. Ew bi hesreta me çû ber rihma Xwedê, em jî ji merhamet û hezkirin û şîretên wî yên pîr û pak û rast mahrûm man...

Bavê min, mamosteyê min ê herî ewil, ji vir 17 sal berê çû ber rihma Xwedê. Du tiştên wî ji min ra mîrat man, du tiştên bi qîmet û bêhempa...

Ya yek, şîretên wî yên pîr û pak...

Ya din jî, saeta wî...

Wek îro tê bîra min.

Dem, demsala payîzê bû.

Li bajêr ji xwe ra saetek kirîbû.

Ew saeta ku ji min ra mîrate ma, tam 50 sal e, bê sekinandin tik tak, tik tak lê dixe. Ne sanîyekî pêşda diçe, ne jî şûnda dimîne...

Ji vir tam 50 sal berê, bavê min jî wek gundîyên me, kar û barê xwe yê havînê qedandibû. Merg û zevî hatibûn çinandin. Bêder ji erdê rabibûn.

Genimê ji bo toximê sala bê hatibû çalkirin, yê mayîn jî li aş hatibû hêrandin.

Ji bo tedarîka payîz û zivistanê, tenê dan û standina li bajêr mabû.

Weke dawîya her demsalên payîzê gundîyan bi hev ra berê xwe dabûn bajêr.

Diçûn, li bajêr dan û standina xwe dikirin, dû ra pel û pûtên xwe li kamyoneka servekirî bar dikirin, bi xwe jî

li kamyona sîyar dibûn û şûnda vedigerîyan. Heger şansê wan heba, kamyon hata binê gund dihat, ya jî gor însafa ajokerê kamyonê, kamyon li derekî disekinî. Heta ku bar dihat valakirin, ji rêwîyan yê hêrî xort, diket serê rê û bi lez û bez xwe digîhand gund. Bi hatina wî ra, ji her malekê xortekî erebê xwe yên ga girê didan û bi rê diketin... Zarokên gund jî derdiketin ser banê xanîyan û ji dûr va li rêya bav û kalên xwe dipan.

Xortên ku bi erebeyan diçûn, digihîştin kamyonê, eşyayê xwe li erebê bar dikirin û vedigerîyan.

Erebeyên ga û gameşan li pey hev rêz dibûn, gundîyên ku ji bajêr hatibûn, ew jî li kêleka erebeyên xwe bi peyatî ber bi gund dimeşîyan. Dema ku erebe nêzikî gund dibûn, zarok ji ser banê xanîyan dadiketin xwarê û ber bi wan dibezîyan. Diçûn destê mezinên xwe yên ji bajêr dihatin, radimûsan, bi şekirekî sor, ya jî bi baloneke rengîn şa dibûn û şûnda ber bi gund direvîyan...

Bavê min jî wê salê ji bo me her yekî kincên dirûtî û solên reş (jê ra lastîkên enqere digotin) anî bû...

Dema ku ji derî da ket hundur, wek roja îro tê bîra min, taximek kincên reş lê bûn, li ser navikâ wî jî zincîreke zîv dibiriqî. Serê zincîrê yek bi qulpê bişkoşka êlegê wî va girêdayî, serê din jî di berika êlegê wî da...

Ji kincên wî yê nû û diyarîyên me zêdetir zincîra li ser navika wî bala me hemûyan dikişand...

Em li dora wî kom bibûn, guhê me li gotinên wî, çavên me jî li zincîra ser navika wî bû. Berê diyarîyên me yekoyek da, pişt ra destê xwe avêt berîka êlegê xwe û serê zincîrê ji berîka xwe derxist. Di serê zincîrê da tiştêkî gilover, nivê wî yê ji alî jêr ji hesinê gewr, nivê wî yê alîyê jor jî ji camekî zelal pêk dihat. Di bin camê da jî hinek reqem û du hesinên tenik û zirav, ji alî çepê ber bi alî rastê dilivîyan û li dora hev diçûn û dihatin. Bi livandina wan ra dengê jê dihat, tik tak, tik tak...

Bavê min saeta xwe ravayê me da û got, „ji vî ya ra saet dibêjin, demê dijmêre...”

Min bixwe tu tiştêkî jê fam nedikir û nizanîbû ku saet çî ye û ji bo çî lazim e. Lê weke xweng û birayên min, min jî dengê ku jê derdiket meraq dikir.

Ji bo ku em dengê wê bibihîzin, bavê min jî hercarê saeta xwe ji berîka xwe derdixist, dor bi dor dida ber guhê me û daxwaza me dianî cîh...

Min cara yekemîn wê rojê saet dîtibû û di demek kurt da jî hînî saetê bibûm...

Xwîşka min ya mezin, ji bo saeta bavê min ji morîyên rengîn qilfêk hûnand. Ji qumaşê dêrîyê xwe jî parçeyek piçûk birî û bi hundurê xilfê ku ji morîyan hûnandibû va dirût...

Ji wê rojê şunda bavê min saeta xwe berê di nav qilfê wî yê rengîn da bi cîh dikir, dû ra jî hêdîka dikir bêrika xwe... Her roj, ber bi 7ê êvarê radyo vedikir, pişt ra jî saeta xwe ji berîka xwe derdixist.

Guhê wî li tûtika radyoyê, çavê wî jî li saetê, bê deng û bê qisedan, disekinî...

Dema ku xulekjimêra saetê dihat ser reqema 12an, wê demê tûtika ajansa 7ê êvarê jî lêdixist, ne çîrkeyek zû, ne jî dereng...

Bi rastxebata saeta xwe dilşa dibû û saeta xwe careke din bi fesal dikir berîka xwe û li ajansê guhdarî dikir...

Saeta bavê min, saeta wî ya 50 salî...

Îro, 17 sale ji bavê min dûr û li welateke xerîb, wek roja ewil tîk tak, tîk tak lêdixê, ne çîrkeyek şûnda dimîne ne jî pêşda diçe...

28.02.2016

Destpêka dawîyê...

Ji bûyîna mirovatîyê heta roja îro, qasî destpêkê, dawîya mirovatîyê jî hatîye û tê şirovekirin. Gor vegotinên olî, an jî gor zanînen zanyarî tu bersivek ji sedî sed nehatîye dayîn. Tiştên ku em dibihîzin, ew jî ji farazîyan pêş va naçin. Lê her farazîyek jî bê bingeş û vala nîne.

Ji van farazîyan yek, Salnameya Mayayîyan ne, ku gor lêkolînen kesên pispor, ev salname, di roja 21ê Berçilê 2012an da diqede. Pergal disekine, dem û dewran di cîhê xwe da dimîne...

Salnameya Mayayîyan, salnameyeke zanyarî nîne, lê ya herî kevn e. Tê gotinê ku, ew tiştên di wê salnameyê da hatinê nivîsandin, piranîya wan rast derketine. Sedem vê yekê ye ku gelek zanyar di derbarê vê salnamê da lêkolînan dikin û sedemên dawîlêhatina wê şirove dikin.

Gor hinek zanyaran dawîlêhatina salnamê, nîşaneyê da-wîlêhatina jîyana mirovatîyê ye.

Hinek zanyar jî dibêjin sala 2012an ne dawî ye, lê belê destpêka dawîyê ye. Gor şiroveyên wan, di sala 2012an da tofan radibe, erd û ezman di nav fizildûmê da dimînin. Piranîya zindîyan can didin. Yê dimînin, ew jî bi îmkânên iro, di her xalî da jîyaneke baş derbas dikin.

Lê ev dem jî, ne demeke dûr û direj e, kêma ya jî zêde 50 ya jî 60 sal e. Dû ra qiyamet diqete û di dinê da tu zindîyek namîne.

Farazîya duyem ya Albert Einstein e. Einstein salan berê gotîye ku, kîngê li dinê moz wenda bibin, hûn bizanibin ku wendabûna mozan, îşareta dawîya dinê ye.

Ew dem jî 50 ya jî 60 sal e...
 Ev gotinên Einstein, kingê hatin rojevê?
 Du meh berê.
 Çima?
 Li Amerîkayê moz wendabûn, loma...
 Farazîya sêyem jî farazîyeke olî ye.
 Wek tê zanîn ku, jîyana mirovatîyê li Mezopotamyayê
 dest pê kirîye. Dîsa tê gotinê ku dawîya jîyanê jî li wir di-
 qede. Gor vê farazîyê; li ser erdê Mezopotamyayê şereke
 mezin, şereke cîhanî derdikeve...
 Li alîkî hinek dewletên misilman û Êrîz, li alîyê din jî qe-
 wmek ji misilmanan bi kafiran ra dibe yek...
 Şer çend salan didome, lê tu alîyek bi ser nakeve...
 Dawîya şer da Mehdî yanê Hz. Îsa ji jor va dadikeve xwarê,
 careke din tê rû dinê...
 Dewleteke Cîhanî ava dike û bi xwe jî dibe hukumdarê
 wê dewletê.
 Di bin hukumdarîya wî da rêvebirîyek bi edlayî û wekhe-
 vî tê sazkirin...
 Hemû hemwelatîyên wê dewletê, reng û netew û ol' a
 wan çî dibe bila bibe, wek xûşk û bira bi hev ra, wekhev
 û azad dijîn...
 Lê ew dem jî ne dûr û dirêj e...
 Dawîya wê demê jî, roja qiyametê ye...
 Bi rastî ev hersê farazî jî ji bo min wek çîrok in.
 Ji wan ya herî nêzîk tê xuyakirin, ew jî ya sisîyan e...
 Ku rastîya wê jî, ji bo min tenê ne xem e...
 Lê xema min ewe ku heger ev farazî rast derbîkeve, ji
 bo Kurdên weke min, daxwaza Kurdîstaneke azad û ser-
 bixwe dikin, ew daxwaz jî li vê dinê weke xewn û xeyal
 dimîne...
 27.09.2007

Xewn û xeyalên kin û dirêj...

Xeyala ji zaroktîya min bi xewneke kin dûr ket!..

Xewnên di xewa ber bi destê sibê da têtên dîtîn, kin in...

Bi sivikbûna xewê ra xewn têtên birrîn, bi kurahîya xewê ra, ji cîhê ku qetîya be careke din dîsa dest pê dikin...

Sedem vê yekê ye ku mirov ne dixwaze ew xewa sivik biqede, ne jî dixwaze dawî li xewnên wî yên kin û dubarekirî were...

Wek xewn û xeyalên me yên li ser Kurdistaneke azad û serbixwe...

Weke hemû Kurdên welatperwer, xeyala min a ji dema zarokatîyê da dest pê kiribû, di destpêka havîna sala 2017an da cara yekemîn weke xewnek nêzîk bibû.

Weke xewnên kin û di xewa sivik da têtên dîtîn...

Di van demê dawîyê da her şev xewnên min zêde bûn û xeyala min a ji zaroktîyê, xemilandin.

Carcaran bi bayê serê sibê ra, hênikayîyek li rûyê min ket û ji xewa xwe ya sivik hîşyar dibûm.

Xewna min dihat birin...

Carcaran jî bi dengê telefona bêwext lêdixist ra, di nîvî da dima...

Ji bo ku, di ku da qetîyabe careke din dest pê bike, çavê xwe digirt...

Û bi daxwazeke ji dil va li benda destpêkirina wê ya ji nû va disekinîm...

Di ber xwe da dihênijîm, xewna min ji nû va dest pê dikir...

Xew kûr, xewn jî dirêj dibû...

Ne ez radibûm, ne jî dawî li xewnê dihat.

Min bi xewnê xwe dixapand, xewnê jî min li pey xwe dibir
û digerland...

Roj û şev li pey hev derbas dibûn.

Ez di nav şereşeke tarî da, li xeyalên xwe digerîyam.

Demsal bû havîn, tîrêja rojê dinya min germ kir...

Ji alî Başûr da bayekî sivik hat...

Fizildûmanek rabû, dawî li germahîya havînê anî.

Weke qirpîna birî û bijangan, havîn jî qedîya...

Demsala payîzê dest pê kir.

Rengê pelê daran guherîn.

Berê hêdî hêdî sor, dû ra zer û gewr bûn.

Bi bayê Bakûrê ra yekoyek ji serê daran pekîyan û ber bi
jêr hilweşîyan.

Li ser rûyê erdê belav bûn, di bin lîngan da man û pelixîn.

Bi qeşayîya şevê ra şil bûn, bi erdê ra zeliqîn...

Roj kin, şev dirêj bûn.

Bi dirêjîya şevên payîzê ra xewn zêde bûn, bi xewnên kin
û dirêj ra xeyal xemilîn...

Bi xewnên xwe yên dirêj ra dilşa...

Bi xewnên xwe yên kin ra jî xemgîn bûm...

Di şeva nivê demsala payîzê da, xewa min revîya...

Xeyala ku ji zarokatîya xwe da didît û li benda wê se-
kinîbûm, qasî gavekî nêzik hatibû û herşev xewnên min
dixemiland, careke din dîsa xatir xwest û di tarîya şevê da
ji min dûr ket...

Ez di payîza emrê xwe da, careke din bê xew û bê xewn
mam...

Êdî ne xewa min tê, ne jî xeyalan dibînim...

Zivistana sar û seqem wê çawa dest pê bike.

Û wê derd û kulên çawa li pey xwe bihêlê û derbas bibe...

Ez jî nizanîm...

Bêguman, zakona xwezayê ye, di her salê da dem û
demsal diguherin.

Careke din dê bihar were û dû ra havîn jî dest pê bike...

Lê ji îro da ne bihareke nû xûya dike, ne jî xewn û xeyalên min dest pê dikin.

Ba tê, ji çep û rast...

Bayê payîzê, bayeke sar û gurr...

Li pişta min dixê û kezêba min dipêritîne...

Eş û jan zêde dibe û li dil û gurçikên min dipijirîne.

Bêhna min di ber min da diçike...

Difetisim...

Ne xewn û xeyal ne jî zaroktîya min tê bîra min.

Serê xwe datînim ser balîfê û çavê xwe digirim.

Heger ku xewa min li min vegere...

Dibe ku xewn û xeyalên min jî ji nû va dest pê bike!

16-17.10.2017



*Jîyan bi Kurdî xweş e.
Jiber ku, Kurdî ji bo min ne tenê ziman e.
Kilam û stranên dengbêjan...
Çîrokê çîrokvanan...
Ken û henekên qîz û xortan...
Reng û dengê jîyana Kurdan...
Hebûn û xemla jîyana min e...
Di heft salîya min da, li min hate qedexekirin.
Wê rojê, ez kerr û lal bûm...
Guhê min xitimîn..
Zimanê min di devê min da tevizî...
Kenên min revîyan û ji min dûr ketin.
Di xortanîya xwe da,
rojek rastî Destana Memê Alan hatim.
Li ser zimanê xwe yê li ber mirinê vegeşîyam.
Guhên min ên xitimî vebûn.
Zimanê min ê tevizîbû, ji nû va livîya.
Ken hatin ser dev û lêvên min...
Îro bi zimanê xwe yê şêrîn difikirim...
Di axîfîm, dixwînîm û dinivîsînîm...
Guhê xwe didim kilam û stranên dengbêjan
Û gotinên çîrokvanan...
Dilê min geş, hestên min azad...
Jîyana min xweş û rengin dibe...*